

Mewlûda Bateyî di edebiyata Kurdî de metnek edebî û klasîk e. Di nav berhemên kurdî de berhema herî meşhûr e. Ev berhem ji aliyê dînî û edebî û musîkî tesîr li Kurdan kiriye û dike. Ji sedem van taybetîyên hanê xebatên li ser wê gellek girîng in. Li gorî qenaeta me ev xebat pirrtir girîng e. Lewra di xebatên li ser mewlûdê de bi pirranî wate girîng hatiye ditîn û aliyê huneran pirr hindik hatiye îzah kirin. Em dikarin bibêjin li ser hunerên Mewlûda Bateyî qet xebat tune ne an jî hindik in. Ev xebat ji aliyê huneran ji bo Mewlûda Bateyî pirr girîng e. Di vê xebatê de behsa hunerên di mewlûdê de yên 'ilmê meânî û beyan û bedî'e hatiye kirin. Bi awayekî kûr li ser wan hatiye seknandin. Qenaeta me ew e ku ev berhem ji aliyê hunerên di metnên Kurdî de ne mînak e.

Şarkiyat

BİLİM VE HİKMET VAKFI YAYINLARI

ISBN 978-625-98843-4-9



9

78625

9884349

M. EDİP ÇAĞMAR

MEWLÛDA NEBÎ Bİ HUNERÊN EDEBÎ

Şarkiyat

BİLİM VE HİKMET VAKFI YAYINLARI

MEWLÛDA NEBÎ Bİ HUNERÊN EDEBÎ

Min hebin sêsed hezar ezman û dev
Yek demê xafil nemînim roj û şev
Wesfê husna te bibêjim subh û şam
Sed qiyamet dê biçîn, hêj na tamam

M. EDİP ÇAĞMAR

Şarkiyat

BİLİM VE HİKMET VAKFI YAYINLARI

MEWLÛDA NEBÎ BÎ HUNERÊN
EDEBÎ

Prof. Dr. M. Edip ÇAĞMAR

Şarkiyat

BİLİM VE HİKMET VAKFI YAYINLARI

Diyarbakır 2023

Hemû mafên weşandina vê pirtûkê aîdê weşanên Weqfa
Rojhilatî ya Zanist û Hîkmetê ye. Ev pirtûk bê destûra
weşanxaneyê û weşînerê wê nayê zêdekirin û qopîkirin û
çapkirin.

Mewlûda Nebî Bi Hunerên Edebî

Yazar: M. Edip Çağmar

ISBN: 978-625-98843-4-9

© Şarkiyat Bilim ve Hikmet Vakfı Yayınları

E-Yayın/Aralık 2023, Diyarbakır

Tüm Hakkı Saklıdır

Editör: Hayreddin Kızıl

Kapak ve Mizanpaj: Fuat İstemi

Şarkiyat Bilim ve Hikmet Vakfı Yayınları

Sertifika No: 52468

Mimar Sinan Cad. Aslan Apt. A Blok, Kat: 1, No: 2,

Yenişehir/DİYARBAKIR

<https://www.sarkiyat.org/>

sarkiyatvakfi@gmail.com

Prof. Dr. Mehmet Edip Çağmar: Bi eslê xwe ji navçeya Farqînê ya Amedê ye. Çend salan bavê wî li gundên Qelqelî ya Wanê melatî kiriye. Ew di sala 1967an da li gundeki Qelqelîyê jî dayik bûye. Xwendina xwe ya dibîtsana seretayî li Farqînê xelas kiriye. Xwendina navîn jî li Amedê temam kirîye. Di sala 1993an da li Zanîngeha Herranê di zankoya Îlahîyatê da xwendina xwe ya lîsansê qedandîye. Di heman Zanîngehê da di sala 1995an da lîsansa xwe ya bilind û di 2003an da jî doktora xwe temam kirîye. 2006an da pileya doçentîyê û 2012an da jî pileya profesoriyê bi dest xistîye. Bê xwendina fermî li medreseyên Amedê, Farqînê, Batmanê, Çinarê û Rihayê jî tehsîla îlmê kirîye. Çend salan li gundekî navçeya Çinarê melatî kirîye. Ji sala 1994an heta niha li Zanîngeha Dîclê Fakulteya Îlahîyatê wek akademisyen dixebite. 11 heb pirtukên wî û dora 30 heb jî gotarên wî hatine weşandin.

NAVEROK

PÊŞGOTIN	5
DESTPÊK	8
1. JIYANA MELAYÊ BATEYÎ Û MEWLÛDA WÎ	8
1.1. Jiyana Bateyî	8
1.2. Mewlûda Bateyî	10
RÊBAZA NIVÎSANDÎNA VÊ XEBATÊ	13
HUNERÊN EDEBÎ DI MEWLÛDA BATEYÎ DE	17
Mijara Yekem: Pesnên Xwedê	17
Mijara Duyem: Selat û Selam û Pesnên ji bo Pêxember	36
Mijara Sêyem: Xêra Xwendina Mewlûdê	56
Mijara Çarem: Afirandina Nûra Cenabê Pêxember	77
Mijara Pêncem: Afirandina Hz. Adem	104
Mijara Şeşem: Întiqala Nûra Pêxember	133
Mijara Heftem: Wîladeta ‘Ebdullah	139
Mijara Heştam: Neyartîya Cuhûyan Li Hemberî Pêxemberê Me. ...	164
Mijara Nêhem: Zewaca ‘Ebdullah û Amîne	182
Mijara Dehem: Weqta Hemla Amîne Bi Hz. Pêxember	217
Mijara Yazdehem: Hatina Hz. Pêxember bi bal Dinyayê	231
Mijara Duwazdehem: Merhaba Dayîna Kaînâtê Ji Hz. Pêxember Re	246
Mijara Sêzdehem: Munacat û Niyaz	256
ÇAVKANÎ	273

PÊŞGOTIN

Ziman nîmetê Xwedê ye û Wî ziman daye hemû mirovan. Mirov bi saya ziman hest û nirx û ramanên xwe ji yên li der û dora xwe re dibêjin. Ziman ji bo tiştên ku di dil û aqilê mirovan de ye wek derî ye. Tiştên behsa ji wan girêdayî bi îhtîyacê ve be piştî destbixistina îhtîyacê qala wan nayêkirin. Lê tiştên ku eslê wan li ser bawerî û hezkirinê ne, xeberdan û peyvên der barê wan de daîmî ne. Dîn jî yek ji van mijaran e. Lewra her bawermend ji bo jiyana xwe dîn girîng dibîne. Çi bawermendên dînê Îslamê çi jî bawermendên dînên din ferq nake. Ji bo ku evîn û hest û bawerîyên xwe diyar bikin îhtîyaca wan ya bi bal ziman ve pir zêde ye. Mirovên bawermend niyazên xwe, hezkirinên xwe, îbadetên xwe hemû bi zimên diyar dikin. Mewlûd jî ji ber ku eleqeya wê bi Hz. Pêxember ve heye dikeve nav vê qategorîya me got. Mewlûd cureyek ji wêjeyê ye û ji aliyê dînî û edebî ve gellek pêşda çûye. Ji ber van tiştên me gotin Mewlûda Nebî di nav mislimanan de belav bûye, ciyek girîng girtiye. Mewlûd bi awayekî giştî bi zimanê pirên netewên misliman hatiye nivîsandin. Li gorî tesbîtên zanyaran berhemên wek mewlûdan di sedsala sêyem a koçî de bi zimanê Erebi hatine nivîsandin. Lê di sedsala şeşem an jî heftem a koçî de ji bo hatina Hz. Pêxember bi bal dinyayê ve ji aliyê rêveberan civîn hatine saz kirin û berhemên mewlûdan hatine xwendin. Li dû van tiştan nivîsandina mewlûdan zêde bûye. Li gorî Sexawî (w. 902/1428) heta zemanê wî hejmara mewlûdên Erebi gihîştîye sedan.¹ Niha tesbîtkirina hejmara mewlûdên bi zimanê Erebi ku heta niha hatine nivîsandin mimkun nîne. Mewlûd bi zimanê Kurdî û Tirkî û Farisî jî pir hatinin nivîsandin. Bi zimanên din jî mewlûd

¹ es-Sexawî, *el-Îlân bî't-Tewbîx*, r. 90; Çağmar, M. Edip, *Edebî Açından Arapça Mevlitler*, r.17.

hatine nivîsandin. Li gorî agahiyên ku niha di destê me de ne di nav mewlûdên Kurdî de mewlûda herî kevin a Bateyî ye.²

Mewlûda Bateyî bi sed salan e di nav gelê Kurd de tê xwendin û tê hezkirin. Heta zemanek nêzîk jî piraniya zarokên Kurdan piştî xwendina Qurana pîroz mewlûda Bateyî dixwend û mewlûd di zihna zarokan û di ziberê wan de bi cî dibû. Metnek Kurdî û Edebî bi rêyek xwezayî di zihna wan de bi cî dibû. Ji ber vê taybetiyê di peyvên pirrên Kurdan de rist û malikên mewlûdê hene û Kurd di gotinên xwe de wan tînin ziman. Li gorî qenaeta me sebebê belavbûna mewlûdê di nava Kurdan de bi tenê aliyê dînî nîne. Belkî aliyê edebî ye jî. Lewra mewlûda Bateyî ji aliyê gotin û wateyê ve bi awayekî tevayî xwedî xususiyetên heja ye. Li gel vê rewşa mewlûda Bateyî jî hindik xebat li serê çêbûne. Hemû xebatên hene jî bi tenê li ser wateya mewlûdê disekin û behsa hunerên wê yê wêjeyî nakin. Heta niha tu berhemeke ku behsa hunerên di mewlûdê de ne kiribe me nedît. Ji bo rewşa mewlûda Bateyî ji aliyê hunerî derkeve holê me berhemek bi vî awayî nivîsand. Lewra mewlûda Bateyî ji aliyê hunerên edebî ve gellek dewlemend e. Di pirê malikên mewlûdê de herî hindik çar-pênc hunerên edebî hene. Hunerên di mewlûdê de bi tenê şibandin, kînaye, îstîare û mecaza mursel nînin. Belkî di mewlûdê de hunerên ku ji ilmê meanî û bedî'ê ne jî hene.

Li gorî qenaeta me vê berhema me ji aliyê du xalan ve gellek girîng e. Yek jê behskirina hunerên di mewlûdê de ye. A duyem

² Ji bo mewlûdan bnr: Tayyip Okıç, "Çeşitli Dillerde ve Süleyman Çelebi Mevlidinin Tercemeleri", Atatürk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, sayı: 1975; Zahir Ertekin, *Mela 'Elîyê Baqûstanî û Mewlûda Wî*, Muqaddîme-2015, 6 (1), r., 107; Kızıl, Şinğar-Çetin, *Ceribandinek Li ser Senifadina Kurdiya Kurmancî li Gorî Mijarên Wan*, *Înternational Journal of Kurdish*; Issue, No. 1. (2015/1); Çağmar, *Edebî Açından Arapça Mevlitler*, r., 15-23.

ji pirkêm bûna berhemên bi vî awayî di zimanê Kurdî de ye. Îhtîmal heye ku di zimanê Kurdî de berhemên bi vî awayî tune be ji. Me heta niha berhemek tam bi vî awayî nedît. Belê hinek berhemên li ser Dîwana Melayê Cizîrî yan ji li ser berhemên Ehmedê Xanî hebin ji yan giraniya wan ne li ser huneran e yan ji di wan de wate li pêşîya huneran e. Di wan de pirên caran li ser hunerên zanistên beyanê û bedî'ê hatiye rawestin. Li ser hunerên zanistê meanîyê nehatiye rawestin. Belkî qet behsa hunerên meanîyê nehatiye kirin. Me di vê berhemê de bi qasî mimkun bûye Mewlûdê li gorî her sê zanistan ji şîrove kir. Ji ber ku ji vî alîyî de di Kurdî de nimûne pirkêm in xebatên bi vî awayî gellek zehmet in. Ji ber kêmbûna nimûneyan û ji ber hinek tiştên din ji, bawer dikim di vê xebatê de xeletî û şaşîtî û kêmanî hene. Lê tevî vî halî ji em hêvî dikin ku hûn kêmanîyên min mazûr bibînin û min ji wan haydar bikin.

Spasiyên xwe ji Xwedê re pêşkêş dikim ku ne bi alîkarî û minneta wî be tu tişt naçe serî û nagihêje armanca xwe. Lewra hemû tişt bi alîkariya Wî ye. Spasiyên xwe ji bo Prof. Dr. Abdurrahman ADAK, Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU û Prof. Dr. Hayreddin KIZIL pêşkêş dikim.

M. Edip ÇAĞMAR

Amed-2023

DESTPÊK

1. JIYANA MELAYÊ BATEYÎ Û MEWLÛDA WÎ

1.1. Jiyana Bateyî

Melayê Bateyî di edebiyata Kurdî de alim û helbestvanekî klasîk û girîng e. Bandora wî di der û dorên edebiyata Kurdî de belav bûye û her Kurdê ku haya wî ji Kurdîtîya wî heye navê wî bihîstîye.

Derbarê jiyana vî helbestvan û zanayê me de agahiyên cuda hene. Berîya hemû tiştan dema jiyana wî bi awayekî qetî kifş nîne. Lewra li gorî hinek lêkolîneran Bateyî di serê sedsala 15an de ya zayînî ji dayikbûye û di paşîya vê sedsalê de jî wefat kiriye. Li gorî wan jidayikbûna wî 1417ên zayînî de ye û wefata wî jî 1495an de ye.³ Lê hinek lêkolîner dibêjin ku Bateyî di sedsala 15an de ne jiyaye. Li gorî wan Bateyî di sedsala 18ên zayînî de jiyaye.⁴ Jiyana wî di sedsala 18an de di nav lêkolînerên 30-40ên salên dawî de pirtir hatiye qebûlkirin. Delîlê yê ku dibêjin Bateyî di sedsala 18an de jiyaye derbas nebûna navê Bateyî di berhemên Melayê Cizîri, Feqîyê Teyran û Ehmedê Xanî de ye. Lê çawa Rênas jiyana jî dibêje navê wan jî di berhemên Bateyî de derbas nabe. Li gorî fikra wan ev tişt gotina wan red dike.

Navê Bateyî, Huseyn e û navê bavê wî jî Mistefa ye. Di hinek berhemên de an jî di nav gel de ji bo Bateyî navê Hesên an jî Ehmed hatibe bikaranîn jî, tê gotin ev her du jî navê Bateyî nînin.

³ Zekî Beg, *Meşahîru'l-Kurd û Kurdîstan*, I, 446; Baba Merdoxê Rûhanî, *Dîroka Navdarên Kurd*, I, 201; Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebîyata Kurdî*, 85; Melayê Bateyî, *Mewlûd û Hemû Helbestên Wî*, (Amadekar: Rênas Jiyana), r., 10.

⁴ Molla Huseyîn Bateyî, *Mewlûda Nebî*, (Werger û şîkar: M. Xalîd Sadînî.), r. 7.; Bateyî, *Mewlûd Melayê*, (Amdekar: Huseyn Şemrexî), r. 16.

Di serê destnivîsa pirtukxaneya taybet a Seyda Îsmâ'îl Taha Şahîn de ku Seyda li Duhokê ye “tesnîfu Mewlana Muhemmed Bateyî” hatiye nivîsandin.⁵

Mexlesa vî nivîskar û helbestvan û zanayê me Bateyî ye. Batê navê gundê wî ye. Batê gundekî navçeya Elkê (Beytu's-şebabê) ye. Ev navçe îro li ser Şirnexê ve ye. Lê di zemanê Bateyî de ev navçe Navçeyeka Colmergê bûye. Ji ber vî tiştî Bateyî bi Hekarîfî jî hatiye naskirin. Ji bo wî nisbeta el-Hekkarî hatiye bikaranîn. Di hinek berheman de Ertûş wek gundê wî hatiye nîşandayîn.⁶ Lê Batê gundê wî ye û Ertûş jî navê 'eşîra wî ye. Ji sedem ku Bateyî alimekî olî bûye di nav gel de jê re Melayê Bateyî jî hatiye gotin. Bateyî ji 'Eşîra Ertûşîyan e. Loma ji bo wî nisbeta Ertûşî hatiye bikaranîn.⁷

Li gorî agahiyên di berheman de hene Bateyî li cem kekê xwe dest bi perwerdehîya xwe kiriye.⁸ Di dû re wek feqîyên herêmê ji bo tehsîla îlmê ji gundê xwe derketiye û çûye bajarên herêmê û demekê li wan deran xwendîye. Gava nû ji bo ilmê derketiye û demekê li Colemergê xwendîye. Piştî vê xwendina xwe berê xwe daye 'Îmadî, Duhok, Mîks û Cizîrê û li van deran xwendîye.⁹

Hinek lêkolîner dibêjin ku sê berhemên Bateyî hene.

1. Dîwan: Lê vê tesbîta hanê ne bi wateya diwaneke serbixwe ye. Xalid Sadînî dibêje “35 qesîdeyên cuda yên Bateyî hatine tesbîtkirin û weşandin. Sî û pênc qesîde nîşanî me didin

⁵ Di serê vê destnivîsa wê de بلسان الكردي تصنيف هذا مولود النبي صلى الله عليه وسلم مولانا محمد باتي رحمة الله عليه hatiye nivîsandin.

⁶ el-Behrekî, *Hayâtu'l-Emcâd Mîn 'Ulemaî'l-Ekrad*, I, 63.

⁷ Hemdî es-Selefî-Doskî, *'Îqdû'l-Cuman*, II,799.

⁸ Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebîyata Kurdî Ya Klasîk*, r. 244.

⁹ Hemdî es-Selefî-Doskî, *'Îqdû'l-Cuman*, II,799. Melayê Bateyî, (Amadekar: Şemrexî), r. 15.

ku dîwaneke Bateyî hebûye.”¹⁰ Sî û pênc qesîde ji bo dîwaneke kafi ne. Hinek lêkolîner dibêjin ku dîwaneke wî ya ji helbestên Kurdî û Erebi pêkhatî hebûye.¹¹ Tehsîn Îbrahîm Doskî di sala 1996an de helbestên Bateyî wek pirtûk daye çapkirin.

2. Mewlûdu'n-Nebî. Ev berhem mijara vê xebata me ye.

3. Hemaîl: Berhemeke ji bo şifayê an jî ji bo îş û karê mirovan rast bibe hatiye nivîsandin. Li gorî hinek nivîskaran *Hemaîl* pirtûkekî mezin e. Bi piranî zimanê wê Erebi ye. Hinek tiştên bi zimanê Farisî jî tê de hene.¹²

1.2. Mewlûda Bateyî

Navê Mewlûda Bateyî di piraniya çap û nusxeyan de “Mewlûdu'n-Nebî” hatiye nivîsandin. Çap û destnivîsên vê mewlûda hanê yên cuda hene.¹³ Li ser hinek destnivîsan “Mewlûdu'n-Nebî” hatiye nivîsandin. Li ser hinek nusxeyan jî navê wê “Kîtabu Mewlûda Şerîf” û “Mewlûd” hatiye nivîsandin.¹⁴

Mewlûda Bateyî xusûsen di van salên dawîyê de pir hatiye çapkirin û derbarê wê de xebatên cuda çêbûne. Şerhên Seydayê Mela Zeynelabidîn Amedî û Seydayê Mela Nûrûllahê Godişkî û Seydayê Mela Mûsayê Celalî ku li ser mewlûda Bateyî ne meşhûr in.¹⁵ Li gorî M. Emîn Zekî Beg çapa wê ya yekem ji aliyê

¹⁰ Molla Huseyîn Bateyî, *Mewlûda Nebî*, (Werger û şîkar: M. Xalîd Sadînî.) s. 7.; Bateyî, *Mewlûd Melayê*, (Amedekar: Huseyn Şemrexî) r. 16.

¹¹ Merdoxê Rûhanî, *Navdarên Kurd*, I, 201.

¹² Hemdî es-Selefî –Tehsîn Doskî, ‘Iqdu'l-Cuman, II, 803.

¹³ Ji bo jiyana Bateyî û ji bo Mewlûda wî û çap û nusxeyên mewlûdê bnr., Adak, *Destpêka Edebîyata Kurdîya Klasîk*, r. 241-252.

¹⁴ Abdurrahman Adak, “*Destnivîsên Mewlûda Melayê Bateyî Di Arşîva A Jaba De: Nasandin û Analîz*”, *The Journal of Mesopotamian Studies*, C:2/2, Havîn, 2017, 1-29., r., 6-10.

¹⁵ Min ji çend kesan bihîst ku Seyda Mela Ehmed Qoxî, Şerhek li ser Mewlûda Bateyî nivîsandiye. Lê tevî teşebbusên me jî vê xebata hanê

rojhilatnas Von Loc hatiye çapkirin.¹⁶ Li gorî hinekan jî cara yekem ji alîyê Kudîzade Ehmed Ramîz hatiye çapkirin.¹⁷ Zîver Îlhan di teza xwe ya lîsansa bilind de der heqê destxet û çapên Mewlûdê de agahî dide. Li gorî agahiyên wî çapa herî zû çapa Ehmed Ramîz nîne; dibe ku çapa Haziq be.¹⁸

Mewlûda Bateyî bi qalibê 'erûzê hatiye nivîsandin. Bateyî di vê berhema xwe de qalibê "fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun" bikaranîye.¹⁹ Mewlûd bê malika tê dubarekirin 567 malik in. Lê dîsa jî hejmara malikan li gorî beşa merhebayê diguhere. Lewra ev beş di hinek nusxeyên mewlûdê de heye. Lê di hinekan de tune ye. Nusxeyên ku beşa merhebayê di wan de heye jî hejmara malikên merhebayê wek hev nîne. Temamê mewlûdê hijde beş e. Mijara beşa yekem hemd e; mijara ya dawî jî dia û munacat e. Bi awayekî giştî naveroka mewlûdê bê van her du mijarên me gotin fezîleta mewlûdê, pesnê pêxember û mewlûdê, behsa çêkirina Hz. Adem û nûra Hz. Muhemmed, behsa bavê wî Hz. Ebdullah û wî ye. Bûyerên heta wîladeta Hz. Pêxember û mayîna Hz. Pêxember li nav Qebîla Se' dîyan e.²⁰

Mewlûda Bateyî bi malika jêrê dest pê dike.

Hemdê bêhed bo Xudayê 'alemîn

Ew Xudayê daye me dînê mubîn²¹

û bi malika jêrê jî diqede

neket deste me. 'Ebdû'l-Basît el-Amedî û Huseyin Şemrexî jî li ser Mewlûda Bateyî şîroveyên xweş nivîsandine.

¹⁶ Zekî Beg, *Meşâhîru'l-Kurd ve Kurdîstan*, II, 446.

¹⁷ Hemdî ês- Selefî-Tehsîn Doskî, *Îqdu'l-Cuman*, II, 804.

¹⁸ Zîver Îlhan, *Mewlûda Mela Huseyîn Bateyî (Metn û Lêkolîn)*, r.56-66.

¹⁹ Abdurrahman Adak, *Teşeyên Nezmê Di Edebîyata Kurdî Ya Klasîk De*, r. 263.

²⁰ Bateyî, *Mewlûd*, r. 7, 9, 11, 14, 19, 25, 32, 43, 51, 90.

²¹ Bateyî, *Mewlûd*, (Amadekar: Huseyin Şemrexî), r.9.

Bo cemî'ê muslîmîn û salîhe

Bo feqîrê Bateyî el-fatîhe²²

Di piraniya çap û nusxeyan de

Ger divêtin hûn ji narî bin necat

Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin esselat²³

malika neqeratê ye.

Lê di çapa ku Kurdîzade Ehmed Ramîz weşandiye de malika

Sallû 'eleyhî ve sellîmû teslîma

Heta tenal û ceneten we neîma²⁴

malika neqeratê ye.

Di destnivîsa pirtûkxana Seyda Îsma'îl Taha Şahîn de malika neqeratê qet nehatiye di şuna neqeratê de navê mijarê hatiye nivîsandin.

Mewlûda Bateyî ji alîyê ziman ve hêsan e. Lewra mirovekî Kurdî baş zanibe û bi awayekî pir hindik hinek peyvên Erebi û Farişi ji zanibe famkirina Mewlûdê jê re ne zehmet e. Ji alîyê hunerên edebî jî dewlemend e. Lewra di her malikê de çend huner derbas dibin. Tê de ji her sê zanistên belaxetê jî huner hene. Li gorî qenaeta me, di mewlûdê de hunerên herî zede hatine bikaranîn îcaz, îtnab, tekîd e. Li dû van huneran îstîfere, mubalexe, îktîfa tê. Ji ber sedema ku zimanê Bateyî zimanekî hêsan û sade ye, gava meriv li ser hunerên edebî fikir neke, di mewlûdê de meriv zû li hunerên edebî hay nabe. Lewra hinek malik pir bi awayekî rehet tînin famkirin. Bê nêrîneke kûr û hişyar tesbîtkirina hunerên di wê de dijwar e. Lewra hêsantîya zimanî dibe sebebê kêmkirinê li ser malikên mewlûdê. Bi awayekî giştî hunerên di mewlûdê de cure ne. Yek jê hunerên di ziman

²² Bateyî, *Mewlûd*, (Amadekar: Huseyin Şemrexî), r. 93.

²³ Bateyî, *Mewlûd*, s.7, 9, 90, 92.

²⁴ Bateyî, *Mewlûdu'n-Nebî*, (Amadekar: Kurdîzade Ahmed Ramîz), r.; 1, 2, 3, 6, 9.

de pir belav bûne ne û ji ber sedema ku pir belav bûnê ew daketine asteke xwarê û alîyê wan yê hunerî bala kesî nakşîne. Ji bo vê cureya hanê mînaka herî baş hunerên îtnab, îcaz û tekîdê ne. Cureya duyem a hunerên di ziman de an jî di peyvên mirovan de pir nayên ditîn îstîfere, îktîfa, kînaye ne.

Mewlûda Bateyî kevn e û di nav gel de belav bûye. Ji sedem vê taybetîyê pir berhemên mewlûdên ku piştî Bateyî hatine nivîsandin di bin bandora wê de manin.²⁵ Ev tişt ji alîyê naverok û tertîba mijaran ve di hinek mewlûdan de pir eşkere ye.²⁶

RÊBAZA NIVÎSANDÎNA VÊ XEBATÊ

Mebesta me ji vê xebatê danasîna mewlûda bateyî ji alîyê hunerên edebî ve ye. Ji ber vê armancê me mewlûda Bateyî ji serî heta beşa merhebayê û li dawîya wê jî beşa Ehmedayê ji alîyê huneran şîrove kir. Lewra mewlûd bêyî malika hatiye dubarekirin 567 malik in. Ji wan malikan bi tenê li ser 330 malikan hate sekinandin û ji alîyê hunerê lêkolîn hate kirin û agahî hate dayîn. Li gorî qenaeta me ev jî ji bo danasîna hunerên di Mewlûda Bateyî de têr dike. Di civak û merasiman de gava Mewlûda Bateyî tê xwendin piştî beşa merheba heta beşa “Vegera Helîmeyê bi bal Mekkeyê” nayê xwendin. Vê xala hanê jî sebebek e ji bo nerawestina me li ser hinek beşên mewlûdê.

Di vê xebatê de berîya her tiştî, me gotin û hevokên mewlûdê ji xwe re kirin mesned û li gorî wate û şîroveyên wan tesbîta hunerên edebî hate kirin. Me gotin û hevokên mewlûdê ji alîyê

²⁵ Hayreddin Kızıl, Cemal Şığnar, Ramazan Çetin, “*Ceribandinek Li ser Senîfadîna Kurdiya Kurmancî li Gorî Mijarên Wan*” *Înternational Journal of Kurdish*, r. 58.

²⁶ Bnr.; Hayreddin Kızıl, “*Diyarbakır ve Çevresinde Yazılmış Meolitlerin Konularına Göre Tasnifi Denemesi, e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*”, Sayı: VII, Nisan-2012.

wateyê û ji alîyê lefzê ve qet îhmal nekir. Li ser vî eslî hinek huner tevî îhtîmalên ze'îf jî ji alîyê me ve hatine tesbîtkirin û hatine nivîsandin. Di vê nivîsê de heqîqet û mecaz gellek girîng hatine dîtîn û li gorî vê xalê jî huner hatine tesbîtkirin. Tiştêkî din jî carinan ji bo tesbîtkirina wateyê me bi heqîqet û mecazê tenê îktîfa nekir. Bejeya “nûr”ê ji bo vê xalê mînakek ji wan e. Lewra ji bo tesbîtkirina wate û hunerê di bêjeya “nûr”ê de berhemên tesewufê û belkî carinan jî berhemên hedîs û siyerê jî hatine xwendin. Lewra wateya vê bêjeyê di ferhengan de “ronahî” ye, di pirtukên belaxetên de “rênîşandan” e û di tesewûfê de jî “nûr”a Hz. Pêxember e. Ev bêje li gorî van tesbîtan hatiye nîrxandin.

Di tesbîta huneran de li çap û destnivîsê Mewlûda Bateyî yên cuda hate mêzekirin. Li gorî wan mêzekirinan mewlûd ji alîyê huneran ve hate şîrovekirin.

Ji ber ku di vê xebatê de wate û nuqte û mêzekirinên cuda esas hatine girtin di derxistina huneran de an jî di tesbîtkirina wan de carinan ji bejeyekê çend huner hatine derxistin.

Dibe ku carinan hinek xwendevanên vê berhemê bibêjin: “Bateyî tiştên ku di vê berhemê de hatine gotin qesd nekiriye.” Lê me ji qesda Bateyî zêdetir metin ji xwe re kir mesned. Li gorî metnê Mewlûdê me li ser Mewlûdê fikir û ramanên xwe ji alîyê hunerê ve diyar kir. Lewra qesda Bateyî dibe ku ne diyar be. Li gorî metnê û wateya jî metnê tê famkirin huner hatine tesbîtkirin. Hunerên di vê xebatê de derbas dibin hemû li gorî belaxetê hatine tesbîtkirin. Bi tenê di tesbîta çend huneran de alîyê luxetê jî mihîm hate qebûlkirin. Hunerên tewcîh û muşakeleyê ji vê xalê re mînak in. Lewra di tesbîta van her du huneran de tenê bi pênaseya têgehî nehate îktîfakirin. Wateya wan a ferhengî jî mihîm hate dîtîn û carinan li gorî wê wateyê malikên Mewlûdê

ji alîyê hunerê ve hatin şîrovekirin. Me bi qasî tespîtîkirina xwe behsa hemû hunerên edebî yên di mewlûdê de ye kir. Lê me qet tu behsa qafîye û redîfan nekir. Lewra di malikekî ji malikên mewlûda Bateyî de herî hindik ya qafîyeyek yan jî redîfek heye. Ji sedem pîrbûna van her du huneran di mewlûdê de me jî nexwest em behsa wan bikin. Lewra behsa ji wan dibû sebab ji bo dirêjîkirina vê berhemê.

Ji bo bi awayekî rast em huneran tesbît bikin berîya her tiştî me famkirina wateya malikan girîng dît. Bi vê mebestê ji îzah û şîroveyên li ser Mewlûda Bateyî ye hate îstîfadekirin û ji bo famkirina her malikê me ji berhema Seydayê Mela Zeynelabidîn Amedî “*Behcetû'l-Enam bi Şerhî Mewlîdî Sahîbi'l-Meqam fî Yewmî'l-qîyam*”, Seydayê Mela Nûreddîn Godîşkî, “*Sehlu'l-Mewrîd fî Şerhî'l-Mewlîd*”, Seydayê Mela Mûsayê Celalî Beyazîdî, “*Feydu'l-Kadîrî'l-Mubdî Şerhu Mewlîdî'l-Kurdî*” û ji şîrove û ji îzahên M. Xalîd Sadînî, Rênas Jiyan, Huseyn Şemrexî û Ebdulbasît el-Amedî pir îstîfade kir. Bê van berhem û lêkolinerên navê wan derbas bû ji berhemên luxet, belaxet, nehiw, tefsîr, hedîs û hwd. sûd hate girtin.

Di vê xebatê de her malik yek bi yek hate şîrovekirin. Di serî de wateya wan hate gotin. Ji bo wateyê çend îhtîmal hebin hemû hatin nivîsandin. Di dû re jî li ser huner hate sekinandin. Ji bo hunerên hatine behskirin tevî hev nebin berîya hunera hejmar bi reqeman hate nivîsandin.

Di vê xebatê de pirê caran navê têgehan ên Erebi hatine nivîsandin. Tegehên nehwe jî û yên belaxetê jî navê wan ên Erebi hatine gotin. Lê di hinek ciyan de têgeh bi Kurdî jî hatine gotin. Lê carinan peyre Erebiya wan jî hatiye nivîsandin.

Di tesbîtîkirina huneran de hinek carinan lêkera “dibe”yê hatiye bikaranîn. Sebebê bikaranîna lêkera “dibe”yê çend tişt in.

A yekem nediyarbûna wateyê ye. A duyem îhtîmala cudatîya halê ku bûye sebebê malikê. A sêyem ji pîrbûna wateya hevokê an jî bêjeyê ye. A çarem musaît bûna wateyek ji bo çend hunerane. A pêncem hebûna îzafîyetê di ilmê belaxetê de ye.

HUNERÊN EDEBÎ DI MEWLÛDA BATEYÎ DE

Mijara Yekem: Pesnên Xwedê

Hemdê bêhed bo Xudayê 'alemîn

Ew Xûdayê daye me dînê mubîn

“Pesn û sena û sipasiyên bêdawî ji bo Xwedayê ‘aleman bin. Ew Xwedayê ku daye me dînê eşkere, an jî dînê ku tiştan eşkere dike.”

1. Di risteya yekem de telmîh bi bal ayeta jêrê ve heye.

الحمد لله رب العالمين

“Temamê hemdan (pesn û spasiyan) ji Xwedê re be ku ew perwerdîgarê hemû ‘aleman e” (el-Fâtîha, 2).

2. Di vê malikê de husnu’l-îbtîda jî heye. Lewra di dû hemdê de behsa ol, ummet û tabi’iyeta Pêxember (s.x.l.) tê kirin. Ji ber ku van wateyan hemû jî muvafiqê mewlûdê ne li vir husnu’l-îbtîda derketiye holê.

3. Di te’bîra “bêhed”ê de mubalexe heye.

4. Di berîya bêjeya “bo”yê de daçeka “ji”yê ketiye. Ji ber ketina vê bêjeyê li vir îcaz heye.

5. Di bêjeya “mubîn”ê de tewcîh heye. Lewra ev bêje û bêjeyên ku ji reha vê bêjeyê bixwe tî bi muteadîtî (gerguhêzî) jî û bi lazimîtî (negerguhêz bûn) jî tî bikaranîn. Ji sedem vê xalê dibe ku wateya wê “dînê eşkere, diyar, kifş” be û dibe ku wateya wê “dînê ku tiştan eşkere, diyar an jî kifş dike” be. Li gorî wateya yekem dînê Îslamê eşkere ye û başî û rindîtî bi awayekî asan jê tê famkirin. Li gorî wateya duyem jî Îslam tiştên baş an jî rind bi mirovan dide famkirin.

6. Di nîvê duyem de musawat heye. Lewra wate û lefzên wê bi qasî hev in. Yek ji wan kêmbibe ya din zêde dibe.

7. Bêjeya “Xuda”yê di cara duyem de îhtîmala pir ew e ku ji bo telezzuz, tekîd û weznê hatiye bikaranîn. Lewra cînavka “ew”ê bi tênê jî hatiba ji alîyê wateyê ve tu tiştêk kêr nedibû.

8. Bêjeya “ew”ê rengdêra nîşanê ye û ji bo tiştên dûr tê bikaranîn. Di vê malikê de ji bo Xwedê hatiye bikaranîn. Halbukî Xweda ji nefsa me jî nêzîktirê me ye. Li gorî qenaeta me hatina rengdêra nîşanê “Ew”ê li vir ji sedem mebestekî belaxetê ye ku ew jî mezinahîya Xwedê û biçûkkirina nefsa gunehkar li hember Xwedê ye.

9. Di bêjeya “daye”yê de dibe ku hunera îstîfeyê hebe. Lewra dînê Îslamê nehatiye dayîn belkî bi wasîteya Hz. Cebrail hatiye şandin. Ji sedem vê xalê li vir îstîfeya tebeîyye û tesrîhîyye heye. Muşebbeh lêkera “şand”ê an jî “hinart”ê ye. Di dewsa wan de lêkera “daye”yê hatiye bikaranîn muşşebbehun bîh e. Li vir şandin wekî dayînê ye. Lewra gava tiştêk bê şandin bi bal mirovekî dibe wek dayînê. Ji tiştên tên dayîn jî û tiştên tên şandin jî alîyek jê îstîfade dike, ê din jê îstîfade nake.

10. Em dikarin bibêjin di vir de, bi “Xwedayê alemîn”ê îktîfa hatiye îcrakirin. Lewra Xweda Xwedayê hemû heyberan e. Tiştên alem û ne alem hemû di binê vî hukmê hanê de ne. Lêbelê bi ‘aleman ên ne ‘alem jî hatiye qesdkirin. Ev jî îktîfa ye.

11. Di bêjeya “alemîn”ê de texlîb heye. Lewra her çiqas ev cemî be ji bo wan kesên bi aqil be jî yên din jî ji sedem qaîdê texlîbê dikevin binê wê.

12. Hevoka “Ew Xwedayê daye me dînê mubîn” ji bo Xwedê wek sifet e. Lê dibe ku girêdayî bi hevoka berîya xwe be. Wê gavê li vir gihanek nehatiye gotin û îcaz derdikeve holê. Wateya wê jî “bo Xwedayê ‘alemîn û ji bo Xwedayê daye me dînê mubîn” dibe

Em kirîne ummeta xeyru'l-beşer

Tabî'ê wî muqtedayê namiwer

“Ew Xwedayê ku em kirine ummeta Xeyru'l-beşer ku ew Xeyru'l-beşer jî Hz. Muhemmed (s.x.l.) e. An jî wî di nav însanan de em kirine ummetek herî qenc û baş. Ew ummet li dû Resûlê Xwedê ye an jî peyrewê wî rêberê ku navdar e. Ew rêber jî Hz. Pêxember (s.x.l.) e.”

1. Mebest ji raveka (terkîb) Xeyru'l-beşerê Pêxember (s. x.l.) e. Li vir kînaye heye. Lewra wê gavê di vir de kînaye ji mewsûfê ye ku ew jî Muhemmed (s.x.l.) e.

Bateyî di mewlûdê de di ciyekî din de dibêje:

Sellî ya Rebbî 'ela xeyrî'l-beşer

Ji vê te'bîrê jî tê famkirin ku mebest ji “xeyru'l-beşer”ê Hz. Pêxember e.

2. Di “Xeyru'l-beşer”ê de telmîh jî heye. Lewra îşaret bi bal ayet û hedîsên jêrê ve heye.

وَإِنَّكَ لَعَلَىٰ خُلُقٍ عَظِيمٍ

“Miheqeq! Tu xwedîyê exlaqekî mezin î.” (el-Qelem, 4). Ji ber ku xeyru'l-beşerîyyet girêdayê bi exlaqê qenc ve ye li vir telmîh heye.

Hedîs:

إِنَّ اللَّهَ اخْتَارَ خُلُقَهُ فَاخْتَارَ مِنْهُمْ نَبِيَّ آدَمَ، ثُمَّ اخْتَارَ مِنْهُمْ الْعَرَبَ، ثُمَّ اخْتَارَنِي مِنَ

العرب.

“Bi rastî Xwedê mexlûq tercîh kirin. Ji nav wan jî nesla Hz. Adem tercîh kir. Di dû re jî “Ereb tercîh kirine. Di nav wan de jî wî ez tercîh kir.”²⁷

²⁷ el-Hindî el-Mutteqî, *Kenzu'l-Ummal*, 33927.

3. Ji “xeyru’l-beşer”ê meqsed dibe ku ummet bi xwe be. Li gorî vê şîroveyê raveka xeyru’l-beşerê wateya wesfî digire û dibe telmîh bi bal ayeta jêrîn.

كُنْتُمْ خَيْرَ أُمَّةٍ أُخْرِجَتْ لِلنَّاسِ تَأْمُرُونَ بِالْمَعْرُوفِ وَتَنْهَوْنَ عَنِ الْمُنْكَرِ وَتُؤْمِنُونَ بِاللَّهِ

“Hûn ummeta herî baş in û hûn hatine derxistin ji bo însanan. Hûn qencîyê emr dikin û ji xerabîyê dûr dixin û baweriyê bi Xwedê tînin.” (Âl-î Îmrân, 110). Di vir de vê ayeta hanê beyan dike ku ummeta Îslamê ummeta herî baş e û xwedî wesfên baş e.

4. “Muqtedayê namiwer” jî sifet e û ji mewsûfê kînaye ye. Lewra meqsed jê Hz. Muhemmed (s. x. l.) e.

5. Di nîvê duyem de îcaz heye. Lewra di navbera xeyru’l-beşer û tabî’ê wî de gihaneka “û”yê heye.

6. Di “em kirîne ummeta xeyrul-beşer” de kirde (mubteda) ketiye ku ew jî “Xweda” ye. Ji sedem vê xalê li vir îcaz heye.

Ew Xudayê Malîku’l-Mulkê ‘ezîm

Daye me mîrasa Qurana Kerîm

“Ew Xwedayê ku xwediyê mulkê mezin e ji me re Qurana Pîroz şandîye an jî wî tesîr û fayda wê daye me.”

1. Di vê malîkê de mecaz heye. Lewra bêjeya “mîras”ê dibe ku bi çend awayan bê şîrovekirin. Heke mirad ji mîrâsê “tiştên muwafiqî Quran”ê be. Mîrasa Quranê bi awayekî rasteqîn mimkun nîne. Lewra mîras bi wateya heqîqî tiştên ku aidê mirovan e. Wê gavê musebbeb hatiye gotin. Lêbelê mebest jê sebeb e ku ew jî Quran bi xwe ye. Her du bi hev re hatine, bi vî awayî wateya malîkê bihêztir bûye. Li gorî vê şîroveya hanê dibe ku bêjeya “mîras”ê ji bo weznê hatibe. Dîsa li gorî vî tiştê hanê dibe ku bêjeya “mîrasê” zaîd be jî. Wê gavê li vir îtnab derdikeve holê.

2. Di bêjeya “ezîm”ê de îcaza qiser heye. Lewra ev bêje dibe ku sifetê “malik”ê be û dibe ku sifetê “mulk”ê be. Ev her du jî ji aliyê wateyê ve mimkun in.

3. Di lêkera “daye”yê de îstîfareya tesrîhîyye û tebeîyye heye. Lewra mebest ji “daye”yê “şandîye” ye.

4. Dibe ku mebest ji bêjeya mîrasê sunnet, hedîs û tiştên ku Quran ji bo wan bûye sebeb. Li gorî vê şîroveyê em dikarin bibêjin di mîrâsa Quranê de îstîfareya meknîyye heye. Lewra Quran hatiye şibandin bi insanekî qenc. Lêbelê însan nehatiye gotin. Belkî di şuna însan de, muşebbeh hatiye gotin û lazimê muşebbehun bih ku ew jî mîras e hatiye îsnadkirin bi bal muşebbehê ve. Ji sedem vê xalê jî em dibêjin di vir de îstîfareya texyîlîyye jî heye.

5. Dibe ku di vir de bi tiştên mezin hatibe îktîfa kirin. Lewra gava ku tiştên biçûk nîmet bin, tiştê mezin ku ew jî di vir de Quran e û bi rûmettir û qenctir e. Ji ber vê taybetiyê ihtîyac nemaye bi bal anîna nîmetên ku li gorî Quranê biçûk in. Li gorî vê şîroveya hanê em dikarin bibêjin di vir de îcaz jî heye. Heke îktîfa hebe, wê gavê mebest jê “Quran û mîrasa Qûranê û nîmetên din” tev e. Bi Quranê hatiye îktîfa kirin, ji ber vê rewşa hanê, tiştên biçûk jî tê famkirin.

6. Heke mebest ji “mulkê ‘ezîm”ê erş be. Li vir mecaza mursel heye. Lewra mulkê Xwedê erş bi tenê nîne. Tiştên din jî hene. Li gorî vê şîroveya hanê kull hatiye gotin. Lêbelê cuz hatiye zikirkirin.

7. Rengdêra nîşanî ku bêjeya “ew”ê ye ji bo tiştên dûr tê bikaranîn. Halbûkî Xweda nêzîkî me ye. Ji sedem vê xalê li gorî qenaeta me îşaretkirin bi bal mezinaîya Xwedê ye. Bateyî xwestiye ku bibêje Xweda wisa mezin e ku mirov pir ji famkirina mezinaîya wî dûr in.

8. Te’bîra “maliku’l-mulkê ezîm”ê di hinek nusxeyan de “malikê mulkê ‘ezîm” hatiye. Di vê te’bîrê de an jî di te’bîra

“malîku’l-mulk”ê û “malikê mulkê ‘ezîm”ê de telmîh bi bal hinek ayetên Qurana pîroz ve heye. Hinek ji wan ayetan li jêrê ye.

قُلِ اللَّهُمَّ مَالِكَ الْمُلْكِ

“Bêje: Ey Îlahê min ê xwediyê mulk!” (Âl-î Îmran, 26).

وَلَهُ الْمُلْكُ

“Mulk ji wî bi tenê re ye.” (el-Enam, 73).

مُلْكُ السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضِ

“Mulkê erd û asîmanan ji wî bi tenê re ye.” (el-‘Erâf, 158).

9. Te’bîra “Qurana kerîm”ê di hinek nusxeyan de di dewsa bêjeya “kerîm”ê de bêjeya “hekîm”ê hatiye. “Qurana kerîm” îqtîbas e ji ayeta jêrîn.

إِنَّهُ لَقُرْآنٌ كَرِيمٌ

“Bêguman ew Quran bi rûmet û bi şeref e.” (el-Waqî’a, 77).

10. Di hinek nusxeyan de di şuna “mîrasa Qurana”yê de “mîras û Qurana” hatiye. “Mîrasa Qurana” baştir xwanê dike. Lewra heke “mîras” û “Qurana” be, mebest ji “mîras”ê nayê famkirin. Lêbelê bi ravektî be an jî bê gihanekê bê xwendin “mîras” diyar dibe.

Dînê me kir kamil û ni’met tamam

Ye’nî da me Ehmed û daru’s-selam

“Wî dînê me kamil kir û nimetê xwe jî li ser me tamam kir û Ehmed şand ji me re û cenet kir nesîbê me. Ye’nî bi saya wî, ciyê hizûrê da me. Dibe ku mebest ji ciyê hizûrê dinya û axiret tev be.”

1. Di risteya yekem de jî û di ya duyem de jî kirde nehatiye zikirkirin. Ev jî îcaz e. Lewra di halê hezfê de jî pêwîst e ku wateya kirdeyê bê famkirin. Ji ber ku li vir wate tê famkirin, nehatina kirdeyê pirsgirêk nîne û îcaz derdikeve holê.

2. Di te'bîrên "kir kamil û nî'met"ê de îtnab hatiye îcrakirin. Lewra nîmet temambûn bê kamilbûna dîn nabe. Di vir de îtnab ji bo tekîdê ye.

3. Di navbera bêjeyên "dîn" û "nî'met"ê de bi xwe jî îtnab heye. Lewra bêjeya "nî'met"ê jixwe "dîn" dixwe nava xwe. Li gorî vê şîroveya hanê "dîn" beşek ji nî'metê ye. Ji sedem vê xalê em dibêjin li vir zîkru'l-has be'de'l-'amm heye.

4. Di navbera "dîn" û "nîmet"ê de tenasub jî heye. Lewra wateya wan ji hev ne dîr e.

5. "*Ye'nî da me Ehmed û daru's-selam*" dibe ku fesl be. Lewra ev qîsim wekî ku cewab be ji bo pirseke veşartî. Dibe ku ew pirs "nî'met çawa temambû û dîn çawa kamilbû?" be. An jî dibe ku ew pirs "temambûna nî'met" û "kamilbûna dîn bi çi ye?" be.

6. Di "*Ye'nî da me Ehmed û daru's-selam*"ê de dibe ku îzah be'de'l-îbham hebe. Risteya duyem ji bo risteya yekem îzah e. Wê gavê em dikarin bibêjin ku li vir îtnab heye. Lewra li gorî vê şîroveya hanê li dû nediyar bûna wateyê te'bîreke ku wateyê diyar kiriye hatiye.

7. Di vê malîkê de îqtîbas û kînaye hene. Lewra di ayeta jêrîn de te'bîra "daru's-selam"ê derbas dibe ku ew ji cenetê kînaye ye.

وَاللَّهُ يَدْعُو إِلَىٰ دَارِ السَّلَامِ

"*Xweda (mexlûqatên xwe) gazî dike bi bal Daru's-selamê (cenetê) ve.*" (Yûnus, 25) Te'bîra "daru's-selâm"ê ji ayeta jorê îqtîbas e. Li vir sifet hatiye û ji mewsûfê kînaye ye.

8. Di hevoka "*da me Ehmed û daru's-selam*"ê de kînaye heye. Lewra mebest jî "daru's-selam"ê cenet û ciyê bi hizûr tev e.

9. Di "*da me Ehmed*" û "*daru's-selam*"ê de texlîb an jî muşakele heye. Gava texlîb be hikmê "darû's-selam"ê ji bo "Ehmed" hatiye dayîn. Ji ber vî tiştî lefzê "da"yê ji bo Ehmed jî

hatiye bikaranîn. Gava muşakele be, ji ber bi hev re hatine Ehmed jî bi “lêkera” da”yê ve hatiye girêdayin.

10. Di vê malikê de telmîh bi bal sûreyê Mâideyê ayeta sisêyan ve heye. Lewra Xwedayê Teala dibêje ku

الْيَوْمَ أَكْمَلْتُ لَكُمْ دِينَكُمْ وَأَتْمَمْتُ عَلَيْكُمْ نِعْمَتِي وَرَضِيْتُ لَكُمُ الْإِسْلَامَ دِينًا

“Îro min ji we re dînê we kemiland, nîmetê xwe jî li ser we temam kir û îslam jî bi dînîti min ji we pejirand.” (el-Mâide, 3).

11. Di hinek nusxeyan de “kamîl û nîmet” nehatiye. Di dewsa wê de “kamil nimet” hatiye. Li gorî ya dawî em dikarin bibêjin li vir îcaz heye. Lewra bê teqdîra gihanekê wate kê m dimîne.

Ew Xudayê bênezîr û zulcelal

Bêmîsal û bêheval û bêzewal

“ Tiştêki wek Xweda tune ye û Xweda xwediyê meznatîyê ye û mînakek wek wî tune ye û ew bê heval e û bê dawî ye.”

1. Di vê malika hanê de bêjeya “bê”yê ji bo wateya tekîda neyînî neyînî hatiye tekrarkirin.

2. Di vê beytê de qertafa hikmê û bêjeya gihanekê nehatiye bikaranîn. Ev jî îcaz e. Lewra ne hatibin bikaranîn jî tîn famkirin. Ji ber vê negotina wan iltîbas çênabe. Eslê vê malikê “Ew Xweda bê nezîr û zulcelal û bê mîsal û bê heval û bê zewal e” ye. Lêbelê di helbestê de ev rewş pir heye. Bateyî ev tiştî di Mewlûda Nebî de gellek bikaranîye.

3. Di vê malikê de hunera mura’etu’n-nezîrê jî hatiye bikaranîn. Lewra bêjeyên mîsal, heval û zewalê hem ji alîyê dengê hem jî alîyê wateyê nêzîkî hev in. Em dikarin bibêjin di vê malikê de tenasub jî heye. Ew jî wek mura’etu’n-nezîr e.

4. Di te'bîrên "bênezîr û bêmîsal"ê de îtnaba bi tekîdê heye. Lewra wateya her du te'bîran jî wek hev e. Lêbelê lefzê wan cuda ne.

5. Di te'bîrên "bênezîr û bêmîsal"ê de telmîh bi bal ayetên jêrê ve.

لَيْسَ كَمِثْلِهِ شَيْءٌ وَهُوَ السَّمِيعُ الْبَصِيرُ

"Tiştêkî wek wî tune ye. Ew pir baş dibihîze û pir baş dibîne" (eş-Şûra, 11).

وَيَبْقَى وَجْهُ رَبِّكَ ذُو الْجَلَالِ وَالْإِكْرَامِ

"Zat Rebbê te yê ku xwedîyê mezinatî û dayînê ye ewê baqî be." (er-Rahman, 27)

وَلَمْ تَكُنْ لَهُ صَاحِبَةٌ

"Ji Xwedê re tu jin nebûn." (el-En'am, 101).

كُلُّ شَيْءٍ هَالِكٌ إِلَّا وَجْهَهُ

"Bêyî zatê Xwedê her tişt ewê helak bibe." (el-Qesas, 88).

Ev her çar ayetên li jorê derbas dibin ji bo vê malika hane bingeh in.

6. Li dû bêjeya "nezîr"ê de gihanek nehatiye bikaranîn. Lêbelê bêyî gihanekê wateya malikê kê mî dimîne. Ji sedem vê xala hane li vir teqdîra gihanekê zarûrî ye. Ev jî dibe îcaz.

Razîqê bê dest û pa û mar û mûr

'Alimê sirra ne gotî der sudûr

"Xweda rizqê wan mewcûdatên ku bê dest û ling in û yê maran û kurmorîyan e. Ji wan sirên ku di singên mexlûqan de ne û nehatine gotin jî hayidar e û dizane."

1. Di navbera bêjeyên "dest û pâ"yê de şîbhê tîbaq heye. Lewra dest û pa ne zidê hev bin jî, gava bi hev re tên bikaranîn ji wateya wan zidiyet tê hişê merivan.

2. Di vê malikê de tenasub heye. Lewra wesfê razîq û alim minasib in ji bo tiştên li dûyî wan tîn.

3. Di vê malikê de hunera îktîfayê jî heye. Lewra Xweda razîqê mexlûqatan gişa ye. Lêbelê behsa yên bê dest û lingan bi tenê hatiye kirin. Wateya vê hevokê ne ku Xweda raziqê wan bi tenê ye. Çiqas jî behsa yên ku bi dest û pê ne nehatibe kirin jî, ew jî di binê vî hikmî de ne. Sebebê ku di vir de behsa tiştê din nehatiye kirin, îcrakirina hunera iktîfayê ye. Lewra Xweda razîqê bê dest û lingan be, bi awayekî rehet kane rizq bide yên xwedîyê dest û pêyan jî. Li gorî vê hunerê yek ji wan du tiştên ku minasebeta wan bi hev re hene tê gotin û ê di jî tê hezifkirin. Di vir de jî ev zîkr û hezîf heye. Ji ber hezîfê em dikarin bibêjin li vir îcaz jî heye.

Minakên vê hunera hanê di Qurana pîroz de jî hen in. Di ayeta jêrê de ev huner heye.

وَجَعَلْ لَكُمْ سَرَائِلَ تَقِيكُمْ الْحَرَّ

“Xwedê ji bo we kincên ku we ji germ û (sermaye) disitirînin çêkirin.” (en-Nehl, 81). Di vê ayetê de behsa germê hatiye kirin, Lêbelê çiqas behsa sermaye nehatibe kirin jî serma jî hatiye qesdkirin.

Ayeta jêrê jî ji me re tîne ziman ku Xweda rezaqê mexlûqatan gişan e.

وَمَا مِنْ دَابَّةٍ فِي الْأَرْضِ إِلَّا عَلَى اللَّهِ رِزْقُهَا

“Li ser rûyê erdê mexlûqê ku hareket dike rizqê wan hemûyan li ser Xwedê ye.” (Hûd, 6).

4. Di te’bîra “Razîqê bê dest û pa û mar û mûr”ê de bi meqsed tekîdê an jî sedem weznê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra wateya “bê dest û pa” û wateya “mar û mûr”ê eynî ye. Mar û mûr jî bê dest û ling in.

5. Di bêjeyên “mar” û “mûr”ê de dibe ku bêjeya “mûr”ê tekîd be ji bo “mar”ê û dibe ku “mûr” ji bo kurmorîyê hatibe

bikaranîn. Wê gavê jî tekîd tune ye û tesîs heye yanê wateyeke cuda heye. Di zanistên zimanî de tesîs tê tercîhkirin li ser tekîdê.

6. Ji bo risteya yekem em dikarin bibêjin *“Raziqê mar û mûrê bê dest û pa”* li gorî vê wateya hanê, qelba mekanî heye. Tişteki din jî li gorî vê şîroveyê gihaneka di navbera *“pa”* û *“mar”*ê de zâid e.

7. Mebest ji alimî û raziqtîya Xwedê, ne ji bo van her du tiştên ku helbestvanê me gotine bi tenê ye. Lewra alimîya Xwedê ji bo hemû masîwayê Xwedê heye. Belkî ev tiştên ku di vir de hatine cuz in. Lêbelê meqsed jê kull e. Li gorî vê şîroveyê li vir mecaza mursel heye.

8. Di vê malikê de meqsed ji bêjeya *“sirr”*ê tiştên di dilê mirovan de ne. Ji *“sudûr”*ê jî meqsed dil e. Li gorî vê şerha hanê di vir de mecaza mursel heye. Mehel hatiye zikirkirin. Lêbelê mebest hall e ku ew jî qelb e. Lewra sir, di hundirê qelbê de ye. Yanê sir di dil de ye û jixwe nehatiba gotin jî dihat famkirin. Ev tiştan nîşan didin ku di nîvê duyem de mubalexe heye. Lewra di dewsa van tiştan de *“sirra di dilan”* de bihata gotin, mubalexe dernediket holê.

9. Li vir tekîda mubalexê heye. Lewra *“der sudûr”* jixwe ji bo tiştên nehatiye gotin tê bikaranîn. Gava bi *“der sudûr”*ê re *“sirra negotî”* jî hatiye, mubalaxa wateyê pirttir bûye.

10. Di *“sirra negotî der sudûr”*ê de dibe ku îcaz jî hebe. Lewra di navbera *“negotî”*yê û *“dersudûr”*ê de gihaneka *“û”*yê û bêjeya *“tiştên”*ê dibe ku hezif bûbe. Wê gavê berîya *“der sudûr”*ê bêjeyên *“û tiştên”*ê heye. Lê nehatiye zikirkirin. Gava *“der sudûr”* bi te’bîra *“negotî”*yê ve bê girêdayin, *“der sudûr”* ji bo bêjeya *“sirr”*ê dibe wek sifetê duyem.

11. Di bêjeya *“sudûr”*ê de dibe ku cuz hatibe gotin, lêbelê qesd jê zat be. Lewra agahî û malûmat berîya dil, di zihnê de peyda dibin.

12. Bi bêjeya *“sudûr”*ê telmîh bi bal ayeta jêrê ve hatiye kirin.

إِنَّ اللَّهَ عَلِيمٌ بِذَاتِ الصُّدُورِ

“Bêguman Xweda bîzzat bi qelban zane.” (Âl-i ‘Îmrân, 119).

13. Di “Sirra ne gotî”yê de tekîd heye. Lewra sirr jixwe ji bo tiştê nehatiye gotin tê bikaranîn. Heke tişt bê gotin ji sirîfîyê derdikeve. Yanê gava “sir” be, jixwe wateya wê nehatiye gotin û kesek pê nizane. Îhtîyac jî bi bal lêkera “negotî”yê ve namîne. Di vê rewşê de hatina wê ji bo tesîsê nîne; belkî ji bo tekîdê ye.

Karisazê bende û sultanê can

Rahim û Rehman Letîf û Mêhreban

“Karên ‘ibadan rast dike, mezinê rûhan e, rehîm e, rehman e û ji wan pir hez dike. An jî meznê cinan e.”

1. Di vê malikê de “karisaz” ji bo Xwedê hatiye bikaranîn. Di bikaranîna te’bîra “karisaz”ê de muşakele heye. Lewra tiştê ji bo mirovan tê bikaranîn ji bo Xwedê jî hatiye bikaranîn. Ji bo çêkirina Xwedê lêkera ‘خلق’ê tê bikaranîn. Bi kurdî wateya vê lêkerê “çêkir û afirandin” e. Lê Bateyî di dewsa wan de bêjeyeka ku ji sazîkirinê tê bikaranîye. Ji vê îstîmala hanê tê famkirin di te’bîra “karîsaz”ê de muşakele heye. Lewra mebest ji vê lêkerê çêkirina an jî afirandina Xwedê tişteki ye. Xwedayê teala dibêje:

وَاللَّهُ خَلَقَكُمْ وَمَا تَعْمَلُونَ

“Xwedê hûn û tiştên ku hûn dikin hemû çêkirin.” (es-Saffât, 96). Ji vê ayetê tê famkirin ku Xweda karan diafirîne û ji bo wê jî lêkera ‘خلق’ê hatiye bikaranîn”. Wateya bêjeya karisazê “damezirîner û müessîs” e. Ev jî ji bo Xwedê nabe. Bi rêya muşakeleyê ji bo Xwedê hatiye bikaranîn.²⁸

²⁸ Muşakele di belaxetê de qalkirina ji tiştê bi peyvekî ye ku eleqa wê peyvê bi tişteki din ve ye. Sebebê muşakeleyê hatina du tiştan di

2. Di peyva “bende” û “sultân”ê de tîbaq heye. Ji tîbaqê re tezaad jî tê gotin.²⁹ Lewra her du zidê hev in.

3. Di vê malikê de ji ber lihev hatina peyvên û asanbûna wan hunera însîcamê û suhuletê jî heye.

4. Bi bêjeya “mêhrebân”ê hunera îtnabê hatiye bikaranîn. Lewra wateya bêjeya “mêhrîban”ê cuda nîne ji wateya bêjeyên berîya wê. Wateya vê bêjeyê “yê hez dîke û dilê wî bi meriv dişewite” ye. Ev wate di bêjeyên “rehman û rehîm”ê de jî heye.

5. Di risteya duyem de tenasub heye. Lewra wateya bêjeyan li hev hatiye. Çawa berîya niha jî dîsa derbas bû.

6. Di vê malikê de sê bêje bi wateya “rehma Xwedê” ye. Ev xal jî telmîh e bi bal hedîsa *إِنَّ رَحْمَتِي سَبَقَتْ غَضَبِي* “*Bêguman rehmata min ji xedeba min derbas bûye.*”³⁰

Asîmanê bêstûn Wî kir bedîd

Suretê ba xal û xet wî aferîd

“Xwedê asîmanê bêstûn ji tunebûyê anî heyînê û suretê mirovan bi rî û şanikên xweşik neqîşand an jî erd bi çem û çiya û deşt û newal û daran xweşik kir.”

1. Te’bîra “Asîmanê bêstûn Wî kir bedîd”ê bi bal ayetên jêrê ve telmîh e.

حَلَقَ السَّمَاوَاتِ بِعَيْرِ عَمَدٍ تَرَوْنَهَا

“Çawa ku hûn asîmanan dibînin Xwedê ew bêstûn afirandin.” (Loqman, 10).

اللَّهُ الَّذِي رَفَعَ السَّمَاوَاتِ بِعَيْرِ عَمَدٍ تَرَوْنَهَا

axaftinekî de ye. Di Quran’a Pîroz de jî numaneyên ji bo muşakeleyê hene.

²⁹ Osman Aslanoglu, “Di Mem û Zînê de Çend Hunerên Wateyî”, Muqaddîme, 2019 10 (1), r.148.

³⁰ İbnu’l-Esîr, Camî’u’l-Usûl, 2622.

“Çawa ku hûn asîmanan dibînin Xwedê ew kes e ku asîmanan bêstûn bilind kirin.” (er-Rad 2).

2. Di te’bîra *“kir bedîd”*ê de mecaza mursel heye. Lewra *“kir bedîd”* ji bo afirandinê an jî ji bo çêkirinê netîce ye. Yanê musebbeb hatiye gotin. Lêbelê mebest jê sebeb e.

3. Dibe ku ji risteya dawîyê sê wate bên famkirin.

A yekem mebest ji *“suret”*ê dinya ye, ji *“xal”*ê jî dar e û ji *“xet”*ê jî çem in.

A duyem teswîra xwediyê rûhan bi hinek şeklên xusûsî ye.

A sêyem şekildayîna wechê însan bi şanik û xêzên bêhempa ye.

Li gorî ya yekem di bêjeyên *“suret, xal û xet”*ê de îstîfereya tesrîhîyye heye. Lewra ev her sê bêje mustearun mînh ne. *“Dinya, dar û çem”* jî mustearun leh in. Lêbelê li gorî wateya sêyem û duyem îstîfere di lêkera *“aferîd”*ê de hatiye îcrakirin Lewra *aferîd* mustearun mînh ye û teswîr jî mustearun lehû ye. Dibe ku ji bo wateya duyem û sêyem de di şuna *“teswîr û şekil dayîn”*ê de wateya *“aferîd”* hatibe qesdkirin. Li gorî vê şîroveya hanê li vir îstîfere tune ye û wateya heqîqî bi tenê heye.

Hêvîdar in em ji te Şahê Kerîm!

Îhdîna ya Reb sîrate’l-musteqîm

“Ey padîşahê comerd û bi rûmet! Hêvîya me ji te heye. Ey Rebbê me! Tu riya rast nîşanî me bide.”

1. Te’bîra *“hêvîdar in”* di vê hevokê de pêveber (xeber) e. Ev bêje berîya kirdeyê hatiye ku di ilmê belaxetê de jê re teqdîm tê gotin. Sebebê vê teqdîmê pirrbûna hêvîya nivîskar e yan jî bal kişandina guhdaran bi bal pêveberê ye.

2. Li gorî malika berîya vê malikê di vê malikê de îltîfat heye. Lewra di malikên berê de ji Xwedê bi bêjeyên xaîb tê

behskirin. Lêbelê di vê malikê de te'bîra "em ji te" heye. "Te" jî ji bo muxatebê ye.

3. Bi peyva "şah"ê hunera muşakeleyê hatiye bicîkirin. Lewra şah ji bo însanan tê bikaranîn. Lêbelê di vê hevokê de, meqsed jê Zatê Xwedê ye.

4. Di "sîratu'l-musteqîm"ê de, çawa ku şîrovekarên Qurana Pîroz jî dibêjin îstîareya tesrîhîyye û eslîyye heye. Lewra Îslam li vir bi riya rast hatiye şibandin.

5. Di "şahê kerîm"ê de îcaz heye. Lewra bêjeya nîdayê ku "ya" ye ketîye.

6. Di nîvê duyem de îqtîbas heye. Lewra risteya dudiyar bê te'bîra "ya Reb"ê ji suretê Fatîheyê hatiye girtin. Herfa tarîfê jî ku li ser peyva "sîrât"ê ye ketîye. Ev jî tiştêkî xwezayî ye. Lewra îqtîbasên ji ayet û hedîsan du cure ne. Di cura yekê de gotina ku tê îqtîbas kirin nayê guherandin. Di ya din de gotina ku tê îqtîbas kirin tê guherandin. Li vir hatiye guherandin.

7. Di vê risteyê de tiştêkî din jî hatina nîda û munadayê ye. Ji alîyê wateyê ve hatina van her duyan gellek xweş e. Ji sedem vê xalê, di vê ayetê de çiqas nîda û munada tunebin jî di hinek berhemên şîroveya Quranê de di ayetê de nîda û munada hatiye teqdîrkirin.

8. Bi bêjeya "kerîm"ê î'tîlafu'l-me'na we'l-lefiz hatiye îcrakirin. Lewra "hêvî" û "şahî" minasibê başî û comerdîyê ne.

Nê ji me sûc û xeta tîn û stem

Lê ji te îhsan û xufran û kerem

"Lewra em xeta û zilim dikin. Lêbelê tu başîyê bi 'ebdên xwe dikî û tu wan dibexşîm û tu derbarê wan de comerd î."

1. Şîrovekarên mewlûdê ji bo daçeka "nê"yê çend wateyên cuda bi lêv dikin. Wateyên wê "bi tenê, pir, dewamî, bêguman, lewra, erê, lêbelê" ne. Ev bêje carinan jî ji bo xweşikbûna hevokê

tê bikaranîn. Li gorî van wateyan em dikarin bibêjin di vê daçekê de îcaza qîser heye. Lewra ew gellek wateyan îfade dike. Yan jî tewcîh heye. Lewra ji bo wê îhtîmala çend wateyan heye.

2. Te'bîra "xeta tîn"ê bi awayê "xetatîn" bê xwendin di hevokê de îcaz derdikeve holê. Lewra wê gavê "pêveber" nehatiye gotin û veşarî ye ku ew jî lêkera "tê" ye. Lê "xeta tîn" bê xwendin musawat çêdibe. Li gorî vê şîroveyê wateya wê "xeta û zilim ji me tê" ye.

Bêjeya "nê"yê bi wateya "lêbelê"yê be, di vê hevokê de îstîdrak çêdibe. Gava bêjeya "nê"yê bi wateya "lewra"yê be, ev malik ji alîyê wateyê dibe wek cuzekê ji bo malika berîya xwe.

Daçeka "nê"yê bi wateya "dewamî, pir, bêguman, bi tenê" be em dikarin bibêjin bi riya têkida wateyê îtnabê hatiye îcrakirin.

Li gorî qenaeta me, li vir "nê" bi wateya "erê"yê be, ne rast e. Lewra berîya wê tiştêkî ku pirs be an jî peywendîya wî bi pirsê be derbas nabe.

3. Bêjeya "nê"yê li gorî Seydayê Mela Zeynelabidîn dibêje di hinek nusxeyan de "tê" hatiye nivîsandin.³¹ Li gorî vê agahiya hanê "tê" lêker e û îcaz li vir tune ye. Lêbelê wê gavê îtnab û musawat her du jî muhtemel in. Lewra bêjeya "xetatîn" "xeta tîn" bê xwendin, wê gavê bi rêya tekîdê îtnab çêdibe. Lewra "tîn" lêker e û ji bo "tê" ya di serê hevokê de dibe têkida lefzî û îtnab derdikeve holê. Gava xetatîn wek pirjimarîya "xeta"yê bê pejirandin, musawat derdikeve holê. Lewra wate û deng bi qasî hev dibin.

4. Di navbera risteyên vê malikê de hunera muqabeleyê heye. Lewra her risteyek ji wan di nav xwe de ji alîyê wateyê li hev re rûdinin û nêzîkî hev in. Lêbelê gava em van her du risteyan didin berhev, em dibînin ku ji alîyê me'neyê ve dijî hev

³¹ Zeynelabidîn Amedî, Behcetü'l-Enam, r., 27.

in. Ji ber vê xala hanê em jî dibêjin di vir de hunera muqabeleyê heye.

5. Hunera îtnabê jî heye lewra îhsan çawa xufra û keremê di nav xwe de digre; bêjeya sûcê jî wateya xeta û sîtemê di nav xwe de dihewîne.

6. Bi gihaneka “lê”yê îstîdrak hatiye bikaranîn. Lewra nivîskar di nivê malika yekem de behsa kêmanîya mirovan dike, ji vê behsê cezayên wan kêmanîyan tê hişê merivan û meriv ji efûnekirina Xwedê ditirse. Lêbelê nivîskar bi gihaneka “lê”yê û bi tiştên ku li dû wê hatine vê fikra hanê ji zihnê însan derdixe.

Ya Reb, îmanê dixwazîn em, mudam

Jêrê alaya Muhemmed wesselam

“Ya Rebê me! Em her daîm ji te bawerîyê û di roja qiyametê de seknandina dibin ala Hz. Pêxember dixwazin û selam li ser wî be”

1. Te’bîra “Ya Reb”ê nîda ye û mebest ji bikaranîna wê îstîrham e.

2. Di navbera her du risteyan de îcaz heye. Lewra çawa ji wergera me ya jorê jî tê famkirin gihanek di vir de heye. Lêbelê nehatiye bilêvkin.

3. Bikaranîna bêjeya “mudam”ê ji bo tekîda wateyê hatiye. Ev jî îtnab e.

4. Îcaz di nivê duyem de jî heye. Lewra di dawîya risteya dudiyar de “selam li ser wî an jî we be” heye. Lê li ser wî/we be” hezif bûye. An jî “selam ji wî re û ji we re be” heye. Li gorî vê şîroveya hanê em dikarin bibêjin li vir çawa îcaz heye û tewcîh jî heye. Lewra di vir de “wî û we” her du jî mimkun in. Nivîskar bi te’bîra “wesselam”ê bi guhdarên xwe daye zanîn ku dawîya vê beşê hatiye.

5. Ji bo “alaya Muhemmed”î du wate hatine gotin yek jê “al” e û ya di jî “esker” e. Ev jî nîşan dide ku li vir tewcîh heye.

6. Di “jêrê alaya Muhemmed”î de îcaz heye. Lewra mebest jê “Tu roja qiyametê me di bin ala wî de bidî seknandin” e.

7. Ev malik bi şeklê xwe xeberîye ye. Lêbelê mebest jê însaî ye. Lewra wateya malikê “tu bawerî û sekna di bin ala Pêxemberê xwe de bidî me. Sebebê hatina hevokê bi şeklê xeberîyê li gorî zanista belaxetê ji bo edeba li hember Xwedê ye. Yanî li hember xwedê bikaranîna raweka emrê tiştêkî qenc nîn ne.

8. Mebest ji nivê duyem dibe ku “Tu roja qiyametê me bikî ji wan kesên ku bawerî bi wî anîn”. Li gorî vê şîroveyê ev hevok wateya hevoka berîya xwe tekîd dike ku ew jî dibe îtnab.

9. Gava ku em bibêjin li vir mebest ji “selam”ê “selama li ser Hz. Pêxember” e îktîfa jî heye. Lewra selama li ser Pêxember bê selat kêm dimîne. A qenc ew e ku di vir de “selat” bê teqdîrkin. Ev jî hunera îktîfayê ye. Ev tiştê em dibêjin ji ayeta jêrê jî tê famkirin.

يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا صَلُّوا عَلَيْهِ وَسَلِّمُوا تَسْلِيمًا

“Gelî ew kesên bawerî anîne! Selat û selaman li ser (Pêxember) bînin.” (*el-Ehzâb*, 56), Di vê ayetê de emrê bi selat û selamê tev tê dayîn. Li gorî ‘urfa gelên misliman jî selat û selam ji hev cuda nabin. Ji ber van tiştên hanê ku me ew ji wera gotin em dibêjin di vê malikê de îktîfa heye. Yanê eslê beytê jêrê “alaya Muhemmed selam û selat li ser be” ye. Lêbelê nivîskar qîma xwe bi bêjeyawessalamê anîye û selat negotiye. Bê vê şîroveyê di hinek ciyan hatiye gotin ku selat û selam bi hev re werin wateya wan cuda ye. Bi hev re neyên her du wate jî dihebînin.

Ger divêtin hûn ji narî bin necat

Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin: es-selat

“Heke hûn dixwazin ku ji agirê cehennemê xelas bibin, bi hezkirin û bi xwestin salawatan li ser Hz. Pêxember bînin.”

1. Di bêjeya “nar”ê de mecaza mursel heye. Mebest jê cehennem e. Lewra tiştê di “mekan”î de ye hatiye zikirkirin ku ew jî “nar” e. Lêbelê mebest jê mekan bixwe ye ku ew jî cehennem e nehatiye zikirkirin. Li gorî vê şîroveyê hal hatiye zikir kirin. Lê mehel hatiye qesdkirin. Di vir de dibe nar cuz be ku hatiye zikirkirin. Lêbelê meqsed jê kull e ku ew jî cehennem e.

2. Di lêkera “bin”ê de îcaz heye. Lewra eslê wê “bibin” e.

3. Di te'bîra “eşq û şewqek”ê de îtnab heye. Lewra ev her du bêjeyên hanê wateya wan pir nêzîkî hev e.

4. Dibe “eşq û şewqek” kînaye be. Lewra tevî wateya “hezkirin û xwestin”ê, wateya “ji dil” jî li vir heye.

5. Li gorî qenaeta min di “hûn bibêjin”ê de texlîb heye. Lewra çiqas li vir cînavk ji bo muxateban be jî nivîskar jî dikeve bin hukmê wê. Ji bo vê taybetîya hanê em dibêjin li vir cînavka muxateban bi rîya texlîbê ji bo mutekeliman jî hatiye bikaranîn.

6. Tiştêkî din dibe ku li vir hunera îktîfayê hatibe bikaranîn. Wê gavê tê gotin li vir her çiqas cînavka “em”ê nehatibe bilêvkirin jî, lêbelê hatiye teqdîrkirin. Ev jî dibe îltîfat. Wateya wê gavê dibe “Eger em dixwazin ku ji agirê cehennemê xelas bibin, em bi dil û can selat û selam bibêjin” dibe.

7. Gava îktîfa hebe, em dikarin bibêjin ku gihanek di navbera “hûn” û “em”ê de heye ku ew jî nîşanî me dide îcaz jî li vir heye.

8. Di nivê duyem de îktîfa heye. Lewra çawa di ayet û hedîsan de selat û selam bi hev re tê li vir jî bi hev re ne. Ji sedem

vê xalê em dibêjin di risteya duyem de “selam” heye lêbelê nehatiye gotin. Heta te’bîra “li ser be” jî heye nehatiye bilêvkirin. Li gorî vê şîroveyê li vir îcaz jî heye.

Mijara Duyem: Selat û Selam û Pesnên ji bo Pêxember

Ber tu bada her zeman û an û hîn

Ey Muhammed sed hezaran aferîn

“Ey Muhammed (s.x.l.)! Her gav û her zeman her dem bi sed hezaran (gellek) pesn û tiştên xweş, selat û selam li ser te bin.”

1. Di bêjeyên “an, hîn û zeman”ê de îtnab heye. Lewra wateya van her sê bêjeyan wek hev e. Ji sedem vê xalê, di vir de, îtnab heye. Bi îtnabê wateya malikê hatiye bihêzkirin.

2. Ji te’bîra “sed hezaran”ê mebest hejmar nîne. Belkî mebest mubalexe ye. Lewra di zimên de peyva heft, sed, hezar hwd., carinan ji bo mubalexeyê jî hatine bikaranîn. Li vir a baş ew e ku mubalexe be.

3. Di hatina “Muhammed”î de dibe ku nivîskar zewq girtibe. Lewra nehatiba zikirkirin jî, me’ne kêma nedima.

4. Di serê vê malikê de cînava “tu”yê ji bo muxatebê ye. Lê di nivê duyem de “Ey Muhammed” hatiye bikaranîn. Ew jî ji bo muxatebê ye. Nehatiba gotin jî wate تمام bû. Lêbelê ji bo temambûna beytê xîtaba “Ey Muhammed” hatiye bikaranîn û wate hatiye bihêzkirin.

5. Di bêjeya “aferîn”ê de bi qenaeta min mecaza mursel heye. Lewra ev bêje di vir de bi wateya tiştên baş hatiye bikaranîn. Ev tiştêkî ûmum e, mebest jê jî selat û selam e. Ev jî xusûs e. ‘Umûm hatiye gotin, lêbelê mebest jê xusus e.

6. Dibe ku bêjeya “aferîn”ê bêjeyek ji bo gellek wateyan bê bikaranîn. Li gorî vê şîroveyê “aferîn” lefzeke camî û mişterek e

û heman gavê îcaza qiser jî tê de heye. Li gorî vê rewşê mecaz tê de tune ye.

7. Di hinek nusxeyan de di navbera “zeman, an û hîn”ê de gihanek nehatiye bikaranîn. Li gorî van nusxeyên em dibêjin îcaz heye. Lewra ji bo temambûna hevokê pêwîst e ku gihaneka “û”yê hebe.

Ey şefî' û daruwê her 'illetê

Dîde û bînahiya vê ummetê

“Ey mehdervanê ummetê û îlacê hemû nexweşîyên umetê û çav û dîtina wê!”

1. Dibe ku di peyva “şefî”ê de îstîare hebe. Lewra ji sedem ku Pêxember ji bo başbûna nexweşan sebeb e, Pêxember hatiye şibandin bi wan kesên dibin wesîle ji tiştan re. Li gorî vê xalê Pêxember muşebbeh e, şefî' jî muşebbehun bîhî ye.

2. Bêjeya “darû”yê muwafiqê bêjeya ‘İllet’ê ye. Lê bêjeya “şefî”ê ne muwafiqê “illet”ê ye. Ji vê noqteyê gava em li van kelîmeyan binêrin, em dikarin bibêjin di vir de muşakele heye. Lewra bêjeya “şefî”ê ji sedem bêjeyên “darû” û “illet”ê bi watayeke din ve hatiye bikaranîn.

3. Di navbera “şefî” û “darû”yê de herfa ‘etfê heye. Lewra ev her du peyv ne sifet in ne jî mudafun îleyh in. Tevî ku hinek şirovekaran sifetbûna darûyê caizdêran e jî hatina wê bi sifetî ne xweş e. Lewra darû nav e, ne sifet e. Di hinek nusxeyan de bi herfa gihanekê hatiye û di hinekan de jî herfa gihanekê nehatiye. Gava neyê îcaz derdikeve holê.

4. Gava ji “darû”yê meqsed Pêxember (s.x.l.) be, ji bo “şefî”ê re îhtîmalekî din derdikeve holê. Ew jî divê rewşê de ji “şefî” sifet û mudafun îleyh nabe û em dikarin bibêjin îstîare dibe. Lewra Pêxember muşebbeh e, “Darû” jî muşebbehun bîhî e. Wechê şebah xelasbûna ji nexweşîyan e. Li vir her du nexweşî

dibe maddî û me'newî ye. Vê şîroveya hanê gava "darû" bi wateya yê ku tedawî dike be mimkun e.

5. Heke meqsed ji "her îllet"ê "nexweşîyên me'newî" bin, di vir de mecaza mursel heye. Ji sedem ku kull hatiye gotin, lêbelê mirad jê cuz e. Ku ew cuz jî nexweşîyên me'newî ne.

6. "Ey şefî" munada ye û ji bo diayê ye. "Darûyê her 'îlletê" jî matuf" e û nîda ji bo diayê ye.

7. Di hinek nusxeyan de di dewsa "ey şefî"ê de "ew şefî"ê hatiye. Li gorî van nusxeyan li vir îltîfat heye. Lewra di malikên berîya wê de peyvên mixateban hatine bikaranîn. Lêbelê çawa tê dîtîn cînavka "ew" jî bo xaîbê ye.

8. Di "dîde û bînahiya vê ummetê" û bêjeyên li dû wê tîn de du îhtîmalên cuda hene. Yek jê ew e ku ew jî munada bin û herfa gihanekê ketibe. Li gorî vê şîroveyê îcaz heye. A di jî ew e ku ne munada bin û kirde hezif bûbe. Ew jî "tu" ye. Mebest jê Hz. Resûlullah e. Li gorî vê şîroveyê jî li vir îcaz, tekîd, tesîs û medîh heye.

9. Di "dîde û bînahî"yê de jî îstîfere heye. Lewra ji sedem rênîşandana Resûlullah (s.x.l.) ji umetê re Hz. Pêxember hatiye şibandin bi çav û ronahîyê. An jî îstîfere di umetê bixwe de heye. Ew jî şibandina umetê bi însan ve ye û di dû re çav û ronahî hatiye girêdayîn bi umetê ve.

10. Bejeya "vê"yê cînava navnîşanî ye, mebest ji bikaranîna wê dibe ku te'zîm an jî cudakirin û zahirîkirin be.

Destegîr û mustexasê her du kewn

Bo gunehkaran penah û pişt û 'ewn

"Hz. Pêxember (s.x.l.) ji bo dînya û axiretê dibe destek û alîkar. Destek jî alîkarî jî ji wî tê xwestin. Ew ji bo gunehkaran spartek, destek û alîkar e. Yan jî Hz. Pêxember (s.x.l.) di dînya û axiretê de ji bo gunehkaran destek e û ew ji wî alîkarîyê dixwazin, xwe dispêrin wî û

ew jî alîyê wan dike ya jî ew hembêza xwe ji wan re ve dike û piştevanîyê û alîkarîyê dide wan."

1. Di "destegîr"ê de mecaza mursel heye. Lewra sebab hatiye gotin, lê meqsed jê, netîce ye. Yanê mebest ne ê ku destan digire; belkî mebest jê ê ku alîkar e.

2. Di peyva "destegîr"ê de dibe ku wateya "alîkar"ê û "destgirtin"ê her du jî bîen qesdkirin. Gava ev her du wate jî bîen qesdkirin, em dikarin bibêjin di vê peyvê de kînaye heye. Lêbelê di vir de wateya heqîqî mimkun be jî pirê caran wateya mecazî tê famkirin.

3. Di vê malikê de dibe ku "destegîr, mustexas û bo gunehkaran" munada bin. Bateyî bi van wesfan gazî Hz. Pêxember (s. x. l.) dike. Li gorî vê şîroveya hane li vir îcaz heye. Lewra baneşana bangkirinê ketîye.

4. Di te'bîra "her du kewn"ê de mecaza mursel heye. Lewra mehel hatiye gotin. Lêbelê hal hatiye qesdkirin. Yanê mexlûqatê mîkelef hatiye qesdkirin ku ew jî însan û cin in. Dibe ku 'eleqa mecazê di vir de sebebîyyet be jî. Lewra peyva لَوْلَا لَوْلَا لَمَا خَلَقْتَ الأفلāk "Tuneba (ya Muhemmed) (s.x.l.) min kaînat nediafirand."

Yanê rûmet û qîmeta Hz. Pêxember (s.x.l.) li cem Xweda neba Xweda kaînatê çenedikir. Ew rûmet bûye alîkar an jî bûye sebab ji bo çêkirina kaînatê.

5. Di te'bîra her "her du kewn"ê de dibe ku ji bo mubalexeyê temamê mexlûqatan hatibe qesdkirin. Lêbelê meqseda eslî ji vê te'bîrê însan û cin in.

6. Bêjeya "kewn"ê bi wateya kaînatê ye. Li gorî vê mebest ji mesderê îsmê fail e. Hinek ehlê belaxetê ji vî tiştê hanê re gotine mecaza mursel.

7. Di peyva "penah"ê de dibe ku kînaye hebe. Lewra penah carinan bi wateya heqîqî, carinan jî bi wateya mecazî tê bikaranîn. Di vir de her du wate jî mimkun in. A heqîqî ew e ku

meriv pišta xwe bi şeklekî maddî bispêre tiştêkî yan jî şexsekî yan jî ew e ku meriv here cem yekî û alîkarîyê ji wî bigre. A mecazî jî sipartina me'newî ye ku ew jî alîkarî xwestin e.

8. Di bêjeya "pişt"ê de jî mecaza mursel heye. Lewra pişt bi wateya pišta însan nîne, bi wateya "destek dayîn"ê ye. Li gorî vê şîroveya hanê pişt sebeb e. Lêbelê meqsed jê alîkarî ye ku ew jî netîceya piştdayîne ye. Sebeb hatiye bilêvkirin. Lêbelê musebbeb hatiye qesdkirin.

9. Di hinek nusxeyan de di navbera bêjeyên "pişt" û "ewn"ê de gihanek heye û di hinekan de jî tune ye. Heke gava gihaneka "û"yê tune be, bi teqdîrkirina wê em dikarin bibêjin li vir îcaz heye.

10. Di navbera "penah, pişt û ewn"ê de îtnab heye. Lewra wateyên wan nêzîkî hev in. Di navbera "destegîr û mustexas"ê de jî îtnab heye. Wateya wan jî nêzîkî hev e.

11. Di vê malikê de îcaz heye. Lewra kirde û lêkera alîkarîyê hatine hezifkirin. Eslê vê beytê "tu destegîr û mustexas î" ye Li gorî vê şîroveyê tê dîtin li vir hezif heye. Bi sebebê wê jî îcaz çêbûye.

12. Bêjeyên "destegîr, pişt, penah"ê dibe ku bi îstîaretî jî bê şîrovekirin. Lewra li gorî vê fikirê "alîkarî, destek û qencî" tiştên me'newî ne, bi tiştên muşexxes hatine şibandin.

13. Wateya bêjeya "'ewn"ê "alîkar" e. Li gorî vê şîroveya hanê li vir mesder di şuna îsmê fail de hatiye.

Sellî ya Rebbî 'ela xeyrî'l-beşer

Ta hebin teyr û bixûnin ber şecer

"Ey Rebê min! Heta ku çivîk li ser daran bixwînin tu selat û selaman li ser pêxemberê xwe yê ku herî başê mirovan e bîne."

1. “Xeyru’l beşer” sifetek e ku ji bo Muhemmed (s.x.l.) hatiye bikaranîn. Ew jî mewsûf e. Di vir de kînaye heye. Lewra bi sifetê mewsûf hatiye qesdkirin.

2. Bi peyva “bixûnin” îstîareya tebeîyye hatiye bikaranîn. Li vir gava lêkera “bixûnin”ê bi wateya xwe ya rasteqîn be û ji bo însanan bi tenê be, îstîare derdikeve holê. “Bixûnin” muşebbehun bîh e û deng derxisina çivîkan jî muşebbeh e.

3. Di “bixûnin” de dibe ku hunera muşakeleyê jî hebe. Teyr bi tiştê re hatiye ku ew jî di derbarê mirovan de ye. Ji sedem vê xalê jî tiştê aîdê mirovan ku ew jî xwendin e hatiye nisbetkirin bi bal teyran ve.

4. Bêjeya “ber”ê di Kurdî de bi wateya “pêşî, cem, bal, teref”ê tê bikaranîn.³² Xwarin li ber wî ye. Lê li vir bêjeya “ber” bi wateyê “ser” hatiye bikaranîn. Hinek şîrovekar jî dibêjin li vir “ber” li gorî wateya xwe ya Farisî hatiye bikaranîn ku ew wate jî “ser” e. Îhtîmalek zeîf be jî em bibêjin li vir “ber” Kurdî ye, wê gavê li vir di “ber”ê de îstîareya tebeîyye heye. Lewra “ser” muşebbeh e û muşebbehun bîh jî muşebbehun bîh e.

5. Dibe ku di risteya duyem de mecaza mursel hebe. Li gorî vê şîroveyê “wucûd, jîyan” hatiye qesdkirin. Lêbelê netîca wê hatiye gotin ku yek jê xwendina teyran li ber daran e. Yanê heta mewcûdat hebe.

6. Bêjeya “şecer” ji alîyê şekil ve yekjimarî be jî, wateya wê pirjimarî ye. Lewra siyaq û sîbaq wê maneya pirjimarî dixwazin.

7. Di nivê duyem de qelba mekanî heye. Lewra bi piranî halê hevokê “*ta teyr hebin*” e. Kirde berîya pêveberê ye.

8. Di hinek nusxeyan de di navbera “teyr” û “bixwûnin”ê de gihanek nehatiye bikaranîn. Li gorî wan nusxeyan li vir îcaz heye. Lewra gihaneka “û”yê her du hevokan bihev ve girêdide.

³² M. Emin Bozarşan, Ferhenga Kurdî, I, 205-212.

9. Di risteya duyem de hevoka “bixûnin ber şecer”ê ji bo ya yekem ku “ta hebin teyr” e wek îzahê ye. Ew jî dibe îtnab. Lewra wateya wê bêyî ya duyem tam nayê famkirin. Piştî ku ya duyem li dû ya yekem tê ihtîyac bi bal ya yekem namîne. Lewra hebûna teyran jixwe “bixwendina wana li ber daran” eşkere dibe. Yanê xwendina teyran jixwe îzah e ji bo hebûna teyran. Teyr tunebin nikarin bixwînin jî. Li vir hevoka dudiyar dişibihe hevokên feslê jî.

Ew hebîbê rohnîya heft asîman

Her du ‘alem qalib ew rûh û rewan

“Hz. Pêxember (s.x.l.) hebîbê Xwedê ronîya heft asîmanan e. Her du alem (dinya û axiret) cesed in û Hz. Muhemmed (s.x.l.) jî ji bo wan rûh e. Ew her du jî bi saya wî hebûna xwe dewam dikin.”

1. Di bêjeya “hebîb”ê de dibe ku tewcîh hebe. Lewra wateya wê bi îsmê failî jî û bi îsmê mefûltî jî dibe.

2. Di pirên nusxeyan de bêjeya “hebîb”ê hatiye îdafekirin bi bal “rohnîya heft asîman” ve. Lêbelê li gorî qenaeta me li vir îdafekirina hebîbê ji alîyê wateyê ve xweş xwanê nake.

Bi rastî tevi vê xala hanê jî dibe ku wateya wê “Ew evîndarê rohnîya heft asîmanan e” be an jî “ew dildarê rohnîya heft asîmanan e” be. Gava li vir wateya “hebîb”ê evîndar be, em dikarin bibêjin di vir de ronahî bi wateya başîyê ye. Li gorî vê şîroveyê li vir îstîfeyê tesrîhîyê û eslîyê derdikeve holê. Lewra “başî” bi “ronahî”yê hatiye şibandin.

Lê gava mebest ji bêjeya “hebîb”ê dildar be. Yanê “ew mirovek e ku başî ji wî hez dike û daîm bi wî re ye.” Lewra ronahî bi mirovekî evîndar hatiye şibandin, lê mirov ku muşebbehun bîh e nehate gotin û lazîmê mirovê ku ew jî li vir “hebîb” e hatiye îdafekirin bi bal muşebbehê ve ku ew jî ronahî ye. Ev hemû dibe îstîfeyê meknîyê û texyîlîyê. Li vir bi îstîfeyê ji

bo ronahîyê teşxîs çêdibe. Teşxîs ew e ku bi riya şibandin tiştêk bibe xwedî kesayetîyê.³³ Ji evindariya başîyê û dildariya Hz. Pêxember derdikeve holê ku başî giş li cem wî ye û li ciyên din başî û xelasî tune ye. Ev jî kînaya bi te'rîzê ye. Yanê cî û kesên elaqa wan bi Hz. Pêxember ve tune ye başî li cem wan tune ye.

3. Gava ku bêjeya "hebîb"ê îdafe nebe, wateya vê malikê rindtir dibe. Jixwe di hinek nusxeyan de jî di dû wê re gihanek hatiye. Wê demê wateya vê risteyê "ew dildar û ronahiya heft asîmanan e" dibe. Ji vê wateyê tê famkirin ku bêjeya "ew"ê muhtemala ye û hebîb û tiştê li dû wî hatiye jî xeber e.

Gava ku îdafe û gihanek tev li vir neyê fikirkirin, "ew hebîb" her du bi hev re dibin muhtemala û dîsa yên din dibin xeber. .

4. Di peyva "hebîb"ê de dibe ku kînaye jî hebe. Li gorî vê şîroveyê sifet hatiye gotin û mewsuf hatiye qesdkirin ku ew jî Pêxemberê (s.x.l) me ye.

5. Di te'bîra "heft asîmanan"ê de îktîfa heye. Lewra Pêxember (s.x.l.) çawa rohniya heft asîmanan be; bi wî awayî rohniya heft qatên erdê ye jî.

6. Gava ku em ronahîyê şîrove bikin bi ya me'newî, em dikarin bibêjin di te'bîra "heft asîmanan" de mecaza mursel heye. Lewra mehel hatiye gotin. Lê mebest ji ew kesên ku li asîmanan dijîn melaîket in.

7. Dibe ku di "*rohniya hefta asîman*"ê de telmîh bi bal bûyera mîracê hebe.

8. Di te'bîra "her du alem qalib ew rûh û rewan"ê de du teşbîhên belîx hene. Lewra Hz. Pêxember (s.x.l.) hatiye şibandin bi rûh; dinya û axiret jî hatine şibandin bi qalib. Gava rûh tune be, tu xêrek ji cesêd re namîne. Li gorî vê şîrovê kâinata an jî jiyana ku Hz. Pêxember tê de tune ye kêrî tiştêkî nake.

³³ Osman Aslanoğlu, Di Mem û Zînê de Hunerên Mecazî, e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi, Nisan-2019 Cilt:11 sayı 1 (23), 146.

9. Di van her du şibandinan de hem îcaza qiser û hem jî îcaza hezfê heye. Lewra daçeka şibandinê û wechê şebêhê nehatiye zikirkirin. Ji teşbîhên bi vî awayî re teşbîhên belîx tê gotin. Tiştêkî din jî ev hevok ji aliyê erênî gellek wateyên qenc ji me re dibêje. Ji sedem vê taybetîya hanê jî li vir îcaza qiser heye.

10. Di “rûh û rewan”ê de îtnab heye. Lewra wateyên rûh û rewanê yek in an jî nêzîkî hev in.

11. Ji sedem ku pêveber nehatiye zikirkirin, di vê beytê de îcaz heye. Lewra “asîman” lazime ku “asîman e” be û “alem qalib” “alem qalib e” be û “rûh û rewan” jî “rûh û rewan e” be.

Xakîpayê Ehmed ew Beytu’l heram

Lew şerîf in Zemzem û Rukn û Meqam

“Axa bin lingê Ehmed, Beytu’l-haram e. Yan jî ew Beytu’l-heram axa bin lingê Ehmed e. Ji sedem vê taybetîya hanê Bîra Zemzem, Rukn û Meqam bi rûmet û bi qîmet bûne.”

1. Di hevoka “Xakîpayê Ehmed ew Beytu’l heram”ê de dibe ku daçeka şibandinê bê fikirkirin. Wê gavê em dikarin bibêjin ku divê hevokê de, şibandina belîx heye. Yanê “axa bin lingê Ehmed wek axa beytu’l-heramê” ye.

2. Li gorî hinek şirovekarên di hevoka “Xakîpayê Ehmed ew Beytu’l-heram”ê de şibandin tune ye. Lewra li gorî wan daçeka şibandinê di vir de nayê fikirkirin û têkilîya navbera xakîpay û beytu’l-heram de têkilîya mubteda û xeberî ye. Yanê “axa bin lêngên Ehmed di Kabeyê de cî girtî ye. An jî “bi axa bin lingê Ehmed Ka’be hatiye çêkirin.”

3. Di nîvê yekem de bi ketina qertafa pêveberê îcaz çêbûye. Lewra eslê wê “Beytu’l-Heram e”

4. Di nîvê duyem de jî îcaz heye. Lewra mebest ji Zemzemê ava Zemzemê ye an jî Bîra Zemzemê ye, ji ruknê jî Rukne Yemanî an jî ruknên din in û ji meqam jî meqamê Îbrahîm e. Bêyî van

bêjeyan Sefa û Merwe jî em dikarin bibêjin nehatiye zikirkirin; lêbelê hatine qesdkirin. Lewra Beytu-'l-Heram û wan tiştên li dora wê bi sebab Hz. Pêxember Muşerref in. Sefa û Merwe jî tiştê li dora wan e ew jî muşerref ji heman sebebi muşerref bûne.

5. Dibe ku mebest ji Ruknê Yemanî Heceru'l-Eswed be. Li gorî vê şîroveyê li vir mecaza mursel heye. Lewra Ruknu'l-Yemanî hatiye gotin ku mehel e. Lê Heceru'l-eswed hatiye qesdkirin ku ew jî hall e.

Sellî ya Rebbî 'ela xeyri'l-wera

Ma tesîrûş-şemsû fî's-seb'î'l-'ula

“Ey Rebê min heta roj li heft asîmanên bilind (asîmanan) bi gere tu selawatan li ser herî başê mexlûqan bînî.”

1. Di bêjeya “sellî”yê de du îhtîmal hene. A yekem “îktîfa” ye. Wê gavê peyva “sellîm”ê ji sedem îktîfayê hatiye hezifkirin. Li gorî ya duyem îktîfa tune ye. Lêbelê “sellî” wateya “sellîm” jî îfade dike. Lewra di zimanê erebî de tê gotin ku hinek bêje إِذَا اجْتَمَعَا إِفْتَرَقَا “Wexta bi hev re tîn, wateya wan cuda dibe, Gava ji hev cuda dibin, wateya wan dibe yek.”³⁴

2. Ji te'bîra “Xeyru'l-wera”yê Pêxember (s.x.l.) hatiye qesdkirin. Ji sedem vê taybetîya hanê di vir de kînaye heye. Lewra sifet hatiye; lêbelê mirad jê mewsuf e.

3. “Lêkera “Sellî”yê emr e û ji bo wateyekî jî alî şer'ê ve ku mecazî ye hatiye bikaranîn. Ku ew jî “dia” ye.

4. Dibe ku mebest ji “ma tesîrû şemsû fî's-seb'î'l-'ula” “heta ku kâinat hebe” be. Li gorî vê wateya hanê em dikarin bibêjin ku di vir de kînaye heye. Mebest jê ne gera rojê li asîmanan e, lewra gerandina dinyayê li dora xwe dibe sebab ji bo hasilbûna roj û şevê.

³⁴ Suleyman el-Buceyremî, Tuhfetu'l-hebîb, V, 142.

5. Mebest ji “fi’s-seb’l-’ula”yê heft asîman e. Ji sedem vê taybetîyê di vir de kînaye heye. Sifet hatiye gotin mewsuf jî hatiye qesdkirin.

6. Di hinek nusxeyan de “fi’s-seb’î”yê ye. Di hinekan de jî fi seb’î” ye. Li gorî ya dawîyê bêjeya seb’i ji mewsûftîyê derketiye û bûye mudaf û îdafekirina mewsûf bi bal sifetê xwe ve ye.

7. Mebeset ji lêkera “tesîru”yê (تَسِيرُ) “tetlu” ye (تَطْلُعُ). Li gorî vê şîroveyê em dikarin bibêjin mecaza mursel heye. Lewra musebbab hatiye zikirkirin. Lêbelê sebeb hatiye qesdkirin.

Fexrê Îbrahîm û Îsmail û Nûh

Mustefayê bawefa yê bafutûh

“Hz. Îbrahîm, Hz. Îsmail û Hz. Nûh bi Mistefayê xwedîyê wefa û fethê fexr kir û pesnên wî dan. ”

1. Bêjeyâ “fexrê” dibe ku pêveber (xeber) be û dibe ku kirde (mubteda) be. Dema ku em wê bi pêvebertî qebûl bikin, wateya vê malikê “Mustefayê Xwedîyê feth û wefayê fexra Îbrâhîm, Îsmail û Nûh e” dibe. Li gorî vê şîroveyê di vir de pêveber hatiye teksîskirin li kirdeyê. An jî ji sedem girîngtîya pêveberê, pêveber berîya kirdeyê hatiye. Lêbelê fexr kirde be wateya malikê “Fexra Îbrâhîm, Îsmail û Nûh Mustefayê Xwedîyê feth û wefayê ye” dibe. Di vir de kirde berîya pêveberê hatiye. Meraqkirina guhdaran sebeb e ji bo berê hatina pêveberê. Lewra guhdar meraqa pêveberê dikin.

2. Di vê malikê de îcaz jî heye. Lewra lêkera alîkarîyê hatiye hezifkirin.

3. Di peyva “fexr”ê de mubalexe heye. Lewra ev bêje mesder e. Mesder jî hedes (bûyer) e. Yanê mesder navê lêkerê ye an jî eslê lêkerê ye. Çawa ku dibêjin “dîtin” ji bo lêkera “dît”ê esl e. An jî dibêjin nav e. Ji sedem vî tiştê hanê di vir de jî hatina

fexrê bi pêvebertî xweş xwanê nake. Lewra li gorî vê şîroveya hanê kirde dibe hedes. Wateya hevokê “îftîxarkirina van pêxemberan Hz. Muhemmed e.” Ev jî bi awayekî rasteqîn ne li cî ye. Ji sedem vê xalê hatiye gotin ku ev mubalexe ye an jî gotine ku ev mesderê hanê bi wateya îsmê me’ûlê hatiye bikaranîn. Lewra wê gavê wateya vê bêjeyê “pêxember pesnê wî didin, an jî bi wî îftîxar dikin” dibe. Mimkun e li vir hezif jî hebe. Li gorî vê şîroveya hanê jî îcaz heye û wateya fexrê “yê ku mirov pê îftîxar dikin Hz. Muhemmed e” dibe.

4. Di “bâwefa” û “bafutûhê” de camiyet heye. Em dikarin bibêjin ku ev îcaza qiser e. Lewra futûh jî bo alîyê madî gellek girîng e. Wefa jî ji bo alîyê me’newî gellek girîng e.

5. Îhtîmalek zeîf be jî dibe ku bêjeya fexrê bi wateya îsmê tefdîl be. Li gorî vê şîroveyê bêjeya fexr bi tenê kirde (mubteda) dibe. Îhtîmala bûna wê ya xebertîyê namîne. Wateya hevokê “Di nav van pêxemberan de yê ku herî xwedîyê îftîxarê Hz. Pêxember e” dibe.

6. Di “bâ wefa” û “ba futûhê” de îcaz jî heye. Lewra “û”ya gihanekê nehatiye bilêvkin.

7. Di “bâ wefa” û “ba futûh”ê de “ba”yê hatiye tekrarkirin. Ji vî alî ve jî îtnab heye.

8. Di peyva “futûh”ê de dibe ku tewcîh jî hebe. Lewra di vir de dibe ku “futûh” du wateyan îfade bike. A yekem “fetha memleketan” e. A duyem jî “vebûna derên rehmetê” ye. Li gorî van her du wateyên “futûh”ê em dikarin bibêjin ku di vir de telmîh bi bal van du ayetên jêrê ve heye.

وَمَا أَرْسَلْنَاكَ إِلَّا رَحْمَةً لِّلْعَالَمِينَ

“Me te bi tenê ji bo tu bibî rehmet ji aleman re şand.” (el-Enbiya, 107).

“Bêguman me fetheke eşkere ji bo te kir nasîb.” (el-Fetih, 1).

Ma remeyte îz remeyte goşidar!

Destê wî destê Xuda der kar û bar

“Ey guhdar an jî ey mixateb! Guhdarî bike gava te (tişte) avêt ew avêtin ne avêtina te ye. Destê Hz. Pêxember (s.x.l.) bi alîkarîya dest û qudreta Xwedê kar dike.”

1. Di vê malîkê de îqtîbas heye. Lewra gotina “Ma remeyte îz remeyte”ê ji sureya el-Enfâlê ayeta hevdehan hatiye girtin. Xwedayê Teala di ayeta hevdehan de dibêje

وَمَا رَمَيْتَ إِذْ رَمَيْتَ وَلَكِنَّ اللَّهَ رَمَى

“Gava te avêt te ne avêt. Lê Xwedê avêt” (el-Enfâl-17).

2. Di “Ma remeyte îz remeyte”yê de telmîh jî heye. Lewra di vir de îşaret bi bal cenga Uhûdê ve jî hatiye kirin.

3. Di bêjeya “goşidar” de tewcîh heye. Lewra dibe ku emir be û dibe ku îsmê fail be. Emir be, wateya wê “guhdarî bike” ye û îsmê fail be jî wateya wê “Ey guhdar!” e.

4. Goşidar îsmê fail be, îcaz jî heye. Baneşana gazîkirinê ku ew jî “ey” e an jî “ya” ye hatiye hezifkirin.

5. Gava bêjeya “goşidar” bi wateya “guhdar” be, dibe ku îltîfat jî hebe. Lewra çiqas li vir bêjeyên ayetê bi raweka mixatebê bin jî hatiye îqtîbas kirin. Ji ber vê yekê mimkun e ku bê şîrovekirin bi îltîfata jî xâibê bi bal mixatebê ve. Lewra îqtîbas wek xaibê te pejirandin û “goşidar” jî mixateb e. Lewra nîda ye.

6. Di navbera her du bêjeyên “dest”ê de cînasa naqis heye. Sebebê cînasê cudatîya wateya destê ye. Lewra mebest ji destê Xwedê qudreta Xwedê ye. Lêbelê mebest ji destê Pêxember dibe ku wateya heqîqî be û dibe ku sebebîyet û alîkarî be.

7. Di peyva “dest”ê de îhtîmala muşakeleyê jî mimkun e. Lewra di vir de behsa Xwedê û Pêxember her duyan jî hatiye kirin, yanê her du di eynê meseleyan de cî girtine. Ji ber ku Xweda û Resûlê xweda di heman meseleyê de hatine, ji Xwedê re bêjeya destê hatiye bikaranîn tevî ku ji Xwedê re dest bi wateya heqîqî mimkun nîne.

8. Di “kâr” û “bar”ê de du îhtîmal hene. A yekem ew e ku bar ji bo karê tekîd be. Wê gavê wateya wan wek hev e û dibe îtnab. A duyem jî ew e ku wateya bêjeya “bar”ê ji ya karê cudâ be. Wê gavê jî cînasa naqis tê meydanê, lewra wateyên wan cuda ne, lê ne bi temamî be jî hevdeng in. Li gorî vê şîroveya hanê em dikarin bibêjin ku wateya “bar”ê bi wateya “wezîfe”yê ye.

9. Di nîvê duyem de dibe ku îcaz hebe. Lewra wê gavê wateya wê “destê wî bi destê Xwedê re” dibe.

10. Bi îdafa “destê Xweda”yî ji “kar û bar” re te’zîm çêbûye.

11. Di hinek nusxeyan de di navbera “kar” û “bar”ê de gihaneka “û”yê heye. Li gorî van nusxeyan li vir îcaz heye. Di hinek nusxeyan de jî bêjeya “kar”ê hatiye îdafekirin bi bal bêjeya barê ve. Li gorî vê şîroveya hanê du îhtîmal hene. A yekem ku “kar” hatiye îdafekirin bi bal hemwateya xwe. A duyem jî wateya kar û barê cuda ne. Li gorî vî tiştê hanê wateya îzafê “zehmeta, meşeqqeta kar an jî wezîfê” ye.

Sellî ya Rebbî 'ela xetmî'r-rusûl

Ma yemûcu'l-aşîqûne fî's-subul

“Ey Rebê min! Heta ku ehle ‘îşqê di riyana de bibin wek pêlê (ava derayayê) tu selatan li ser ê ku hatina pêxemberan bi dawî anîye bînê.”

1. Heta vê malika hanê helbestvan sê caran hevoka “Sellî yâ rebbî” bikaranîye. Sebebê vî tiştê hanê hebûna emrê selatê ye. Lewra di Quranê de Xweda emrê selatê li ser Pêxemberê xwe kiri

ye. Tiştêk din jî ku sebebê tekarê ye zewq girtina helbestvan ji anîna selatê li ser Hz. Pêxember e.

2. Di bêjeya “rusûl”ê de îktîfa heye. Lewra mebest ji bêjeya “resulan”ê nebî nîne. Lêbelê bi wasita hunera îktîfayê nebî jî hatiye qesdkirin.

3. Di “rusûl”ê de dibe ku mecaza mursel jî hebe. Li gorî vê xala hanê cuz hatiye gotin, lêbelê kull hatiye qesdkirin ku ew jî nebî nin. Lewra rusul bi awayekî qetî nebî ne. Lê hemû “nebî” resûl nîn. Ji alîyekî ve rusûl xas in, nebî umûm in.

4. “Xetmî’r-rusul telmîh e bi bal ayeta jêrê ve:

وَلَكِنَّ رَسُولَ اللَّهِ وَخَاتَمَ النَّبِيِّينَ

“Lêbelê Ew (Muhemmed) Resulê Xwedê û dûmahîkê pêxemberan e.” (el-Ehzâb, 40).

5. “Xetmî’r-rusul” sifetê Hz. Pêxember e. Navê wî nehatiye gotin. Lêbelê wesfê wî hatiye gotin. Ji ber vî halî, xetmî’r-rusul kînaye li vir heye. Lewra sifet hatiye gotin, mewsûf hatiye qesdkirin.

6. Peyva “xetm”ê mesder e, û ji bo mubalexeyê ye. Li gorî vê şîrovevê Hz. Resûlullah xatimê pêxemberan e. Xatim îsmê fail e. Lêbelê ev wesf ji bo Hz Pêxember wisa qetî ye û pir pê re heye ku ew bixwe bûye xwedîyê wateya xetmê an jî bi xwe bûye xetim. Ji sedem vê taybetîyê di dewsa “xatim”ê de bêjeya “xetim”ê hatiye bikaranîn.

7. Di peyva “yemûc”ê de îstîareya tebeîyye û tesrîhîyye heye. Lewra xebat û cehda evîndarên riya Xwedê de ne bi pêlên deryayê hatiye şibandin. Girêdana mevcê bi aşîqan jî qerîne ye. Fî’s-subul mûlaimê muşebbehê ye. Ji sedem vê di vir de îstîareya tecrîdîyye heye. Bi vê îstîarê peyv pirtir bi hêz bûye.

8. Dibe ku em îstîarê di bêjeya “aşîqûn”ê de îcra bikin. Li gorî vê ramanê aşîqûn hatiye şibandin bi ava pir. Qerîne jî lêkera “yemûcu”yê ye. Wê gavê îstîare dibe îstîareya “meknîye û texyîlîye. “Subul” dibe ku ji bo mustearun minh û mustearun leh

tev bê bikaranîn. Li gorî vê ramana hanê di vir de îstîareya mutleqa heye. Lêbelê subûl pirê caran ji bo “aşîqan” tê bikaranîn. Ji sedem vê taybetîyê jî em dikarin bibêjin li vir îstîareya tecrîdîyye heye.

9. Îcrakirina îstîarê di “Subul”ê de jî mimkun e. Li gorî vê şîroveyê subul mustearun leh e û musearun minh “derya” ye. Ev dibe îstîareya meknîyye. Hasil bûna pêlan di riyan de qerîna îstîarê ye û dibe îstîareya texyîlîyye. Di vir de aşîq mulaîmê mustearun leh e. Ji sedem vî halî ev jî dibe îstîareya tecrîdîyye.

10. Taqyîda selatan bi “*Ma yemûc-ul aşîqûne fis-subûl*”ê ji bo bal kişandina evîndarên Xwedê ye. Lewra helbestvan ev tişt girîng dîtîye û ji wan hez kiriye.

11. Ji bo bêjeya “sellî” îhtîmala îktîfayê an jî îcaza hezfê heye. Lewra “selam” nehatiye gotin. Hezif be îcaz e. Lê hezif neyê teqdîrkirin, îktîfa ye. Ev tişt berê hate diyarkirin. Îhtîmala îcaza qîser jî heye. Lewra bi lêkerek tenê pir wate hatine gotin.

Ew kelîmê xweşnewê çerxê Tûr

Daxîdar im bo wî sîmayê binûr

“Ew Hz. Mûsa (e.s) ku li çiyayê Turê bi Xwedê re bi dengê xweş axîfîye gotîye ez bi hesrata dîtina ser û çavê Pêxember im an jî ji bo wan dişewitim û dihelim ku ser û çavên wî bi nûr in.”

1. Li gorî hinek şîroveyan di vir de peyva “ew”ê îsmê îşaret e û tê de teşbîha temsîlîyye heye. Lewra wê gavê derketina Resûlullah (s.x.l.) bi bal asîmanan û axaftina wî bi Xwedêyê Teala re û derketina holê di hal û şeklen maddî û me’newî de hatiye şibandin bi çûna Hz. Musa (a.s.) bi bal çiyayê Tûrê û xeberdayîna wî bi xwedê re. Wê gavê mebest ji bêjeya “ew”ê Hz. Pêxember e û “ew” mubteda ye. Mebest ji bêjeya “kelîm”ê jî Hz. Musa ye û ji bo “ew”ê xeber e. Li gorî vê şîroveyê di vê malikê de daçeka şibandinê ketiye.

2. Dibe ku mebest ji bêjeya “ew”ê Hz. Musa be. Wê gavê risteya yekem hemû mubteda ye û tiştên li dû “ew”ê ji hatiye, wesfên Hz. Musa ye. Risteya duyem ji peveber e yanê xeber e.

3. Di hinek nusxeyan de di dewsa bêjeya “ew”ê de “ey” hatiye bikaranîn. Li gorî vê bêjeyê mebest ji “kelîm” dibe ku Hz. Musa an jî dibe ku Pêxemberê me (s.x.l.) be. Ev jî dide famkirin ku di bejeya “kelîm”ê de hunera tewcîhê heye.

4. Em dikarin bibêjin bêjeya “kelîm”ê kînaye ye ji Hz. Musâ. Lewra kînayê sifetê ji mewsûfê ve ye.

5. Di bêjeya “kelîm”ê de telmîh bi bal ayeta jêrîn ve heye.

وَكَلَّمَ اللَّهُ مُوسَى تَكْلِيمًا

“Xweda bi Musa re rasterast Xeber da.” (en-Nîsa, 164).

6. Di hinek nusxeyan de “daxdar im” e û di hinekan de jî “daxîdare” ye. Dema “daxdar im” be, bêjeya “dibêje an jî got” tê teqdirkirin û mebest jê Hz. Musa ye û wê gavê li vir îcaz heye.

7. Di vir de ku em bibêjin peyva “ew”ê cînava kesatîyê ye. Wê demê di vê hevokê de teşbîha muekked heye. Lewra li gorî vê şîrovevê peyva “wekî”yê ketiye. Ew jî daçeka şibandîne ye. Lewra wateya wê “ew (Hz. Muhemmed) wek kelîm xweş newayê çerxê tûr e” dibe. Di vir de ji sedem ketina daçeka şibandîne û pêveberê îcaz heye.

8. Di te’bîra “daxîdar im”ê de îstîfereya tesrîhîyye û tebeîyye heye. Lewra ev lêker di dewsa “mutessîr im, mehzûn ûm”ê de hatiye bikaranîn ku mustearun leh e û “daxîdarim” jî mustearun minh e.

9. Daxîdar im “daxîdare” bê xwendin em dikarin bibêjin di vir de tecrîd jî heye, lewra tê famkirin nivîskar ji şexsê xwe wekî şexsekî xaîb xeyal kiriye û derxistîye.

10. Di hinek nusxeyan de di dewsa “ew”ê de herfa nîdayê hatiye bikaranîn li gorî van nusxeyan di dû re lêker “daxîdare” bê xwendin îltîfat çê dibe. Lewra di vî halî de hatina mixateb an jî mutekelim pêwîst e. Lêbelê xaîb hatiye.

11. Gava mebest ji “kelîmê Xweş newa” Hz. Resûlullah be û di serê malikê de herfa nîdayê hebe dibe îcaz jî hebe. Lewra gora vê şîroveyê li dû bêjeya “sîma”yê, cînava “te”yê heye. Lêbelê hezif bûye.

12. Mirad ji peyva “Sîma”yê zatê Pêxember (s.x.l.) be, Em dikarin bibêjin di vir de mecaza mursel heye. Lewra cuz hatiye zikirkirin, lêbelê mirad jê, kull e ku ew jî zatê Pêxember e.

13. Dibe ku ji vê malikê nîvê duyem gotina helbestvan be. Wê gavê jî mebest ji kelîm Hz. Muhemmed (s.x.l.) e. Li gorî vê şîroveyê di nîvê duyem de daxîdare hebe, pêwîst e ku bêjeya “nefa min” an jî cînava “ez”ê bê teqdirkirin. Di vî halê hanê de îcaz derdikeve holê.

14. Têgotin “Çerxê tûr” îdafeya teşbîhîyye ye. Lewra wateya wê “tûrê wek asîmanan” e. Lêbelê bi qenaeta me, di vir de wateya vê ravekê “tûrê wek çerxê li dora xwe digere” ye. Sebebê wê ji ku ev, wateya halê tûrê ye. Lewra gava Hz. Mûsa dixwaze, Xweda bibîne û ji sedem tecellîya Xwedê di Tûrê de, ev rewş hasil dibe. Yanê Tur wek çerxê di ciyê xwe de nasekîne û digere.

فَلَمَّا تَجَلَّىٰ رَبُّهُ لِلْجَبَلِ جَعَلَهُ دَكًّا وَخَرَّ مُوسَىٰ صَعِقًا

“Gava ku Xwedayê Mûsa xwe ji bo çiya diyar kir, çiya (ji tirs û meznatîya Xwedê hûr hûr bû û Mûsa jî bideng hat Xwarê û bêhiş ket.” (el-‘Erâf, 143).

15. Di hinek nusxeyan de bêjeya “sîmayê” “sîmaya” hatiye nivîsandin. Gava “sîmaya” be, ji bo bêjeyên mê tê bikaranîn û “sîmayê” jî ji bo bêjeyê nêr tê bikaranîn. Li gorî qenaeta me hatina “sîmayê” li vir baştir e.

Ew şefî' û sahibê Alayê hemd

Min hene bêhed guneh, nisyan û 'emd

“Ey mehedervan û ey xwediyê ala hemdê,-an jî şefî' û xwedî civaka hemdê- gellek gunehên min ên bi qesdî û ji sedem bîrkirinê hene.”

1. Di raveka “alâyê hemd”ê de îstîareya meknîyye û texyîlîyye heye. Lewra hemd hatiye şibandin bi mirovan, lê mirov nehatine zikirkirin. Lêbelê hemd ku muşebbeh e hatiye bikaranîn. Peyva “alay”ê ku têkildariya wê bi mirovan ve heye hatiye îdafekirin bi bal hemdê ve. Ev îdafa jî qerîna îstîarê ye û ji sedem vî tiştî li vir îstîareya meknîyye û texyîlîyye heye. Li gorî vê şîroveyê “Hz. Pêxember şefaet kirox e û xwedîyê wê civakê ye ku ew jî Xwedê re pir hemd dikin. Vê wateya hanê gava bêjeya “alay”ê Tirkî be mimkun e.

2. Hebûna gihanekê di navbera bêjeya “şefî’ û sahîbe” de ji alîyê wateyê baştir dibe. Lewra li gorî vê me’na ku me niha got îdafekirina şefî’ê bi bal bêjeya “sahîb”ê ve ji alîyê wateyê nexweş e.

Lêbelê wateya bêjeya “alay”ê “bayraq, an jî sembol” be, wateya risteyê “ey wî kesê ku şefaatkiroxê û xwedîyê bayraqa hemdê ye” dibe. Gava wateya “alay”ê “bayraq, sembol” be, dibe ku hemdê pir bi civakê hatibe şibandin û “alay” jî bi bal wê ve hatiye îdafekirin. Ku sembol e an jî bayraq e ji bo hemdê. Alay bi wateya “bayraq û sembolê” be baştir e. Lewra şîrovekarên mewlûdê behsa vê wateyê dikin. Di hinek nusxeyan de di dewsa “alay”ê de “lîwa” hatiye. Wateya wê jî “bayraq” e. Li gorî vê wateyê jî di raveka (îdafeya) “alayê hemd”ê de îstîareya meknîyye û texyîlîyye heye.

Lê tevî me got ku hemd bi civakê hatiye şibandin dibe ku hemd bi tişteki nehatibe şibandin jî wê, gavê li vir mecaz jî holê radibe.

3. Di hinek nusxeyên mewlûdê de jî “lîwau’l-hamd” derbas dibe. Li gorî van nusxeyan di vê malikê de îqtîbas ji hedîsê heye. Lewra Hz. Pêxember dibêje roja qiyametê وَأَنَا حَامِلٌ لِيَوْمِ الْقِيَامَةِ “Ez di roja qiyametê de bayraqa hemdê digirim.”³⁵.

³⁵ Îbnul-Esîr, Camî’ûl-usûl, 6324.

4. Di navbera peyvên “nîsyan” û “emd”ê de tîbak heye. Lewra her du peyv zidê hev in.

5. Di vê malikê de îtnab heye. Lewra piştî te’bîra “bê hed guneh”ê du bêje hatine ku bêjeyên berîya xwe îzah dikin. Ji wî re îzah be’de’l-îbham tê gotin.

6. Di hevoka “Min hene bêhed guneh, nîsyan û ‘emd’ê de mubalexe heye. Lewra wateya “bê hed”ê bê sînor” e. Di “nîsyan”ê de jî mubalexe heye. Lewra di hedîsa Hz. Resûlullah (s.x.l.) de tê gotin ku gunehên ji sedem bîrkirinê tên holê nayên nivîsandin.

وَمَا اسْتَكْرَهُوا عَلَيْهِ *“Webalê tiştên bi xeta, bi bîrkirin an jî bi cebrê tên holê ji ser umeta min hatin rakirin.”*³⁶

Lê me hêvî wasîqe dê ez feqîr

Jêrê alaya te bim roja 'esîr

“Lêbelê hêvîyekî me ya bêguman heye ku ez feqîr ewê di roja zor de ezê di bin ala te de bim. An jî “di roja dijwar de di nav umeta te de bim.”

1. Di vê malikê de îxtîsas heye. Di serê hevokê de mutekelim pirjimar e û umûm e. Di dawîya hevokê de mutekelim, behsa nefsa xwe bi tenê dike. Ew jî nîşan dide ku wate hatiye teksîskirin û li vir tewazû heye.

2. Di te’bîra “Lê me hêvî wasîqe” de bi awayekî niyazkar hemla mixatebê li ser kirina tiştê ku tê xwestin hatiye kirin.

3. Di gihaneka “lê” yê de îstîdrak heye. Lewra tiştê ji malika berê tê famkirin, hatiye teshîhkirin.

4. Bêjeya “feqîr”ê kînaye ye jê nivîskarê mewlûdê.

5. “Roja ‘esîr”ê kînaye ye ji roja qiyametê.

Di Qurana pîroz de jî ev raveka hevalnavî (terkîba mewsuûfî) hatiye bikaranîn. Lewra di ayeta jêrê de derbas dibe.

³⁶ el-Hindî el-Mutteqî, Kenzu’l-‘Ummal, 10307.

فَذَلِكَ يَوْمًا عَسِيرٌ

“Ev roja hanê rojêke dijwar e.” (el-Muddessîr, 9).

Ji vê raveka hanê re em dikarin bibêjin telmîh e. Telmîh ji alîyê îşaretkirinê bi bal roja qiyametê ye. Lêbelê ji alîyê lefzê de dibe ku îqfîbas be. Lê ev tişteki zeîf e. Lewra ev gotin bi guherandina bêjeya “yewm”ê bi bal Kurdî ve hatiye îqfîbaskirin.

6. Di peyva “jêr”ê de îstîfareya tesrîhîyye heye. Lewra dibe ku “jêr” bi riya şibandinê di şuna bêjeyên “dû, dawî”yê hatibe bikaranîn. Li gorî vê şîroveyê mebest ji bêjeya “alay”ê umeta Îslamê” ye.

7. Bêjeya “alay”ê heke bi wateya beşek ji artêşê be, em dikarin bibêjin tê de, îstîfareya tesrîhîyye heye. Ji sebeb ku wê demê umeta Muhammed (s.x.l.) hatiye şibandin bi komek mirovên wek artêşê yin ku bi tertîb û meqsed in û bihêz in û fedakar in.

8. Di hinek nusxeyan de di dewsa “dê”yê de “da” hatiye. Ji bo “dê”yê çend wateyên cuda tê behskirin ku ew jî bikaranîna “dê”yê ji bo “sebebiyyet, qetiyet û zeman” e. Gava “dê” hebe, hunera tewcîhê derdikeve holê ku di daçeka “da”yê tewcîh ji holê radibe. Lewra “da” ji bo sebebiyyetê bi tenê tê bikaranîn.

Mijara Sêyem: Xêra Xwendina Mewlûdê

Her kesê guhdarê Mewlûda Nebî

Dergehê mîzgîniyan dê lê vebî

“Kî guhdarî xwendina mewlûda Nebî be, ewê mîzgîna tiştan jê re were, an jî ewê derîyên cenetê li vebive.”

1. Di navbera peyvên “vebî” û “nebî”yê de cînasa naqis heye. Lewra ev her du bêje jî alîyê wateyê cuda ne. Lêbelê lefzên wan bêyî herfa serî wek hev in.

2. Di bêjeya “mewlûd”ê de tewcîh heye. Lewra wateyên bêjeya “mewlûd”ê pir in. Wateyên wê ewê nû ji dê dibe, berhem û merasim in. Li vir wateya wê berhem û merasîme e.

3. Di bêjeya “mewlûd”ê de mecaza mursel jî dibe hebe. Lewra “hatina Hz. Pêxember bûye sebebê xwendina mewlûdê, sebeb hatiye bilêvkirin. Lêbelê mebest jê musebbeh e ku ew jî xwendina mewlûdê ye.

4. Di bêjeya “mîzgînîyan”ê de mecaza mursel heye. Lewra mirad jê cenet e ku ew ciyê mîzgînîyan e.

5. Em dikarin bibêjin dibe ku di bêjeya “mîzgînîyan”ê de îstîfereya meknîyye û texyîlîyye heye. Sebebê vê îstîfereyê şibandina “mîzgînîya tiştan” bi baxçan û an jî malan ve ye. Qerîne jî îdafekirina “derî” bi bal mîzgînîyan ve ye.

6. Heke gotina “mîzgînîyan” bi wateya heqîqî be. Îdafekirina “dergeh”ê bi bal mîzgînîyan ve jê sedem edna mulabesetê (têkilîya herî biçûk) ye.

7. Di hinek nusxeyan de di dewsa bêjeya “guhdar”ê de lêkera “guhda”yê hatiye. Li gorî bêjeya “guhda”yê îdafa namîne.

Gotî wî Pêxemberê ‘alî sifet

Mewlûda min her kesê mazin biket

“Hz. Pêxemberê (s.x.l.) ku xwedîyê sifetên bilind û mezin e û ku Qurana pîroz jî dibêje “Bêguman tu xwedî exlaqekî mezin î, got ku ewê guh bide mewlûda min û hurmetê jê re bike ewê mewlûda min ji wî re bibe sebebê bilindatîyê û pêşveçûnê.”

1. Di peyva “gotî”yê de qetiyet heye. Lewra di dewsa “gotiye”yê de hatiye bikaranîn.

2. Di “alî sifet” de qelba mekanî û îcaz heye. Lewra sifet û mewsûf cî guherandine. Bi awayekî din sifet bi bal mewsûfê ve

hatiye îzafekirin. Bêjeya “xwedî” jî ketiye. Eslê vê te’bîrê “xwedîyê sifetê ‘alî” ye.

3. Di “alî sifet”ê de telmîh bi bal ayeta jêrîn ve heye.

وَإِنَّكَ لَعَلَىٰ خُلُقٍ عَظِيمٍ

“Miheqeq! Tu xwedîyê exlaqekî mezin î.” (el-Qelem, 4).

4. Di bêjeya “mewlûd”ê de îxtîsar heye. Ji sedem ku li vir mirad ji mewlûdê xwendina pirtûkên an jî xwendina rîsaleyên mewlûdê ye. Yan jî bi cî anina mersîma mewlûdê ye.

5. Di te’bîra “herkesî mazin biket”ê de mecaza mursel heye. Lewra mewlûd însan mezin nake. Dibe sebab ji bo mezinkirinê.

6. Di “mazin biket”ê de îcaza qiser heye. Lewra ev hevok di nav xwe de pir wateyan dihewîne.

Ez şefî’ê wî me roja mehşerê

Dê vexwût ew taze ava kewserê

“Hz. Pêxember gotîye ku roja qiyametê ezê bibim şefî’ê wan kesên ku hurmet û rûmetê didin mewlûda min û ew kesan ewê ava kewserê ku taze ye an jî bi lezet vexwin.”

1. Mebest ji mehşerê mesder e. Yanê roja heşrê. Li vir bêjeya mehşer zeman û mekan bîne aqilê merivan jî bibe mesder xweştir dibe. Lewra hatina rojê li vir îhtîyac nahêle bi bal mekantî û zemanîya mehşerê ve.

2. Mirad ji “tasek ava keserê”ê , cins e. Lewra sînordanîn ji bo nimetê Xwedê li cenetê de, eqil qebl nake. “Tasek” bi tenê ji bo nî’metên cenetê ne li cî ye. Ji sedem van her du xalên hanê em dibêjin meqseda helbestvan jê cîns e.

3. Di vê malikê de musawat jî heye. Lewra wate û bêje tam bi qasî hev in. Yek ji bêjeyan bê hezifkirin. Wateya a din kêm dibe.

4. Bi cînavka “ez”ê tenbîh û tekîd hatiye qesdkirin.

5. Di hinek nusxeyan de di dewsa bêjeya “taze”yê de bêjeya “tasek” hatiye. Lêbelê li gorî qenaeta me, li vir hatina bêjeya “tas”ê ji hatina bêjeya “taze”yê baştir e. Lewra “ava kewserê ji xwe daîm teze ye. Îhtîyac bi bal qeyda “taze”yê tune ye. Tevî vê xala ku me amace pêkir jî em dikarin bibêjin bêjeya “taze”yê ji sedem tekîdê hatiye. Wê gavê jî tê gotin ku bi wasita tekîdê îtnab hatiye bikaranîn. Lêbelê li vir ji sedem bêjeya “taze”yê berîya bêjeya “av”ê hatiye. Hatina wê bi sifetîfîyê ne mimkun e. Bi tenê dibe ku bibe hal ji bo kirdeyê. Yanê kirde bi awayekî kêfxweş û geş ewê avê bi geşî û xweşîfî avê vexwe.

6. Bêyî van şîroveyên me ji bo bêjeya “taze”yê qal kir. Li vir dibe qelba mekanî jî hebe. Yanê eslê wê “ava taze” ye.

Serfê mewlûda me yek dîrhem fer e

Hemberê yek kohê zêrê ehmer e

“Serfkirina dîrhemek bi tenê ji bo mewlûda me, hêjayê xerckirina çiyayekî ji zêrê sor e.”

1. Di bêjeya “mewlûd”ê de tewcîh heye. Lewra wateya wê dibe ku wîladeta Hz. Pêxember û xwendina mewlûdê bi xwe be jî.

2. Di bêjeya “fer”ê de îtnab heye. Lewra wateya ferê jixwe ji peyva “yek”ê tê famkirin.

3. Hinekan gotiye wateya “fer”ê pere ye. Li gorî vê şîroveyê jî di vir de dîsa îtnab heye. Lewra jixwe ji dîrhemê pere tê famkirin. Hinek şîrovekarên mewlûdê gotine ev bêje bi wateya “pir, xweş û muteber”ê jî tê bikaranîn. Li vir ji bo vê bêjeyê wateya “pir”ê ne durist e. Lewra bêjeya “yek”ê manie ji bo vê wateya hanê. Lêbelê wateyên “muteber” û “xweş” li vir dibin. Li gorî vê şîroveya hanê îtnab di risteyê de namîne.

4. Di hinek nusxeyan de di dewsa bêjeya “fer”ê de “pare” hatiye. Ji bo bêjeya “pare”yê îhtîmala du wateyan heye. Yek jê

“pere” ye. A din jî “parçe, miqtar” e. Li gorî van her du wateyan jî li vir îtnab derdikeve holê.

5. Peyva “serf”ê di forma mesderê de jî hatibe, îsmê mef’ûl e. Lewra wateya wê “mesruf” e ku mirad jê tiştên ji bo mewlûdê hatine xerckirin e.

6. Mirad ji peyva “hember”ê misl be, di vê malikê de şibandin heye. Lewra dîrhema hatiye serfkirin ji bo mewlûdê hatiye şibandin bi çiyayê zêr.

7. Di peyva “ehmer”ê de îtnab heye. Lewra peyva “zêr”ê kafî hatiye. Lêbelê ji bo weznê an jî qafiyê ev bêje hatiye bikaranîn.

8. Li vir îcaz heye. Mebest ji te’bîra “serfê mewlûda me”, “serfkirin ji bo mewlûda me” ye.

9. Di “kohê zêrê” de dibe ku îdafeya cînsîyye hebe. Li gorî vê şîrovevê bi wateya “çiyayê ji zêr” tê. Îhtîmala ku îdafeya teşbîhîyye jî heye. Wê gavê wateya wê “kohê wek zêr” e.

10. Di te’bîra “yek kohê zêrê ehmer e” de mubalexe heye.

Fî sebîlillah bêbexşîn ber feqîr

Qedrê Mewlûdê bizanin hûn kebîr

“Ewê (hemberê çiyayê zêr) ku hûn ji bo Xwedê li feqîran înfâq bikin. Ey gelî mezinan qedr û qîmeta mewlûdê hûn zanibin û ji bîr nekin”

1. Di te’bîra “fî sebîlillah”ê de îstîare heye, Lewra wan amelên ku mîrov dighêcîne bi bal Xwedê hatiye şibandin bi riya ku di dawîya wê de gihîştina hedefeke heye. Ev te’bîr di Qurana Pîroz de di pirê ciyan de derbas dibe. Yek ji wan ciyan jî vê ayeta jêrê ye.

وَأَنْفِقُوا فِي سَبِيلِ اللَّهِ

“Di riya Xwedê de serf bikin.” (el-Beqere, 195).

2. Di bêjeya “kebîr”ê de tewcîh heye. Lewra dibe ku jê du wate bîn famkirin. Yek jê ku sifet be ji bo “hûn”ê, wê gavê wateya wê “hûn kesên mezin” e. A dudiyar ku wateya wê “pir, gellek” be, wê hingê “pir qederê mewlûdê bizanin,” dibe.

3. Di “hûn kebîr”ê de, îcaz jî heye. Lewra wateya wê “*Ey hûn mezinan*” e. Li gorî vê famkirina hanê li vir uslûba nîdayê heye.

4. Di “hûn kebîr”ê de ji alîyekî din em dikarin bibêjin îtnab heye. Lewra lêkera “bizanîn”ê kafî ye. Te’bîra “hûn kebîr”ê nehatiba bikaranîn jî wate kêma nedima.

5. Çawa me berê jî got di bêjeya “Mewlûd”ê de tewcîh heye.

6. Di hinek nusxeyan de di şuna “bêbexşîn”ê de “bibexşîn” jî hatiye. Hatina “bibexşî” li vir baştir e. Lewra her du lêker wek hev dibe. Gava “bibexşî” be dibe ku wateya wê pirjimar be.

Hem ji Bûbekr û 'Umer hat ev xeber

Hem ji 'Usman û 'Elî çêbû eser

“Ev rîwayetên me gotin an jî emê bejin ji Ebû Bekr û 'Umer hatiye bihîstin û ji 'Elî û 'Usman jî rîwayet hatine.”

1. Di “Bûbekr” de îcaza bi hezîfê heye. Lewra eslê Bû Bekr Ebû Bekr e. Lêbelê hemze hatiye hezîfkirin.

2. Te’bîra “jî bû” tewrîyeyê tîne hişê merivan. Lewra ev te’bîr gava ku meriv dixwîne pê re sebebîyet an jî lêkera “bû”yê tê hişê merivan. Lêbelê di vir de çawa me berî niha jî got ku di raveka “Bû Bekr”ê de hemze ketîye, mebest jê “Ebû Bekr” e.

3. Di peyva “çêbûn”ê de îstîare heye. Ji sedem ku “rîwayet” hatiye şibandin bi “çêbûn”ê

4. Di vê malikê de tefrîq û cem’ heye. Lewra ewilê her çar sahabîyan du du ji hev hatine qetandîn û di dû de jî ji bo her du qisman bi awayekî cuda hikum hatiye dayîn.

5. Di vê malikê de îtnab heye. Lewra her du hevok kirdeyên wan cuda bin jî. Pêveberê wan jî alîyê wateya wan eynî ne. Dibu ku pêvebera wan yek ba.

6. Di navdêra nîşanê “ev”ê de te’zîm û muşexxestî heye. Cînav ji bo tiştê nêzîk hatiye bikaranîn. Lewra di malikên jêrê de behsa rîwayetan tê kirin. Mebest ji cînavê nêzîkbûna rîwayetê ye. Di mewlûda Îbn Hecer de ku navê wê *en-Nî’metu’l-kubrâ* ye tê gotin ku rîwayeta di malikên jêrê de ji alîyê Hz. Ebû Bekr hatiye rîwayetkirin. Ji her çar xelîfeyan jî rîwayet heye. Di hinek çapên mewlûdê de di dewsa “ev” de cînavka “ew” hatiye li gorî vê cînavê îşaret kirin bi bal dûrbûna rîwayetan an jî îşaretkirin bi bal mezinaya rîwayetan heye.

7. Di hinek nusxeyên mewlûdê de lêkera “çêbûn”ê di şuna “çêbû”yê de hatiye nivîsandin. Gava “çêbûn” be, tê famkirin ku rîwayet pir in. Bikaranîna lêkera “çêbûn” baştir e. Lewra di berhemana de der barê rûmetdayîna mewlûda Pêxember (s.x.l.) de rîwayet gellek in.

Dîrhemek bit serfê Mewlûda Nebî

Xeyrekî mazin ji bo hasil dibî

“Terxankirina dîrhemekê bi tenê jî ji ber mewlûda Nebî dibe sebebê peydabûna xêreke mezin ji bo wî kesê ku mesref dike.”

1. Di vir de mebest ji “serf”ê mesrûf e. Li gorî vê şîroveyê mesder hatiye zikirkirin. Lêbelê mesrûf hatiye qesdkirin. Ku ew jî îsmê meful e.

2. Di berîya bêjeya “dîrhemek”ê de bêjeya şertê hatiye hezifkirin. Ji ber vî tiştî li vir îcaz heye.

3. Di bêjeya “mewlûd”ê de tewcîh heye. Lewra mewlûd wateyên cuda dixwe de dihewîne.

4. Di vê malikê de îcaz bi’l-hezif heye. Lewra ji sedem weznê, di şuna “ji bo wî”yê de “ji bo” hatiye.

5. Di bêjeya “dîrhemek”ê de hindiktî heye. Mebest jê “tiştêkî hindik an jî biçûk jî ji bo mewlûda Nebî bê xerckirin, dibe sebebe xêreke pir.”

6. Di hinek destnivîsan de di dewsa bêjeya “mazin”ê de bejeya “mezin”ê hatiye. Her du jî wateyên wan wek hev e. Bi tenê bêjeya “mezin”ê li ser ziman sivik e. Lê li gorî zimanê erebî pîrbûna herfa pîrbûna wateyê yan jî bi hêzbûna wateyê ye. Li vir herfa medê wek wateyê bi hêz tê xuyakirin.

Hem ji Şeyxan bû rîwayet ev xeber

Şeyxê Kexxî Fexrê Razî ba dîger

“Ji şexê Kexxî û ji Fexrê Razî û digel hinek alimên din ev rîwayet hatîye neqlkirin.”

1. Peyva “şeyxan”ê di nav ulemayê mislimanan de bi çend awayên cuda wek bêjeyek istilahî hatiye bikaranîn. Gava ji bo sehabîyan bê bikaranîn mebest jê Hz. Ebûbekr e û Hz. Umer e, Ji bo alimên hedîsê bê bikaranîn qesd jê Buxârî û Muslim e. Di vir de çawa Bateyî gotîye mebest jê Fexrê Razî û Şeyxê Kexxê ye. Li vir dubare heye. Lewra navê aliman nehatiye gotin. Lêbelê leqeba wan hatiye zikirkirin.

2. Di peyva “şeyxan”ê de çawa kînaye heye. Wisa dibe ku tewrîye jî hebe. Sebebê wê tesnîyebûna şeyxan e di erebî de. Lê di Kurdî de bi cemî tê bikaranîn. Ji sedem vê rewşê, dibe ku di vê hevokê de tewrîye hebe. Di dû vê hevokê de leqebâ du aliman hatiye bilêvkirin ku ew jî dibe delîl ji bo tewrîyê.

3. Di vir de ji alîyê din tewşî’ jî heye. Sebebê wê hatina bêjeya şeyxan bi tesnîyetîyê û dû re jî hatina du navên yekjimar e. Her du navên yekjimar peyva “şeyxan” diyar dikin. Ev şîroveya hanê gava ku em bêjin şeyxan tesnîye ye, ya cem mimkun e. Lewra hatiye gotin bêjeya pîrjimar jî bi yekjimarên bîn diyarkirin tewşî’ derdikeve holê.

4. Di "bû rîwayet"ê de qelba mekanî heye. Lewra ev hevok bi awayekî xwezayî bê gotin "rîwayet bûye" ye. Di qelba mekanî de mubalexe derketîye holê.

5. Bi "ba diger"ê îcaza qiser hatiye îcrâkirin. Lewra mebest jê zanyarên Îslamî yên din nin.

6. Di "ev xeber"ê de te'zîm û teqrîb heye. Lewra "ev" cînavka nîşanî ye.

7. Dîsa di bêjeya "xeber"ê de umûm heye. Lewra gotinên Hz. Pêxember, sehabe û gotinên hinekên din hemû dikevin binê wateya hevokê.

Her kesê hazir biket ew yek te'am

Ba buxûr û şerbet û qedrê tamam

"Kî xwarinek tevî buxûr û şerbet û rûmetek başhazir bike."

1. Di te'bîra "yek te'am"ê de hejmar hatiye gotin, lêbelê mirad ji hejmarê yek nîne, belkî cins e. Li gorî vê şîroveya hanê bêjeya "yek"ê zaîd e. Îhtîmal heye ku bêjeya "yek"ê ji bo hejmarê hatibe bikaranîn. Lê li gorî vê şîroveyê jî mebest ji hatina "yek"ê pêwîst e ku mewlûda sade be an jî dayîna tiştêkî hindik ji bo mewlûdê kafî be.

2. Di vir de ji sedem bêjeya yekê, îhtîmala qesr û îcazê jî heye. Lewra "xwarinek bi tenê jî" bê teqdîrîkirin wate gellekî xweş dibe.

3. Di şetrâ dawîyê de cemî' heye. Lewra "buxûr, şerbet, qedr" hemû bi gihanekê di bin biryarekê de hatine komkirin.

4. Di "qedrê tamam"ê de muşakele heye. Lewra qedrê tamam nayê hazirkirin. Lêbelê ji sedem bi xwarin û vexwarinê ve hatiye girêdayîn ji bo wê jî lêkera "hazir biket"ê hatiye bikaranîn.

5. "Qedrê tamam" dibe ku îstîfareya tesrîhîyye be. Li gorî vê îzaha hanê qedrê tamam mustearun minh e. "Pijandina baş" jî mustearun leh e. "Hazir biket" jî ji bo îstîfareyê qerîne ye. "Şerbet,

buxûr” ji mûlaîmê mustearun lehuyê ye. Li gorî vê şîroveyê jî li vir Îstîfereya tecrîdîyye heye.

6. Di bêjeya “temam”ê de îtnab heye. Lewra ew nehatiba bikaranîn jî wateya hevokê kê m nedima.

7. Bêjeya “ew”ê tekîd e. Lewra berîya wê bêjeya “herkes”ê derbas dibe ku mebest jî her duyan eynî be.

8. Di hinek nusxeyên destnivîsên mewlûdê de li ciyê bêjeya “qedrê”ê de bêjeya “qedrek”ê hatiye. Wateya her duyan jî wek hev e. Lêbelê li gorî bêjeyên derbas dibe li vir bêjeya “qedrê” jî bêjeya “qedrek”ê baştir be. Gava em li bêjeyên berên mêze nekin û li te’bîra “yek te’am”ê mêze bikin hatina “qedrek” çêtir xwanê dike. Di “qedrek”ê tesxîrtî jî heye. Li gorî vê şîroveyê “qedreke pir hindik” jî muteber e.

Gazî ket îxwan û hîlbîtin çira

Bête xwendin mewlûda Xeyru’l Wera

“Kî jî bo xwendina mewlûda wî kesê ku herî başê mexlûqan e gazî birâyên xwe yên mislîman bike, çirâyê vêxe û mewlûdê bixwîne”

1. Di hevokên “hîlbîtin û bête xwendin” de, îcaz heye. Lewra gihanek nehatiye zikirkirin.

2. Di van her du hevokên jorîn de, li gorî hatina gihanekê jî wesil û fêslê yek heye. Gava gihanek bê bikaranîn, wesil heye. Neyê bikaranîn jî fêsl heye.

3. Di “mewlûda xeyru’l-wera”yê de îcaz heye. Lewra mebest jê “mewlûda di derbarê Xeyru’l-wera de hatiye nivîsandin” e.

4. Di hevoka “hîlbîtin çira”yê de du tişt hene. Yek jê telmîh bi bal zemanê wîladeta Hz. Pêxember e. Lewra çira di tarîfîyê de ku tarîfî jî di şevê de ye. Hz. Pêxember jî di şevê de hatiye dinyayê. A dudîyan jî îşaret bi bal zemanê xwendina mewlûdê

ye. Ji sedem vî tiştê hanê gotine xwedina mewlûdê bi şevê baştir e.

5. Di bêjeya “îxwan”ê de hunera îktîfayê hatiye îcrakirin. Lewra gazîkirina bi bal mewlûdê bi îxwana tenê nabe. Ji sedem vê xalê em dibêjin di vir de, cîran û nas û dost jî hatine qesdkirin. Ji ber vê taybetîyê li vir îktîfa heye. Mîmkun e ku em bêjin di vir de îcaz heye. Lewra van tiştên me gotin hezif bûne.

6. Îhtîmal heye ku li dû bêjeya “îxwan”ê sifet hatibe hezifkirin. Ew jî îcaz e. Yanê “îxwanê misliman”.

7. Di vir de bêjeya mewlûdê bi wateya “berhemên di derbarê mewlûda Pêxember de” ye. Lewra te’bîra “bête xwendin” vê wateya hanê bi me dide famkirin.

Tête heşrê ew digel xelqê berî

Ye’nî ba Pêxemberanê enwerî

“Ew kes digel xelqê berê an jî digel xelqê paqij, an jî bê guneh tê heşrê. Yanê ewê bi pêxemberan re were heşrê ku Pêxember jî bi nûr in.”

1. Bêjeya “xelq”ê bi wateya mexlûqatê hatiye bikaranîn. Lêbelê di vir de qismekî mexlûqat hatiye qesdkirin ku ew jî însan in. Ji sedem van her du tiştan li vir du huner hene. Yek jê mesder di dewsa îsmê mef’ul de hatiye bikaranîn. A duyem jî mecaza mursel e. Lewra umum hatiye gotin. Lêbelê xusus hatiye zikirkirin.

2. Dibe ku ji bo bêjeya “berî” sê wateyên cuda hebin

Wateya wê ya yekem berê ye. Wateya wê mirovên kevin in, qedîm in. Li vir mebest ji wan Pêxember in. A duyem jî “kesên bê guneh, masum, bê suc in.” Li gorî van her du îzahên xelqê berî dibe kînaye ji Pêxemberan.

A sêyem jî wateya wê mirovên di zemanê berê de jiyane ew in. Li gorî vê şîroveya hanê li vir îdafeya zerfîyê heye.

3. Di vê malikê wateya nîvê yekem ne kifş e. Lêbelê di nîvê duyem de wate ji me re hatiye îzahkirin. Di ilmê belâxetê ji hevokên wisa re dibêjin îzah be' de'l-îbham. Ku ew jî cureyekî îtnabê ye.

4. Bêjeya "heşr"ê bi wateya mehşerê hatiye bikaranîn. Li gorî vê nêrînê di vir de mecaza mursel heye. Lewra bûyer an jî mesder hatiye zikirkirin. Lê mebest jê mekan e.

5. Di nîvê dawîyê de îtnab heye. Ji ber ku bêjeya "enwerî"yê nehatiba jî wate تمام e. Li vir jî îtnab hatiye îcrakirin. Jixwe Pêxember bêjeya ronahiya me'newî bi awayek lazimî di hundirê xwe de digrin. Îtnab li vir îxal e. Ev îxal ji sedem weznê ye an jî ji sedem tekîda wateyê ye.

6. Di hinek nusxeyan de li dewsa "tête" de "dê te" û di hinekan de jî "dê di" hatiye. Di devoka Behdînan de di dewsa "tê" "dê" tê.

Her çi bînit, hindî tiştê xwarinê

Dê mubarek bit li ber vê xwendinê

"Herkesê ku were mewlûdû û tiştên xwarina bîne. Ew xwarin li ber xwendina mewlûdê an jî mewlûd li ser çi xwarinê bê xwendin ewê ji sedem xwendina mewlûdê bi bereket û bi xêr bibe."

1. Di te'bîra "her çî"yê de li gorî qenaeta me, mecaza mursel heye. Ev jî li gorî hinek şîroveyan e. Lewra wateya vê te'bîrê "her tişt" e. Lê di vir de wateya wê jî "her kese" ye. Li gorî vê şîroveya hanê, umum hatiye zikirkirin. Lêbelê xusus hatiye qesdkirin.

2. Îhtîmal heye ku te'bîra "herçî" bi wateya "her tişt" be. Li gorî vê şîroveyê hindî tişt jê re dibe wek bedelê an jî îzah. Ji ber vê îzaha hanê pêwîst e ku kirde ketibe. Li gorî vê şîroveyê li vir îcaz heye.

3. Di "tiştê xwarin"ê de mecaza mursel an jî îktîfa heye. Lewra çiqas ev te'bîr hatiye jî dibe ku mebsset jê "tiştê vexarinê"

jî be. Wê gavê li vir îktîfa heye. Dibe ku “tiştê vexwarinê” hatiye hezifkirin jî li gorî vê şîroveyê îcaz heye.

4. Di vê malikê de li gorî şîroveyê texlîb an jî îktîfa heye. Lewra heke bê gotin di vir de vexwarin di bin xwarinê de ye, wê gavê texlîb heye. Lêbelê bê gotin ku di vir de ji sedem xwarin hatiye zikirkirin bi lêkera “xwarin”ê hatiye zikirkirin û “vexwarin” jî hatiye qesdkirin. We gavê îktîfa heye.

5. Dibe ku bêjeya “xwarin”ê di vir de bi wateya xwarinê û vexwarinê tev be. Li gorî vê şîroveya hanê, peyva xwarinê wateya mecazî îfade dike. Lewra vexwarin ji wê re wateyek heqîqî nîne. Lêbelê dibe ku ji bo bihêzkirina maneyê be. Wê gavê peyva xwarinê bi wateya xwe ye. Yanê ji bo hedes an jî ji bo bûyerê hatiye bikaranîn wê gavê wateya wê jî heqîqî ye.

6. “Ber” di vir de di wateya xwe ya Kurdî de ye û ev wate meşhur e. Ku ew wate “li cem, hindê, li bal” e. Di mewlûdê bi piranî ev bêje ji bo vê wateyê nehatiye bikaranîn. Ji sedem vê xalê di vir de hatina vê bêjeyê bi wateya xwe ya heqîqî balkêş e.

7. Ji bêjeya “hindî”yê wateya teqlîl û hindikbûnê jî tê famkirin. Ji sedem vê noqteyê tê famkirin tiştên li ber mewlûdê çiqas hindik bin jî dîsa bereket dikevê wan.

Bête xwendin ger li avê ê vexwit

Rehmê nazil cûmleyê 'îlet dibit

“Mewlûd li ser avê bê xwendin û kî ji wê avê vexwe, ji sedem wê ewê ji nexweşînên xwe hemûyan xelas bibe.”

1. Di vir de îcaz heye. Lewra ji bo temambûna wateyê di vir de pêwîst e ku bêjeya “mewlûdê û ê ji avê” bê teqdîrkirin.

2. Di bêjeya “dibit”ê de îstîareya tebeîyye û tesrîhîyye heye. Lewra lêkera “dibit”ê di dewsa lêkera “xelas dike” an jî “dûr dike”yê de hatiye bikaranîn.

3. Di bêjeya “illet”ê de tewcîh heye. Lewra ev bêje dibe ku ji bo nexweşîn û tiştên nêram hatibe bikaranîn.

4. Li gorî vê malikê xwendina mewlûdê dibe sebeb ji bo rehmê. Ew jî dibe sebeb ji bo rabûna nexweşîyan.

5. Di her duyan de jî sebebîyet çêdibe. Ji vî tiştî re jî tê gotin mecaza mursel.

6. Bi bejeya “cumleyê” wate hatiye tekîdkirin.

7. Bi bêjeya “illet”ê îcaza qiser hatiye îcrakirin. Lewra li vir “illet” maddî jî û manewî jî dibe.

8. Di nîvê duyem de mecaza mursel heye. Lewra nazilbûna rehmê ji bo rabûna ‘illetan sebeb e. Ew bixwe wan ranake.

Bête xwendin ger li yek sikkedirav

Dê mubarek bin derahîm bibne zav

“Heke mewlûd li ser dirhemekî ku şekil jê re hatiye dayîn bê xwendin û ew dirhem jî tevî dirheme din bibe, ewê dirhemên din ji sedem wê pir bibin û bi bereket bibin. An jî mewlûd li ser pereyê bê xwendin û ew pere tevî pereyê din bibe ewê perê din jî bi bereket bibin.”

1. Bêjeya “sikke” mesder e, lêbelê wateya wê wateya îsmê mef’ul e.

2. Di vir de îcaz heye. Lewra mebest jî “li yek”ê “li ser yek” e.

3. Di “bête xwendin”ê de îcaz heye. Lewra di vê hevokê de bireser (mefulû bîh) ketîye. Ew jî bêjeya mewlûdê ye. Ev tişt jî hevokê tê famkirin.

4. Bêjeya “dirav” wateya wê dirhem e. Lêbelê di vir de mebest jê pere ye. Li gorî vê şîroveya hanê em dikarin bibêjin ku di vir de, cuz hatiye zikirkirin. Lêbelê umum hatiye qesdkirin.

5. Di hinek nusxeyan de bêjeya li dawîya vê malikê “naf” e. Di hinekan de jî “zaf” e. Gava ku “naf” be, wateya wê “tevlîhev bûne” ye. Lêbelê gava bi wateya zaf be, wateya wê “pîrbûn” e.

Her cihê lê bête xwendin rehme lê

Dê melek bèn û tijî wê menzelê

“Her cihê ku mewlûd li tê xwendin ew xwendin rehmet e ji wî cihê re û ewê melek werin wî cihê û ewê vir tije melek bibin.”

1. Ji ber ku sebeb hatiye qesdkirin û musebbeb hatiye gotin. Di “rehm”ê de mecaza mursel heye. Di vir de dibe ku mewlûd an jî xwendina mewlûdê sebeb be.

2. Di bêjeya “rehme”ê de îhtîmala tewcîhê jî heye. Lewra nâibu’l-failê lêkera “xwendin”ê be wateya “rehme”yê mewlûd e. Li gorî vê şîroveya hanê “lê” wateyê bihêz dike. Rehme nâibu’l-fail ne be, wê gavê wateya wê “rehmet li wî cihê” ye.

3. Rehmet bi wateya xwe ya heqîqî be, di vir de îhtîmala îcazê jî heye. Lewra li gorî vê şîroveyê bêjeya mewlûdê ku bireser (mefulu bîh) e. Nehatiye gotin.

4. Gava em nivê yekem wek du hevokan binirxînin. fesill derdikeve holê. Lewra li gorî vê şîroveyê mewlûd tê xwendin û rehmet tê meydane.

5. Di bêjeya “tijî”yê de mecaza aqlî heye. Lewra bêjeya bireser nav (îsmê meful) hatiye bikaranîn ji bo kirdeyê. Ji sedem vê taybetîya hanê di vir de mecaza aqlî heye. Halê vê hevokê bi awayekî heqîqî bi gotin “tijî dikin” e. Lewra melaîket nayên tijîkirin. Belkî melaîket cihan tije dikin.

6. Mebest ji “menzel”ê mekan be, mecaza mursel heye. Ji sedem ku cuz hatiye bikaranîn û kull jî hatiye qesdkirin. Lewra di kurdî de menzel bi wateya çavîkî an jî beşekî ji xanî hatiye bikaranîn.

7. Gihaneka “lê” hatiye tekrarkirin. Dibe ku bi wateya “ser” û “tê de” her duyan jî were. Li gorî vê şîroveya hanê tewcîh heye.

8. Di hinek nusxeyan de di dewsa “bên”ê de hinek lêkerên din hatine bikaranîn. Wekî niha “bibin”. Li gorî vê lêkerê wate û

hunerên cuda derdikevin holê. Lêkera “bên”ê bi tenê were wê gavê îcaz heye. Lewra “û, bikin” hatiye hezifkirin.

Xanîyê lê bête xwendin ev sela

Dê bibîte ba’isê def’a bela

“Xanîyê ku ev mewlûda hanê lê bê xwendin, ew xwendin jê re bibe sebebê dûrxistina ji belayan.”

1. Di bêtîyê “xanî”yê de mecaza mursel heye. Lewra xusus hatiye zikirkirin, lêbelê mebest jê umum e. Lewra tiştê jê tê behskirin ne mehdûdê bi xanî ve ye. Belkî li her derê ye.

2. Di bêtîyê “sela”yê de jî mecaza mursel heye. Lewra cuz hatiye zikirkirin. Lêbelê mebest jê mewlûd hemû ye.

3. Di “ev”ê de te’yîn û te’zîm” heye. Lewra “ev” nehatiba jî wateya hevokê temam bû.

4. Di “sela”yê û di “bela”yê de cînasa naqis heye. Lewra wateya wan cuda ye. Lêbelê bêyî herfekî dengê wan wek hev e.

5. Di bêtîyê “sela”yê de dibe ku tewrîye an jî tewcîh hebe. Lewra mebest jî vê peyvê dibe ku wateyên nêzîk hev bin. Tewcîh heye. Gazîkirin, rehmet û selawat li ser Hz Pêxember, xwendin, dia û xwendina mewlûdê hemû wateyên wê ne. Gava li vir mebest jê wateya dur be, em dikarin bibêjin li vir tewrîye heye.

6. Dibe ku du wateyên gihaneka “lê”yê hebin. Yek jê “li ser”; a din jî “tê de” ye. Wê gavê li vir tewcîh heye.

7. Gava ku “sela” li vir bi wateya mewlûdê be îstîfzare heye. Lewra xwendina mewlûdê hatiye şibandin bi xwendina selayê. Gava ku sela bi wateya rehmetê be mecaza mursel heye. Ji ber ku li gorî wê sela sebeb e; rehmet jî musebbeb e.

8. Di “ba’isê def’a bela”yê de mecaza aqlî heye. Lewra di vir de lêker hatiye îsnadkirin bi bal sebebê ve.

Bo xudanê zadî û bo hemnişîn

Her selatan dê bidin kerrûbiyîn

“Gava mewlûd bê xwendin jî bo xwedîyê xwarinê û ji bo wan kesên ku beşdarî civîna mewlûdê dibin, melaîketên ku nêzîkî Xwedê ne ew ji wan re dia dikin û ji bo wan beşandinê ji Xwedê dixwazin.”

1. Bêjeya “bo” hatiye tekrarkirin. Ji sedem vê taybetîyê li vir îtnab heye.
2. Di “kerrûbiyîn”ê de îhtîmala mecaza mursel heye. Lewra mebest ji “kerrûbiyîn”ê melaîket hemû bin, xas hatiye zikirkirin ‘umûm hatiye qesdkirin.
3. Di “hemnişîn”ê de mecaza mursel heye, lewra zikra rûniştî hatiye kirin. Lêbelê mebest jê beşdarê mewlûdê hemû ne. Ên rûniştî û yên nerûniştî hemû hatine qesdkirin.
4. Bi bêjeya “her”ê wateya hevokê hatiye tekîdkirin û îtnab heye.

Dafi’ê cumle hesûdê çavxerab

Der mezarî sehl e lê redda cewab

“Xwendina mewlûdê bela û musîbetên ji hesûdan tên ji mirovan dûrdixe. Di gorê de jî bersîva munker û nekîr asan dike.”

1. Di te’bîra “redda cewab” de tîbaq heye. Lewra her du bêje ji hev re dijmane nin.
2. Di te’bîra “redda cewab” de telmîh jî bi bal pirsên munker û nekîr ve heye.
3. Di bêjeya “redd”ê de dibe ku cewab dayîn hatibe şibandin bi reddê. Li gorî vê şîrovevê li vir îstîfareya tebeîyye û tesrîhîyye heye. An jî îstîfare tune ye û wateya wê jî “zivrandina pirsên munker û nekîr” e.

4. Di “dafî’ê cumle hesûdê”yê de îcaza hezfê heye. Lewra mebest jê, defa mirovê hesûd nîne. Belkî mebest jê, “defa xerabîya mirovê hesûd” e.

5. Di bêjeya “dafî”ê de mecaza mursel heye. Lewra xwendina mewlûdê bi xwe belayê def’ nake. Belkî dibe sebebê defa belayê.

6. Di “çavxerab”ê de dibe ku mecaza mursel hebe. Lewra mebest jê mirovê neqenc e.

7. “Çavxerab” dibe ku tekîd be ji bo hesûd. Wê gavê li vir îtnab derdikeve holê.

8. Di te’bîra “çavxerab”ê de dibe ku kînaye jî hebe, lewra li gorî vê şîroveya hanê, mimkun e du wate bi hev re bînen qesdkirin. A yekem ku tiştan baş nebîne. Ji vî alî de cudatî di navber tiştên maddî û me’newî de tune ye. A duyem jî mirovê nebaş e.

9. Di te’bîra “dafê cumle hesûd”ê de îcaz heye. Lewra mebest jê “dafê xerabîya cumle hesûdan” e.

10. Di “hesûdê çavxerab”ê de îtnab heye. Lewra hesûd jixwe çavxerab e.

11. Di hevoka “der mezarê sehl e lê redda cewab”ê de, îcaz heye. Lewra ji bo temambûna wateyê pêwîst e ku te’bîra “ji sedem xwendina mewlûdê”ê bê teqdîrkirin.

12. Dibe ku yek ji “redd” û “cewab”ê zaîd be. Mebest ji red û cewabê heman tişt e.

13. Di hinek nusxeyan de di navbera bêjeyên “hesûd” û “çavxerab”ê de gihanek hatiye bikaranîn. Li gorî van nusxeyan; di nusxeyên din de îcaz heye. Bi bikaranîna gihanekê jî etfa hevmaneyan derdikeve holê.

Pir kesan dîtî keramat û eser

Ji xwendina Mewlûda Sultanê beşer

“Gellek mirovan ji xwendina mewlûda mezinê beşerîyetê xêr û qencîti û başîyên ku ne di destê însanan de ne, dîtî.”

1. Di te’bîra “Sultanê Beşer”ê de kîneye heye. Lewra mebest ji “Sultanê Beşer”ê Hz. Pêxember (s.x.l.) e.

2. Lê eger em bêjin Pêxember (s.x.l.) hatiye şibandin bi mezin û sultanên mirovan. Wê demê îstîareya tesrîhîyye heye. Lewra muşebbeh ku Hz. Pêxember e hatiye hezifkirin, di dewsa wî de muşebbehun bîh hatiye zikirkirin.

3. Di bêjeya “sultan”ê de dibe ku em bêjin muşakele heye. Lewra ev bêje bi wateya xwe ya rasteqîn ji bo pêxemberan durist nîne.

4. Di bêjeya “mewlûd”ê de mecaza mursel heye. Lewra sebeb hatiye gotin. Lêbelê netîce hatiye qesdkirin. Di vir de mebest jê tiştên di derbarê wîladetê de ne.

5. Di “keramat” û “eser”ê de îtnab heye. Ji sedem zikirkirina wan yekî bi tenê jî kafî dibe.

6. Dibe ku mebest ji “eser”ê tiştên maddî û ji “keramat”ê jî tiştên ku nakevin hudûdê qeweta însan be. Li gorî vê şîrovevê li vir îhamu’t-tîbaq heye.

7. Di hinek nusxeyan de di dewsa bêjeya “sultan”ê de raveka “xeyru’l-beşer”ê hatiye bikaranîn. Li gorî van nusxeyan telmîh an jî îqtîbas heye. Di beşa yekemê de ev te’bîr derbas bû û hate îzahkirin.

Her wekî hatine gotin bê hîsab**Lê neşêm bêjim ji tetwîla Kîtab**

“Çawa ku derbarê mewlûda Hz. Pêxember de pir caran keramat û eser hatine rîwayet kirin. Lêbelê ji sedem dirêjbûna vê pirtûkê nikanim wan rîwayetan bêjim.”

1. Bi te’bîra “her wekî”yê malîka derbas bû an jî malika berîya vê malîkê hatiye şibandin bi te’bîra “hatiye gotin bê hîsab”ê. Ev jî teşbîh e.

2. Di “bê hîsab”ê de mubalexe heye. Lewra çiqas di vir de te’bîra bê hîsabê hebe jî ne bê hîsab e. Sebebê gotina “bê hîsab” mubalexe ye.

3. Di peyva “kîtab”ê de tewcîh heye. Lewra ev peyv di erebî de hem bi mesderî tê hem jî bi wateya îsmê mef’ûlê tê. Ew jî “tiştên hatiye nivîsandin” e ku li vir pirtûk an jî rîsale ye.

4. Di “lê neşêm”ê de îhtîmal tedmînê heye. Lewra di vê hevokê de hatina “neşêm”ê bi wateya nikanim xweş nayê dîtin. Lêbelê bi wateya naxwazim ji bo neşêm di vir de baştir e.³⁷

5. Di “lê neşêm bêjim” de îcaz jî heye. Lewra di vir de bireser (mefulu bîh) nehatiye gotin ku ew jî “wan rîwayetan” e.

6. Di “bêjim ji tetwîla kîtab”ê de îhtîmala tewcîhê heye. Lewra wateya “ji”yê dibe ku sebeb be û dibe ku wateya “îbtîda” be. Li gorî vê şîroveyê wateya wê “ez nikanim, naxwazim behsa dirêjkirina kitabê bikim” e. Yanê behsa tiştên hûrik e. An jî “ji ber tetwîlê ez nikanim an jî naxwazim” e.

7. Di gihaneka “lê” de îstîdrak heye. Lewra gava dibêje rîwayet bêhîsab in, mixateb zen dike ku ewê behsa wan bike. Helbestvan jî ber def’a vê zennê gotiye “lê neşêm”.

³⁷ Li vir mebesta me ji tedmînê tedmînê: (التضمنين): bikarnina lefzê ji bo wateya ne aîdê wê ye. (et-Tehanevî, Keşşafu Istîlahatî'l-funûn, I, 496).

8. Di hinek nusxeyan de di şuna lêkera "hatine" yê de lêkera "hatiye" yê derbas dibe.

Qedrê Mewlûdê nizanim bêjim ez

Lêk hişyar bin, da nebîte cergebez

"Ez dibêjim ku em qedrê mewlûdê nizanin. Lêbelê tevî wê halî jî di civînên mewlûdan de hişyar bin da jin û mêr bira tevî hev nebin."

1. Di "qedrê mewlûd"ê de îcaza qîser heye. Lewra ji vê te'bîrê xwendina mewlûdê, îcrakirina merasîma mewlûdê, zeman û roja mewlûdê hemû dibe ku bê famkirin.

2. Di peyva "mewlûd"ê de tewcîh heye. Lewra ev peyv bi wateya wîladetê û zeman û mekanê wê, xwendin û merasim û metinê mewlûdê tev hatiye bikaranîn. Ji sedem vê xalê, di vir de tewcîh heye.

3. Di "nizanim"ê de îltîfat heye. Lewra li gorî sîyaq û sîbaqê pêwîst e di vir de te'bîra "hûn nizanin"ê bihata. Lêbelê ji bo hişyar kirin û tewazûyê di dewsa "nizanîn"ê de "nizanim" hatiye.

4. Di "bejim ez"ê de tekîd heye. Lewra di lêkera "bejim"ê de jixwe wateya "ez"ê heye.

5. Bêjeya "cergebez"ê di eslê xwe de ji du bêjeyan pêk hatiye. Yek jê cerg e ku di Kurdî de jê re tê gotin kezeb. A di jî bez e ku rûn e yanê rûnê sipî ye di laşên heywan û însanan de heye. Dû re ev bêje ji bo tevlihevbûna jin û mêran hatiye bikaranîn. Di vir de îstîfereya temsîlîyye heye. Lewra çawa rûngirtina kezebê dibe sebebê zerareke mezin ji bo bedena mirovan bi wê awayî tevlihevbûna jin û mêran jî dibe sebeb ji bo gellek xerabîyan. Halê xerabûna tevlihevbûna jin û mêran hatiye şibandin bi halê wê kezeba ku bez digre.

6. Bi gihaneka “lêk”ê îstîdrak û îxtîsar hatiye îcrakirin. Lewra bi vê bêjeyê hevok hatiye kurtkirin û tiştên tên zihnê mirovan hatine defkirin.

7. Li gorî qenaeta me dibe ku “nebîte” “nebête” jî bê xwendin, wê gavê wateya wê “neyê holê” ye. Di hinek pirtûkên belaxetê de jî tiştên bi vî awayî re teshîf tê gotin.

Mijara Çarem: Afirandina Nûra Cenabê Pêxember

Girtî yek qebze ji nûra xwe Xuda,

Gote wê: “Kûnî Hebîbî Ehmeda”

“Xweda gava xwest ku Hz. Pêxember bîne wucûdê qebdek ji nûra xwe girt û got ey nûr tu bibe hebîbê min Ehmed.”

1. Di lêkera “girtî”yê de îstîare heye. Lewra girtina jî bo mirovan û ya Xwedê cuda ye. Ji ber vê taybetîyê dibe ku em bibêjin li vir îstîare heye.

2. Di peyva “qebze”yê de jî îstîare heye. Lewra tişteki razber hatiye şibandin bi tişteki şênber. Yanê di vir de nûra Pêxember (s.x.l.) hatiye şibandin bi wan tiştên mirov bi destê xwe digirin.

3. Di “gote wê”yê de îcaz heye. Lewra mebest jî vê hevokê “ji wê re gote”yê ye.

4. Di peyva “kûnî”yê de telmîh bi bal ayeta jêrê ve heye. Lewra Xweda gava tişteki bixwaze çêbe jî re dibêje çêbibe ew jî çêdibe.

إِنَّمَا أَمْرُهُ إِذَا أَرَادَ شَيْئًا أَنْ يَقُولَ لَهُ كُنْ فَيَكُونُ

“Gava Xweda tişteki bixwaze bi tenê jî re dibêje bibe, ew tişt jî dibe.”
(Yasîn, 82).

5. Di “hebîbî Ehmeda”yê de hazirkirin û bicîkirina wateyê heye. Lewra ewilî bêjeya hebîbê hatiye gotin. Di dû re Ehmed hatiye zikirkin.

6. Bi îdafekirina “hebîb”ê bi bal “ya ya mutekelimê” ve ku mirad ji “hebîb”ê jî Hz Pêxember e rûmeta mudafê hatiye zêdekirin.

7. Berîya te’bîra “gote wê”yê de îcaz heye. Lewra gihaneka “û”yê ketiye. Vê gihanekê her du lêker biheve girêdane.

8. Ji ber qafîya helbestê li vir bêjeya Xuda di dawiya malikê de hatiye.

Hêj ne ‘erş û ferş û kursî û qelem

Hêj ne lewh û enbiyayê muhteşem

“Gava Xwedê xwest Pêxember biafirîne erş, ferş, kursî, qelem, lewh û pêxemberên qedrbilind tune bûn.”

Di hinek nusxeyan de ev malik berîya malika jorê hatiye.

1. Di vê malikê de îtnab heye. Lewra te’bîra “hêj ne”yê hatiye tekrarkirin.

2. Di her du risteyên vê malikê de jî îcaza hezfê heye. Lewra “hêj ne” hatiye. Lêbelê lêker ku ew jî “mewcûd bû” ye hatiye hezifkirin.

3. Di vê malikê de ji sedem pêveber hatiye hezifkirin îcaz heye. Ku ew jî lêkera “hebûn”ê ye.

4. Di navbera bêjeyên “erş” û “ferş”ê de cînasa naqis heye.

5. Di vir de îcaza qiser jî heye. Lewra piştî van tiştên hatine zikirkirin, tê famkirin ku bê Xwedayê teala hê tu tişteke tune bûye û berîya her tiştî jî Xwedê Resûlê xwe anîye wucudê. Ji vê xalê jî tê famkirin ku Hz. Pêxember ji tiştan hemûyan bi rûmet û bi qîmetir e.

6. Di vê malikê de mura’etu’n-nezîr heye. Lewra tiştên hatine gotin, nêzîkî hev in.

7. Mebest ji bêjeya muhteşem ku hevalnav e tekîda pesnên mewsûfê û îtnaba gotinê ye. Lewra jixwe Nebî qedrbilind in. Bêyî vê bêjeyê jî ev wateya hanê tê famkirin.

8. Li vir î'îlafu'l-lefz û me'na heye. Lewra tenasuba wateyê û dengên çêbûye.

Saleha tesbîhi kir nûra şigerf

Şeş mîet elf û çîhar û bîst û elf

“Vê nûra xweşik şesed û bîst û çar hezar sal tesbîh ji bo Xwedê kir.”

1. Di bêjeya “şigerf”ê de tewcîh heye. Lewra ev bêje bi wateya xweşik, ecîb, temîz û saf e. Di vir de ev çar wate jî mimkun in.

2. Di bêjeya “tesbîh”ê de dibe ku mecaza mursel hebe. Lewra li gorî vê şîroveya hanê cuz hatiye gotin. Lêbelê mebest jê kull e ku ew jî îbadet e.

3. Bêjeya “şigerf”ê ji bo nûrê sifet e. Mebest ji bikaranîna wê xweşkirina wateya “nûrê” ye. Lewra bêyî vê bêjeyê jî ji nûrê wateya xweşkîrinê tê famkirin.

4. Di vir de îtnab heye. Lewra di nivê yekem de bêjeya “saleha”yê çiqas pirjimar be jî ne kifş e. Di ya dudiyan de îzaha wê bi hejmara “Şeş mîet elf û çîhar û bîst û elf”ê hatiye kirin. Ji vî halî re tê gotin îzah be'de'l-îbham. Lewra îzah piştî tiştên ne kifş bin tê.

5. Bêjeya “elf”ê hatiye tekrarkirin. Dibe ku ev tekrar ji bo weznê be.

6. Nivê duyem ji aliyê teşeyê ve ne fesîh e. Lewra mebest jê şesed û bîst û çar hezar e. Lêbelê bi awayekî wisa hatiye ku wate zor tê famkirin.

7. Di nivê duyem de mezca zimanan hatiye kirin. Lewra bêjeyên hejmarên bi kurdî û bi erebî bi hev re hatine gotin.

Paşê bo wê çêkirin diwanzdeh hîcab

Her yekê xweştir ji ya dî der hîsab

“Li dû van tesbîhan Xwedê ji bo xatirê wê nûrê diwanzdeh perde bi awayekî ku her yekê ji ya din xweştir bû çêkirin.”

1. Di vir de îcaz heye. Lewra mudafun îleyhê bêjeya “paşê” yê nehatiye gotin.
2. Di navbera bêjeyên “hîcab” û “hîsab”ê de cînasa naqis heye. Lewra bêyî herfeke yên din hemû dengên wan eynî nin.
3. Di nîvê paşî de jî îcaz heye. Lewra di dû bêjeya “xweştir”ê de lêkera “bû” yê hatiye hezifkirin.
4. Di “bê hîsab”ê de mubalexe heye. Lewra ev ne tiştêkî bê hudûd e.
5. Di hinek nusxeyan de di dewsa lêkera “çêkirî” yê de “çêkirin” hatiye nivîsandin.
6. Di hinek nusxeyan de di dewsa “bê hîsab”ê de “der hîsab” hatiye. Gava bêjeya “der”ê bi wateya “hundir” be, wate pir xweş nabe. Lê gava bi wateya “li der ve” be, wate xweş dibe. Lê ev ne kifş e ji ber vî tiştî herî baş ew e ku “der” nebe “bê” be.

Qudret û te'zîm û minnet merhemet

Hem se'adet hem keramet menzilet

“Navê wan perdan qudret, te'zîm, minet, se'adet, keramet û menzîlet e.”

1. Ev bêjeyan dibe ku telmîh bin ji bo wesfên Pêxember û wesfên umeta wî.
2. Di navbera bêjeyên “qudret” û “merhemet”ê de îhamu't-tîbaq heye. Lewra wateya wan ne zidê hev bin jî, carinan zidiyetê tînin hişê merivan.

3. Di vê malikê de bêje ji alîyê deng û wateyê nêzîkî hev in. Ji sedem vê taybetiyê di vir de hunera îtilafu'l-lefz ve'l-me'na heye.

4. Bêjeya "hem"ê hatiye tekrarkirin. Ji ber tekrarê îtnab li vir heye.

Hem hîdayet hem nubûwwet rif'et e

Ta'et e yazdeh şefa'et temmet e

"Navê wan perdan hîdayet, nubuwwet, rifeet, taet û şefa'at e."

1. Di vê beytê de jî î'tîlafu'l-lefz û me'na heye. Lewra bêjeyên hatine gotin ji alîyê wateyên xwe û lefzên xwe li hev tînin.

2. Bi bêjeyên yazdeh û temmet hunera îtnabê hatiye îcrakirin. Lewra ew ne hatan bikaranîn jî wate temambû. Lêbelê ji bo weznê hatine bikaranîn.

3. Ev bêjeyan dibe wek bêjeyên ku berê derbas bûn telmîha bi bal wesfên Pêxember û umeta wî be.

4. Di vê malikê de "hem" hatiye tekrarkirin.

5. Dîsa di vê malikê de jî wekî malika jorîn î'tîlafu'l-lefz heye. Lewra dengên wan li hev hatine.

Her yekê westabû tê da çendi sal

Lê 'eded me spare 'ilmê layezal

"Ev nûr di her yekê de çend sal sekînî û di wan de tesbîh ji bo Xwedê kir, Lêbelê em nizanin di her yekê de nûr çend sal ma û me zanebûna miqdarê zemanê ku nûr tê de maye sipart ilmê Xwedê."

1. Te'bîra "ilmê la yezal"ê ji ilme Xwedê kînaye ye. Lewra ilmê layezal sifet e, te'bîra ilmê Xwedê jî nav e. Li gorî vê şîroveyê layezal ji bo Xwedê sifet e.

2. Îhtîmala ku te'bîra "layezal"ê ji bo îlmê Xwedê sifet be jî heye. Li gorî vê şîroveyê dîsa kînaye heye. Lê kînaye ji bo daîmbûna îlmê ye. Mirad jê "îlmê daîmî" ye.

3. Dibe ku di bêjeya "westa"yê de îstîfare an jî mecaza mursel hebe. Lewra ihtîmal heye ku mirad ji bêjeya "westa"yê zikirkirin be. Li gorî vê şîroveyê sebeb hatiye gotin û netîce hatiye qesdkirin.

4. Di vê malikê de ji sedem ketina kirde û daçeka "da"yê îcaz heye. Lewra wateya malikê "nûr di her yekê da çend sal disekînî" ye.

5. Di "lê eded"ê de îcaz heye. Mebest ji vê te'bîra "lê ededê salên ku nûr tê de sekînî ye" ye.

6. Di "me sipare"yê de jî îcaz heye. Lewra mebest jê "zanebûna salên ku nûr tê de tesbîh kiriye" ye ku di malikê de bhesa wan tê behskirin.

7. Bi gihaneka "lê"yê îstîdrak hatiye îcrakirin. Lewra ji nivê yekem "derbarê nûr çiqas zeman sekînî ye di wan perda de tişteki kifş e" tê aqilê merivan. Lêbelê di nivê duyem de bi gihaneka "lê"yê vê wateya hanê ji aqilê merivan derdikeve.

8. Di vir de "me sipare" wek biwêjê ye. Lwera mebest jê "em nizanîn, em pey wî nakevin" e.

9. Di "me spare"yê de dibe ku îstîfare jî hebe. Lewra li gorî vê şîroveyê terkirin hatiye şibandin bi sipartinê.

Her yekê tesbîheke xas û cuda

Daîma tesbîhi xwendin bo Xuda

"Her yekê Xwedê bi zikrên taybet û cuda her gav ji tiştên xerab tenzih kirin."

1. Di navbera bêjayên "Xuda" û "cuda"yê de cînasa naqis heye.

2. Bi tekrara bêjeya “tesbîh”ê îtnab hatiye îcrakirin. Çiqas jî li vîr heman bêje hatibe dubarekirin jî ji alîyê wateyê cudatî heye. Lewra di ya yekem de bal hatiye kişandin lê alî cureyê tesbîhê. Lêbelê di ya duyem de mebest ji tesbîhê, cinsê tesbîhê ye.

3. Di vê malikê de îcaz heye. Lewra “nûr”, “pêveber” û te’bîra “ji bo”yê hezif bûye. Yanî “Nûrê ji bo her perdeye tesbîhê xas û cuda kir”

4. Ji bo bihêzkirina wateyê bi bêjeya “daîma”yê îtnab hatiye îcrakirin.

5. Di vê malikê de dibe ku perde kirde be. Li gorî vê şîroveya hanê mecaza mursel heye. Lewra mehel hatiye zikirkirin. Lê mebest jê hal e ku ew jî nûr e.

6. Di vê malika hanê de nîvê duyem ji bo nîvê yekem wek tekrarê ye. Lewra wateya wan yek e. Di belaxeta erebî de ji bo tiştên bi vî awayî tê gotin tezyîl.

7. Di bêjeyên “xas” û “cuda”yê de îtlaful-me’na heye. Yanê her du bêje jî wateya wan li hev tîn û nêzîkî hev in.

8. Di “xas” û “cuda”yê de îtnab jî heye. Lewra ji peyva “xas”ê cudatî jî tê famkirin. Ji bo tiştêkî xas be, pêwîst e ku cuda be jî.

9. Di hinek nusxeyan de di dewsa lêkera “xwendin”ê de “xwend”; di hinekan de jî “xwan bû” û di hinekan de jî “di xwendî bû” hatiye bikaranîn. Di hinek nusxeyan de jî di dewsa tesbîhekê de “tesbîhekî” hatiye.

Paşê avête çihar behrê mezin

Wî Xudayê layezal ê ins û cin

“Di dû re Xwedayê ebedî ku Xwedayê îns û cinan e vê nûra hanê avêt nav çar derya yê mezin.”

1. Di navbera îns û cin de tîbaq heye. Lewra her du zidê hev in.

2. Di Cînav nişana "Wî"yê de te'zîm heye. Lewra ji bo te'zîmê di dewsa "vî"yê de "wî" hatiye bikaranîn.
3. Di vir de îcaz heye. Lewra bireser (mefulû bih) hezif bûye. Ku ew jî nûr e.
4. Di vir de "layezal" ji beqayê kîneye ye.
5. Dîsa dibe ku bêjeya "behr"ê de îstîfereya tesrîhîyye û eslîyye hebe. Lewra çar tişt hatiye şibandin bi deryayê. Lêbelê muşebbeh nehatiye zikirkirin.
6. Ji ber wezna helbestê te'bîra "layezal"ê ketiye navbera mudaf û mudafun îleyhê. Eslê malikê wî Xudayê îns û cinan" e.
7. "Layezal" rengdêr e ji bo Xwedê hatiye bikaranîn. Lêbelê li gorî helbestvan ev rengdêr bi navdêr re bûye wek nav.
8. Di dû "layezal"ê de dibe ku îcaz jî hebe. Lewra li gorî vê şîroveya hanê gihaneka "û"yê û te'bîra "wî Xweda"yê nehatiye gotin. Wê gavê em dibêjin ku wateya wê "Wi Xwedayê layezal û wî xwedayê îns û cinan" e.
9. Di hinek nusxeyan de piştî te'bîra "layezal"ê de gihanek hatiye. Li gorî van nusxeyan layezal rêngdêr be baştir e.

Behrê nusret, sanî behrê merheme

Behrê qudret, behrê îrfan in heme

"Ev çar behr behrên qudretê, merhemetê, îrfanê û nusretê ne."

1. Bêjeya "behr"ê hatiye tekrarkirin. Ji ber tekrarê wate bihêztir bûye.
2. Dibe ku di "behrê nusret" û di yên din de îdafeya teşbîhîyye hebe. Li gorî vê şîroveyê wateya wan "nusreta wek deryayê, merhemeta wek deryayê, qudreta wek deryayê û îrfana wek deryayê" dibe.
3. Di navbera behran de gihaneka "û"yê hatiye hezifkirin. Li gorî vê taybetîya hanê li vir îcaz heye.

4. Di navbera bêjeyên “nusret, merhemet, qudret, îrfan”ê de lihev hatina wate û lefzan heye. Lewra wate nêzîkî hev in, bi wî awayî lefz jî nêzîkî hev in. Ji bêr vê taybetîyê li vir tenasub heye.

5. Bi bêjeya “sanî”yê îtnab hatiye bikaranîn. Lewra ev bêje tuneba jî. Tişteki kêm nedima.

6. Ji bo te’bîra “în heme”yê sê îhtîmal hene. A yekem ku mubteda be, a duyem xeber be û a sêyem ji bo her çar behran tekîd be.

7. “În heme” dibe ku îşaret bi bal nusret, îrfan û merhemetê be. Li gorî vê şîroveya hanê tekîd an jî xeber be baştir e. Îşaret bi bal te’bîra “cihar behrê” be mubteda be baştir e.

8. Di vê malikê de dibe ku lêkera alîkarîyê hezîfbûyî be. Li gorî vê şîroveya hanê îcaz heye û wateya wê jî “în heme ye” ye.

9. Di hinek nusxeyan de di şuna bêjeya “nusret”ê de “nezret” hatiye. Lêbelê bêjeya nusret be ji alîyê wateyê ve baştir e.

10. Di hinek nusxeyan de di dewsa “behr”ê de “behra” hatiye. Li gorî merhemet, qudret, nusretê hatina bêjeyan bi forma behrê xweştir e.

Çûn ji behra me'rîfet ew hate der

Qetre jê weryan bi îlham ev qeder

“Ev nûra hanê gava ji behra marîfetê derket, dilopê nûrê bi qeder hejmarê Pêxemberan jê rijîya û hatin xwarê.”

1. Di hinek nusxeyan de bêjeya “ew”ê hatiye tekrarkirin. Lêbelê ji bo “ew”ê du îhtîmal hene a yekem cînav e. A duyem jî navnîşan e.

2. Di vir de “qetre” navê cins e. Lêbelê mebest jê pirjimarî ye. Lewra ji wê nûrê gellek dilop hatine xwarê û her yekê bûye pêxemberek.

3. Bêjeya “jê” cînav e û ji “ji û wî”yê an jî “ji û wê”yê hatiye kurtkirin. Ji ber vê taybetîya hanê îcaza herfan di “jê” de heye.

4. Di te’bîra “bi îlham”ê de îcaz heye. Lewra ji bo wateyeke tekûz pêwîst e ku li vir te’bîra “bi îlhamê ji Xweda” bê teqdîrkirin.

5. Di hinek nusxeyan di dewsa “werya”yê de “weryan” hatiye bikaranîn. Li gorî qenaeta me hatina lêkerê bi forma weryanê baştir e. Lewra weryan lêkerê pirjimarî ye. Ew jî minasibtir e ji bo malika di dû re tê. Lewra di risteya dû re de hejmar pirjimarî ye.

6. Di vê malikê de di hinek nusxeyan de di dewsa bêjeya “ew” a duyem de ku hatiye tekrarkirin “ev” hatiye. Li gorî vê “ev” xweştir xwanê dike. Lewra “ew” a yekemîn ji bo tiştên derbas bûyî ye. Ew ji ber ku derbas bûne wek tiştên dût in. Ji bo tiştên dût jî bêjeya ew tê bikaranîn. “Ev” ji bo wan tiştên nêzîk û muşexxes in tê bikaranîn. Li gorî vê agahiya hanê ji bo ya duyem bêjeya ew baştir e.

Sed hezar û hem çihar û bîsti elf

Her yekê bû yek nebiyyê dilşigerf

“Ew hejmar sed û bîst û çar hezar dilop bû. Her dilopekî nûra Pêxemberekî mubarek bû.”

1. Di vê malikê de ji bo weznê an jî ji bo qafiyê bêjeyên “hezar” û “elf”ê hatiye bikaranîn. Du caran hejmara “hezar” hatiye. Yek jê bi kurdî ye û hezar e; a din jî bi erebî ye û elf e. Li vir tekîda hejmarê jî heye. Lewra wateya wan yek e.

2. Bêjeyên “bîst” û “çihar”ê cîyê wan hatiye guherandin. Ev jî qelba mekanî ye. Lewra ya rast “bîst” û “çihar” e.

3. Di vê malikê de îtnab jî hatiye îcrakirin. Ew dîsa ji bo weznê ye. Lewra ev hejmar bê îtnab “sed û bîst û çihar hezar” e.

4. Bêjeya “şigerf”ê bêjeyek camî’ e. Lewra “şigerf” ji bo wateyên cuda tê bikaranîn. Di vir de dibe ku ew wate hemû bê n qesdkirin.

5. Ji bo bêjeya “dil”ê em dikarin bibêjin tê de, mecaza mursel heye. Lewra cuz hatiye gotin. Lêbelê kull hatiye qesdkirin. Kull jî zatê pêxemberan e.

6. Di vê malikê de îtnab heye. Lewra gihaneka “û”yê û “hem”ê her du bi hev re hatine bikaranîn. Dibû ku “hem” nehata bikaranîn jî.

Paşê Wî çêkir ji nûra namiwer

Cewherek lê kir nezer ew bû du ker

“Dû re Xwedê teala ji vê nûra navdar cewherek çêkir û li wî cewherî mêze kir. Ji sedem mêzekirina Xwedê cewher bu du parçe.”

1. Di cînava “wî”yê de tewcîh heye. Lewra ev cînavk dibe ku ji bo “vî tiştê hat gotin” be û dibe ku ji bo Xwedayê Teala be. Li gorî şîroveya yekem wate “piştî wî tiştê hat gotin” e û merci’ê cînavka ku di lêkera “çêkir”ê de heye nehatiye zikirkin. Lêbelê ji siyaqê tê famkirin ku merci’ Xwedê ye. Gava “wî” ji bo Xweda be, “Wî” dibe mubteda û hevoka li dû wê hatiye dibe xeber.

2. Di vê malikê de îcaz jî heye. Lewra di vir de gihanek hatiye hezifkirin. Li gorî vê şîroveya hanê di navbera hevoka yekem û a “lê kir nezer”ê de gihanek nehatiye gotin. Lêbelê tê teqdîrkin.

3. Dibe ku gihanekê nehatibe teqdîrkin. Di navbera her du hevokan de, li gorî vê taybetîya hanê li vir fesil heye.

4. Di navbera lêkerên “çêkir” û “lê kir”ê de cînasa naqis heye. Lewra bêyî tîpekê tîpên din hemû wek hev in.

Nisfê ewwel dayê çavê heybetê

Nisfê sanî dayê çavê şefqetê

“Xweda bi çavê heşmetê, meznatiyê li nîvê yekem mêzekir; Li nîvê dudiyan jî bi çavê merhemet û şefqetê nêrî.”

1. Di navbera bêjeyên “şefqet” û “heybet”ê de tîbaq heye. Lewra wateya wan zidê hev e.

2. Bêjeyên “nisf”, “çav” û “dayê”yê hatiye tekrarkirin. Ev tekrar dibe ku ji bo wezna beytê be û dibe ku ji bo xurtkirina wateya beytê be.

3. Di bêjeya “dayê”yê de îstîareya tesrîhîyye û tebeîyye heye. Lewra bêjeya “dayê”yê di dewsa te’bîra “mêze kir”ê de hatiye bikaranîn.

4. Di “çavê şefqet”ê û di “çavê heybet”ê de îstîareya meknîyye û texyîlîyye heye. Lewra di vir de “heybet” û “şefqet” hatine şibandin bi însanan û di dewsa însanan de jî ev her du bêje hatiye bikaranîn. Lêbelê “çav” ku xassê bi insan ve ye hatiye zikirkirin. Ev jî ji re tê gotin îstîare meknîyye. Ji bo îdafekirina çav bi bal van her du bêjeyan jî îstîareya texyîlîyye tê gotin.

Nisfê ewwel bûye behr û her livî

Nê jê tirs û heybetê qet nanivî

“Nîvê yekem bû deryayek bi pêl û li ciyê xwe netebitî. Bêguman jî tirs û xewfa Xwedê tu carî tebatî neketê.”

1. Bi destpêkirina vê malikê tê famkirin ku helbestvan li vir hunera leff û neşra murettab îcra kiriye. Lewra di malika jorê de dibêje “nisfê ewwel” û “nisfê sanî” û di dû re jî wan bi tertîbê îzah dike.

2. Bêjeya “nisf”ê ji bo nisfa berê derbas bûye tekrar û tekîd e û dibe îtnab.

3. Bêjeyên “nê, her û qet” wateyê tekîd dikin. Bi wasita wan îtnab hatiye îcrakirin.

4. Bi bêjeyên “tirs” û “heybet”ê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra wateyên wan dewsa hev digirin.

5. Gava “nê” bi wateya bêguman be; em dikarin bibêjin di vê malikê de fesil heye. Lewra nivê duyem dibe weka cewabê ye ji bo pirsê ku ji nivê yekem tê famkirin. Ev jî ji hunera fesilê dikeve bin cureya sêyem.

6. Di “nê”yê de tewcîh heye. Lewra ev daçek bi wateya “bêguman” û “lewra” jî tê.

7. Di navbera “nanivî” û “her livî” de tîbaqa selbî heye. Lewra çiqas her du jî wateya wan wek hev be jî, bi “na”yê di wateyê de zidiyet derketiye holê.

Hem kelî ew behr û kef da û dûxan,

Kef bû erd û dûxan bû asîman

“Ew behr kelîya û kef û dûxanê derxist. Kef bû erd û dûxan jî bû asîman.”

1. “Hem” gihanek e ji bo gihanekê û ji bo tekîdê û wateya “dîsa jî” tê. Lêbelê di vir de dibe ku zâid be. Wê gavê ihtîmala mezin sebebê hatina wê wezn e. Yan jî sebebê hatina wê tekîd e.

2. Di nivê yekem de fesil heye. Lewra hevoka “kef da û dûxan” ji pirsê ku ji hevoka “hem kelî ew behr” tê famkirin hatiye gotin.

3. Di vê malikê de îtnab heye. Lewra bêjeyên “dûxan” û “kef”ê hatiye tekrarkirin.

4. Di navbera bêjeyên “erd” û “asîman”ê de tîbaq heye.

5. Di nivê yekem de îcaz heye. Lewra lêkera “da”yê bi dû bêjeya “dûxan”ê hatiye ku ew jî hatiye hezifkirin.

6. Di nivê duyem de leff û neşra muretteb heye. Lewra di nivê yekem de kef û dûxan tê. Di dû re jî her du bi dorê hatine diyarkirin.

Niveka dî çêkir jê çari çîz

'Erş û kursî û qelem lewhê temîz

"Xwedê ji nîvê duyem çar tişt çêkirin. Ew çar tişt 'erş û kursî û qelem û lewhê pak in."

1. Di "nivek"ê de tesxîr heye bi peyveke din biçûkkirin heye. Li vir tesxir dibe ji bo te'zîmê be an jî ji bo hezkirinê be.

2. Lêkera "çêkir"ê di hinek nusxeyan de bi pirjimarî hatiye û di hinek nusxeyan de jî yekjimar e. Heke pirjimar be lêker dibe ku ji bo Xwedê be û dibe ji bo çar tiştan be. Ji bo Xwedê be jî, mebest jê te'zîm e.

3. Bi nîvê duyem îtnab hatiye îcrakirin. Lewra nîvê duyem "çari çîz"ê îzah dike. Ev îzah be'de'l-îbham e. Ev jî cureyekî îtnabê ye.

4. Bi bêjeya "temîz"ê îtnab çêbûye. Lewra ev bêje nehata bikaranîn jî, wateya "pak û temîz"ê dihat famkirin. Lewra lewh jixwe temîz e. Îhtîmala mezin ew e ku temîz ji bo weznê hatiye bikaranîn. Em dikarin bibêjin di bêjeya temîzê de tewrîye jî heye. Li gorî vê şîroveyê mebest jê "halê ku di lewhê de tiştê nehatiye nivîsandin" e. Yanê halê ku emelê xerab ê mirovan e li lewhê derneketiye holê.

Hati emrê Padîşahê Layezel

Maliku'l-mulkê Celîlê Zulcelal

"Emrê padîşahê ku padîşahîtiya wî daîm e, mezin e û xwedîyê meznatîyê û mulk e hat."

1. Dibe ku di "hati emrê padîşah"ê de îstîfare hebe. Lewra mebest jê "Xweda ferman kire" ye.

2. Di vê malikê de însîcam di navbera bêjeyan de heye. Lewra wateya wan nêzîkî hev in û ji alîyê dengî ve jî li hev tên.

3. Bi bêjeya “padîşah”ê hunera muşakeleyê hatiye îcrakirin. Lewra peyva padîşahê ji bo Xwedê bêyî muşakeleyê hunerên din ne caîz e.

4. Di “malîku’l- mulk” û “celîl- zulcelal”ê de hunera îştîqaqê heye. Lewra bêjeyên ravekan jî ji heman rehê tên.

5. Di vê malikê de mura’etu’n-nezîr jî heye. Lewra bêjeyên wê îşaretî wateyên nêzîkî hev dikin.

6. “Mâlikul mulk” hatiye îqtîbaskirin ji ayeta jêrê. Lewra di ayetê de ev îdafe

مَالِكِ الْمَلِكِ

“(Ey) Xwediyê mulk” (Al-î Îmran, 26) derbas dibe. Di ayetekî din de jî

ذُو الْجَلَالِ وَالْإِكْرَامِ

“Xwediyê meznatîyê û comerdîyê” derbas dibe.

7. Di vê beytê de îcaza qiser heye. Lewra lefzên wê hindik in. Lêbelê wateya wê fire ye.

8. Di hinek nusxeyan de di navbera te’bîra celîl û zulcelalê de gihaneka ku ew jî “û” ye hatiye. Li gorî van nusxeyan, gava gihanek tune be îcaza hezfê heye.

“Ya qelem binvîse bi emrê Padîşah!”

“Ez çi binvîsim bi ferman ya Îlah?”

“Xwedê emrê qelemê kir got ku ey qelem bi emrê Xwedê binivîse. Qelem jî got ku “Ferman bike. Ez çi binivîsim Ey îlah!”

1. Di “ya qelem”ê de du îhtîmal hene. Yek jê ku qelem bi tiştên ku xîtab ji bo wan heye hatibe şibandin e. Ew jî melaîket, însan û cin in. Lêbelê muşebbehun bîh nehatiye gotin. Sebebê hebûna îstîfareyê li vir bikaranîna baneşana “ya”yê ji bo xîtabê ye ku ew jî xas bi muşebbehê ye. Li gorî vê şîroveyê li vir îstîfareya

meknîyye û texyîlîyye heye. Îhtîmala duyem jî ew e ku Xweda xîtaba ku bi qelemê re ye bi qelemê dabe famkîrin an jî qelem bi emrê Xwedê halekî were girtibe ku tiştê xwedê gotibe bîne cî û qelem jî anîbe cî. Çawa ayet dibêje ku

إِنَّمَا أَمْرُهُ إِذَا أَرَادَ شَيْئًا أَنْ يَقُولَ لَهُ كُنْ فَيَكُونُ

“Gava Xweda tişteki bixwaze bi tenê ji re dibêje bibe, ew tişt jî dibe.”
(Yasîn, 82).

2. Dîsa bi bêjeya padîşahê hunera muşakelê hatiye bikaranîn.

3. Di vir de te’bîra “bi ferman”ê dibe ku îşaretê bi bal te’bîra “bi emrê padîşah” be jî. Li gorî vê şîroveya hanê, wateya wê “bi fermana padîşah ez çi binivîsim” e. An jî bi ferman bi wateya “emr bike” ye.

4. Pirsra “ez çi binivîsim”ê dibe bi wateya rasteqîn be û dibe bi wateya mecazî be.

5. Di berîya “ez çi binivîsim”ê de îcaz heye. Lewra lêkera “got”ê nehatiye bilêvkirin.

6. Di “ya îlah”ê de îcaz heye. Lewra li vir mudafun ileyh ketiye. Wateya wê “ya îlahim” e.

Qale: "Uktub La îlahe îlla Ene

Hem Muhammed qasidê emrê min e.”

“Xweda (ji qelemê re) got ku “binivîse ku bê Xweda tu îlah tune ye û Muhammed jî qasidê emrê min e.”

1. Bi hevoka لا إله إلا أنا îqtîbas hatiye îcrakirin. Lewra ev hevok ji ayeta

أَنَّهُ لَا إِلَهَ إِلَّا أَنَا فَاتَّقُونِ

“Bêguman rewş wer xuya ye ku bêyî Xwedê tu îlah tune ye” (en-Nehl, 2), hatiye girtin.

2. “Muhemmed qasidê emrê min e” telmîha bi bal ayeta jêrê ve ye.

وما محمد إلا رسول

“Muhemmed bi tenê qasidê Xwedê ye.” (Al-î İmrân, 144).

An jî telmîh bi bal ayeta مُحَمَّدٌ رَّسُولُ اللَّهِ

“Muhemmed qasidê Xwedê ye” (el-Fetih, 29).

3. Di hevoka “emrê min e” yê de îhtîmala mecaza mursel heye. Lewra Hz. Pêxember qasidê Xwedê ye. Yanê qasidê zatê Xwedê ye. Ne ku qasidê emrê wî ye. Belkî qasidê wî ye, emrê wî ji me re aniye.

Sacîd û bê hiş gerî sed salî dî

Ser hilîna got: “Îlahî seyyîdî!”

“Qelem çû secdeyê û sed salê din bê hiş îbadet kir an jî girîya an jî gerîya û di dû re serê xwe rakir û got “Ey îlahê min! Ey mezin û serokê min!”

1. Di bêjeya “sacîd”ê de dibe ku kînaye hebe. Îbadet hatibe qesdkirin. Lêbelê bi îbadetê re secde jî heye. Dibe ku mebest jê îbadet be, cuz hatiye zikirkirin lêbelê kull hatiye qesdkirin. Li gorî vê şîroveyê li vir mecaza mursel heye.

2. Bêjeya “gerî” yê li gorî ji nusxeyên mewlûdê tê famkirin bi çend awayan hatiye xwendin. Wekî “gerî”, “girî”, “kirî”. Li gorî van xwendinan wate û huner jî cuda dibin. Ev bêje “kirî” bê xwendin kirda wî emrê Xwedê ye û ev xal di malika jorê de derbas bû. Li gorî vê şîroveyê îcaz heye û wateya wê jî “emrê Xwedê qelem bê hişkir û qelem bir secdeyê”.

3. “Gerî” bê xwendin tewcîh çêdibe. Lewra wê gavê du wate jê re hene. A yekem “meşîya ye. A din jî “bû” ye.

4. “Girî” bê xwendin mutabaqat pirtir çêdibe. Lewra secde elametê tewbe û pêşmanîyê. Girîn bêhtir muwafiqê tewbê ye. Li gorî vê xwendinê tenasub derdikeve holê.

5. Di bêjeyên “sacid, bê hiş û got”ê de, îhtîmla kînayê jî heye, Lewra dibe ku em van kelîmeyan hemlbikin li ser wateyên wan yên mecazî jî û an jî yên heqîqî. Lewra kirde qelem e. Qelem jî ne xwedîyê rûh e.

6. Di “Îlahî” û “seyyidî”yê de îcaz heye. Lewra baneşan nehatiye gotin.

7. Di bêjeya “seyyid”ê de muşakele heye. Lewra ev bêje ji bo Xwedê ne durist e. Sedemê bikaranîna bêjeya “seyyîd”ê ji bo Xwedê hatina bêjeya Xwedê bi bêjeya qelemê re ye.

Ez dizanim La îlahe îlla Tu wî,

Ew Muhammed hemberê îsmet bû wî

“Ez dizanim bê te tu îlah tune ye. Lêbelê ev navê Muhammed ê li hember navê te ye ez nizanîm ew kî ye.”

1. Mebest ji “ez dizanim”ê îtîraf û teqrîra azameta Xwedê ye. Lewra haya Xwedê ji zanîna qelemê heye.

2. Hevoka “La îlahe îlla Tu wî”yê îqtîbas e ji ayeta jêrîn. Lêbelê lefzê hatiye îqtîbaskirin hatiye guherandin.

لَا إِلَهَ إِلَّا أَنْتَ

“Ji bil te tu îlah tune ye.” (el-Enbîya, 87).

3. Di hevoka “ez dizanim”ê de îtnab ji bo tekîda wateyê ye. Lewra cînavka “ez”ê nehata bikaranîn jî wateya wê dihat famkirin.

4. Di hevoka “La îlahe îlla Tu wî”ê de qesra heqîqî heye.

5. Bi bêjeya “Ew”ê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra ev bêje nehata bikaranîn jî wate dîsa temam bû. Sebebê bikaranîna bêjeya “ew”ê dibe ji sê tiştan yek be. A yekem wezna beytê ye, a

duyem tekîd û te'zîm e. Lewra "ew" ji bo tiştên dûr tê bikaranîn. Dûrîti jî carinan bi îtibara mesafeya maddî ye carinan jî bi îtibara mesfeya me'newî ye.

6. Dibe ku berîya "ew"ê gihanek ketibe wê gavê her du hevok bi hev ve giradayîne û ji bela ku bi hev ve girêdayîne em dikarin bibêjin ku di vir de wesilekî veşartî heye. Yanê gihaneka ku "û" ye ketiye û îcaz heye.

7. Di "hemberê îsmet bû wî"yê de te'zîma xeyrê heye. Lewra bi îdafeya hemberê bi bal îsmekê ve tê famkirin ku dereca Muhemmed (s.x.l.)'î pir bilind e. Lewra cînavka "ke"yê erebî ye ku li dawîya "îsm"ê ye û wateya wê jî "tu" ye.

8. Di hinek nusxeyan de di dewsa "wî"yê de "vî" hatiye. Di hinek nusxeyan de jî di şuna "îsmek"ê de "îsmet" hatiye. Lêbelê her du jî wateya wan wek hev in. "K" eslê wê "ke" ye ew jî erebî ye. "T" jî dibe ku eslê "te" be. Ji sedem helbestê sakîn bûbe û dibe ku eslê wê "et" be. Li gorî nêrîna yekem ev cînavka Kurdî ye û li gorî nêrîna duyem ev cînavkeke Farisî ye.

Kîjk e? ya Sultanê ba cûd û kerem!"

Padîşahê sermedê got: "-Ya qelem!"

*"Qelemê got ku "Ey sultanê xwedî comerdîtîyê û şerefê ew kî ye?"
Padîşahê ebedî got ku "Ey qelem!"*

1. Pirsra "kîjk"ê tevî pirsê wateya teccubê jî di xwe de dihewîne.

2. Di "ya sultanê"yê de tewazû û lavakirin heye. Lewra gazîkirina Xwedê ne ji bo gazîkirineke xweru ye. Belkî lava û rica ye ji bo qebûlkirina tiştan in.

3. Di bêjeya "sultan"ê de muşakele heye. Lewra bêjeya "sultan"ê ji bo mirovan tê bikaranîn. Lêbelê di vir de ji bo Xwedayê teala hatiye bikaranîn.

4. Di bêjeya "Padîşah"ê de jî muşakele heye.

5. Di “ya qelem”ê de gazikirin ji bo hişyarkirinê hatiye bikaranîn.

6. Di “cûd” û “kerem”ê de jî îtnab heye. Lewra wateya wan wek hev e.

7. Bikaranîna “sultan” û “padîşah”ê de tenewwua bêjeyan derketiye holê. Lewra her du heman wateyê îfade nakin.

8. Di “ya qelem”ê de dibe ku helbestvan wateya heqîqî û dibe ku wateya mecazî qesd kiribe. Wateya mecazî be, îhtîmal heye ku qelem hatiye şibandin bi însan ve. Wê gavê, teşxîs derdikeve holê.

9. Di hinek nusxeyan de di dewsa “sermedê” de “serwerê” hatiye. Di hinek nusxeyan de jî di navbera “sultan” û “cûd”ê de gihanek hatiye. Dîsa di hinekan de jî li ciyê “bacûd”ê “yâ cûd” hatiye. Li gorî qenaeta me li vir “bacûd” xweştir e. Di hinekan de jî di şuna lêkera “got”ê de “go” hatiye bikaranîn.

Ger nebûya ew Muhemmed, lewh û erş

Min netînane wucûdê ta bi ferş

“Xwedê got ku “Heke Ew Muhemmed nebûya ji lewh û ‘erş heta ferşê tu tiştek minê çênekira, ne afiranda.”

1. Di vê malikê de telmîh bi bal hedîsa لَوْلَاكَ لَمَا خَلَقْتُ الْأَفْلَاكَ “ne tuba min kaînatê ne diafirand,” ve heye.

2. Bêjeya “ew”ê wekî berîya niha jî derbas bû, zêde ye. Lêbelê dibe ku ji bo weznê ya jî ji bo bihêzkirinê an jî ji bo te'zîmê be.

3. Di hinek nusxeyan de di dewsa “ew”ê de “ev” hatiye. Her du jî mimkun in. Lêbelê wate li gorî wan tê guherandin. Di “ew”ê de tezîm li pêş e; di “ev”ê de jî diyarkirin û muşexxskirin pirtir tê aqilê mirovan.

4. Di “nefîrane” de mecaza mursel heye. Lewra musebbeh hatiye gotin. Lêbelê sebeb hatiye qesdkirin ku ew jî “çêkirin” e.

5. Di navbera “erş” û “ferş” de cînasa naqis heye.

6. Di vê malikê de tiştê mezin hatiye gotin. Lêbelê behsa tiştên biçûk nehatiye kirin. Bi qenaeta me sebebê vê xalê hunera îktîfayê ye. Yanê gava qîmeta tiştên mezin bi Pêxemberê Xwedê be, rûmeta yên biçûk jî bi Pêxemberê Xwedê dibe. Vî tiştê hanê çiqas nehatibe gotin jî tê famkirin.

Nê tu û nê cenet û narê mezin.

Cumle eşya min ji bo Wî çêkirin.”

“Ji bo wî neba min ne te û ne cenet ne jî cehennem çedikir. Min tişt giş ji bo Wî anî wucûdê.”

1. Di vê malikê de îhamu’t-tîbaq heye. Lewra her du alî tam ne zidê hev bin jî; gava bi hev re bin “eleqeya dijmanetîyê tê hişê merivan. Yek neyînî ye ya din jî erênî ye.

2. Daçeka “nê”yê ji bo tekîda wateyê hatiye dubarekirin ku ev jî dibe îtnab.

3. Hevoka “cumle eşya min ji bo wî çêkirin” îşaret bi bal hedîsa لولاك لولاك لما خلقت الافلاك ‘ê ye.

4. Te’bîra “narê mezîn”ê ji cehennemê kînaye ye.

5. Bi bêjeya “cumle”yê wate hatiye tekîdkirin.

6. Di navbera bêjeyên “cenet”ê û “nar”ê de tîbaq heye.

Muhbetê hingavt û şeq bû ew qelem

Ma li ser lewhê eyîsî dem bi dem

“Hezkirina Hz. Resûlullah (s.x.l.) bandor li qelemê kir qelem qelişî, li ser lewhê bi awayekî serxweş ma û zeman zeman nivisandinê kir, an jî lewhê paqij, lewh ya jî qelem biriqê, lewhê hêja jî dibe.”

1. Di bêjeya “dem bi dem”ê de tekrar heye.
2. Bi bêjeya “muhibet”ê mecaza mursel hatiye îcrakirin. Lewra muhibet sebeb e ji bo parçebûnê.
3. Di nivê yekem de îcaz heye. Lewra bireser hatiye hezifkirin. Mebest jê “muhibetê ew hingavt” e. Çawa xuya dike li vir “ew” ketiye.
4. Di lêkera “şeq bû”yê de mutawaat heye. Hezkirinê bandor lê kiriye ew jî ketiye binê bandora hezkirinê.
5. Di nivê dawî de îcaz heye. Lewra kirde derbas nebûye. Liv kirde “ew” e.
6. Bêjeya “nivîs”ê dibe ku pêvebera qelêmê be. Li gorî vê şîroveya hanê wateya wê “qelem nivîs” e. Dîsa li gorî vê şîroveyê, em dikarin bibêjin li vir du hevok hene û gihanek hezif bûye. A yekem “ew li ser lewhê ma” ye. A duyem jî “qelem nivîs” e. Bêjeya “nivîs” dibe ku îsmê me’fûl be. Wateya “lewhê” jî ew e ku tiştên nivîsandinê tê de hene” ye.
7. Di hinek nusxeyan de di dewsa bêjeya nivîs de “eyîsî” heye û di hinekan de jî “nefis” heye. Gava “eyîsî” be wateya wê “biriqî” ye. Dibe ku ji bo lewhê rengdêr be û ji bo qelêmê jî pêveber be. Ev bêjeya hanê gava nefis be dibe rengdêr ji bo lewheyê.

Serxweş û sekranê Wî navê şîrîn

Paşê ba îlhama Rebbîl-'alemîn

“Piştî ku qelem muddetekî bi ilhama Rebbu'l-alemîn serxweşê navê pêxember ma.”

1. Di peyvên “serxweş” û “sekran”ê de îtnaba bi tekîdê heye. Lewra wateya wan her duyan wek hev e.
2. Te’bîra “rebbîl-'alemîn” ji sûreyê fatîhê hatiye îqtîbaskirin.

3. Di “navê şîrîn” de, îstîfare heye. Lewra nav hatiye şîbandin bi xwarinê şîrîn an jî bi lezzetê, lê muşebbehun bîh nehatiye zikirkirin, di dewsa wî de muşebbeh hatiye gotin, tiştê xasê bi muşebbehun bîh ve bi muşebbeh ve hatiye girêdayîn.

4. Piştî bêjeya “paş”ê de hezif heye. Ji ber vê xala hanê li vir îcaz heye.

5. Bêjeya îlhamê dibe ku bi wateya emrê be. Wê gavê, hunera tewrîye heye. Lewra wateya dûr hatiye qesdkirin.

6. Di hinek nusxeyan de di dewsa “ba”yê “bi” hatiye û di hinekan de jî di dewsa “paşê”de “paşî” hatiye. Gava “ba” be li gorî bikaranîna meşhûr wateya wê “digel îlhamê” dibe. Gava “bi” be wateya wê “bi wasita û alikarîya îlhamê” dibe.

Gotî ewwel “-Ya Muhemmed, essalam!”

Hem “Eleyke” gotî Rebbê layenam

“Qelem berîya dest bi nivîsê bike got ku “Ey Muhemmed selam li ser te be. Rabbê ku tu cara ranazê ji qelemê re got ku “ Selam li ser te be jî.”

1. Te'bîra “Rebbê lâyenam” telmîh e bi bal ayeta

لَا تَأْخُذُهُ سِنَةٌ وَلَا نَوْمٌ

“Ne dihênije û ne jî radikeve.” (el-Beqere, 255).

2. Di “Ya Muhemmed”ê de, mecaza mursel heye, Lewra mixateb nûra Hz. Muhemmed e. Di vir de eleqeya ji bo mecaza mursel dibe ku îtîbara ma yekûn be û dibe ku baziyyet jî hebe. Lewra bende hatiye qesdkirin.

3. Di nivê yekem de îcaz heye. Lewra “eleyke” nehatiye gotin.

4. Di nivê duyem de jî îcaz heye. Lewra di vir de “ve’s-sellamu” hatiye hezifkirin. Ev şîrove ji bo vê bendê û benda

berîya wê mekir, eger “hem eleyke” em bibêjin gotina Xweda ye ev şîrove rast dibe. Li gorî vê şîroveyê malika di dû re, dibe îtnab be. Lewra jixwe li vir cewab tê dayîn.

5. Heke “eleyke” gotina “qelêmê be. “hem” zaîd dibe, bi wê îtnab çêbûye.

6. Di nîvê yekem de kirde jî nehatiye gotin ji sedem vê xalê, di vir de jî îcaz heye.

7. Te’bîra “lâyenâm”ê dibe ku bi wateya “ne bêxeber” be, wê gavê em dibêjin ku di vir de îstîareya tesrîhiyye û tebeîyye heye.

Da cewaben ‘en Hebîbî’l Îzzetî

“We eleyke esselam û rehmetî”

“Xwedayê teala di dewsa hebîbê xwe yê bi rûmet bersîvo da û got “selam û rehmeta min li ser te be.”

1. Ev malik çawa me got wateya hevoka berê têtîd dike. Hevoka duyem ji ya yekem re dibe wek feslê.

2. Heke bê gotin “rebbî layenam” kirda lêkera “gotî”yê ye, di vê malikê de îcaz jî tê holê. Lewra wê gavê tê famkirin ku kirda lêkera “da”yê nehatiye gotin.

3. Di te’bîra “da cewaben”ê de qelb heye. Lewra di zimanê kurdî de ev hevok “cewab da” ye. Dibe ku sebebê vê qelbê wezna malikê be.

4. Di “hebîbî’l-îzzetî” de mewsuf ji sifetê re bûye mudaf. Îhtîmalekî zeîf be jî em dikarin bibêjin, di vir de îstîareya meknîyye û texyîlîyye heye. Lewra li gorî vê fikirê îzzet hatiye şibandin bi mirovekî. Lêbelê mirov nehatiye gotin, di şuna wî de muşebbeh hatiye gotin û di dû re, tiştêkî xasê muşebbehun bîhê hatiye îdafekirin bi bal muşebbehê ve.

5. Di “hebîbî’l-îzzetî”yê de dibe ku mesder sifet be ji “hebîb” re. Yanê ew hebîbê bi rûmet û hêja”.

6. Di lêkera “da”yê de îstîareya tebeîyye û tesrîhîyye heye. Lewra selam bi awayekî heqîqî tê gotin nayê dayîn. “Gotin” mûşebbeh e; “dayîn” jî mûşebbehun bîh e. Li vir şibandin di navbera du lêkeran de hatiye bikaranîn û mûşebbehun bîh, bi tenê hatiye zikirkirin.

7. Di vê malikê de îcaz jî heye. Lewra li gorî wateyê li vir pêwîst e ku lêkera “got”ê bihata bikaranîn. Yanê “cewab da û got” an jî “bi selam û rehmetê cewab da” ye.

8. Nîvê duyem dibe ku fesil be. Lewra li gorî vê şîroveyê nîvê duyem jî sedem pîrsekê jî nîvê yekem hatiye famkirin hatiye. Ev pîrs jî “çi gote” ye

Bûye sunnet lew selam û reddê ferz

Cumleyê ehwalê paşî kirne ‘erz

“Dû wî re selam dayîn bûye sunnet û bersîva selamê jî bûye ferz. Dû re Xwedayê teala hinek tişt ji qelemê re gotin.”

1. Di nîvê yekem de îcaz heye. Lewra wateya “Bûye sunnet lew dayîna selamê û redda selamê ferz” sebebê vê îcazê eşkere eşkere hezfa bêjeyan e. Lewra bêjeyên ketin in ji beytê tê famkirin.

2. Dibe ku di dewsa îcazê de bê gotin li vir îktîfa jî heye. Lewra redda selamê û dayîna selamê jî selam û reddê tê famkirin. Ji her du aliyan yek hezif bûye û yek jî hatiye bilêvkirin.

3. “Di bêjeyên “erd” û “ferd”ê de cînasa naqis heye.

4. Bêjeya “cumle”yê wateyê teyîd kiriye.

5. Di nîvê duyem de îcaz heye. Lewra wateya wê “paşê wê hingê” ye.

Wê nivîsî pêkve ummet qencîkar

Cennetî û 'asiyan dê biçne nar

“Qelemê nivîsand ku temamê başên ummetên berîya ummeta Hz. Pêxember ehlê cenetê yîn û temamê xerabên wan jî ewê têkevin çehennemê.”

1. Di “cennetî” û “asiyan”ê de îhamu't-tîbaq heye. Lewra wateya “cennetî” û “asiyan” ne wek hev e. Lêbelê dîsa di navbera wan de bîna zidiyetê heye.
2. Di vê malikê de wesil heye. Lewra hevokên “pêkve ummet qencîkar cennetî” û “asiyan dê biçne nar” yek hevoka navdêrî ya din jî ya lêkerî ye. Bi gihanekê bi hevdu ve hatiye girêdan.
3. Di navbera “pêkve ummet qencîkar cennetî” û “asiyan dê biçne nar” de muqabele heye.
4. Di “pêkve ummet qencîkar cennetî”yê de îcaz heye. Lewra qetfa pêveberê ne hatiye gotin. Ew qertaf jî “nîn” e.
5. Di bêjeya “pêkve” de tekîd heye.
6. Di bêjeya “qencîkar” de mecaz heye, lewra mebest jê “baş, rind” e ne ku başî kiriye, an jî texlîba yên ku qencîyê dikan hatiye kirin li yên ku qencîyê na kin.
7. Di bêjeya “nar”ê de mecaza mursel heye. Lewra hal “nar” e hatiye qesdkirin. Lê mebest jê “cehennem” e ku ew jî mehel e.

Ummeta Ehmed nivîsî ehlê nûr

Ummetun muznîbetun, Rebbun xefûr

“(Qelemê nivîsand) ku ummeta Muhemmed (s.x.l.) ehlê ronahîyê ye û ummetek gunehkar e; lêbelê Rebbê wan efûkar e.”

1. Bêjeya “ummet”ê ji sedem tekîdê hatiye tekrarkirin. Sebebê tekrarkirina bejeya ummetê dibe ku wezna malikê be yan jî bal kişandina li ser ummetê be.

2. Di nivê duyem de hunera muqabeleyê heye. Lewra “Ummetun muznîbetun” û “Rebbûn xefûr” ji aliyê wateyê li hemberî hev in.

3. Di vê malikê de îcaz heye. Lewra di vir de kirde nehatiye bilêvkirin. Ew jî qelem e.

4. Di “ummeta Ehmed”î de ji sedem mudafun ileyhê mudaf bi rûmet bûye. Lewra Hz. Pêxember li bal Xwedayê teala ji hemû mexlûqan bi rûmettir e. Ji ber vî tiştî ummeta wî jî bi rûmettir dibe.

5. Di “Ehlê nûr”ê de telmîh bi bal ayetên jêrê ve heye:

وَالَّذِينَ آمَنُوا مَعَهُ نُورُهُمْ يَسْعَىٰ بَيْنَ أَيْدِيهِمْ

“Ew kesên ku bawer kirin, ronahîya wan peşîya wan ronî dike û bi wan re diçe.” (et-Tehrîm, 8).

نَقْتَبِسُ مِنْ نُورِكُمْ

“Em ji ronahîya we bigrin.” (el-Hadîd, 13).

6. Di vir de ji sedem ku “ummetun muznîbetun” û “Rebbûn xefûr” dijmane nin bi îfîbar bêjetîyê muqabele heye. Lêbelê bi îfîbara bikaranîna her duyan di hevokekê di dijmanetî tune ye.

7. Di “rebbun xefûr” de îqtîbas heye. Lewra ev îbare eynî di ayeta jêrê de jî derbas dibe.

وَرَبُّ عَفْوَرٌ

“Ew Rebbekî pir efûkar e.” (Sebe, 15).

8. Dibe ku bêjeya “nivîsî” di vir de bi wateya lêkera kirinê be, wê gavê em dikarin bibêjin di vir de îstîfere heye.

9. Ji bejeyên “muznîbetun” û “Rebbun xefûr” tê famkirin ku mebest ji vê ristê nîşandayîna perîşaniyê û xwestina rehma Xwedê ye.

Cumleê ehwalê 'alem bîş û kem

Wî nivîsî bûrî û hişk bû qelem

“Ji halê mexlûqatan xêr û xerab çî hebe qelemê nivîsand û di dû re zuha bû. An jî hindik û pir giş nivîsand.”

1. Îhtîmala hebûna îktîfayê di nivê yekem de heye. Lewra bêjeya “alem” çiqas ji bo yên dijîn hatibe bikaranîn jî, li vir em dikarin bibêjin yên ne xwedîyê rûh in jî dikevin binê hukmê vê malikê.

2. Di “bîş” û “kem”ê de, hunera tîbaqê hatiye bicî anîn. Lewra her du peyv zidê hev in.

3. “Bîş” û “kem” her du bi hev re ji “hemû-gişî, biçûk-mezin, pir-hindik” kînaye ye.

4. Bi bejeya “cumle”yê wate bihêzbûye. Lewra tekîd heye.

5. Di “hişk bû qelem”ê de dibe ku îstîfare hebe. Lewra mebest jê ew e ku di dû re qelemê nenivîsandiye.

6. “Hişk bû” dibe ku ji “murekkeb qedandinê” an jî “nenivîsandinê” kînaye be.

Mijara Pêncem: Afirandina Hz. Adem

Çûn îradet hati sultanê refî'

Çêketîn Adem bi vî şeklê bedî'

“Gava ji bo Adem bi awayekî bê mînak bêçêkirin îrada sultanê bala û bilind ku ew jî Xwedê ye derket holê an jî gava Xwedayê teala afirandina sultanê bilind ku ew Pêxemberê me ye xwest yanê çêkirina Ademî bi awayekî bê mînak xwest.”

1. Bêjeya “çûn”ê şert û cewabê dixwaze, di vê malikê de bêjeya “çûn”ê ji bo şertê ye. Lêbelê di vê malikê de cewab nehatiye. Cewab di malika dû wê de hatiye.

2. Di “sultanê refî”ê de kînaye heye. Lewra li gorî vê şîroveya hanê, mirad jê Hz. Pêxember e. Lêbelê mewsûf Hz. Pêxember nehatiye û sifet hatiye bilêvkirin. Li vir mimkun e ku ji sifetê wateya rasteqîn û mecaz her du jî bê famkirin.

3. Ji bo bêjeya “sultan”ê muşakele jî durist e. Lewra sultan ji bo Xwedê be jî ji bo Resûlê Xwedê be jî bi wateya rasteqîn nayê bikaranîn.

4. Di vê malikê de îcaz heye. Lewra heke mebest ji “sultanê refî” Hz. Pêxember be, gihaneka sebebê û mudaf hatiye hezifkirin. Li gorî vê şîroveya hanê te’bîra “ji bo afirandin” tê teqdîrkirin û lêkera “hati”yê jî bi wateya “derket holê, zahir bû, peyda bû” ye.

5. Bêjeya “refî”ê dibe ku bi wateya îsmê fail be û dibe ku bi wateya îsmê mefûl hatibe bikaranîn. Li gorî vê wateyê li vir bikaranîna “refî” ji bo Hz. Pêxember rindtir e.

6. Gava mebest ji “sultanê refî”ê Hz. Pêxember be, di nivê yekem de îcazeke din jî heye. Lewra li gorî wateyê li dû îradê pêwîst e ku bêjeya “Xwedê”yê bê teqdîrkirin.

7. Gava mebest ji “sultanê refî”ê Hz. Pêxember be, em dikarin bibêjin ku bêjeya “çêkitin”ê ji bo “sultanê refî” bedelu’l-îştîmal e û wate hatiye tekîdkirin.

8. Di “şeklê bedî”ê de îktîfa heye. Berîya her tiştî ji şeklê bedî tiştên maddî tîn famkirin. Lê li vir tiştên me’newî pirtir minasibê mirovan e û pirtir jî ji Pêxemberê Xwedê Hz. Adem re minasib e. Lewra ew û nesla wî herî pir ji alîyê me’newî ve bibin mînak. Lewra tiştê ku herî girîng e û mirovatîyê û mirovan ji mewcûdatên din cuda dike me’newîyat e. Ew jî aqil û îta’eta Xwedê, îrade, hezkirin, ilim, edeb, sanat û tiştên din in. Ji ber van tiştan em dibêjin çiqas li vir behsa tiştên maddî hebe jî. Li gorî hunera îktîfayê tiştên me’newî jî hene. Lê nehatine gotin.

Emrî hate goşê Cibrîlê emîn

Qebdeê bîne ji beydaê zemîn

“Emrekî jê xeybê hate guhê Hz. Cebrailê emîn û jê re got ku ji ciyekî paqij ê erdê an jî ciyekî sipî kulmek, çengek ax bîne.”

1. Di “emrî” de mecaza mursel heye. Lewra sebeb hatiye gotin. Lê musebbeb hatiye qesdkirin ku ew jî deng e.
2. Di navbera “emîn” û “zemîn” de cînasa naqis heye.
3. Mebest ji “emîn”ê pesn an jî wezn e. Lewra ew nehatiba jî wateya emîn tê famkirin.
4. Di “emrî”yê de nediyarî heye. Ji sedem vê xalê girîngî û meznatî jê tê famkirin.
5. Di “beydaê zemîn”ê de mecaza mursel heye. Heke em bibêjin mebest ji “zemîn”ê ax e, em dikarin bibêjin di vir de mecaza mursel heye. Mehel hatiye, lê hal mirad e ku ew jî ax e.
6. Di vir de îcaz heye. Lewra lêkera “got”ê nehatiye gotin. Lê eslê cumlê “got qebdeê bîne ji beydaê zemîn” e.
7. Di te’bîra “qebdeê bîne ji beydaê zemîn”ê de îhtîmala qelba mekanî jî heye. Lewra sifet ku “beyda” ye û mewsûf jî zemîn e. Ciyê wan ji sedem qafiyê hatiye guherandin.

Ew dilê erdê û hem husn û beha

Zîneta meknûn û durra bê beha

“Ew kulma an jî çenga ku tuyê bigrî qelbê erdê û xulasa erdê ye û herî paqij û bi rûmet û xweşik e, zîneta veşartî ye û durra ji alîyê qîmetê de bê hempa ye.”

1. Di “dilê erdê”yê de îstîareya tesrîhîyye heye. Lewra mebest ji dil di vir de axa erdê ya paqij e an jî axa tam di nava erdê de ye. Ji sedem vê şîrovevê ev ax hatiye şibandin bi “dil”.

2. Di “ew”ê de rûmetdayîn ji bo wî kesî an jî tiştê jê tê behskirin heye.

3. Bêjeya “beha”yê hatiye tekrarkirin. Ew jî îtnaba ji bo tekîdê ye.

4. Dibe ku “erd” hatibe şibandin bi mirovan. Lê mirov nehatiye muşebbeh hatiye û taybetîya muşebbehun bîh hatiye ku ew jî dil e. Li gorî vê şîroveyê li vir îstîareya meknîyye û texyîlîyye heye.

5. Di nîvê yekem de di husn û behayê de mubalexe jî û îcaz jî heye. Wê gavê şîroveya wê “xwedîyê husn û beha” dibe.

6. Di peyvên “durr” û “zînet”ê de jî îstîare-i tesrîhiye û eslîyye heye. Lewra ew her du jî muşebbehun bîh e.

7. Di vê malikê de îtnab heye. Lewra “zînet, husn û beha” her sê jî maneya wan yek in

8. Di navbera her du peyvên “beha”yê de cînas heye. Lewra “beha” di cara yekem de bi wateya xweşîkbûnê ye. Lêbelê di ya duyem de wateya wê zêdebûna bihayê ye an jî qîmeta tiştan e.

Dibe ku wateya bejeya “beha”yê di cara yekem de jî “qîmet” be. Li gorî vê taybetîya hanê em dikarin bibêjin ku li vir cînasa selbî heye. Lewra wateya her du bêjeyan wek hev bin jî, wateya yekê erênî ye. Wateya ya duyem jî bi “bê”yê neyînî bûye.

9. Di vê malikê de muwafaqata wateyê jî heye. Peyv ji alîyê me’nayê nêzîkî hev in. Bi te’bîrek din tenasub heye.

10. Li gorî qenaeta me di “durr”ê de telmîh bi bal Hz. Pêxember heye. Lewra di mewlûdan de pirrê caran mîrad ji “durr”ê Hz. Pexember e.

Hati Cebraîli ba emrê Letîf

Çengekê axê ji wê qebra şerîf

“Hz. Cebraîl bi fermana Xwedayê lutufkâr kulmekî axê ji ciyê gora Hz. Pêxember girt. Di vê malikê de dibe ku bêjeya letîf ji bo emrê sifet be, wê demê wateya fermana letîf dibe.”

1. Di bêjeya “letîf”ê de tewcîh heye. Lewra dibe ku du wateyên wê hebin. Yek jê letîf sifetê Ellahê be. Ya duduyan jî dibe ku sifetê emrê be.

2. Di nîvê duyem de lêker nehatiye. Di malika jêrê de hatiye. Ji sedem vî tiştî ev malik bi malika dû re girêdayî ye.

3. Di “çengekê axê ji wê qebra şerîf”ê de dibe ku fesil hebe. Lewra ji pirsekî veşartî re ev hevok wek bersîvê ye . An jî li vir fesil tune ye. Lêbelê îcaz heye. Li gorî vê şîroveya hanê di serê malikê de bêjeya “gava” hebûye û ketiye.

4. Di “qebra şerîf”ê de kînaye heye. Lewra mebest jê qebra Hz. Pêxemberî ye.

5. Di hinek nusxeyan de di dewsa “qebra”yê de “qebrê” hatiye.

6. Di “qebra şerîf”ê de îcaz heye. Lewra mebsset jê “ciyê an jî axa qebra şerîf” e.

Girt û ba tesnîmê safî kir hevîr

Têkveda hetta ku ew qenc bû xemîr

“(Hz. Cebraîlî) ew ax girt û lihevexist. Heta bi tesnîma saf ew rind kir hevîr.”

1. Di “ew qenc bû xemîr”ê de şibandî heye. Lewra di vir de çî tiştêkî bibe manî’ ji teqdîrkirina daçeka “wekî”yê re tune ye. Li gorî vê şîroveya hanê cînava “ew”ê muşebbeh e; “xemîr” jî muşebbehun bih e.

2. Bi bêjeya “tesnîm”ê telmîh bi bal ayeta jêrê û yên berîya wê ye

تَسْنِيمٍ وَمَرْاجُهُ مِنْ

“Tiştê tevî wê bûye ji Tesnîmê ye.”

3. Bêjeya “safî”yê li gorî şîroveyên mewlûdê ji bo tesnîmê. Rengdêr e. Lêbelê dibe ku hevalkar be ji bo bêjeya “ax”ê ku di malika berê de derbas bû.

4. Dibe ku bêjeya “safî”yê ji bo bêjeya “hevir”ê bibe tekîd jî. Li gorî vê şîroveyê li vir îtnab heye.

5. Di rista (şetra) dudiyar de îtnab heye. Wateya ku ji vê ristê tê famkirin ji xwe ji ewil jî tê famkirin. Ev riste ji ya yekê re dibe wek îzah an jî tekîd. Em dikarin bibêjin “îzah be, li vir fesil heye.” Lê “tekîd be, liv ir îtnab heye”

6. Di hinek nusxeyan de cînava “ew”ê nehatiye bikaranîn. Wê gavê li vir îcaz derdikeve holê.

7. Di hinek nusxeyan de “bû qenc bû xemîr” e. Li gorî van nusxeyan “bû qenc” û “bû xemîr” her du jî hevokên lêkerî ne û pêveber (xeber) in ji bo “ew”ê.

8. Di “bû xemîr” de qelba mekanî heye. Lewra ciyê her du bêjeyan hatiye guherandin.

Bû wekî durra sipî wê sa’etê

Xewte da der cûyibarê cennetê

“Ew kulma axê gava bû hevîr, wekî durra sipî bû û xweşik bû. Di dû re jî Xwedayê Teala ew di çemê cenetê de noq kir û bi ava wê bêhtir xweşik bû.”

1. Di vir de şibandin heye. Lewra di vir de tiştê ku Hz. Cebrail çêdike hatiye şibandin bi “durra sipî”. Ev şibandin nabe

îstîfare. Lewra çiqas “tiştên ku Hz. Cebraîl çêdike” yanê muşebbeh nehatiye gotin jî hevok bi wan temam dibe.

2. Bi “Wê sa’etê” îtnab hatiye îcrakirin. Lewra “wê sa’etê” di hevokê de hebe jî tune be jî ji gotinê tê famkirin û wateyek zêde çênabe.

3. Dibe ku mebest ji bêjeya “xewte”yê şuştin be û dibe ku mebest jê noqkirin be. Wê gavê em dikarin bibêjin di vîr de kînaye an jî tewcîh heye.

4. Di “xewte da”yê de îstîfariya tebeîyye û tesrîhîyye heye. Lewra mebest jê “xewte kir” e.

5. Di “wekî durra sipî”yê de îcaz heye. Lewra muşebbeh nehatiye gotin.

6. “Cûyîbarê cenet”ê de telmîha bi bal “çemê cenetê” ye ku di Qurana pîroz de derbas dibe.

جَنَّاتٌ تَجْرِي مِنْ تَحْتِهَا الْأَنْهَارُ

“Baxçe û bostanên ku di nav wan de çem diherikin.” (Al-î Imran, 15).

Emrê Cebraîli kir paşê çûnan

Wê bigêre der zemîn û asîman

“Di dû re Xwedayê teala emrî Hz. Cebraîl kir ku ew hevîrî li erdê û li asîmanan bigerîne.”

1. Di vê malikê de îcaz heye. Lewra kirde ku ew jî Xweda ye nehatiye gotin.

2. Di vir de îcazek din jî heye. Lewra gihaneka “û”yê û lêkera “got”ê her du jî hatine hezifkirin.

3. Di vê malikê de di navbera “zemîn” û “asîman” de tîbaq heye. Lewra her du li hemberî hev in.

Berr û behr û şerq û xerbê 'alemê**Hate gêran hêj ne behsa Ademê**

“Û li deryayê lî ser rûyê erdê û li rojhilat û rojavayê cîhanê Hz. Pêxember hate gerandin wê gavê behsa Hz. Adem (a.s) hêja tunebû.”

1. Di nivê yekem de îcaz heye. Lewra wateya malikê bi awayekî tekûz “li behr û berr û li şerq û li xerbê.”

2. Di vir de du caran hunera tîbaqê hatiye bikaranîn. Yek jê di navbera Behr û berrê de ye. Yek jê jî di navbera şerq û xerbê de hatiye îcrakirin.

3. Di nivê yekem de mudafûn ileyh hezif bûye. Lewra berîya van bêjeyan teqdîrkirina bêjeya “alemê” pêwîst e.

4. Di navbera “behr” û “berr”ê de jî cînasa naqis heye.

5. Di “behsa”yê de îcaz heye. Lewra eslê wê “bûbû behsa” ye.

6. Di navbera “Ademê” û “alemê” de cînasa naqis heye.

7. Di risteya duyem de îcaz heye. Lewra bêjeya “ew”ê nehatiye ku cînavk e û merci’ê wê jî “axa sipî” an “çenga axê” ye.

8. Di vê malikê de telmîh bi bal hedîsa *كنت نبياً وآدم بين الماء والطين* “Ez pêxember bûm. Adem jî hêja di nav “herî û avê de bû.”

Nê hezaran sali çûne axerî**Ew nebî bû Adem hêj av û herî**

“Piştî çêkirina Hz. Pêxember bi hezar salan zeman derbas bû ku ew nebî bû wê gavê. Hz. Adem jî av û herî bû.”

1. Di “nê hezaran” de tekîd heye. Lewra di vir de mebest jî hezaran mubalexe ye. Îhtîmala ku mebest jê hejmar bê zeîf e. Lê mebest jê hejmar be, wê gavê li vir mubalexe tune ye.

2. Bi bêjeya axerî îtnab heye. Lewra axerî me‘nayeka nû îfade nake. Bi tenê kêrî tekîdê tê.

3. Nîvê duyem telmîh e bi bal hedîsa jêrê ve.

كنت نبياً وآدم بين الماء والطين “Ez pêxember bûm. Adem jî di nav “herî û avê de bû.”

4. “Hêj av û herî” dibe kînaye be jî. Lewra mebest jê wê gava ku Hz. Adem nehatiye asta afirandinê an jî di asta “av û herîyê” de bû.

5. Di vê malikê de îcaz heye lewra lêkera pêveber ku ew jî “bû” ye.

6. Di nîvê duyem de fesil heye. Lewra “ew nebî bû” hevokek e û “Adem hêj av û herî” jî hevokek e. Her hevok bi hev ve nehatiye girêdayîn.

Paşê hingê Xaliqê her sûretê

Çêkirî Adem bi destê qudretê

“Piştî hevîrkirina axê, sipîkirin, çêkirina wî tevî tesnîmê û noqkirina wî di çemên cenetê de xaliqê şeklan giş ku Xwedê ye Adem bi destê qudreta xwe anî wucûdê.”

1. Di derbarê “destê qudret”ê de ya tê gotin heqîqata wê Xweda dizane, an jî ji bo ku bê famkirin em dikarin bibêjin muşakele heye. Lewra behsa wesfê Hz. Adem hatiye îfadekirin û di dû re jî “destê qudretê” hatiye zikirkirin. Bi awayekî din behsa Xwedê û ‘ebdê wî Adem bi hev re ye. Ev jî muşakele ye. Wateya ev tiştî bikaranîna bêjeyên ji bo mirovan ji Xwedê re ye. Ji ber ku Adem û Xweda di eynî hevokê de hatine.

2. Di “destê qudretê” de dibe ku îstîare hebe. Lewra wê gavê tê gotin ku qudret hatiye şibandin bi mirovekî û di dû re jî, mirov nehatiye zikirkirin û tişteki aidê mirovan hatiye îdafekirin bi bal qudretê ve.

3. Ellah an jî Xweda bi bêjeya xaliq hatiye bikaranîn. Sebebê wê di vir de mesele ku çêkirina suretan e.

4. “Xaliq” jî Xwedayî kînaye ye. Lewra mebest jê Xweda ye. Ev bêje jî mewsûfê kînaye ye.

5. Dibe ku di bêjeya “suret”ê de mecaza mursel hebe. Lewra xas hatiye zikirkirin û umûm hatiye qesdkirin.

6. Di bêjeya “her”ê de tekîd heye. Lewra ev bêje nehatiba bikaranîn jî wate tamam bû.

7. Di bêjeya “hingê”yê de îcaza qiser heye. Lewra ev bêje îşaret e bi bal çend risteyên ku berîya niha derbas bûbûn.

8. Di hinek nusxeyan de di şuna “paşê” de “paşi” hatiye bikaranîn. Di hinek nusxeyan de jî berîya “destê qudretê” cînava “wî”yê hatiye. Dibe wek tekîd jî bo kirdeyê.

Pif kire rûha xwe, ew bû nazenîn

Lew melek hatin ji bo wî sacidîn

“Xweda ji rûhê xwe pifî Hz. Adem (a.s) kir û Hz. Adem (a.s) bû mexlûqekî pîroz, xweşik û delal. Ji ber vê taybetîya hanê melek hatin ji bo Hz Adem (a.s) secde kirin.”

1. Di hevoka “pif kirî rûha xwe”yê de telmîh bi bal ayeta jêrê ve heye.

وَنَفَخْتُ فِيهِ مِنْ رُوحِي

“Min ji rûhê xwe pifî wî kir.” (el-Hicr, 29).

2. Di bêjeya “sacidîn”ê de telmîh bi bal emrê Xwedê jî melaîketa re ku gotiye secde bikin heye.

وَإِذْ قُلْنَا لِلْمَلَائِكَةِ اسْجُدُوا لِآدَمَ فَسَجَدُوا

“Bîne bira xwe me ji melaîketa re got ji Ademî re secde bikin wan jî secde kirin.” (el-Baqere, 34).

3. Di bêjeya “nazenîn”ê de tewcîh heye. Lewra ev peyv di vir de bi du wateyan hatiye bikaranîn. A yekem “şeklê xweş, rind” e. A duyem jî “nazikî û delalî” ye. Ev jî îşaretê bi bal du alîyê însan dike. Ew du alî jî maddî û me’newî ne.

4. Di nîvê duyem de îcaz heye. Lewra wateya wê dibe ku “lew melek hatin û ji bo wî secde kirin” e.

5. Di nîvê duyem de îcaz heye. Lewra wateya wê “melek hatin û ji bo wî secde kirin” e.

6. Bêjeya “sacidîn” ji bo hurmet û qîmetdayînê hatiye bikaranîn. Li gorî vê şîroveya hanê li vir kînaye heye.

Bû xezîne ew ji bo durra yetîm

Daniye pişta wî ew Nûra 'Ezîm

“Hz. Adem ji bo durra yetîm bû xezîne û Xweda wê nûra mezin danî pişta wî.”

1. Di te’bîra “bû xezîn”ê de şibandin heye. Lêbelê di vir de daçeka şibandinê nehatiye gotin. Ciyê muşebbeh û muşebbehun bîh hatiye guherandin. Eslê hevokê “Ew ji bo durra yetîm wekî xezînê bû” ye. Ji sedem ku daçeka şibandinê li vir ne hatiye gotin, ev teşbîh teşbîha mufessel e.

2. Di “durra yetîm”ê de îstîareya tesrîhîyye û eslîyye heye. Lewra Hz. Pêxember (s.x.l.) muşebbeh e; durr jî muşebbehun bih e. Yetîm jî qerîne ye.

3. “Xezîne” dibe îstîareya tersîhîyye jî be. Lewra di vir de xezîne mulaîmê muşebbehun bîhê ku ew jî durr e.

4. “Nûra ‘ezîm” eger bi şexsê Hz. Pêxember maddî bê şîrovekirin, wê gavê îstîareya tesrîhîye heye. Lewra Pêxemberê me dibe muşebbeh; nûr jî dibe muşebbehun bîh. Di vir de dibe ku tiştêkî me’newî bi nûrê hatibe şibandin ev jî îstîareya tesrîhîyye ye. Lêbelê heke bê gotin ku mebest ji nûrê nûr e, wê gavê heqîqet heye; îstîare tune ye.

5. Mebest ji “daniye” “kir” be, wê gavê îstîareya tesrîhîyye û tebeîyye heye. Ji sedem ku lêkera “danîtin”ê ji bo Xwedê nayê bikaranîn.

6. Di îsmê îşareta “ew”ê de mezinatî û rûmetîfî heye. Lewra “ew” ne hatiba jî wate temam bû. Di zimên de esil her bêje ji bo wateyekê ye an jî armançê e. Li gorî texmîna me li vir “ew” ji bo tezîmê ye. Îhtîmala tekîdê jî heye.

Paşê bir avête baxê cennetê

Keyrî darê jê bixwe her nî'metê

“Di dû re Xwedayê teala Hz. Adem (a.s) xist cenetê bi halê ku bê darê ji her tiştê ku nî'met e bixwe.”³⁸

1. “Bir avête” biwêj e. Lewra wateya wê ya rasteqîn li vir jî bo Xwedê durist nîne. Mebest ji vê hevokê “ew xist bihiştê” ye.

2. Di bêjeya “paşê”yê de îcaz heye. Lewra mebest jê piştî van tiştan” e. Ji ber ku îcaz pirê caran jî hokerên zeman û mekan cuda nîne, di zimanî de îcazên bi vî awayî xwezayî ne.

3. Di “baxê cenetê”yê de îtnab heye. Lewra mirad ji vê gotinê cenet e. Bêjeya “bax”ê tune be jî meqsed hasil dibe. Ayeta jêrê jî ji bo vê şîroveya me delîl e.

وَقُلْنَا يَا آدَمُ اسْكُنْ أَنْتَ وَزَوْجُكَ الْجَنَّةَ

“Me got: Ey Adem! Tu û hevala xwe li cenetê bi cî bibin.” (el-Beqere, 35).

³⁸ Di hinek nusxeyan de ev malik tune ye.

4. Di serê nivê duyem de îcaz heyê. Lewra di serê risteyê de lêkera "got"ê hezif bûye.
5. Di hevoka "bir avête"yê de îstîfare heyê. Lewra li vir mebest ji vê te'birê "xiste" ye.
6. Emrê "bixwe"yê ji bo îbahê ye.
7. Di lêkra "bixwe"yê de ihtîmala mecaza mursel jî heyê. Lewra wê gavê "bixwe" cuz e. Mebest jê "îstîfade bike" ye.
8. Di "xeyrê darê"yê de îcaz heyê. Lewra mebest jê "ji xeyrê fêkîyê darê xuldê" ye.
9. Bêjeya "xeyî" ji bo îstîsnayê ye.

Sef bi sef westane pişt a wî gellek

Nazirê nûra Muhemmed ew melek

"Melaîket hemû li dû hev li pişt a Hz. Adem (a.s) ketin sefê û li nûra Muhemmedî (s.x.l.) mêze kir."

1. Bêjeya "sef bi sef" hatiye tekrarkirin. Mebest jê tekîd û pirkirina tiştê ku jê tê behskirin e.
2. Di nivê yekem de îcaz heyê. Lewra li vir daçek a "li" an jî "di", de hatiye hezifkirin.
3. Di vê malikê de dibe ku "ew melek" kirde be ji bo westane û nazirê tev be. Li gorî vê şîroveya hanê li vir tenazu jî heyê. Lewra du lêker heman mamûl dixwaze.
4. Bêjeya "ew" ji bo tezîmê an jî ji bo weznê hatiye bikaranîn. Lewra ev bêje nehatiba jî wate temam bû.
5. Di bêjeya "nazir"ê de dibe ku tewcîh hebe. Lewra ji vê bêjeyê du wate tê derxistin. Ev her du wate jî "mêzekirin" û mihafezekirin e.
6. Di navbera bêjeyên "gellek" û "melek" de cînasa naqis heyê.

Goti Adem ew melaîk bo çi her**Wê li pišta min dîkin daîm nezer**

“Hz. Adem (a.s) got ku ew melaîket ji sedem çî daîmî li pišta min mêze dîkin.”

1. Di “gotî Adem”ê de teqdîm heye. Lewra lêker di pêşîya kirdeye de hatiye.
2. Di “gotî Adem” de îcaz heye. Lewra “ya rebbî, ya îlahî” hatiye hezifkirin.
3. Dibe ku cînava “ew” ji bo tezîmê be. Lewra li vir ji alîyê wateyê hatina “ev” xweştir e.
4. Bêjeya “wê” dibe ku zaîd be jî. Lewra nehatiba bikaranîn jî wate تمام bû.
5. Cînava “wê” yê yek hejmar e. Lêbelê wateya wê pirjimar e.
6. Bi bêjeyên “daîm” û “her”ê tekîd hatiye icrakirin.
7. Di “dîkin nezer” de qelba mekanî heye. Lewra eslê wê “nezer dîkin” e.
8. Di hinek nusxeyan de di şuna “gotî” yê de, “got” hatiye û di hinekan de jî di dewsa “dîkin” de “tikin” hatiye. Ev devoka alîyê Behdînan e.

Rebbê ‘alem goti Adem, ey mûlî!**Tu ji bo nûra Muhemmed hamil î**

“Rebbê alem ji Adem (a.s) re got: Ey mirovê xweşik nûra Muhemmed bi te re ye an jî tu nûra Muhemmed neql dikî.”

1. Li vir bêjeya “mûlî” bi çend awayan hatiye xwendin. “milî, melîyy, mela, melî”, li gorî van xwendinan wateyên wê bi rêzê “tijêyê bi ilmê û îrfanê, xweşik, dewlemendê bihêz, ê

şaşmayê û ê ku ewletî li cem wî heye ye." Li gorî van wateyan em dikarin bibêjin li vir tewcîh heye.

2. Ji bo te'zîm û hêvîya rehmetê di dewsa Ellah û Xwedê de Rebbê alemê hatiye bikaranîn.

3. Di nîvê yekem de îcaz û teqdîm heye. Lewra eslê wê "ji Adem re got" e.

4. Di bêjeya "nûr"ê de dibe ku mecaza mursel hebe. Lewra mebest jê şexs be. Wateya wî meZRûf hatiye gotin lêbelê zerf hatiye qesdkirin.

5. Di hinek nusxeyan de di dewsa "goti"ê de "gote" hatiye.

6. Di vir de "hamil" bi wateya naqil e. Ji sedem vê xalê em dikarin bibêjin di vir de mecaza mursel heye. Lewra sebeb hatiye gotin. Lêbelê musebbeb hatiye qesdkirin.

Ew Hebîbê Min di pişta te zuhûr

Lew melek têne temaşeyê ji dûr

"Ew kesî ku ez jê hez dikim nûra wî di pişta te de xwanê dike. Ji sedem vê xala hanê melaîket ji dûr ve tîn û wê temaşe dikin."

1. Di bêjeya "ew"ê de te'zîm heye.

2. Di "ew hebîbê min"ê de jî te'zîm heye ji bo kirdeyê ew jî "ew" e.

3. Bêjeya "zuhûr"ê mesder e. Lêbelê bi wateya îsmê failê hatiye bikaranîn.

4. Di nîvê yekem de îcaz heye. Lewra eslê wê "pişta te de" ye.

5. "Têne temaşayê" biwêj e. Lewra wateya wê "mêze dikin" e. Ev biwêj bi du wateya tê bikaranîn. A yek temaşa dikin, mêze dikin a duyem jî "ji bo dîtîna û mêzekirinê tîn" e.

6. Di bêjeya "hebîb" de kînaye jî heye. Lewra di dewsa lefzê Muhemmed de hatiye bikaranîn.

Goti Adem: “Ey Xudawendê felek

Min divêtin bêne pêş min ew melek

“Adem (a.s) got: “Ey Xwedayê kâinâtê, ez hez dikim ku melaîket werin pêşîya min.”

1. Di “goti Adem” de teqdîm heye. Lewra lêker berîya kirdeye hatiye.
2. Di “Ey Xudawendê felek”ê de dibe ku îcaz hebe.
3. Di navbera bêjeyên “felek” û “melek” de cînasa naqis heye.
4. Di “Xudawendê felek”ê de kînaye heye. Lewra navê Xwedê nehatiye gotin. Lêbelê sifetê Xwedê hatiye gotin.
5. Hevoka “min divêtin bêne pêş min melek”ê bi mebest diayê ye.
6. Di hinek nusxeyan de di şuna “ey”ê de “ya” hatiye.

Hem bi fermana Xudê wê sa’etê

Nûr ji piştê hate nêva cebhetê

“Bi emr û fermana Xwedê wê sa’etê nûr ji piştê wî tam hate nava enîyê.”

1. Di “nûr ji pişt”ê de îcaz heye. Lewra di vir de cînava “wî”yê hezif bûye.
2. Di “wê sa’et”ê de îcaz heye. Lewra eslê wê “di wê sa’etê de” ye.
3. Gihaneka “hem”ê li vir ji bo bihêzkirina wateyê hatiye.

Hin dibêjin hate tilya şahidê

Lê heqîqet her dizanîtin Xudê

“Hinek dibêjin ku nûr hatiye tilya şahadetê. Lê Xwedê bi tenê heqîqeta wê dizane.”

1. Di te'bîra “hin dibêjin hate” yê de îcaz heye. Lewra eslê wê “hin dibêjin ew nûr hate” ye.
2. Di “her dizanîtin”ê de îtnab heye. Mebest jê jî tekîd e. Lewra bêjeya “her”ê neyê bikaranîn jî wate kêr nabe.
3. Bi gihaneka “lê”ê îstîdrak heye. Lewra famkirina tiştê ku nehatiye qesdkirin ji holê hatiye rakirin.
4. Di “heqîqet”ê de îcaz heye. Lewra mebest jê “heqîqeta wê” ye.

Mislê roja hatiye ewca felek

Hem teheyyur Adem û hindî melek

“Ev nûra Hz. Pêxember wek roja li nava asîman bi ronî bû û xweşik bû. Ji sedem vê taybetîya hanê li halê wê Hz. Adem (a.s) û melaîket hemû heyran man jê re.”

1. Di vir de şibandin heye. Teşbîha mursel e. Lewra daçeka şibandinê “mîsl” e, muşebbehun bîh hatina rojê nava asîman e; muşebbeh jî hatina nûrê tilya şahadete an jî enîyê ye.
2. Di “teheyyur”ê de îcaz heye. Lewra eslê wê “teheyyur ma” ye.
3. Di bêjeyên “felek” û “melek”ê de cînasa naqis heye.
4. Di bêjeya “hindî”ê de bihêzkirina wateyê heye. Lewra ev bêje ne hatiba jî bêjeya melek kafi dibû.
5. Di nivê yekem de îcaz heye. Lewra eslê wê “Mislê rojê ew hatiye ewca felek” e

Goti Adem: “Ya Rebb ew Nûra qebûl.”**“-Maye tişte?” Gotê Eshabê Resûl**

“Hz. Adem (a.s) got ku “Ya Reb ji wê nûra muteber û meqbûl tişte qey maye?” Xwedayê teala got ku Sehabîyên Hz. Resûlullah mane.”

1. Di vê beytê de îcaz heye. Lewra wateya wê Adem got: “Ya Rebbî ji nûra meqbûl tişte maye” Xwedê got: maye eshabê resûl Çawa tê famkirin bêjeyên “ Xwedê jî û maye jî” hatine hezifkirin.

2. Di bêjeya “qebûl”ê de îxal heye. Lewra qebûl ne hatiba jî wate dihat famkirin. Lê bejeya “qebûl”ê ji sedem tekîdê ye yan jî ji ber mubalexeyê hatiye. Dibe ku ji bo qafiyê jî hatibe.

3. Di bêjeya “ew”ê de te’zîm heye. Lewra di ciyê “ev”ê de “ew” hatiye bikaranîn.

4. Di “maye tişte”ê de dibe ku “jê” hatibe hezifkirin li gorî vê şîroveya hanê ev îcaz e.

Goti Adem: “-Ya Îlahî qenc e bê**Bête tiliyan her çi maye, min divêt”**

“Hz. Adem (a.s) got ku “Ya Rebbî tiştê ji vê nûrê maye, ez dixwazim were tiliyên min û ewê baş bibe.”

1. Di rista (şetra) dudiyar de îcaz heye. Lewra “tilîyan” eslê wê “tilîyên min” e.

2. Di vir de “ya îlahî” ji bo diayê ye.

3. Di “her” de tekîd heye.

Nûra Bûbekrî di wustayê û 'Umer

Di binser û 'Usman di xinser musteqer

"Nûra Ebû Bekir di tiliya navîn a 'Umer di kêleka wê de ku ji re tiliya babelîçkê tê gotin 'Usman di a biçûk de bi cî bû (Nûra Hz. Pêxember jî di şehadetê de çawa ku berê derbas bû)"

1. Di "nûra Bûbekir"ê de îcaz heye. Lewra "bûbekir" eslê wê Ebû Bekr e.
2. Di "musteqer" de îcaz heye. Lewra eslê wê "musteqer bû" ye.
3. Bêjeyên "'Umer, xinser, binser û musteqer" ji aliyê deng de li hev tên. Lewra hinek tîbê wan tekrar in yan jî nêzîkî hev in. Ji sedem vê taybetîyê li vir îtilafu'l-lefz heye.
4. Di navbera "xinser û binser"ê de cînasa naqis heye.

Hate îbhamê dibên Nûra 'Elî

Şu'le da tilyan û cennet muncelî

"Dibêjin nûra Hz. Elî ji piştî Hz. Ademî hat tiliya serî û tiliyên wî biriqîn û di wan de cenet derket holê."

1. Di "îbham"ê de îcaz heye. Lewra mebest jê "tilya îbhamê" ye.
2. Di "Hate îbhamê dibên Nûra 'Elî"yê de qelb heye. Lewra ev hevok bi awayekî rast "Dibên nûra Elî hate tilya îbhamê" ye.
3. Di "dibên"ê de îcaz heye. Lewra kirde ku ev jî "ew" e hezif bûye.
4. Di "cennet muncelî"yê de mecaza mursel heye. Lewra tilî bûye sebebê derketina cenetê.
5. Di "cennet muncelî"yê de dibe ku şibandin hebe. Lewra li gorî vê şîroveyê hevok "Ew nûr wek cenetê derket holê" ye.

Hati Hewwa û nezer da nûra saf**Gotî: “- Ya Adem çî nûr e pir şefaf?”**

“Hawwa hat û li nûra Hz. Pêxember mêze kir û got: ku “Ya Adem ev çî nûreke paqij û safî ye.”

1. Di te‘bîra “nezer da”yê de îstîfare heye. Lewra mebest jê “mêze kir” e. Di vir de mêzekirin hatiye şibandin bi dayînê. Lêbelê muşebbeh nehatiye zikirkirin. Muşebbehun bîh hatiye bilêvkirin.

2. Di “nûra saf”ê de îtnab heye. Mebest jê îcrakirina hunerê îxalê ye. Bi îxalê wate hatiye tekîdkirin. Lewra nûr jixwe safî ye. Îhtîyaca wê bi bal bêjeya “saf”ê ve tune ye. Lêbelê ji bo tekîdê hatiye bikaranîn.

3. Di “çî nûr e pir şefaf” de pirs ji bo teeccûbê ye.

4. Bêjeya “pir” îtnab e. Ji sedem tekîdê hatiye bikaranîn.

5. Di hinek nusxeyan de di dewsa “pir” de “ho” derbas dibe. Li gorî me, bejeya “pir”ê li vir be, baştir dibe. Lewra ji aliyê Kurdî bikaranîn nayî û wate nayê famkirin. “Ho şeffaf” yanê “ew şefaf e” dibe. Lê ev hevok Erebi ye û pêwîstî bi bal wê ve tune ye. Lê “pir” be, “wê gavê wateya “gellek û zêde” ye. Ji bo şefafê dibe tekîd.

Gote: “- Nûra yek nebiyyê mezin e**Seyyîd û hem serwerê nesla min e.”**

“Hz. Adem (a.s) got ku eva hanê nûra nebîyêkî mezin e û ew mezin û serokê nesla min e.”

1. Di bêjeyên “seyyîd” û “serwer” de îtnab heye. Lewra wateya wan nêzîkî hev e.

2. Di vir de ji bêjeya “yek”ê “rûmetdayîn ji bo Hz. Pêxember tê famkirin.”

3. Di bikaranîna bêjeya “hem”ê de tekîd heye.
4. Di “nesla min e” de mecaza mursel heye. Lewra mebest jê yên ku bawermend in. Yên baweriya wan bi Xwedê tune ne, eleqeya Pêxember (s. x. l.) jî bi wan tune ye. Di vir de bende hatiye zikirkirin. Lêbelê mebest jê cuz e.
5. Li vir bêje ji alîyê deng û wateyan ve li hev dikin. Ji ber vî tiştê hanê li vir î’tîlafu’l- me’na û lefz heye.
6. Di hinek nusxeyan de li dewsa “serwer”ê de “mezin” an jî “mazine” hatiye.
7. Hatina “û” û “hem”ê wate tekîd kiriye. Lewra wateya wan wek hev e.

Çûnkî bê emrî ji Adem bû zîhar

Nûr ji eniyê hate piştê bû sitar

“Gava bê emrîya li hember Xwedê ji Hz. Adem (a.s) çêbû, nûra Muhammedî ji eniyê Adem hat ket piştê Adem.”

1. Di peyva “sitar”ê de mecaza mursel heye. Lewra sitar bi îsmê failtî tê bikaranîn. Lêbelê di vir de bi îsmê mefultî hatiye bikaranîn. Yanê wateya wê “ku tiştan vedişêr” e. Lêbelê di vir de wateya wê “hat veşartin” e. ‘Eleqeya wê mef’ûlîyet e.
2. Peyva “çûnkî”yê Farisî be, wateya wê “gava ku” ye. Ev bêje dibe ku Tirkî be. Wê gavê wateya wê “lewra” ye. Ji sedem ku ev her du îhfîmal hene, bi qenaeta me hunera tewcîhê tê de heye.
3. Dibe ku bêjeya “sitar”ê mesder be û bê armanca îsmê mefule hatibe bikaranîn.

Nê ji darê xwarin her dukan şîrîn

Hulleyê cennet ji bejnê da firrîn

“Bêguman gava wan ji dara qedexe xwar, kincên wan ên cenetê ji bejna wan firîya an jî hat xwarê.”

1. Daçeka “nê”yê ji bo tenbîhê ye. Wate hatiye tekîdkirin. Dibe ku “nê” ji bo tefsîlê be jî.

2. Di bêjeya “dar”ê de îcaz heye. Lewra mebest jê “dara qedexe” ye. Bêjeya “qedexe”yê teqdîrkirî nebe, wateya hevokê xera dibe.

3. Di vê malikê de telmîh bi bal ayeta jêrê ve heye.

فَلَمَّا ذَاقَا الشَّجَرَةَ بَدَتْ لَهُمَا سَوْآتُهُمَا وَطَفِقَا يَخْصِفَانِ عَلَيْهِمَا مِنْ وَرَقِ الْجَنَّةِ

“Gava ji fêkîyên darê tam kirin, ewretê wan ji wan re zahir bûn wan ewretê xwe bi pelê darên cenetê veşartin.” (el-‘Erâf, 22).

4. Di peyva “şîrîn” de mecaza mursel heye. Lewra mebest ji “şîrîn” riza ye. Sebeb hatiye qesdkirin, lêbelê musebbeb hatiye zikirkirin.

5. Di “bejnê”ê de mecaza mursel heye. Lewra cuz hatiye mebest jê kull e.

6. Di bêjeya “şîrîn” de dibe ku îstîfare jî hebe. Lewra razîbûn hatiye şibandin bi şêrînbûnê.

7. Di “hulleyê cenetê” de îdafeya zerfîyye an jî îdafeya lamîyye ye. Lewra mebest jê “ hulleyê di cenetê de” ye an jî “hullê xasê cenetê” ye.

8. Di “hulleyê” de mecaza mursel heye. Lewra hulle xas e û mebest jê umûm e ku ew jî kinc hemû ye.

9. Di navbera “firîn” û “şîrîn”ê de jî cînasa naqis heye.

10. Di bêjeya “firîn”ê de îstîfereya tesrîhîyye ve tebeîyye heye. Lewra ketina kincan ji wan, hatiye şibandin bi firandinê. Wechê şebah di her duyan de jî “zûbûn” e.

11. Di “ji bejnê da firîn”ê de kînaye heye. Lewra ji bo vê te’bîra hanê îhtîmala du wateyan hene. A yekem ku heqiqeten kinc firîyan be. A duyem jî “tazî man, bê kinc man” e.

Îhbîtu mînha cemî’en hati emr

Adema dê bêyeve lêkin bi sebr

“Emr hat got: “bi hev re jê derkevin herin xwarê” û ji Adem re hat gotin ku hûnê werin cenetê. Lêbelê bi sebrê hûnê bi zivirin bi bal cenetê ve.”

1. “Îhbîtu mînha cemî’en hati emr” ji ayeta jêrê îqtîbas e.

فُلْنَا اهْبَاطُوا مِنْهَا جَمِيعًا فَإِمَّا يَأْتِيَنَّكُمْ مِنِّي هُدًى فَمَنْ تَبِعَ هُدَايَ فَلَا خَوْفٌ عَلَيْهِمْ وَلَا

هُمْ يَحْزَنُونَ

“Me got ku hûn ji wira bi hev re werin xwarê, ger hîdayetek ji min bighêje we û kî ji we guhdarî hîdayetê bike, ji bo wan tirs û mehzûnîyet tune ye.” (el-Beqere, 38).

2. Di rista (şetra) dudiyan de mecaza mursel heye. Lewra Hz. Adem hatiye zikirkirin. Lêbelê hatina cenetê ji bo nesla wî hemûyan e. Bi şertê ku tabê hidayete bin.

3. “Adema” însa ye. Lewra elîfa li dawîya Adem elîfa nîdayê ye.

4. Di “lêkin bête sebr”ê de îstîdrak heye. Lewra piştî “bêyeve”yê zivirandina însan bi awayekî zû bi bal cenetê tê aqilê mirovan. Ji bo ev fêhma hanê bê rastkirin bêjeya “lakîn bi sebr” hatiye bikaranîn.

Der Serendîbê bi erdê ket girî

Çendî sêsed sal û rohnîk bûn herî

“Li Serendîbê hate xwarê û girîya, sêsed salan girî û histirkên çavê wî ax kir herî.

1. Di “Serendîbê bi erdê ket girî”yê de tewcîh heye. Lewra îhtîmal heye ku du wate ji vê hevokê re hebe. Yek jê ku “ku Hz. Adem li Serendîbê hatiye ser rûyê erdê û girîya” ye. A din jî “li Serendîbê girî bi erdê ket” e. Li gorî wateya yekem li vir îcaz heye. Ji sedem ku gihanek “û” ye nehatiye gotin. Li gorî wateya duyem “girîyê Hz. Adem hatiye şibandin bi agir. Lê muşebbehun bîh nehatiye gotin muşebbeh hatiye gotin. Girî muşebbeh û agir muşebbehun bîh e. Bi erdê ket jî aidê muşebbehun bîhê ye. Ji sedem vî tiştê hanê li vir îstîareya texyîliyye û meknîyye heye.

2. Di “bi erdê ket girî” de dibe ku mecaza mubalexeyê hebe. Wê gavê ji ber poşman bûn û girîngîyê bandora girîne pir zêde dibe. Her wekî girî li hemû rûyê cîhanê derketibe holê.

3. Gava ku em bibêjin di şetra yekemê de tewcîh heye, mecaza mursel an jî mecaza aqlî jî tê de heye. Lewra erd nagirî. Lê yê ku di wê erdê jiya ye, ew digrî. Li gorî vê şîrovê mecaza mursel heye. Mehel hatiye zikirkirin. Lêbelê hal hatiye qesdkirin. An jî sebeb zeman fiil hatiye îsnadkirin bi bal wî tiştê ku fiil ne aidê wî ye.

4. Di “rohnîkê wî” de mecaza mursel hatiye. Lewra mebest ji rohnîka “hêsirên çava” ne.

5. Nîvê duyem wek hevoka fêslê ye. Lewra ew cewab e ji bo pirsê ku têkilîya wê bi hevoka berê re ye.

6. Di “rohnîkê wî” de îcaz jî heye. Lewra wateya vê hevokê bi awayekî temam “rohnîkê wî bû sebebê çêbûna herîyê” ye.

7. Di “rohnîkê wî bûn herrî” de dibe ku mecaza mursel hebe. Wê gavê eleqa mecaza îtîbar ma yekûnu ye.

8. Di hinek nusxeyan de di dewsa “çend salan” de “çend sêsed salan” hatiye. Ji sedem mubalexeyê sêsed salan baştir e.

Rohnikê wî şîn kirin dar û nebat

Çûn di erdê da du pa û mayi mat

“Hêsirên çavê wî dar û giya şîn kirin, gava her du lingên wî di heriyê de ku ji sedem hêsrên wî çêbûbû çû xwarê, şaş ma.”

1. Di vir de mecaza aqlî heye. Lewra hêsirên çavan tiştan şîn nake. Lê av şîn dike.
2. Di vê şetra dawîyê de dibe ku kînaye hebe. Ji wê wateya haqîqî û mecazî jî dibe ku hatibe qesdkirin.
3. “Çûn di erdê da û pa”yê de îcaz heye. Lewra eslê wê “paye wî” ye.
4. Di navbera “dar” û “nebat”ê de xusûs û umum heye. Lewra dar bi xwe jî nebat e.
5. Bi bêjeya “du”ê îtnab hatiye îcrakirin.
6. “mayî mat” ji heyret mayîne kînaye ye. Li vir cînasa naqis jî heye.

Pir girî û xweş girî bê hed gellek

Newheê “inna zelemna” çû felek

“Pir û xweş girîya, qîrîna wî ya ku digot “bêguman me li nefsa xwe zilim kir” gihîşt asîmana.”

1. Di “pir girî û xweş girî” de bi du awayî îtnab hatiye îcrakirin. Yek jê tekrara lefzê ye ya din jî tekrara wateyê ye. Di vê tekrarê de wate hatiye tekîdkirin. Lewra wateya “pir” û “xweş”ê wek hev e.
2. Di “newheê inna zelemna” de, îcaz heye. Lewra di vir de mebest ji vê hevokê “newheê (girîna) wî kesî digot inna zelemna çû felek” e. Çawa ku jê vê şîroveyê jî tê famkirin di vir de mudafun îleyh, mewsûl û sila wî hezif bûye.

3. “Newheê “inna zelemna” dibe ku îdafeya beyanîyye be. Lewra newhe wek tiştêk ji inna zelemna ye. Eger “inna zelemna” ji newheê re wek cins bê qebûlkin.

4. Di “bê hed” de mubalexe heye.

5. Bi hevoka “inna zelemna” hunera îqtîbasê hatiye bikaranîn. Lewra ev hevok ji ayeta jêrê hatiye girtin. Dibêjekî Hz. Adem û Hewwa gotin

قَالَا رَبَّنَا ظَلَمْنَا أَنفُسَنَا وَإِنْ لَمْ تَغْفِرْ لَنَا وَتَرْحَمْنَا لَنَكُونَنَّ مِنَ الْخَاسِرِينَ

“Gotin “Ey Rebbê me! Bêguman me li nefsa xwe zilim kir, Eger tu efû neki û li me neyê rehmê, bi emê bibin wan kesên ku ehlê zerarê ne.” (el-Erâf,23.) Çawa ku ji ayetê tê famkirin di vira de îqtîbas heye.

6. Di “felek” û “gellek” de cinâsê naqis heye.

Rojekê ew der sucûdê bê mefer

Pirr girî û hem li erşî kir nezer

“Rojekê wî secdeke wer kir ku qet nexwest terka wê bike jê bireve an jî jê re ciyek bibe qerar û xwe bispêrê nemabû û pê re jî gellek girîya û li ‘Erşê Xwedê mêze kir.”

1. Di “der sucûd”ê de îcaz heye. Lewra bêjeya “de” ketiye.

2. Di “bê mefer”ê de kînaye heye. Lewra “bê rev” dibe û “secdeyeke dirêj, jê nerevîya” an jî “ji xeynî Xwedê tiştêk xwe bispêrê nema” be. Li vir tevî wateya rasteqîn wateya mecazî hatiye qesdkirin.

3. Di “pir girî”yê de mubalexe û tekîd heye.

Dît nivîsî “La îlahe-îlallah”

Ba Muhemmed ba Resûlellahê Şah

“Dît ku li ‘Erşê Xwedê *إِلَّا اللَّهُ مُحَمَّدٌ رَّسُولُ اللَّهِ* hatiye nivîsandin.”

1. Di hevoka لا إله إلا الله ' de îqtîbas heye e. Ev hevok di Qûrânê û hedîsan de derbas dibe.

فَاعْلَمْ أَنَّهُ لَا إِلَهَ إِلَّا اللَّهُ

"Tu zanibe ku ji Ellah pê ve tu Xweda tune ye." (Muhemmed, 19).

2. Di hevoka "Ba Muhemmed ba Resûlellahê Şah"ê de jî îqtîbas heye. Lêbelê guherandin hatiye çêkirin di ayetê de.

مُحَمَّدٌ رَسُولُ اللَّهِ

"Muhemmed qasidê Xwedê ye." (el-Feth, 29).

3. Di vê malikê de hunera qelbî ya mekanî heye. Lewra ev malik bê qelb pêwîst e ku *"Dît ba Muhemmed ba Resûlellahê Şah La îlahe îlle Ellah dinivîsi"* be. Çawa ku dîtîn bi vî awayî nîne.

4. Bi tekrara "ba"yê wateya hevokê hatiye tekîdkirin.

5. Bi bêjeya "şah"ê îtnab bi'l-îxal hatiye îcrakirin. Lewra bêyî wê jî wate temam dibe. Lêbelê helbestvan ev bêjeya hanê bi kar anîye. Di methê de mubalexe kiriye.

6. Dibe ku di "resûlellahê şah" de şibandin hebe. Li gorî vê şîroveyê gihaneka şibandînê nehatiye bilêvkirin.

7. Bi bêjeya "şah"ê dibe ku muşakele hebe. Lewra tu eleqeya Pêxemberê Xwedê bi şahîtiyê ve tune ye.

Got: "Bi heqqê an Muhemmed key te neqş"

Wî kirî ba îsmê xwe ber saqê 'erş

"Got: "Bi xatirê Wî Muhemmedê ku te ew li Erşê xwe bi navê xwe re nivîsandîye"

1. Di te'bîra "heqqê an Muhemmed" de tekîd heye.

2. Di bêjeya "neqş"ê de tewcîh heye. Lewra jê du wate tê famkirin. Yek jê nivîsandin; a din jî tezyîn e.

3. Di "saqê erş"ê de dibe ku kînaye an jî îstîiare hebe. Li gorî şîrovekirinê ye. Mebest jê terafê Erş be, îstîiare heye. Dibe ku

mebest jê “dâim navê Pêxember bi navê Xwedê re” be. Wê gavê kinaye jî dibe.

4. Di şetra dawîyê de îcaz heye. Lewra wateya wê “te ew kiriye” ye.

5. Di “ber saqê erş” de îstîfare heye. Lewra saqê erş tune ye . Lêbelê alîyê erş heye.

6. Di bêjeya “neqş”ê de qelba mekanî heye. Lewra cînava “wî”yê di navbera wê û lêkerê de ye.

Tu bi xufranî min ê bêçare ah!

Hatê Cebraîli ba emrê Îlah

“Tu min ê biçare û perîşanî efû bikî. Hz. Cebraîl bi emrê Xwedê hat.”

1. Bêjeya “ah” dibe ku kînaye be ji perîşanî yê û dibe ku îcaz hebe. Wê gavê “poşîman im ji bo ew zemanê vala derbas bû” wate ye ji bo bêjeya ahê.

2. Bi bêjeya “ah”ê em dikarin bibêjin ku nazim bêçaretîya xwe û muhtabûna xwe ya bi bal efwa Xwedê tekîd dike.

3. Mebest ji nîvê yekem dia ye û zahirkirina zeîftîyê ye.

4. Te’bîra “bi xufranî”yê di hinek nusxeyan de bi xefrînî hatiye. Bi xufranî navdêr e lêbelê wateya wê wateya lêkerê ye.

5. Di vir de “bêçare” sifet e û ji bo yên rehmî lê bê kirin hatiye bikaranîn.

Ser hilîne, Adema! 'Efwa Celîl

Bo te hat û rabe ey zîba cemîl!

“Ey Adem! Serê xwe bilind ke, Ey însanê xweşik û rind ‘efwa mezin ji bo te hat.”

1. Di “ser hilîne” de dibe kînaye hebe. Lewra dibe ku mebest jê “ji xetayê xwe şerm neke” be jî.
2. Di “Adema”yê de nîda heye. Lewra “elîfa dawîyê ji bo nîdayê ye.
3. Di “rabe”yê de jî dibe ku kînaye hebe. Lewra wê demê mebest jê dibe ku ji sedem xetayê xwe rûnenê û xwe nede goşeyekî, tevbe bike be. Wateyek din jî rabe ser lîngan e.
4. Di “ewfa celîl” de îtnab heye.
5. Di “ewfa celîl” de dibe ku tewcîh hebe. Lewra li vir “celîl” dibe ku sifetê ‘efwê be û dibe ku sifetê Xwedê be jî.
6. Di “zîba cemîl”ê de kînaye heye. Lewra sifet hatiye zikirkirin. Lêbelê mewşûf ku Hz. Adem e hatiye qesdkirin.
7. Di “zîba cemîl”ê de îtnab jî heye. Lewra wateya wan eynî ye. “Zîba” bi Farisî ye û “cemîl” jî bi Erebî ye. Bêjeya dudiyar wateya yekem bi hêz dike.
8. Di “celîl” û “cemîl” de cînasa naqîs heye.

Hurmata navê Muhemmed an Resûl

Tewbeya te bû qebûl û her qebûl

“Bi xatirê rûmeta navê Resûlê Xwedê Muhemmed (s.x.l.) tewba te qebûl bû û her tim ewê qebûl be jî.”

1. Di şetra dawîyê de ku “bû qebûl her qebûl” de bi mebest tekîdê îtnab heye.
2. Di “hurmeta navê Muhemmed”î de îcaz heye. Lewra mebest jî “bi hurmeta gotina te navê Muhemmed” e.
3. Ji bo tekîdê “Muhemmed an Resûl” de her du bi hev re hatine gotin.
4. Di cînavka “an”ê de te’zîm heye.

Mijara Şeşem: Întiqala Nûra Pêxember**Çûn ji Adem nûra Ehmed bû cuda****Hate pişta Şîsê burhanu'l Huda**

“Gava nûra Hz. Muhemmed (s.x.l.) ji şexsê Hz. Adem (e.s.) derket, hate pişta Şîsê ku ew delîlê qet’î ye ji bo hîdayeta mirovan an jî çû pişta Hz. Adem û pêxemberên din.”.

1. Di navbera “hudâ” û “cuda”yê de cînasa naqis heye.
2. “Burhanu'l-huda” de îdafeya lamîyye heye. An jî îstîareya meknîyye û texyîlîyye heye. Lewra lamîyye be wateya wê dibe “delîla hîdayetê.”
3. Dibe ku “burhanu'l-huda” ji bo pêxemberan kînaye be. An jî sifet be ji bo Hz. Şîs.

Hate eslabê butunên tahîr e**Qet nebû yek jê, xerab û facîr e**

“Nûra Hz. Pêxember hat ket pişt û rehmê wan kesên ku ji xerabîyê dûr bûn û di nav wan de kesekî nebaş û fasiq tune bûn.”

1. Di lêkera “hate”yê de îstîareya tesrîhîyye û tebeîyye heye. Lewra “hate” di dewsa lêkera “kete”yê de hatiye bikaranîn.
2. Di hinek nusxeyan de di navbera eslab û butûnê de herfa gihanekê nehatiye. Li gorî van nusxeyan îcaz heye.
3. Di hinek nusxeyan de di dewsa “butûn”ê de “butûnên” hatiye. Di vir de qertafa pirjimarîyê zêde ye. Lewra “butûn “bi xwe bêjejeke pirjimar e.
4. Di peyva “eslab”ê de mecaza mursel heye. Lewra mebest ji “eslab”ê bav û kalên Hz. Pêxember in.

5. Di bêjeya “butûn”ê de îcaz û mecaza mursel heye. Di vir de mebest ji butûnê rehmên dayik û pîrikên Hz. Pêxember in. Eslê wê “rehmên dayikên Hz. Pêxember” e.

6. Di peyvên “xerab” û “facîre”yê de îtnab ji bo tekîdê hatiye îcrakirin. Lewra wateyên wan pir nêzîkî hev in.

7. Di te’bîra “qet nebû yek”ê de bi mebest tekîdê îtnab hatiye îcrakirin.

8. Di berîya eslabê de daçeka “ji”yê ketiye. Ji sedem vê xalê di vir de îcaz heye.

Fewqê 'Ednan ta ji Adem îxtîlaf

Tê heye lew bê tîfaq e ew mesaf

“Ji ‘Ednan heta Hz. Adem (e.s.) di derbarê bav û kalên Hz. Resûlullah de îxtîlaf heye, lewra di vê xususê de îtîfaq çênebûye.”

1. Di bêjeya “fewq”ê de îstîare heye. Lewra mebest jê “berîya Ednan”ê ye.

2. Bi hatina “ji”yê di berîya Adem de qelb her wekî hatibe îcrakirin. Lewra “ji fewqê ‘Ednan heta Adem” bibûya xweştir dibû.

3. Bi hevoka “lew bê tîfaq e ew mesaf” fesil hatiye îcrakirin. Lewra wateya wê wek hevoka berîya wê ye. Her du jî eynî tiştî dibêjin. Lêbelê yek erênî ye yek jî neyînî ye. Li vir îhtîmala tezyîlê jî heye. Lewra nîvê duyem ji nîvê yekem re wek tekîdê tê xwanêkirin.

4. Di hinek nusxeyan de di dewsa “ji”yê de “bi” hatiye bikaranîn. Li gorî qenaeta me di vir de “ji” were ji “bi”yê çêtir e.

5. Di hinek nusxeyan de di dewsa “ew”ê de “ev” hatiye bikaranîn.

Jêrê Ednan ta bi 'Ebdullah guhist**Bîst û yek bab in, hemî rast û durist**

“Ji ‘Ednan ber bi jêrê heta bigihêje ‘Ebdullah bîst û yek bav in. Bi awayekî rast û durist derbarê hemûyan de agahî heye.”

1. Di bêjeya “jêr”ê de îstîare heye. Lewra zemanê ji Ednan heta Ebdullah hatiye şibandin bi ciyê serberjêr.
2. Lêkera “guhîst”ê bi wateya “gihîşt” e û “guhest” be wateya wê “heye” dibe. Li gorî vê şîroveya hanê li vir teshîf heye.
3. Di “hemî” de tekîd heye.
4. Bi hev re hatina “rast û durist” de bi hev re de îtnab heye. Lewra yek ji wan kafî ye.

Hin yekî ‘Ednan û Me’d û hem Nizar**Mudr û Ilyas in, bizan ey goşidar**

“Ey guhdar! Tu wan ‘Ednan û Me’d û Nizar û Mudr û Îlyas bizanibe.”

1. Bêjeya “hin” îhtîmal e ku ji bo tefsîlê be û bi wateya “evana” jî be û di hinek nusxeyan de “hên” hatiye nivîsandin.
2. Bi “hem”ê wate hatiye tekîdkirin.
3. “Ey goşidar” îtnab e. Lewra ew tune be jî, ji alîyê wateyê ve kêmanîyek çênabe.
4. Li vir nîda dibe ji bo hişyarkirin an jî ji bo bala xwendevan bê kişandin bi bal meselê ve.
5. Di hinek nusxeyan de di dewsa “yekî” de bêjeya “belî” hatiye.

Mudrîke paşê Xuzeyme, taze 'eyş

Hem Kenan e, paşê Nêdrê bû Qureyş

“(Kalên Hz. Pêxember) Mudrîke ye di dû re Xuzeymeyê ku xwedîyê jiyaneke xweş bû. Dû van de jî Kenan li dû wî jî bavê Qureyş Nêdr e.”

1. Di vê malikê de îcaz heye. Lewra gihaneka “û”yê nehatiye gotin.
2. “Taze ‘eyş” îşaret e bi bal başbûna heyata Xuzeyme.
3. Di “Bû Qureyş” de îcaz heye. Lewra eslê vê te’bîrê “Ebû Qureyş” e.
4. Bêjeya “paşê”ê hatiye tekrarkirin.
5. Di vê malikê de îcaz heye. Lewra qertafa pêveberê hezif bûye.

Malik û hem Fehr û Xalib hem Lu’ey

Ke’b û Murre hem Kilab û hem Qusey

“Bi awayekî bi tenzîm kalanan Hz. Pêxember Malik û Fehr û Xalib û Luey e û Ke’b û Murr û Kîlab e, yê dê jî Qusey e.”

1. Bêjeya “hem”ê tekrar bûye ji bo tekîdê an jî bo weznê. Lewra ew neyê jî herfa gihanekê ku “û” ye li vir hatiye.
2. Li ciyê ku gihanek nehatiye dibe ku “hem” gihanek be.
3. Di vê malikê de jî qertafa pêveberê hezif bûye.

Hem ji pişta wî Quseyyê pak û saf

Ew emanet hate nik 'Ebdulmenaf

“Nûr ji pişta Quseyyê pak û temiz, hate pişta ‘Ebdulmenaf.”

1. Dibe ku di “pişta Qusey” de mecaza mursel hebe. Lewra çawa di malika li dû de jî derbas dibe, di dewsa piştê de li vir hatina “nik” jî durist e.

2. Dibe ku “ew” ji bo te’zîmê hatibe bikaranîn.
3. Di peyvên “pak” û “saf”ê de îtnab heye. Lewra wateya wan yek e. Îtab ji bo bihêzkirina wateyê hatiye îcrakirin.
4. Di peyva “emanet”ê de îstîfare heye. Lewra Hz. Resûlullah hatiye şibandin bi emanetê.

Hem ji nik 'Ebdulmenaf ew muxtefî

Hate pişta Haşim ew Nûra sefî

“Ji cem ‘Ebdulmenaf ew nûra veşartî hate pişta Haşim ew nûra temîz û paqij.”

1. “Ew muxtefî” ji nûra Hz. Pêxember kînaye ye.
2. “Ew nûra sefî” ji bo “ew muxtefî” tekîdê û îzahê ye. Ji sedem vê şîroveya hanê li vir îzah be’de’l-îbham heye.
3. “Ew” hatiye tekrarkirin bi tekrarê balkişindin û tekîd çêbûye.
4. “Nûra sefî” telmîh bi bal hedisa jêrê ve
 إن الله اصطفى من ولد آدم “Heqîqeten di navbera zarokên Adem de Xweda min neqand.”

Hem ji Haşim bû emanet munqelib

Hate bû mêhvanê 'Ebdulmuttelib

“Ew emanetê ku nûra Hz. Pêxember e ji cem Haşim hat bû mêhvanê ‘Ebdulmuttelib”

1. Di peyva “emanet”ê de îstîfareya tesrîhiye heye. Lewra mebest ji emanetê nûra Hz. Pêxember e, ew hatiye şibandin bi emanetê. Bi vê îstîfareyê hatiye diyarkirin ku “Hz. Pêxember her daîm di bin mihafaza Xwedê de bûye.” Wekî din jî ji vê îstîfareyê tê famkirin ji bav û dêyan pirtir alîyê nubuvvetê hertim pêşda bûye ji bo resûlê Xwedê.

2. Di “munqelib”ê de îstîareya tebeîyye û tesrîhiyye hatiye îcrakirin. Lewra muşebbeh ku ew jî munteqil e hezif bûye û bi munqelibê hatiye şibandin.

3. Di bêjeya “mêhvan” de jî îstîare heye. Mebest ji vê peyvê ku ketina nûrê piştta ‘Ebdulmuttelib e. Wech-i şebêhê di vir de ne sekinandina li ciyekî û ghişîtina ciyê eslî ye. Ji peyva mêhvan em fêhm dikin ku nûra Hz. Pêxgamber di piştta bavan gişan de nesekinîye heta ku ghişîfîye Hz. Ebdullah.

4. Di nîvê duyem de îcaz heye. Lewra eslê wê “hat û bû mêhvanê Ebdulmuttelib” e.

5. Di nîvê yekem de di hevokê de qelb çêbûye. Lewra pêveber û du kirdeyan cî guherandine.

Silsila wî ta bi Adem da û bab

Pêkve dê biçne beheştê bê hîsab

“Nesla Hz. Pêxember, heta tevî Hz. Adem dê û bav wî ewê tev biçin cenetê.”

1. Di “silsila” wî de dibe ku îstîare hebe. Lewra li gorî vê şîroveyê mebest ji bêjeya silsileyê helqe û zincîr e. Li vir sulale an ji neseb hatiye şibandin bi silsileyê.

2. Di navbera “da” û “bav”ê de tîbaq an jî îhamu’t-tîbaq heye. Lewra îhtîmal bi jî, ji sedem van her du peyvên zidîtiyê tê aqilê însan.

3. Di peyva “pêkve”yê de îtnab heye. Lewra wateya wê ji hevoka berîya wê tê famkirin. Mebest ji anîna vê bêjeyê tekîd e.

4. Mebest ji lêkera “biçine”yê “ewê têkevinê” ye. Li vir mecaza mursel heye. Lewra sebeb hatiye qesdkirin. Lê musebbeb hatiye zikirkirin.

5. Di “bê hîsab”ê de mubalexe heye.

Mijara Heftem: Wîladeta 'Ebdullah**Hem ji 'Ebdulmuttelib bû hamîle****Fatîme hem muddeteş bû kamîle**

"Fatîme ji 'Ebdulmutellib bi heml bû û zemanê hemla wê تمام bû."

1. Di navbera peyva "kamîle"yê û peyva "hamîle"yê de cînasa naqis heye. Lewra tevî ku wateya wan cuda ye, lefzê wan bêyî herfekî hemû wek hev in.

2. Di peyva "muddeteş"ê de îcaz heye. Lewra wateya wê "mudetê hemleş" e. Li gorî vê wateyê diyar e ku tê de îcaz heye.

3. Di vê malikê de ji bo gihanekê an jî ji bo bihêzkirina wateyê gihaneka "hem" hatiye dubarekirin.

4. Mebest ji "kamîle" hatina dawîya zemanê hemlê ye, an jî neh mehê wê تمام bûye. Ev her du tişt jî wateya wan wek hev e. Li gorî vê şîroveya hanê li vir îcaz heye.

5. Di nîvê duyem de cînavka "eş" zaid e. Lewra berîya wê bêjeya "Fatîme"yê hatiye. Eslê hevokê "muddetê hemla Fatîme" ye.

6. Di vê malikê de qelba mekanî heye. Lewra "bû" berîya "hamîl" û "kamîle"yê hatiye.

Jê bû 'Ebdullah bi hukmê sabîqe**Nûrê Ehmed der cebîneş barîqe**

"Ji wê 'Ebdullah bi hukmê li cem Xwedê hat dinyayê. Di halê ku nûra Ehmed di eniya wî de dibiriqî."

1. Di risteya dudiyar de dibe ku em bêjin îstîfere heye. Lewra îhtîmal heye ku mebest ji "der cebîneş bariqe"yê bandor û tesîra nûra Muhemmedî be.

2. Li vîr em dikarin bibêjin "hukmê sabîqe" ji hukmê Xwedê kînaye ye.
3. Heke peyva "barîqe"yê bi "wek birûskê roni da" bê manekirin, wê gavê em dikarin bibêjin teşbîh heye.
4. Di hinek nusxeyan de li dewsa "nûrê" "nûra" hatiye. Ev jî nîşan dide ku ev bêje bi muzekker û muennestî tev hatiye bikaranîn.
5. Nîvê duyem ji ya yekem re wek hevoka halê ye.

Mezherê nûra Muhammed hate ew

Pak û nûrânî mueyyed hate ew

"Ebdullahê ku mezherê nûra Hz. Muhammed (s.x.l.) e hat. Ew bi pakîtî, bi nûrtî û bi alîkarîya Xwedê hat."

1. Mebeset ji nûrê dînê Îslamê be, îstîare heye. Lewra îslam hatiye şibandin, bi nûrê.
2. Di "pak" û "nûranî"yê de îtnaba bi îxal heye. Lewra nûr jixwe pak e.
3. "Hate ew" ji bo xurtkirina wateyê an jî ji bo weznê hatiye dubarekirin.
4. Dibe ku bi cînavka "ew"ê te'zîm an jî tekîd hatibe qesdkirin.
5. Di te'bîra "hate ew"ê de bal kişandin û tekîd heye.

Cubbeyê Yehya di Şamê da numûn

Sûfeke spî bû hemî têkda bi xûn

"Cubbeyê Hz. Yehya di Şamê de ji ber hatina Hz. Pêxember an jî ji bo hatina bavê wî bû mînak. Ew ji hirîya sipî bû û hemû bi xûn bû."

1. Di şetra yekem de du îcaz heye. Yek jê ketina peyva "bû" ye. A din jî "ji bo hatina Hz. Pêxember" e.

2. Di “sûfeke spî”yê de du îhtîmal hene. Ya yekem mecaza mursel e û li vir eleqa îtîbar mâ kane ye. Li gorî vê şîroveyê kinc hatiye qesdkirin lêbelê eslê kinc hatiye zikirkirin. Îhtîmala dudiyar şibandî e. Li gorî vê şîroveyê musnedun îleyh müşebbeh e nehatiye bilêvkirin. “Sûfeke spî” jî müşebbehun bîh e û daçeka têşbîhê jî nehatiye zikirkirin. Wateya hevokê “Ew wek sufekê spî bû” ye.

3. Li vir îcaz heye. Lewra di şetra dudiyar de “ew” ketiye. Li gorî maneyê eslê hevok “ew hemî têkda bixûn” e.

4. Di “hemî têkda” de xurtkirina wateyê heye.

5. Nusxeyên mewlûdê ji aliyê risteya duyem ji hev cuda ne. Risteya duyem di wan de bi çar awayan derbas dibe. Ya yekem: “Sûfeke spî bû hemî têkda bû xûn”, a duyem: “Sûfeke spî bû hemî têkda bixûn”, a sêyem: “Sûfeke spî hemî têkda bixûn”, ya çarem “Sûfeke spî hemî têkda bû xûn”. Li gorî van şeklan îcaz û musawat derdikeve holê.

Girti xûnê cubbeyê Yehya çû nar

Wê dema bûye şehîdê pêşîwar

“Cubbeyê Yehya (a.s.) bû wek tiştêkî pêtiyê agir bigre yan jî bû wek dara ku zû agir digre bi xûn bû û Yehya wê gavê bêguman bû şehîd, yan jî bû şehîdê pêşeng yan jî bû şehîdê ku ji dinê û malê tê de dur e.”

1. Di “girti xûnê” de îstîfare heye. Lewra “bi xûnê bû” hatiye şibandî bigirtina tiştêkî.

2. Di te’bîra “çû nar”ê de şibandî heye. Di vir de tê gotin ku “Bixîn bûna cubbeyê Hz. Yehya di sor bûn û geşbûnê wek pêtibûne agir bûyê.

3. Di peyva “bê şîwar” de tekîd heye.

4. Di nivê duyem de îcaz heye, lewra kirde nehatiye gotin.

5. Di hinek nusxeyan de di dewsa “bêşîwar” de “pêşîwar” hatiye. Wateya “bêşîwar” bêguman e. Ji bo pêşîwarê jî “pêşeng, pêşewa” hatiye gotin.

Hişki bû ew xûni borîn rozigar

Ta wucûdê ‘Ebdullahê namidar

“Ew xwuna li ser cubbeye Hz. Yehya (a.s.) rijiya heta hişk û zuwa ma heta Hz. Ebdullhê navdar hate dinyayê.”

1. Di nîvê yekem de îcaz heye. Lewra gihaneka “û”yê nehatiye.
2. Di nîvê yekem de îcaz heye. Lewra gihaneka “û”yê ketiye. Eslê hevokê “ew xuni hişk bû û rozigar borîn” e.
3. Rengdêra “namidar” ji bo pesnê ye.
4. Ji bêtîyê “wucûd”ê mebest hedes e.

Taze bû ew xûn û mercan bûne rêz

Rahiban go: ayiway exbari nêz

“Ew xwun ron bû wek hebên mercana dilop kir. Rahiban gava ev tiştên hanê dîtin, gotin xwelî li serê me be xeberên di derbarê hatina Muhemmed (s.x.l.) de nêz in.”

1. Di peyva “mercan”ê de îstîare heye. Lewra di vir de dilopên xwunê hatiye şibandin bi mercanan.
2. Di peyva “rêz”ê de jî îstîare heye. Ji sedem ku dilopkirina xwunê hatiye şibandin bi tiştên bi tertîb û sukunetê di sirayê de ne.
3. Di navbera “rêz” û “nêz” de cînasa naqis heye.
4. Di “ayê way” jî bo tekîdê hatiye tekrarkirin.

Weqt e rabit Ehmedê ‘alî ‘elem**Nasixê Tewrat û Încîl û senem**

“Zemanê hatina Ehmedê ku nav an ji ala wî bilind e û nasixê Tewrat û Încîl û putan e nêzîk bûye.”

1. Di lêkera “rabit”ê de îstîare heye. Lewra mebest ji “rabit”ê were ye. Li gorî vê şîroveyê “rabit” muşebbehun bîhh e û “were” jî muşebbeh e.

2. Di “ ‘elem” de tewcîh heye. Lewra ev peyv dibe ku bi wateya nav be. Dibe ku bi wateya alayê be.

3. Di “ ‘alî ‘elem” de îcaz heye. Lewra mebest jê “xwedîyê ‘alî ‘elem e.

4. Mebest ji “ ‘alî ‘elem”ê “ ‘elema ‘alî ye”. Ji sedem vî tiştê hanê li vir qelba mekanî heye. Bi te‘bîrek din sifet bûye hatiye îdafekirin bi bal mewsûfê xwe.

5. Di lêkera “rabit”ê de mecaza mursel heye. Lewra rabit wek sebebê ye; lê musebbeb hatiye qesdkirin ku ew jî lêkera “hate”yê ye.

6. Di peyva “nasix”ê de mecaza mursel heye. Lewra mubellîx hatiye gotin. Lêbelê mebest jê mubellex e ku ew jî Quran e.

7. “Tewrat” û “Încîl û senem”ê de mecaza mursel heye. Lewra meqsed ji van tiştan tiştên berîya Hz. Pêxember giş in. Di vir de xusus hatiye gotin lêbelê mebest jê ûmûm e.

Hat xudanê seyf û Fûrçana mubîn**Xûnê Yehya bû nîşana wî yeqîn**

“Xwedîyê şûr û Qurana aşîkar an jî tiştan aşîkar dike hat. Xûna Yehya (a.s) bi awayekî bêguman ji bo hatina wî elamet e.”

1. Di navbera bêjeyên "Our'an" û "seyf"ê de îhamu't-tîbaq heye, Lewra gava ku seyf bi Quranê re tê bikaranîn, zidiyet tê hişê mirovan.
2. Di "Xûnê Yehya" de îcaz heye. Lewra "herikandin" an jî "dilopkirin" hatiye hezifkirin.
3. Bêjeyên "furqan" û "seyf"ê her du cami' in. Ji bo îzahkirina Hz. Pêxember li hember însanan. Ji vir tê famkirin îslam zanebûn û hêz ji hev cudanekiriye.
4. Di bêjeya "mubîn" de jî îtnab heye. Lewra furqan jixwe, wateya "mubîn"ê dihewîne. Ev îtnab ji bo tekîdê hatiye îcrakirin.
5. Di hinek nusxeyan de di dewsa "furqan" de "Quran" hatiye û di hinek nusxeyan de jî di dewsa "wî" de "fî" hatiye.

Lêk vegêran hem soal û hem cewab

Way û weyla kefte nav ehlê kîtab

"Lêbelê rahiban bi pîrs û bersîvan bi hev re îstîşare kirin û ji sedem elametên hatina Hz. Pêxember musîbet û felaket ket nav ehlê kîtab."

1. Gihaneka "lêk" ji bo îstîdrakê ye.
2. Di navbera bêjeyên "soal" û "cewab" de tîbaq heye.
3. Di "way û weyla" de kînaye heye. Lewra di vir wateya heqîqî û mecazî tev bihev re mimkun e bê famkirin.
4. Di "vegêran" de dibe ku îstîfare hebe. Lewra mebest jê pîrskirina pîrsan û bersîv dayîna pîrsan be. Ev hal bi "vegêran"ê hatiye şibandin.
5. Dibe ku nivê yekem ji şevra bi hev re kînaye be.
6. Ji bo bihêzkirina wateyê gihaneka "hem"ê hatiye dubarekirin.

Wan yeqîn kir ‘Ebdullah hate wucûd

Ba ‘edawet qesd kirin qetla wî zûd

“Wan bi awayekî bêguman bawer kirin ku ‘Ebdullah hatîye dinyayê û bi neyartî zû xwestin ‘Ebdullah bikujin”.

1. Di bêjeya “wucûd”ê de mecaza mursel heye. Lewra umum hatiye gotin ku ew jî wucûd e. Lêbelê xas hatiye qesdkirin ew jî wîladet an jî ji dayikbûnê ye.

2. Dibe ku di vê malikê de îcaz hebe. Lewra li gorî vê şîroveya hanê “Gava” nehatiye gotin. Yanê “Gava wan yeqîn kir.”

Ehlê kîzb û ehlê zûr û îftîra

Çendi caran hatine Ummu’l-Qura

“Ehlê derew û buhtan û virran ku ew jî rahib bûn ji bo kuştina Hz. Pêxember çend caran an jî ji bo kuştina ‘Ebdullahî hatin Mekkeyê.”

1. Di şetrâ yekê de bi bêjeyên “kîzb” û “zûr” û “îftîra”yê îtnab hatiye îcrakirin. Ev her sê bêje wateya wan hev tekîd dikin.

2. Îdafeya ehlê bi bal tiştên li dû wê hatiye ya îdafeya zerfiyye ye. Bi wateya ku ew mirov di nav derew û îftîrayan de jî in ne. An jî di vir de îstîareya meknîyye heye. Li gorî vê şîroveyê kîzb, zûr û îftîra hatiye şibandin bi jîyanê an jî însanan, di dû re muşebbehun bîh mustearun minh nehatiye zikirkirin. Lêbelê ev her sê bêje hatine zikirkirin ku ev her sê jî mustearun leh yanê muşebbeh in. Piştî vê şibandin tiştêkî ku aîde mustearun minhu ye bi mustearun leh ve hatiye girêdayîn. Li gorî vê şîroveyê di ehlê kîzb û zûr û îftîrayê de îstîareya meknîyye û texyîlîyye heye.

3. Bêjeya “ehlê” hatiye dubarekirin.

4. Di “ummu’l-qura”yê de kînaye heye. Lewra sifet hatiye gotin. Lêbelê mebset jê mewsûf e ku ew jî Mekkeyê Mukerreme ye.

5. “Çendî caran” ji hejmaran kînaye ye. An jî hejmara xeyrê serîh e.

‘Ebdullah der hîfzê sultanê wedûd

Nûra Ehmed dafi’ê şerrê Yehûd

“‘Ebdullah di bin mihafezaya Xwedê de bû ku Xweda ji ebdên xwe pir hez dike û nûra Ehmed şerê Yehûdîyan ji Hz. ‘Ebdullah dûr xist.”

1. Di karanîna bêjeya “sultan”ê de muşakele heye. Lewra bêjeya “sultan”ê ji bo Xwedê nayê bikaranîn. Lêbelê ji sedem muşakeleyê ji Xwedê re ev bêje hatiye bikaranîn.

2. Di şetrê dawîyê de mecaza mursel heye. Lewra nûr bi xwe şerê Yehûdîyan ra nake. Lêbelê dibe ku bibe sebeb ji bo dûrketina şerê Yehûdîyan.

3. Bi bêjeya “der”ê tiştê hatiye hatiye tekîdkirin. Lewra di hundirê muhfaza Xwedê de ye û tişteki xerab nagihêje wî.

4. Nîvê malikê ya duyem, ji nîvê yekem re wek tekîdê ye. Lewra wateya her du nîva jî behsa parastina Ebdullah ji şerên Yehûdîyan e. Li gorî vê şîroveya hanê dibe ku li vir fesil hebe.

‘Ebdullah mazin bû ba naz û delal

Canê ‘Ebdulmuttelib ew mah û sal

“‘Ebdullah meh bi meh sal bi sal tevî ku wek rûhê Ebdulmuttelib bû bi nazikî û bi delaltî mezin bû.”

1. Di “ba”yê de mecaza mursel heye. Lewra di wateya xwe de nehatiye bikaranîn. Wateya wê di vir de “tevî, bi hev re”. Lêbelê wateya wê ya ku daîm pêre ye “cem” “hindê” ye. Sebeb

hatiye gotin, mebest jê musebbeb e. Di vir de “ba” di dewsa “bi”yê de hatiye bikaranîn. Lê dibe ku “ba” li gorî zimanê Farişî hatibe bikaranîn. Wê gavê wateya wê “pê re” ye û bikaranîna li vir ne mecaz e.

2. Di vê malikê de bêjeya “ba”yê bi wateya “li cem, hinde” be. Dibe ku “naz” û “delal” bi parastvan hatibe şibandin. Wê gavê li vir ji sebeb teşxîsê îstîare derdikeve holê. Yanê li cem naz û delalê mezin bûye. Naz û delal hatiye şibandin bi mirovekî pir bi merhemet, Vî merivî Ebdullah mezin kiriye. Di vir de ji bo nazikbûn û delalbûna Ebdullah mubalexe hatiye kirin.

3. Rista duyem dibe ku hevokek ser bixwe be. Li gorî wê şîrovê, em dikarin bibêjin di vê malikê de fesil heye. Lewra her du ristê jî hevokên, wateya wan munasibê hev e. Lê bi hev ve nehatine girêdan.

4. Di nîvê duyem de dibe ku îcaz jî hebe. Lewra “ew mah û salan wek canê Ebdulmuttelib bûn” dibe.

5. Di nîvê duyem de îhtîmala teşbîha belîx jî heye. Lewra we daçeka şibandinê û wechê şibandinê nehatiye zikirkirin.

6. Di “naz” û “delal”ê de îtnab heye. Lewra wateya wan wek hev e.

7. Di te’bîra “canê Ebdulmuttelib” de şibandin heye. Lewra wateya wê “wek canê Ebdulmuttelib” e.

8. Bêjeyên “mah” û “sal”ê dibe ku ji bo bêjeya “mazin”ê zêrf be û dibe ku ji nav nişana “ew”ê beyan be jî.

9. Di “mah” û “sal”ê de mecaza mursel heye. Lewra behsa cuz hatiye kirin. Lêbelê meqsed jê zeman gişe.

10. Di nîvê paşîn de îcaz heye. Lewra pêveber nehatiye gotin. Ku ew jî lêkera “bû”yê ye.

Xweşdivê babê 'ezîzê maderê

Rohniya malê û zîba esmerê

“Bavê wî pir jê hezdir û li bal dayika xwe jî hêja û bi rûmet bû, li malê wek çirayê malê ronî dikir û esmerekî xweşik bû.”

1. Di bêtîya “xweş” de îhtîmala mecaza mursel heye. Lewra mebest jê pir e. Tiştêkî baş pir be, netîce xweş dibe û tiştê pir nebaş be, netîce xerab dibe. Li gorî vê şîroveyê, pir sebeb e û xweş jî musebbe e. Mebest jê pir e.
2. Di nîvê yekem de giahneka “û”yê ketiye. Lewra eslê wê “xweşdivê babê û ‘ezîzê maderê” ye.
3. Di “rohnîya malê” de îstîfara heye. Lewra mebest ji rohnîyê ne tiştêkî maddîye. Belkî tiştêkî me’newîye. Lêbelê hatiye şibandin bi rohnîyê. Muşebbeh nehatiye bikaranîn.
4. Di vê malîkê de îcaz jî heye. Lewra bêtîyên “ew” û “bû” ketiye.
5. Di “zîba esmerê” de îcaz heye. Lewra mewsof nehatiye gotin. Eslê wê “rû zîba û reng esmerê” ye.

Şikl û sîma mîslê bedra asîman

Nazik û re’na û nûra xanedan

“Wechê û şeklê ‘Ebdullah wek hîva çarde şevî bû û ew delal û zerîf û rohnîya malê bû.”

1. Di “şikl” û “sîma” yê de îtnab heye. Lewra wateya wan wek hev e.
2. Di şetra yekemîn de şibandin heye. Muşebbeh şikl û sîma ye. Muşebbehun bîh jî bedr e.
3. Di “nazik” û “rena”yê de îtnab heye. Vê şîroveya hanê ku em bibêjin wateya wan yek e. Lê bêlê dibe ku re’na bi wateya bejin dirêjîyê be. Li gorî vê wateyê îtnab tune ye.

4. Di hinek nusxeyan de di dewsa “nazik”ê de, “nazil” hatiye nivîsandin. Lêbelê li vir bêjeya nazilê xweş nayê. Lewra ji alîyê wateyê xweş nîne.

5. Di “nûra xanedan”ê de îstîfareya tesrîhîyye û eslîyye heye. Lewra muşebbeh Ebdullah e. Muşebbehun bih jî nûr e.

6. Di bêjeya “xanedan”ê de tewcîh heye. Lewra mebest jê mala Ebdulmuttelib bitenê jî dibe hatibe qesdkirin û Benî Haşim û Qureyş jî hatibe, qesdkirin.

7. Di her du alîyên malikê de jî îcaz heye. Lewra kirde nehatiye gotin. Ku ew jî “Ebdullah” e an jî cînavka “ew”ê ye.

Dilber û mehbûb û şêrîn wek şeker

Her kesê ew dît û dil lê bû duker

“Ew pir tesîr li qelaban dikir û dihat hezkirin û wek şekir şêrîn bû û ki ew didît dilê wî ji sedem hezkirina wî dibû du parçe.”

1. Di vê malikê de îcaz heye. Lewra kirde nehatiye zikirkirin.

2. Di “şêrîn” û “şeker”ê de şibandin heye. Daçeka şibandinê “wek” e. Di hinek nusxeyan de “wek” tune ye. Wek tune be wê gavê em dikarin bibêjin bi mebset tekîd îtnab hatiye îcrakirin. Yan jî daçek nehatiye gotin û şibandin teşbîha muekked e. Lewra carnan daçeka şibandinê nayê gotin. Lêbelê daçek ji hevokê tê famkirin.

3. Di bikaranîna bejeyên “şêrîn” û “şeker”ê de dibe ku mubalexe jî hebe. Lewra wateya ku ji şekerê hatiye qesdkirin jixwe di bêjeya “şêrîn”ê de jî heye.

4. Di “her kesê”yê de mecaza mursel heye. Lewra ji malika di dû re de tê famkirin ku mebesta wî jê “keçên ereb û qureyşîyan” e.

5. Bêjeya “dilber”ê bi wateya “yê” ku qelban kaş dike bi bal xwe ve.” Li gorî vê şîroveyê bêjeya “dilber” îstîareya tebiyye heye. Lewra bandora lêkirin hatiye şibandin bi kaşkirinê.

6. Di “dil lê bû du ker”ê de kîneye heye. Lewra mebest ji vê te’bîrê hezkirin û evîndarî ye.

7. Di “dil bû du ker”ê de îstîareya murekkeb jî dibe hebe. Lewra mebest jê “her kesê wî dît pir jê hez kir” e.

Dohtê çakanê Qureyşî û ‘Ereb

Muntezir bûn pêkve bo wî roz û şeb

“Keçikên Qureyşî û Ereban yê xweşik û ezeb û ne ezeb hemû bi şev û roj li benda wî bûn.”

1. Di peyva “Ereb”ê de îtnab heye. Lewra piştî Qureyş ku xusus e Ereb hatiye ku ew jî umum e.

2. Di bikaranîna bêjeya “pêkve”yê de, tekîda şidandina wateyê heye. Lewra ew nehata bikaranîn jî wateya eslî kêma nedibû.

3. Di “dohtê çakan” de tetmîm heye. Lewra ev sifet tunebûya, wate evqas xweş nedibû û wate basît dima.

4. Di “bo wî”yê de îcaz heye. Lewra mebest jê “bo teklîfa zewacê li wan” e.

5. Di “roz” û “şeb”ê de tîbaq heye. Lewra di navbera her duyan de zidiyet heye.

6. Di “roz” û “şeb”ê de mubalexe jî heye. Lewra her gav li benda yekî ne mimkun e. An jî mecaza mursel heye. Li gorî vê şîroveyê mebest ji “roj û şev” temamê roj û şevê nîne. Belkî hinek jê ye.

Her yekê hêvî dikir ew bit qebûl**Ba yekê wî qet neda meyla wusûl**

“Her yekê ji wan keçikan hêvî dikir ku ewê ‘Ebdullah bi wê re bizewice. Lêbelê wî meyla xwe neda bi bal tu kesên ji wan.”

1. Di “her yekê” yê de îcaz heye. Lewra pêwîst e ku ev gotin “her yek ji wan” be.

2. Îhtîmal heye ku “bit qebûl” kînaye ji zewacê be û ihtîmal heye ku mebest jê wan hez bike û di netîcê de bi wan re bizewice be.

3. Di “meyla wusûl”ê de îstîfareya meknîyye û texyîlîyye heye. Lewra peyva “wusûl”ê hatiye şibandin bi însan. Di dû re jî lazîmê însan ku meyl e hatiye îdafekirin bi bal wusûlê ve.

4. Di “qet neda meyla wusûl”ê de îtnab heye. Lewra di cîyê vê hevokê de helbestvan kanîbû “meyl nekir” an jî “meyl neda” bi karbaniya. Lêbelê ji sedem weznê an jî ji sedem belaxetê hevok bi vî awayî bikaranîye.

5. Di “ba yekê” de îcaz heye. Lewra di vir de meqam meqamê ‘umûmê ye. Ji sedem vê xalê, pêwîste ku ev gotin “ba tu yekê” an jî “ba tu yekek ji wan” be.

6. Bi bêjeya “qet”ê mubalexe hatiye bikaranîn.

Bûdi aza ew ji fikira î n û an**Yumnê nûra Ehmedî bû pasîpan**

“Ew ji fikira zewaca bi vê re an jî wê re azad bû. Bereketa nûra Ehmed jê re bû mihafîz.”

1. Şetra yekem kînaye ye ji “ne tesîrkirina keçikên Qureyş û Ereban li ‘Ebdullah.”

2. Di “Yumnê nûra Ehmed bû pasîpan” de, mecaza aqlî heye. Lewra nûr bûye sebeb ji bo mihafaza ‘Ebdullah.

3. “În û an” kînaye ye ji keçikên Qureyş û ereban e an jî ji temamê jinan kînaye ye.
4. Di nivê yekem de daçeka “di” zaîd e. Li gorî vê şîroveya hanê “bû” Kurdî ye. Di hinek nusxeyan de di “bû di” û “bûd” hatiye nivîsandin. Wê gavê “bûd” Farisî ye; zaîd nîne. .
5. Risteya duyem wek hevoka fêslê xuya dike. Lewra risteya duyem ji bo pirsê “çawa azad bû”yê re her wekî cewabê ye.
6. Bi “yumn”ê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra nûr sebebê mihafazatîyê û yumnê tev e.

Rojekê wî gote babê ey emîr!

Sa’eta ez biçme Bethaya beşîr

“Rojekê ‘Ebdullah ji bavê Xwe ‘Ebdulmüttelîb re got ku “Ey mezinê Qureyşîyan gava ez diçim newala Mekkeyê ku mizgîna hatina Hz. Pêxember dide min. An jî gava bi şûrê xwe diçim newala Mekkeyê.”

1. Di “Ya emîr” de îcaz heye. Lewra eslê wê “Ya emirê Qureyş” e.
2. Di “Gote babê” de du îhtîmal hene. Yek jê ku “babê” jî munada be. Li gorî vê şîroveyê di vir de îcaz heye. Îhtîmala dudiyar bi wateya “ji bavê xwe re got” be. Li gorî vê jî, îcaz heye.
3. Dibe mebest ji bethayê derva yan jî ciyên vala be. Li gorî vê xalê di vir de mecaza mursel heye. Lewra xas hatiye gotin, mebest jê ‘umûm e.
4. Di hinek nusxeyan de di dewsa bêjeya “beşîr”ê de “sebîr” heye û di hinekan de jî di şuna “beşîr”ê de “be şîr” hatiye.
5. Gava “beşîr” be, em dibêjin li vir îxal heye. Lewra bi wê wate xweşîktir û bihêztir bûye. Bi îxalê re em dikarin bibêjin, li vir mecaza mursel jî heye. Lewra hatina Hz. Pêxember li wan deran wan kiriye wek ew kesên ku mizgîniyê dide. Mehel hatiye zikirkirin. Lêbelê bûyerên li vir hatine holê hatine qesdkirin.

6. Gava “be şîr” be. Wateya wê “şûr”e. Lewra hinek Kurmanc di dewsa şûrê de “şîr”ê bikar tînin.

7. Gava “sebîr” bê xwendin, mebest jê çiyayekî li Mekkeya Mukerrema ye û li vir îcaz heye. Lewra wê gavê wateya wê “Betha û Sebîr” e û gihaneka “û”yê ketiye.

Min ji piştê tête der nûrek mezin

Radibîte ser serê min ew ji min

“Ji piştê min nûrek mezin derdikeve û yan jî ji termê min radibe li ser serê min bilind dibe.”

1. Di “min ji piştê”yê de qelb heye. Lewra mebest jê “ji piştê min” e.

2. Di “radibîte serserê min”ê de kînyayê heye. Lewra dibe ku mebest ji vê hevokê wateya mecazî û heqîqî tev be jî.

3. Di nîvê paşî de jî dibe qelb hebe. Li gorî vê famkirinê, “ji termê min radibe ser serê min” e. Lê dibe ku qelb tune be jî. Li gorî vê şîroveyê wate “ji piştê min derdikeve û radibe ser serê min” e.

4. Gava “radibîte” bi wateya xwe ya rasteqîn be, li vir îcaz heye. Lewra li gorî vê şîroveya hanê wateya wê “li ser serê min” e.

5. Di nîvê dawîyê de qelb tune be em dikarin bibêjin ku di vir de îtnab heye. Lewra wê gavê du heb hevok derdikevin holê û wateya wan jî nêzîkî hev e.

Ez dibînim munqesim bûye du ker

Yek di şerqê yek di xerbê çûye der

“Ez dibînim vê nûra mezin dibe du parçe û yek jê li rojhilat wenda dibe û yek jî li rojava dihere ava.”

1. Li vîr îcaz heye. Lewra kirde ku ew jî nûr e nehatiye bilêvkirin.
2. Di “ez dibînim”ê de ji bo tekîdê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra “ez” nehatiba jî, wate kêman nedibû.
3. Di peyvên “şerq” û “xerb”ê de tîbaq heye.
4. Di vê malikê de îzah piştî îbhamê heye ku ev jî îtnab e. Lewra berê hejmara dudiyar hatiye. Di dû re hatiye diyarkirin.
5. Bi bêjeya “munqesim”ê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra nehata bikaranîn jî, ji aliyê wateyê tiştê kêman nedima.
6. Di vê malikê de bi tewşî’ê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra berê dujimarî hatiye di dû re jî dujimarî bi tebîrên yek di şerqê û yek di xerbê hatiye diyarkirin.
7. Di nivê duyem de îcaz heye. Lewra wateya wê “yek di şerqê de û “yek di xerbê de ye.
8. Di “çûye der”ê de mecaz heye. Îstîareya tesrîhîyye û tebeîyye heye. Lewra mebest jê “yê wenda bûye” ye. Wenda muşebbeh; “çûye der” jî muşebbehun bîh e.
9. Di “der” û “ker”ê de cînasa naqis heye.

Tête ve çespan û çapik bê dereng

Tête ser yek mîslê ‘ewrê tazereng

“Ev nûr bi awayekî pir zû tê ser hev dibe û wek ‘ewrê ku rengê wî taze û xweş e.”

1. Di risteya yekem de bi bêjeyên “çespan, çapik û bê dereng”ê de ji bo tekîdê îtnab hatiye îcrakirin. Ji van her sê bêjeyan ya yekê Farisî; ya dudiyar Tirkî û a sisêyan jî Kurdî ye. Lêbelê wateya wan hemûyan yek e.
2. Di risteya dudiyar de şibandin heye û daçeka şibandinê jî “mîslê” ye.
3. Bi peyva “reng”ê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra di vir de bêjeya “reng”ê tunbe jî ji aliyê wateyê kêmanî dernakevê holê.

4. Mebest ji “taze reng”ê “xweş reng” e. Li vir dibe ku mecaza mursel hebe. Lewra tazetî sebebê xweşikîyê ye.

5. Di “tête ser yek”ê de, îstîare heye. Lewra mebest jê her du parçeyê nûrê dicivin û dîsa wek berê dibin parçekî bi tenê.

6. Di “reng” û “dereng”ê de cînasa naqis heye.

7. Lêkera “tête”yê hatiye tekrarkirin.

8. “ve’ dibe ku cînava nîşanî be. Lewra hinek şarihan wateya cînavk a nîşanî daye wê. Li gorî vê şîroveya hanê wateya wê “ev nûr tê” ye.

Ez dibînim asîmanî bûye du şeş

Radibit ew nûre ta heftem tebeq

“Ez dibînim asîman dibe du parçe nûra bi min re diçe heta qatê heftan. Seydayê Mele Zeynelabidîn dibêje ku “tem”a di dawîya peyva heftê de ye, mîma mutekelimê ye. Lêbelê ji bo weznê bi peyva heft re hatiye. Dibêje ku heqê wê ew e ku bi peyva nûrê re be.”

1. Di “ez dibînim”ê de ji bo tekîdê îtnab hatiye îcrakirin.

2. Di lêkera “radibit”ê de dibe ku îstîare hebe. Lewra “gihîştin û çûna bi bal heft tebeqê asîman ve” ji bo tezîma nûrê hatiye şibandin bi bal tişteki pir mezin ve.

3. Di “heftem tebeq”ê de îstîare û îcaz heye. Lewra temyiz ku ew jî asîman e nehatiye gotin.

Tête ve fi’l-halî jan ‘alî meqam

Ez dibînim tête pişt a min tamam

“Ez dibînim ku ev nûra hane bi awayekî zû ji qatê heftan meqamê bilind tê xwar û dizivire û dikeve pişt a min.”

1. Di “alî meqam”ê de sifet hatiye îdafekirin bi bal mewsûfê xwe ve. Lewra eslê wê “meqamê ‘alî” ye.

2. Bi “ez dibînim” ji bo tekîdê îtnab hatiye îcrakirin.
3. Lêkera “tête”yê bi wateya “dikeve” ye. Dibe ku mecaza mursel hebe. Lewra netîca tête “dikeve” ye.
4. Di “temam”ê de îtnab heye. Ji sedem ku tamam neyê bikaranîn jî wate ku hatiye qesdkirin tê famkirin.
5. Di “tê te pišta min” de îcaz heye. Lewra bêjeya “ew” ku kirde ye nehatiye gotin.
6. “jan” di hinek nusxeyan de “der an” e; di hinek nusxeyan de jî “zan” e. Di zan û jan de texffîf heye. Eslê wê “ji wê dera” û “ez an” e.

Sa’eta rûnim li ser mehda zemîn

Mîn ‘ecayîb têne pêş û aferîn

“Gava li ser erda ku wek dergûşê ye rûdinê mîstên ecaîb û xweş tîn pêşîya min.”

1. Di “mehda zemîn”ê de wek لوء لوء الدمع ‘ê şibandin û îdafe heye. Lewra wateya vê terkîbê “erda wek dergûşê” ye.
2. Di “li ser mehda zemîn”ê de îtnab heye. Lewra ev wate jî lêkera “rûnim”ê jî tê famkirin.
3. Di berîya bêjeya “aferin”ê de bêjeya “dibêjin”ê hatiye ketin ji sedem wê di vir de îcaz heye.
4. Bêjeya “aferin”ê dibe ku sifet be ji bo “ecaîb”ê aferîn. Li gorî wateya hevokê hatiye tekîdkirin.
5. Di vir de “min” û “pêşim” de tekîd heye lewra her du jî behsa mutekelmê dikin. Di hinek nusxeyan de bi şeklê “pêş û vaferîn” hatiye. Di dewsa “tenê” “tête” jî hatiye.
6. Di hinek nusxeyan “min” û di hinek nusxeyan de jî “hin” derbas dibe

Hem ji erdê tê te sem'im ev kelam**Wê di gel te nûra Ehmed es-Selam**

“Û ji erdê jî gotina selam ji te re be nûra Ehmed di gel te ye tê guhên min.”

1. Dibe ku di nîvê yekem de kînaye hebe. Lewra dibe ku wateya wê “ji erdê ev deng tê” ye û dibe ku ji erdê deng tê bihîstin be jî.

2. Di cînava “ev”ê de muşexxeskirina wateyê heye.

3. Piştî “ev kelam”ê hatina nîvê duyem dibe wek îtnabê. Lewra nîvê duyem ji kelamê re îzah e. Li gorî vê şîroveyê li vir îzah be’de’l-îbham heye.

4. Di lêkera “tê”yê de, îhtîmala ku erd bi xwe wî tiştî dibêje heye û îhtîmal heye ku erd bi xwe na bêje, lê deng ji tişteki ku li alîyê erdê ye tê.

5. Di nîvê yekem de dibe ku îtnab hebe. Lewra di dewsa wê de “ji erdê dibihîzim” jî bihata wate dihat famkirin û deng kurttir dibû.

6. Di navbera “sem” û “kelam”ê de î’fîlafu’l me’na heye.

7. Dibe ku di “wê di gel te nûra Ehmed” de mecaza mursel hebe. Lewra çawa mebest jê nûr e, dibe ku mebest jê “nutfe”ya di piştî Hz. Ebdullah de be jî.

8. Di hinek nusxeyan de di dewsa “ev” “ew” hatiye. Lêbelê “ev” çêtir e. Lewra îşaret li vir xweştir xweya dike. Tişteki di jî di hinek nusxeyan de di şuna “wê”yê de jî “ewê” hatiye.

9. Di “we’s-selâm” de îcaz heye. Lewra em bibêjin ew gotina Bateyî ye عليه hatiye hezifkirin Ji sedem îhtîmala عَلَيْكَ jî mewcûd e dibe ku li vir tewcîh jî hebe. Gava عَلَيْكَ hatibe hezifkirin ev hevok dibe ya xwedîyê wî dengî. Di hinek nusxeyan de berîya selamê gihaneka “we”yê heye, li gorî vê xalê, li vir dîsa îcaz heye.

10. Di “kelam” û “selam”ê de cînasa naqis heye.

Herçî dara hişk e û ez biçme binî

Bû hêşîn û kesk ji belgan pir xenî

“Çi darên hişkên û ez diçim binê wan ter û kesk dibin û pir pel digrin.”

1. Di “hêşîn”ê de tewcîh heye. Lewra ev bêje bi du wateyan tê bikaranîn. Yek ji rengê hêşîn e. A dudiyar hêşînbûn e.

2. Di vê malikê de demê şert û cewabê li hev nehatiye. Lewra “ez biçme binî” dema tê ye. Lêbelê “bû” dema bihurî ye. Ji sedem vê xalê em li vir du îhtîmalan fikir dikin. Yek jê di vir de şert tune ye û berîya ku ew neçe wê derê Xwedê wê derê dixê halekî xweş. Îhtîmala duyem jî xwestina bilêvkirina wateyê bi awayekî qetî ye. Ji sedem vê xalê lêker di teşeya zemanê bihurî de hatiye. Lewra gava lêkera “bihurî” sabit bibe, îtiraz lê nayê kirin. Ji ber vê xalê sabitbûna lêkerê hatiye qesdkirin.

3. Di “herçî”yê de ûmum û tekîd heye.

4. Bi bêjeya “pir”ê mubalexe hatiye îcrakirin. Lewra “xenî” wateyan pir dihewîne, pêwîstîyek bi bal “pir”ê tune ye. Lê ji bo zêde û bihêzbûna wateyê “pir” hatiye bikaranîn.

5. Gava em bibêjin mebest ji bêjeya “hêşîn” rengê hêşîn e, em dikarin bibêjin di vir de îtnab heye. Lewra wê gavê wateya wê û a bejeya “kesk”ê yek dibe.

6. Di “pir xenî” û tekîd heye. Lewra wateya wan dewsa hev digirin.

7. Di navbera “hişk” û “hêşîn” de tîbaq heye. Lewra di navbera wan de zidiyet mewcûd e.

8. Di hinek nusxeyan de nivê duyem de “kate ez pelgan” hatiye.

Bû sih û seywan li ser min nagehan**Ez ku çûm bû hişk û bê belg û xusan**

“Ji nişgava ve ji min re sihê çêkir û gava ku ez dûrdikevim hişk dibin û rût û tazî bê pel û gulî dimînin.”

1. Di “sih” û “seywan”ê de bi mebest tekîdê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra piştî sih pêwîstî bi bal vê bêjeyê ve namîne.
2. Di “hişk û bê bel û xusan”ê de tekîd de heye. Lewra her sê bi awayekî rast e rast hev îfade dikin.
3. Di vê malikê de îcaz heye. Lewra kirde ku ew jî “dar”ê ye nehatiye gotin.
4. Di navbera her du ristan de wek hunera îhamu’t-fîbaq heye. Lewra çiqas ne zidê hev bin jî, zidiyet tê hişkê merivan.
5. Di te’bîra “ez ku çûm”ê de tekîd heye. Lewra ez neyê bikaranîn jî ji alîyê wateyê ve pisrgirêk dernakeve holê.
6. Di nîvê duyem de qelb heye. Lewra te’bîra “bû hişk”ê “hişk bûye” ye.

Ew çi remz û hal e babo bêje min**Gotê babo rohniya çavê di min**

“Got ku bavo ji min re bêje ev ‘elamet û rewş çiyê? Ebdulmüttelîb got ku “Ey bavê min û ey ronîya çavê min.”

1. Di “ew çi remz”ê de pirs digel teccûbê ye. Lewra ev hevok çiqas pirs be jî teaccûbê îfade dike.
2. Di “rohniya çavê di min”ê de îstîfere heye. Lewra Hz. Ebdullah hatiye şibandin, bi rohniya çavan. Di vir de muşşebhun bih hatiye zikirkirin. Lêbelê muşşebh hatiye hezifkirin. Îstîfereya tesrîhîyye heye.
3. Di “remz” û “hal”ê de tekîd heye. Lewra meqsed bi wan yekê hasil dibe.

4. Di vê malikê de “di” zaîd e. Lewra tune be jî wate xera nabe .

5. “Rohniya çavê di min”ê munada ye û tê de îcaz heye. Lewra herfa nîdayê nehatiye gotin. Hinekan rohnîya û çavê di min her du cuda qebl kirine. Li gorî gihanekê jî em dikarin bibêjin gihanek jî ketiye. Lêbelê li gorî qenaeta min di vir de îdafa rohnîyê bi bal çavê ve ye û bûna bêjeya rohnîyê bi tenê xweştir e.

6. Bêjeyên “min” û “bab”ê hatine tekrarkirin. Di mudafun îleyh bûna “min” a dawîyê de hezkirina Ebdulmuttelib ji Ebdullha re nîşanî me hatiye dayîn.

7. Di “çavê di min”ê de tekîd heye. Lewra daçeka “di” hatiye navbera mudaf û mudafun îleyhê. Nehatiba jî ji wateyê tişktek kê m nedibû. Ev daçek zaîd e.

Şa be mizgînîm li te Ey nazenîn

Dê ji te zahir bitin şahê emîn

“Ey delal! Kêfxweş be û mizgîn ji te re be, bêguman ewê şahê emîn Pêxemberê emîn ji piştî te peyda be.”

1. Di peyva “şa be”yê de dibe ku tewcîh hebe. Lewra ev bêje dibe ku texfîfa padîşah û şah be û dibe ku bi wateya kêf kirine hatibe bikaranîn. Lê ji sedem bêjeya mizgînê em dibêjin wateya wê “şa bibe” ye.

2. Di peyva “şah”ê de îstîfareya tesrîhîyye heye. Lewra ji alîyê quwet û qudreta axiretê an jî dinyayê Hz. Pêxember hatiye şibandin bi şah.

3. Di “mizgînîm li te”yê de, îcaz heye. Lewra daçeka “ji”yê hatiye hezifkirin. Li gorî hinek nusxeyan gotine “mizgîna min li te” ye. Li gorî hinekan jî “min mizgîn li te” ye.

4. Bê îstîfareya di şahê de em dikarin bibêjin muşakele jî heye. Lewra peyva şahê ji bo pêxembera ne tişkê xweş e. Şahîfî

girêdayî bi dunya ve tenê ye. Lêbelê Pêxembertî karê dinya û axiretê tev e.

5. Di “min mizgîn”ê de daçeka “ji” neyê teqdîrkerin em dikarin bibêjin tê de qelb heye. Lewra îstîmala meşhur “mizgîna min” e. Di hinek nusxeyan de jî “mizgînim” e di hinekan de jî “mizgînî” ye.

6. Di “ey nazenîn”ê de îcaza qiser heye. Lewra bi gota “ey kurikê min, an jî lawikê min” wateya di nazenîn de heye nedihat famkirin. Ji vê bêjeyê li siyaqê “wateya yê ku ji tê hezkirin, bi rûmet, bi qîmet, nazik” tê famkirin.

7. Di “min”ê de wateya tekîd û tewsiqê jî heye. Lewra min tuneba jî mane tamam dibû. Tiştêkî din min yanê ez bavê te mizgînê didim te, tu emîn be.

8. Di te’bîra “li te”yê de îstîfereya tebe’îyye heye. Lewra li te di devsa “ji te re” hatiye bikaranîn.

9. Bi bêjeya “emîn”ê îtnaba bi ihtîrasê hatiye îcrakirin. Lewra bêjeya “şah”ê bi tenê bihata bikaranîn, ewê wateya şah a nexweş jî bihata hişê me. Lêbelê gava ku “emîn” gotiye ew wate hatiye ji bîrakirin.

10. Peyva “zahir bitin”ê ji bo hevoka “zarokekî te ewê çêbive” îstîfere ye.

Hêvîya min wasîq e dê rabin

Ekremê alem ji te peyda bitin

“Bi bawerî û bi hêvî yim ku ewê ji nesla te baştirîn alemê derkeve holê.”

1. Di hinek nusxeyan de “Ehmedê mursel”û di hinekan de jî “Ehmedê ‘alem” heye. Di “Ehmedê mursel”î de mecaza mursel heye. Lewra ev gotin ji aliyê Ebdulmutilib hatiye gotin û eleqa jî îtîbar mâ yekûnu ye. Lewra Hz. Pêxember bi zaroktî nebûye pêxember. Belkî piştî temenê çilî bûye pêxember.

2. Bi peyva “wasîqe”yê wate hatiye tekîdkirin. Lewra bêjeya wasîqê tuneba jî wateya eslî dihat famkirin.

3. Di vê malikê de îhtîmala tenazuyê heye. Lewra em dikarin bibêjin ku ji bo “ekremê ‘alem” tenazu di navbera “rabitin” û “peyda bitin”ê de heye.

4. Di dewsa tenazuyê de dibe ku nîvê yekem û nîvê duyem her yek biserê xwe hevokek cuda be. Hevoka duyem wateya hevoka duyem tekîd dike. Ew jî îtnaba bi tezyîlê ye.

5. Di vê malikê de di hevokên “rabitin û peydabitin”ê de îstîfare heye. Lewra mebest jê “ewê zarokek ji pišta te were” ye.

6. Di hinek nusxeyan de di dewsa “Ekremê ‘alem” de “Ehmedê mursel” hatiye. Di “Ehmedê mursel”î de nav û wezîfe tev heye.

7. Di hinek nusxeyan de di şuna “rabitin”ê de “ez feqîr” hatiye bikaranîn. Ez feqîr hebe hevok xweştir tê famkirin. Lewra di hevokêkî de du lêker dernekeve holê baştir dibe. Di te’bîra “ez feqîr”ê de jî tevazu û îfadekirina îhtîyaca bi bal rehma Xwedê ve heye.

8. Di vê malikê de bi bêjeya “bitin”ê tekrar çêbûye.

9. Di daçeka “dê”yê de, îhtîmala tewcîhê heye. Lewra ev daçek ji bo du wateyan tê bikaranîn. Yek jê ku dema bê ye. Di zimanê Erebî de ji bo dema bê (سَ، سَوْفَ) tê îstîmalkirin. Wateya din jî “tekîd” e. Ku zimanê di Erebî de (قَدْ) ji bo vê wateyê tê bikaranîn.

Eşrefê mexlûq û sultanê cîhan

Dê ji te peyda bitin bê şek bizan

“Bêguman tu bawer bike ku herî başê mexlûqan û serokê cîhanê ewê ji pišta te be an jî ji nesla te be.”

1. Di “Sultanê cîhan”ê de şibandin heye. Lewra Hz. Peyxamber ji sedem tesîr û quwetê Hz. Pêxember hatiye

şibandin bi sultanen. Lêbelê tesîr û quweta wî ji alîyê dinyayê ve tenê nîne. Li vir ji sedem muşebbeh nehatiye, îstîare heye.

2. Di “sultanê cîhan”ê de îktîfa heye. Lewra serkeftin û qîmeta wî ya li axiretê ji dinyayê zêdetir e. Ji sedem vê xala hanê çawa dinya hatiye zikirkin. Axiret jî meqsûde. Lêbelê ji sedem qerînê axiret nehatiye gotin.

3. Di vê malikê de îcaza qîser heye. Lewra bi bejeyên “eşref û sultan” meznatiya Hz. Resûlullah bi awayekî umûmî hatiye gotin. Lewra van her du tiştan bihev re dibe ku mirovan de mewcud nebe, wê gavê ji îhtîmala kêmanî xerabîyê heye. Lêbelê dema ku vana bi hev re bin bi tu awayî îhtîmala kêmanî û xerabîyê namîne.

4. Di te’bîra “bê şek bizan”ê de îtnab heye. Mebest ji îtnabê tekîd e.

5. Dibe ku li vir îhtîbak hebe. Lewra “eşref û sultanê mexlûq û eşref û sultanê cîhan” bê gotin wateya wê nabe xelet.

6. Di hinek nusxeyan de li ciyê bêjeya “peyda”yê bêjeya “zahir”ê hatiye bikaranîn.

Min diye der xwab û mayim muntezer

Ehmed ez pişta te ye canê peder

“Min ev tişt di xewna xwe de dît û ez li benda wî me, ey rûhê bavê xwe Ehmed ji pişta te ye.”

1. Di peyva “mayim”ê de îtnab heye. Lewra mirad jê “mayim muntezer” “ez li hêvîyê me” ye ku vê wateya hanê jixwe ji bêjeya muntezerê tê famkirin.

2. Di “canê peder”ê de şibandin heye. Lewra “hezkirin, hêvî û giridana wî bi’Ebdullahî” hatiye şibandin bi “can”.

3. Di te’bîra “min diye der xwab”ê de îtnab heye û te’bîrek Farîsî ye. Lewra “min xwen dî” bihata gotin kurttir dibû. Lêbelê dibe ku ji sedem weznê ev peyv hatibe tercîh kirin.

4. Di te'bîra "Canê peder"ê de îcaz heye. Lewra munada ye û baneşana gazîkirinê nehatiye gotin.

5. Ji sedem "canê min" "canê peder" hatiye bikaranîn di bêjeya "peder"ê de îltifat heye. Lewra nivîskar ji mutekelimê derbasî xaibê bûye.

6. Di bêjeya "muntezer"ê de mecaza îsnadî hatiye bikaranîn. Lewra di şuna "muntezir"ê de ku îsmê fail e; muntezer hatiye bikaranîn.

7. Bêjeya "Ehmed"ê wek ehda zîhnî hatiye bikaranîn. Lewra Hz. Ebdullah teccub maye û pirs kiriye. Lêbelê bersîv her wekî ku berê zanibe hatiye dayîn.

8. Dibe ku di "min dîye" de, teccub hebe. Lewra bixwe dîtîye û li haybûye. Lêbelê bi awayekî wer hatiye bilêvkirin ku gava dîtîyi li hay nebûye, di dû re lê hay bûye. Ev tişt tecahulu'l-'arif tîne bîra min.

9. Di "mayim muntezer"ê de jî teccub dibe hebe.

Mîjara Heştem: Neyartîya Cuhûyan Li Hemberî Pêxemberê Me.

Çûnkî 'Ebdullahî rabû pakizat

Xweş li qetla wî Cuhûdan kir xebat

"Gava'Ebdullah bi şexsîyetek pak mezin bû. Cuhû tam ji bo kuştina wî xebitîn."

1. Di "rabû"yê de îstîareya tebeîyye heye. Lewra di vir de peyva "rabû"yê di şuna " mezinbûn, geşbûn"ê ve de " hatiye bikaranîn. Lewra wechê şebah hereket, peşveçûn û fayde ye.

2. Di peyva "cuhudan" de mecaza mursel heye. Lewra kull hatiye zikirkirin. Lêbelê cuz hatiye qesdkirin. Lewra mebest ji Cuhuyan hinek ji wan bi tenê ne.

3. Di “pakizat”ê de îktîfa heye. Lewra çiqas zat tenê hatibe gotin jî. Pakbûna xisletên wî jî hatiye qesdkirin.

4. Di hinek nusxeyan de di dewsa gihaneka “nê”yê de bêjeya “xweş” hatiye bikaranîn. Ji bo daçeka “nê”yê wateya tehqîq, etf û teqîbê hatiye gotin. Heke em ji bo wê wateya tehqîqê qebûl bikin. Wateya wê û bêjeya xweş nêzîkî hev dibe. Li gorî vê şîrovevê tekîd heye. Lewra wê gavê di bêjeya “xweş” de “baş û tam” heye ku ew jî tekîd e. Lêbelê bêjeya xweş bi wateya erênî, rind û qenç be, hatina vê bêjeyê li vir nexweş dibe.

5. Di lêkera “kir xebat”ê de îtnab heye. Lewra di şuna wê de lêkera “xebitin”ê bihata bikaranîn kintir dibû.

6. Di hinek nusxeyan de di dewsa “nê” de bêjeya “xweş” hatiye.

Rahib û ehbar û hem ehlê kîtab

J’agirê kerbê hemî bûne kebâb

“Rahibên fillan û alimên cuhûyan û ehle kîtabê bixwe jê qehr û beecan wek kebabê şewitin.”

1. Di şetra yekem de îtnab heye. Lewra li vir zîkra ‘umûmê piştî xuxusê heye. Ewîlî bêjeyên “rahîb” û “ehbar” hatine ku ew jî tebeqên xassan in. Di dû re ehle kîtabê hatiye ew jî umum in. Ku mebest jî Cuhû û Fille ne.

2. Di peyva “hemî”yê de îtnab heye. Ku mebest jê tekîd e.

3. Di “agirê kerbê” de îstîareya meknîyye û texyîlîyye heye. Lewra “kerb” hatiye şibandin bi ardûyê an jî bi tiştên tîn şewitandin. Di dû re ardû nehatiye zikirkirin. Lêbelê di dewsa “ardû”yê de “kerb” hatiye ku ew jî muşebbeh e hatiye gotin û lazme muşebbehun bîhê hatiye îdafekirin bi bal muşşebbehê ve. Ji sedem van tiştên me gotin li vir îstîareya meknîyye û texyîlîyye tev heye.

4. Di “agîrê kerbê” de, dibe ku bi îdafeya teşbîhîyye bê şîrovekirin. Lewra li gorî vê şîroveyê wateya wê “kerba wek agir” e.

5. Di hinek nusxeyan de di şuna “kerbê” de “kufrê” hatiye gotin.

6. Di peyva “kebab”ê de jî îstîareya terşîhîyye heye. Lewra kebab mulaîmê muşebbehun bihê ye.

7. Heke bê gotin îstîare di bêjeya “agir”ê de ye, wê gavê “agir” muşebbehun bih e. Perîşanî û eczîyeta ji sedem kerbê hasil dibe ew jî dibe muşebbeh. Li gorî vê şîroveyê di vir de îstîareya tesrîhîyye û eslîyye heye. Qarîne jî îdafeya agirê bi bal kerbê ve ye. Hemî bûne kebab jî dibe îstîareya terşîhîyye. Lewra di vê hevokê de kebâb mulaimê muşebbehun bihê ye.

8. Bêjeye “hemî” ji bo tekîdê hatiye bikaranîn.

9. Di navbera “hem” û hemî” de cînasa naqis heye.

Hayî dan heftê cihûd ez milkê Şam

Taze beyat best û ‘ehda natemam

“Heftê Yehûdî ji erdê şamê beyata xwe ji bo ehda ku nayê cî nû kirin û hatin Mekkeyê.”

1. Di hinek nusxeyan de di dewsa lêkera “hatin”ê lêkera “hayidan”ê hatiye bikaranîn. Li gorî vê şîroveyê mefûl nehatiye gotin. Ji sedem vê xala hanê di vir de îcaz heye.

2. Di “mulkê Şam”ê de mecaza mursel heye, Lewra hal hatiye gotin. Lêbelê mehel hatiye qesdkirin. Wateya wê “erdê şamê” ye.

3. Dibe ku mebest ji “heftê cihûd” ne jimara heftê be. Belkî mebest jê piranî ye. Li gorî vê şîroveya hanê li vir mubalexe heye.

4. Bêjeya “taze”yê bi wateya “bihêz û baş” be, tekîd hatiye îcrakirin. Lêbelê bi wateya “nû” be tekîd tune ye.

5. Di “ehda na temam”ê de tewcîh heye. Lewra ji bo “na”yê îhtîmala du meneyan heye. Yek jê ku “na” neyînî ye. A din jî dibe ku “na” ji bo pirjimarîyê hatibe bikaranîn.

6. Li gorî her du wateyên “na”yê du tiştên cuda derdikevin holê. A yekem ku “ehdana” be. Wê demê “ wate “ehdên qetî, bitekîd girtin” an jî “sozên qetî dan hev” e. A duyem ku “na” neerênî be. Peyv di teşeya neerênî de dibe. Wateya wê “ehda natemam” e. Yanê wan “ehd” u “we’dên” ku wan dan hev bicînebûn û negihîştin hedefên xwe.

Cengî û merdê dilawer şîregîr

Pêkve xwarin sond û bestin tîr û şîr

“Hemû yên wan ehle cengê bûn û cesur bûn û li qelban tesîrdikirin (lêdixistin) û hemûyan bi hev re sond xwarin û şîr û tîrên xwe girtin.”

1. Di vir de dibe ku mubteda cînavka “wan” be. Cînavk di heman demê de mewsuf e. Li gorî vê şîroveyê mubteda hezif bûye di şetrê yekem de. Ji sedem hezfê îcaz heye.

2. Di “dilawer”ê de, mecaza mursel heye. Lewra wateya wê ku qelbandin be an jî lixistin be. Cuz hatiye zikirkirin. Lêbelê mebest jê kull e. Yanê mirovan dikujin.

3. Di “dilawer” û “şîrî gir”ê de kînaye jî dibe hebe. Mebest ji dîlawerê pehlîvanî, cesaret û dikarin bûn şerbikin e û mebest ji “şîregîr”ê jî ku zanabûna di cengê de ye an jî ji bo cengê amede bûnî ye. Mebest ji wan “ê ku li qelban kaşdikin û şûran digirin” nîne. Lêbelê ev wate jî dibe ku bê famkirin.

4. Di bêjeya “pêkve”yê de, tekîd heye. Lewra wateya wê “hemû û giş” e.

5. Di lêkera “vexwarin”ê de îstîfara heye. Lewra sond hatiye şibandin bi avê. Çawa ku însanek gava ku av vedixwe û dikeve wucûda wî ji cuda nabe an jî çawa ku jîyan bê av nabe . Qerar jî

bi sondê tê tekîdkirin ew sond jî ji însanan cuda nabe û jiyana însan bêyî wê ne mimkun e.

6. Di dawîya nivê paşîn de di hinek nusxeyan de di dewsa “tîr û şîr”ê de, “taze şîr” hatiye; di hinekan de jî “şîr û tîr” hatiye nivîsandin. Li gorî a yekem yanê “şîr û tîr” helbestvan ji ya kêm çûye bi bal ya bihêz ve. Lewra di cengê de “tîr” nagihêce asta “şûran”.

7. Di hinek nusxeyan de di ciyê te’bîra “tîr û şîr”ê de; “tîze şîr” û di hinekan de jî “taze şîr” hatiye. Li gorî “tîze şîr” îdafeya sifetê bi bal mewsûfê ve ye. Tiştêkî di jî em dikarin bibêjin ku di vir de îtnaba bi îhtîrasê heye. Lewra bêjeya “tîze” dibe mani’ ji bo zenkirina ku şurê wan ko û kevn in. Tiştên me ji bo “tîze şîr” gotin heman tiştan em dikarin ji bo “taze şîr” jî bibêjin. Lêbelê li vir “tîze şîr” pirtir xweş e. Mebest ji te’bîra Wateya “taze şîr”ê “şûrên nû in” e. Mebest ji vê wateyê “şûrên tûj” e. Li gorî vê şîroveyê di ravekê de kînaye heye.

8. Di navbera “şîr” û “gîr”ê û di navbera “tîr” û “şîr”ê de cînasa naqis heye.

9. Dibe ku mebest ji “tîr û şîr”ê “bi altên çenge derketin rê” be. Wê gavê em dikarin bibêjin li vir mecaza mursel heye. Lewra xusûs hatiye gotin. Lê ‘umûm hatiye qesdkirin.

Ta neête kuştin ew zîbaxeram

Yek ji me naête ax û mulkê Şam

“Hemûyan sond xwar û gotin “heta ku ew ‘Ebdullahê xweşik û delal neyê kuştin, yek ji me na zivire erdê Şamê.”

1. “Zîbaxeram” ji Hz. Ebdullahî kînaye ye. Di vir de kînaye ji bo pesinkirinê hatiye bikaranîn.

2. Di “ax” û “mulk”ê de îtnaba bi tekîdê heye. Lewra wateya wan nêzîkî hev e. Dibe ku bêjeya mulkê bi wateya îdarê an jî dewletê be. Li gorî vê şîroveya hanê dîsa tekîd heye. Lêbelê bi

tekrarê bêjeyên hemwate derketine holê. Belkî mulk bê ax nabe. Gava neyên mulkê Şamê wateya wê ew e ku ewê neyên axa şamê jî an jî eksa wî gava neyên axa şamê nayên mulkê Şamê jî. Lewra mulkê Şamê li ser erdê Şamê ye.

3. Dibe ku “xeram” bi wateya “wefakar” jî hatibe bikaranîn. Li gorî vê şîroveya hanê di “xeram”ê de tewcîh heye. Lewra wê gavê wateya wê “wefakar û meşa nazîktî û delaltî” ye. Her du wate jî ji bo wê dibe.

4. Di hinek nusxeyan de di dewsa “ax û mulkê”ê de “axa mulkê” hatiye nivîsandin. Li gorî van nusxeyan îtnab tune ye. Lewra wateyê her duyan jî hev cuda ne. Ji sedem vê cudatîyê îtnab tune ye.

5. Di te’bîra “yek ji me”yê de tekîd û umumtî heye. Lewra di şuna wê de “em nayên” bihata gotin jî wateya eslî wenda nedibû.

Rahê sehra girt û çûn ew kînedoz

Mîslê kundê her bi şeb çû ne bi roz

“Wan Yehûdîyan kincên neyartîyê û kîne li xwe kirin û ketin rê yên çola û wek kundan bi şev çûn, bi roj bêhna xwe dan û xwe veşartin.”

1. Di lêkera “girt”ê de îstîareya tebeîyye û tesrîhîyye heye. Lewra bi meqseda şibandinê di ciyê lêkera “ketine rê”yê de bêjeya “girt”ê hatiye bikaranîn. Di vir de an jî îstîareya meknîye û texyîlîyye heye. Li gorî vê şîroveyê “rahê sehra” hatiye şibandin bi tiştêkî ku mirov wî dixwe destê xwe û di dûre lazimê wê hatiye îsnad kirin bi bal muşebbehê ve.

2. Di peyva “sehra”yê de îktîfa heye. Lewra çiqas sehra bi tenê hatibe zikirkirin jî rêyên tiştên din jî tê famkirin. Ev tişt ji sedem ku di vir de muqtezayê hal ‘umûmê dixwaze tê famkirin li çolê û ne li çolê daîm ji bo meqseda xwe di xebitin.

3. Di terkîba “kîne doz”ê de îstîareya meknîyye û texyîlîyye heye. Lewra wan kîna xwe ya di derbarê Ebdullah de ji xwe re

kirine wek kincan û wan kincan li xwe kirine. Di vir de kinc an jî cil muşebbehun bîh e, kîn jî muşebbeh e. Ev îstîfare meknîye ye. Îrtîbata dozê bi bal kînê ve ku ew ji lewazimê muşebbehun bîhê ye dibe îstîfareya texyîlîyye ye. Ev şîrove gava ku bêjeya “doz” bi wateya “dûrutinê be. Lêbelê ev bêje dibe wateya wê “kîndar” be. Li gorî vê wateyê qesir heye. Lewra wê gavê em dikarin bibêjin “ew bitenê çûn”

4. Di te’bîra “bi şev çûne ne bi roz”ê de dibe ku îcaz hebe. Lewra “çûne” jî “ne bi roz” jî tê famkirin.

5. Bi bêjeya “her” jî bo tekîdê hunera îtnabê hatiye îcrakirin.

6. Di “mîslê kund”ê de şibandin heye. Lewra çûna Yehûdîyan hatiye şibandin bi çûna kundan. An jî Yahûdî hatine şibandin bi kundên bi şevê dikevin rîyan û bi roj î disekinin.

7. Di navbera “şeb” û “roz”ê de tîbaq heye.

8. Di hinek nusxeyan de “bi şev çûne ne bi roj” hatiye nivîsandin. Li gorî van nusxeyan lêker pirjimar e û wate jî “bi şeva û rojan meşîyan nesekînin” e. Di hinek nusxeyan de “hem bi şeb çûn û bi roz” hatiye nivîsandin. Li gorî van wate hatiye tekîdkirin. Lewra bêjeya “hem” berîya “bi roze” mahzûf e.

Zû gehîştin çûne dora Mekkehê

Ketne bûsan mîslê ava bin kehê

“Ew zû çûn û gihîştin dora Mekkeyê. Wek ava di bin kayê de ketin nav ciyên ku dek û dûk lê tê çêkirin, an jî kemîn û kozik li hene an jî ketin nav bostanan, an jî xwe li nawal û bestên vala de veşartin.”

1. Te’bîra “zû gehîştin” û “çûne dora Mekkehê”yê li gorî hinek şarihên mewlûdê du hevok e. Wan di vir de lêkerên “gehîştin” û “çûne” wek du hevokên cuda qebul kirine. Li gorî vê şîrovê dibe ku îtnab hebe û dibe ku fesil jî hebe. Lewra wateya her du cumleyan wek hev e. “Çûne jî bo zû gihîştinê wek tekîdê be, dibe îtnab. Lêbelê bi îfîbar etfê, dibe fesil. Lewra di vir de etf

ne câiz e. Ji sedem ku ji alîyê wateyê cudatî di navbera her du hevokan tune ye. Li gorî hinek şarihan li vir du hevok bin jî tekîd tune ye. Wê gavê em dikarin bibêjin mefula yanê biresera “zû gihîştin”ê hezif bûye ku ew jî “ciyên ku dixwestin” e. Li gorî vê şîroveya hanê îcaz heye.

2. Di rista yekem de dibe ku qelba mekanî hebe. Lewra “çûn û zû gihîştin” be, wate xweştir dibe.

3. Di hinek nusxeyan de di şuna bêjeya “bûsan”ê de bêjeya “bestan”ê hatiye. Wê gavê li nawalan xwe veşartine. Lêbelê ev dibe ku “bustan” jî bêxwendin. Wê gavê li bostan, baxçe û zevîyan de xwe veşartine. Li gorî ev her duyan em dikarin bibêjin li vir îcaz heye. Lewra wateya hevokê “ketin wan ciyan û xwe veşartin” e.

Li gorî bêjeya “bûsan”ê du îhtîmal hene. A yekem “ketine” bi wateya “çêkirin, bikaranîn” be, wê gavê îstîiare derdikeve holê. A duyem ew e ku ciyên xwe tê de weşêrin “wek kozikan çêkirin” e. Li gorî vê şîroveyê îhtîmala şibandina wan ciyan bi kozikan heye.

4. Di risteya paşîn de jî şibandin heye. Lewra veşartina wan di dora Mekkeyê de hatiye şibandin bi ava bin kayê de. Çawa ava bin kayê bê denge û tevî diherike nayê xwanêkirin, wan jî bo meqsda xwu ya xerab xwe xistine wî halî.

Da binê kengê dibinin dervetê

Nobedar ketne kenarê hêşetê

“Ji bo ku mêzekin ka firseta wan çi wextê ewê were, li benda Hz. Ebdullah xwe li xanî û malên vala veşartin.”

1. Di hinek nusxeyan de di dewsa “da”yê de “ta” hatiye. “Ta” bi wateya heta tê bikaranîn; “da” jî bi wateya sebeb tê bikaranîn. Lêbelê di hinek devokan de wekî devoka Badînî di dewsa tîpa

“t”yê de, tîpa “d”yê tê bikaranîn. Li gorî vê devokê dibe ku “da” mişterek be û her du wateyan jî îfade bike.

2. Mebest ji “hêset”ê dibe ku ciyên vala be. Li gorî vê şîroveya hanê di vir de kîneye heye. Lewra behsa mal û xanîyan kiriye. Lêbelê mebest jê ciyên vala ye. Li gorî vê şîroveyê bêjeya “kenar” zêde ye.

3. Bêjeya “hêset”ê dibe ku bi wateya “kenar”ê be. Li gorî vê wateya hanê, li vir îtnab heye û bêjeya “hêset”ê zaîd e.

4. Hinek şîrovekarên mewlûdê dibên li vir “hêset” bi wateya îzdirabê ye. wê gavê bi hêsetê îstîareya meknîyye û texyîlîyye hatiye îcrakirin. Lewra “hêset” bi xanî an jî cî hatiye şibandin û tiştê aidê malê ku “kenar” e bi hêsetê ve hatiye girêdan.

5. Di bêjeya “nobedar”ê de îstîare heye. Lewra ew hatine şibandin bi notrvanên şevan. Lêbelê muşebbehun bih nehatiye gotin.

6. Di “ketne”yê de îstîareya tesrîhîyye ve tebeîyye heye. Lewra mebest jê “veşartin” e. Li gorî vê şîroveya hanê kenarê hêstê” jî dibe îstîareya terşîhîyye.

7. Di hinek nusxeyan de di şuna “dervet”ê de “firset” hatiye. Di hinekan de jî “derve” an jî “dûrve” hatiye nivîsnadin. Lêkera “ketne”yê jî cuda hatiye. Lewra di hinek nusxeyan de “kevîne” hatiye nivîsandin.

Rojekê wan dî bi çolê da meşî

Talibê nêçîr û ahû xweşî

“Rojekî wan dît ku ‘Ebdullah li çolê de dimeşe û li dû nêçîr û xezalên xweşik e.”

1. Di nivê yekem de kirdeya “meşî”yê nehatiye gotin. Ji sedem wê îcaz heye. Lewra Ebdullah kirde ye.

2. Di peyvên “nêçîr û ahûyê” de îtnab heye. Lewra “ahû” dikeve bin peyva nêçîrê. Lêbelê tevî vê rewşa hanê peyva “ahû”

hatiye. Di vir de pişt ûmumê zikra xassê heye. Ji sedem “ahû” ajalek e ku bi xweşikî û bi bezatiya xwe bala mirovan dikşîne li vir “ahû” hatiye gotin. Ev zîkra xas be’de’l-’amm e.

3. Di bêjeya talib de dibe ku mecaza mursel hebe lewra talib sebeb e û musebeb jî di rev e û di meşe ye. Li vir mebest jî ev e.

4. Di navbera nîvê yekem û duyem de ji alîyê wateyê dibe ku gihanek bê teqdîrdkirin. We gavê em dibêjin li vir, îcaz heye.

5. Di hinek nusxeyan de “ahûyê xweşî”, di hinekan de jî “ahû û xweşî” û di hinekan de jî “ahû xweşî” derbas dibe. “ahûyê xweşî” herî rast tê xwanêkirin. Li gorî vê îzahê ahû dibe ku îsmê cins be û dibe ku yek be jî. Li gorî “ahû û xweşî” dibe ku li dû gihanekê mewsûf ketibe ku ew jî “ajalin” e. Sedem ketina mewsûf ê jî dibe ku wezin be. “Ah û xweşî” îhtîmalek zêde ew e ku bi xeletî ji alîyê destnivîskar hatiye nivîsandin.

Wan ku dî raborî ‘Ebdullah çûnan

Ba tenê tenha bi çolê da rewan

“Wan dît ‘Ebdullah li ser rê, bi awayek tikû tenê, bi serê xwe di rê de diherike diçe.”

1. Lêkera “raborî”yê di hinek nusxeyan de “rabû rê” hatiye nivîsandin. Li gorî ya duyem lêker bi wateya “di rê de li piya sekini”ye û daçeka “di” an jî “da” ketiye. Lewra wateya wê ku “di rê de rabû” ye. Li gorî a yekem “ji rê derbas bû” ye. Li gorî ya yekem jî îcaz tune ye. Lêbelê li gorî ya duyem îcaz heye.

2. Di “çûnan”ê de şibandina halekî bi halekî din ve heye.

3. Di dewsa “bi”yê “ba” hatiye bikaranîn. Ev xal wer dide famkirin ku nivîskar “tenêtî”yê bi mirovekî şibandiye û berîya wê jî “ba” bikaraniye. Li gorî vê şîroveyê em dikarin bibêjin ku di vir de îstîareya meknîyye û texyîlîyye heye.

4. Dibe ku di “ba”yê de tecrîd hatibe îcrakirin. Wek ji “tenê” şexsiyetek hatibe tesevvurkirin û hatibe derxistin.

5. Di bêjeya “tenha”yê de îtnab heye. Gava em bibêjin ev jî bi wateya bi “tenê” ye îtnab heye. Lewra bi bêjeya “tenha”yê hevok hatiye tekîdkirin. Lê gava ku tenha bi wateya sakin be. dibe hal jî bo Ebdullah.

6. Dibe ku di lêkera “rewan”ê de mecaza mursel hebe. Lewra hinek hatiye gotin. Lêbelê bi wê kull hatiye qesdkirin. Zûbûn wek cureyek çûnê ye. Yanê zûbûn cure bi cure ye.

Firseta xwe dîn û rabûn şîr hesûn

Çûn di pey da mîslê gurgê devbixûn

“Gava firseta ku li bendê bûn dît û li pey wî ketin şûrên xwe tuj kirin. Li dû wî wek gurê dev bixwûn çûn.”

1. Di “firseta xwe”yê de îtnab heye. Lewra peyva “xwe”yê tune be jî, jî alîyê wateyê kêmanî çênabe. Lêbelê jî bo tekîdê ev bêje hatiye bikaranîn.

2. Di lêkera “çûn”ê de mecaza mursel heye. Lewra sebeb hatiye qesdkirin. Lêbelê musebbeb hatiye gotin. Li gorî vê şîrovevê di serî de niyet çêbûye di dû re jî li du çûne.

3. Di lêkera “rabûn”ê de jî mecaza mursel heye. Lewra jî rabûn mebest hereketkîrin û jî bo xaya xwe xebatikirin e. Sebeb hatiye zikirkirin lê mebest jê musebbeb e.

4. Di “şîr hesûn”ê de teswîra halê wan jî alîyê xerabîyê heye. Di vir de dibe ku em bibêjin jî bo mubalexeyê îtnaba bi îxalê hatiye îcrakirin. Lewra şûr jî xwe “hesin” e û “tûj” e. Mebest jê hesin be, em dikarin bibêjin li vir hesin cinsê şûr, îzah dike. Bejeya “hesûn”ê bi wateya kevirê ku pê hesin tê tuj kirin hatiye bikaranîn: Li gorî vê wateya hanê li vir mecaza mursel heye. Lewra mlezûm hatiye zikirkirin. Lê mebest jê lazim e. Ew jî tûj bûne.

5. Di te'bîra "misle gurgê dev bixwun" de şibandin heye. Lewra ew hatine şibandin bi gurê dev bixwûn. Ev teşbîh teşbîha mursel e û tereffê muşebbehun bîhê muqeyyed e.

6. Di "devbixûn" de xerabîya halê wan hatiye tekîd kirin. Ji alîyek din wek terşîha di îstîareyê de ye. Lewra "devbixûn" minasibê muşebbehun bîhê ye.

Hem di wê rojê li seyde bû Weheb

Ye'nî babê Amîne 'Alî neseb

"Di wê rojê de bavê Amînê Weheb ku xwedî nesebekî bilind e li nêçîrê bû."

1. Li vir du îhtîmal ji bo bêjeya "hem"ê hene. Yek jê ku ji bo gihanekê be. A dudiyar jî ku ji bo tekîdê be.

2. Di bêjeya "seyde" de îstîare heye. Lewra seyd nabe zerf. Tê famkirin ku di vir de seyd hatiye şibandin bi mekanî. Lêbelê mekan nehatiye zikirkirin. Di dewsa wî de muşebbeh hatiye gotin. Di vir de îhtîmala mecaza mursel jî heye. Lewra dibe bê gotin ku di vê malikê de hal hatiye bilêvkirin. Lê mebset jê mekan e.

3. Dibe ku mebest ji te'bîra "li seyde bû"yê "nêçîr dikir" an jî "ji bo seyde derketi bû" ye. Li gorî vê şîroveya hanê jî wateya mecazî hatiye qesdkirin.

4. Di şetra dudiyar de îtnab heye. Lewra piştî bêjeya Weheb, hevokek heye ku ew ney jî wate bêyî wê tamam dibe û tê famkirin. Nîvê duyem ji yê yekem re dibe wek îzah be'de'l îbham. Bi te'bîrek din îzah be'de'l-îbham e.

5. Sifet di nîvê duyem de ji bo medhê hatiye zikirkirin. Lê belê li vir çiyê, sifet û mewsûf hatiye guherandin. Lewra li gorî Erebi jî Kurdî jî hatina bêjeya 'alî li dû bêjeya nesebê pêwîst e.

6. Di nîvê yekem de îcaz heye. Lewra daçeka "de"yê nehatiye.

7. Nîvê duyem ji bo yê yekem re wek hevoka îzahê ye.

8. Di “Alî neseb” de tewcîh heye. Lewra vî sifetê hanê dibe ku ji Amîne re jî û ji ‘Ebdûllah re jî bibe sifet.

Çûn seda hat û weheb lê kir nezer

Hate ‘Ebdullahi qewmê xûnceger

“Gava ku deng hat Weheb li guhdarî kir, dit ku qewmê ku rengê kezeba wan ji kîn û buxzê guherî ye êrîşî ser Ebdullah dikin.”

1. Di te‘bîra “seda hat”ê de îstîfareyên meknîyye û texyîlîyye hene. Lewra deng nayê. Belkî tê bihîstin. Lêbelê ji ber eşkere bûna “seday”ê, seda bi tiştên hatiye şibandin bi tiştên tîn dîtin. Têklîya hatinê bi sedayê dibe îstîfareya texyîlîyye. Di hevoka “lê kir nezer” de jî îstîfareya terşîhîyye heye. Lewra ev hevok di vir de ji mulaîmê muşebbehun bîhê ye.

2. Dibe ku “lê kir nezer” îstîfareya tebeîyye be. Bihîstin bi mêzekirinê hatiye şibandin. Li gorî vê şîroveya hanê, li vir îstîfareyên din tê guhertin.

3. Di “xûnceger”ê de kînaye ji “bê wîcdanîyê û bê însafîyê” heye. Yanî îşaret bi bal qatil buna wan e. Lewra yê ku mirovan dikuje, xûna wan dirêje. Ji sedem ew dibên sebebe xwunrêjîyê. Xwunceger hatiye gotin. Her wekî ew xwun ji hundirên wan hatiye. Yan jî ew kîna di hundirê wan de, bi xwunê hatiye şibandin.

4. Dibe ku di vir de îcaz hebe. Lewra eslê wê “lê kir nezer û dît” dibe.

5. Di bêjeya “qewm”ê de mecaza mursel heye. Lewra mebest ji qewmê wan kesan e ku êrîşî ser ‘Ebdullah kirine.

Revdegurgêk hate bexê nûciwan**Lêbelê hişyare lê zîba şivan**

“Birrek gur hatin û êrîşî ‘Ebdullah kir ku ew wek bexê taze û ciwan bû. Lêbelê şivanê baş û xweşik hişyar bû û haya wî ji wan hebû.”

1. Di şetra yekê de du îstîare heye. Yek jê “ refde gurg” e. Lewra bi “refde gurg” wan kesên ku êrîşî ser ‘Ebdullah kiriye, hatine şibandin bi kerîyê guran. Ji ber vî tiştê hanê em dibêjin ku di vir de îstîareya tesrîhîyye û eslîyye heye.

2. Di hinek nusxeyan de dewsa bêjeya “refde” “rewde” hatiye. Bêjeya “rewde” eger bi wateya “baxçe, bostan” be. Mecaza mursel heye. Lewra mehel hatiye gotin. Lêbelê hal hatiye qesdkirin ku ew jî “birr, kerî” ye.

3. Di bêjeya “ciwan”ê de tekîd heye. Lewra ew tune be jî. Wateya wê tê famkirin.

4. Di “bexê new ciwan” de jî îstîare heye. Sebebê wî jî şibandina ‘Ebdullah bi bexê nû ye. Di vir de jî îstîareya tesrîhîyye û eslîyye heye. Di hevoka “Refde gurgê hate bexê new ciwan” bi awayekî îstîareya temsîlîyye heye.

5. Di lêkera “hate”yê de îstîareya eslîyye û tebeîyye heye. Lewra mebest ji vê lêkerê “êrîşkirin” e ku ew jî mustearun leh e.

6. Di bêjeya “şivan”ê de îstîare tesrîhîyye û eslîyye an jî muşakele heye. Lewra mebest ji şivan Xwedayê teala ye.

7. Di bêjeya “hişyar”ê de jî îstîareya tersîhîyye heye. Lewra hişyar mulaîm e ku ew jî “şivan” e.

8. Bêjeya “zîba”yê ji ber pesnê hatiye bikaranîn.

Nagehan fekrî Weheb dî ji asîman**Hate xwarê leşkerê rûhanîyan**

“Weheb li asîmanan mêzekir û ji nişkava dît ji asîman eskerê rûhanî ku ew jî meleaîket in tên xwarê.”

1. Di bêjeya "leşker"ê de îstîareya tesrîhîyye û eslîyye heye. Lewra cînavka melaîketan hatiye şibandin bi artêşa eskeran.
2. Di bêjeya "leşker"ê de dibe ku mecaza mursel jî hebe. Lewra mebest jê şexsê eskera bixwu nîne. Belkî mebest jê artêş e. Vê şîroveyê gava ku em fikirbikin di vir de îdafeya beyanîyye heye.
3. Heke leşker ne bi wateya artêşê be. Wê gavê raveka leşkerê ruhanîyan dibe rengdêr. Wateya wê jî leşkerên ruhanî ye. Ew jî melaîket in.
4. "Hate xwarê" ji erdê kînaye ye. Yanê hatin erdê.
5. Di bêjeya "ruhanîyan"ê de kînaye heye. Lewra mebest jê melaîket in.

Xeybîyanê keske poşê gul'îzar

Hatinê ew jêkra kirin jê tar û mar

"Wan melaîketên ku kincên kes li xwe kiribûn û serçavê wan wek gula bûn daketîn ser rûyê erdê û wan cuhûyan bi temamî ji ser rûyê erdê rakirin û helak kirin."

1. Di bêjeya "xeybîyan"ê de kînaye heye. Lewra mebest jê firîşte yanê melaîket in.
2. Di bêjeya "keske"ê de mecaza mursel heye. Lewra mebest jê kinc in. Lêbelê behsa renga hatiye kirin. Yanê hal hatiye gotin mehel hatiye qesdkirin.
3. Di "gulizar"ê de şibandin heye. Lewra mebest jê "wech an jî gepên wek gulan" e. Li gorî vê şîroveya hanê di vir de îdafeya teşbîhîyye heye.
4. Di "tar û mar"ê de tekîd heye. Lewra wateya bêjeya duduyan wateya bêjeya yekemîn tekîd dike.
5. Di "jêkra kirin"ê de dibe ku kînaye hebe. Lewra mebest jê kuştin û bêtesîrkirin tev dibe.
6. Di "tar û mar"ê de cînasa naqis heye.

Tarfetu'l-'eynê cuhûd ber ba kirin**Wan ji îqlîmê cîhan wenda kirin**

“Bi qasî zemanê çav girtinê, ew wenda kirin, an jî ew bi berbayê xistin bûn wek wê xwelîya ku bela wela tu tiştêkî jê li holê namîne û ew ji ser rûyê erdê wenda kirin.”

1. Di “tarfetu'l-'eynê”yê de îcaz heye. Lewra di vir de “û di ... de” nehatiye gotin.

2. “Tarfetu'l-'eynê” ji “zûbûn û 'ecelebûn”ê kînaye ye.

3. Di hinek nusxeyan de di şuna “ber ba” “ber bad” hatiye. “Ber bad” bi wateya ew “wenda kirin” e. Mebest jê jî kuştin e. Mebest ji “ber ba”yê kuştin û bêtesîr bûna wan e. Li gorî ev şiroveya hanê îstîfareya tesrîhîyye û tebeîyye heye. Lewra kuştina wan û bê tesîr mayina wan hatiye şibandin bi tiştên ku bi ber bayê dikevin û ji holê diherin û li holê bandorek ji wan re namîne.

4. Di hinek nusxeyan de di berîya “îqlîmê” de, daçeka “ji”yê nehatiye bikaranîn. Li gorî vê şiroveya hanê li vir îcaz heye.

5. Di navbera wateya her du nîvan nêzîktî heye. Lewra her du jî bi wateya helak bûnê û wenda bûnê ye. Li gorî vê şiroveyê em dikarin bibêjin di vir de fesil heye. Lewra ji sedem ku wateya wan ji hev re wek têkidê ye. Hevok û gihanek bi hev re nehatiye girêdayîn.

6. Di “îqlîmê cîhan”ê de mecaza mursel heye. Lewra kull hatiye zikirkirin. Lêbelê mebest jê cuz e. Di hinek nusxeyan de di dewsa “îqlîmê” de “eqalîm” hatiye. Gava “eqalîm” be îtnab derdikeve holê, lewra “eqalîm neyê jî, jixwe bêjeya cîhan wateya wê îfade dike.

7. Lêkera kirinê tekrar ji bo weznê an jî qafiyê.

Sa'eta sîrra ji xeybê dî Weheb

Mayî heyran û vemayî der eceb

"Gava ku Weheb sîrra ji xeybê ku veşartî an jî xerîb bû dît, şaş ma û heyran bû"

1. Di nivê duyem de bi tekrarê îtnab heye. Lewra wateya "heyran" û "eceb" wek hev e.

2. Di te'bîra "ji xeybê" de du îhtîmal hene. Yek jê ku "ji xeyb"ê rengdêr be ji bo bêjeya "sirr"ê, a duyem jî girêdayî bi bal lêkera "dî"yê be.

3. Di bêjeya "sîrra" de mecaza mursel heye. Lewra tiştêkî piştî hat zanîn ji teref mirovan, nabe sir. Lêbelê bi îfbar mî kane jê re dibe ku sir bê gotin.

4. Bi bêjeya "der"ê îtnab hatiye çêkirin.

5. Bi "mayî" û "vemayî"yê îtnab hatiye îcrakirin.

Çûn ji 'Ebdullahî dît ew sîrr û hal

Xweş li lewhê dil nivîsî ev xeyal

"Gava ku wî ji 'Ebdullahî ev sîrr û halê xerîb û ecîb dît, xeyala zewaca Hz. Amîne bi Hz. Ebdullah re tam di lewha qelbê xwe de bi cî kir."

1. Di vir de "dil" hatiye şibandin bi lewhê. Lêkera "nivîsî"yê jî qârîne ye.

2. Dibe di "dil"ê de îstîareya meknîyîye û teryîlîyîye hebe. Lewra dil hatiye şibandin bi meskenek lêbelê mesken nehatiye gotin, tiştêkî mulaîmê wî ku ew jî lewhe ye hatiye îdafekirin bi bal dilî ve. Bi bejeya nivîsî jî îstîareya muraşşha hatiye îcrakirin. Lewra nivîsnadin li sermalê an jî li ser tiştêkî ku mesken de be mimkun e.

3. Di hinek nusxeyan de di navbera bêjyên “sîrr” û “hal”ê de gihanek hatiye bikaranîn; di hinekan de jî nehatiye bikaranîn. Hatina gihanekê ku ew jî “û” ye çêtir e. Lewra her du bêje ji hev cuda ne û tiştêkî di jî gava “û” neyê bikaranîn di wateyê de pirsgirêk der dikeve holê.

4. Di bêjeya “xeyal”ê de mecaza mursel heye. Eleqa wê îtîbara mâ kane ye.

5. Di hinek nusxeyan de du caran “ew” hatiye bikaranîn, di hinekan de jî di şuna “ew”ê de “ev” hatiye bikaranîn û di hinekan de jî di nivê yekem de “ew” û di nivê duyem de jî “ev” heye. Li gorî malika berê “ev” bê bikaranîn baştir dibe. Lewra Weheb bi şexsê xwe dibe şahide bûyeran. Di vir de bi bikaranîna “ev”ê bûyer bêhtir muşexxes dibe û tezîm çêdibe.

6. Di vir de jî di peyva “sîrr”ê de mecaza mursel heye. Lewra sîrr bi îtîbar ma kane hatiye gotin.

Ger qebûl ket daye wî min Amîne

Pak û me’sûm e hebîb e mûqîn e

“Weheb got ku heke ‘Ebdullah qebûl bike, ezê Amîne bidim wî. Lewra Amîne keçek paqij e, bê guneh e, bi namus e û qenaetkar e. Divir de dibe ku em bibêjin wateya peyva mûqîne, xwedîyê qenaet û bawerîyakî resen e. Van wêsfên li vir dibe ku ji bo ‘Ebdullah be jî”

1. Di nivê dawîyê de î’îlafu’l me’na û îtnab hatiye îcrakirin. Bi bêjeyên “pak”, “masume” û “efîf”ê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra wateyên wan nêzîkî hev in.

2. Di “daye wî min Amîne” de dema bihurî hatiye bikaranîn. Pewîste ku dema bê bihata bikaranîn. Lêbelê nehatiye bikaranîn. Weheb ji sedem ku pir ji dil xwestîye niyeta xwe bi dema bihurî bikaranîye. Sebebê bikaranîna dema bihurî dibe ku tefaul be.

3. Di nivê yekem de qelb heye. Lewra eslê hevokê “min Amîne daye wî” ye.

4. Di hinek nusxeyan de di dewsa bêjeya “hebîb”ê de bêjeya “efîf”ê hatiye bikaranîn. Hatina bêjeya “hebib”ê çêtir e. Lewra bi wê tesîs yanê wateyek nu em fêhmdikin. Lêbelê “efîf” li vir efîfe ji bo tekîda “me’sum”ê. Di zimên de tesîs tê tercîhkirin li ser tekîdê.

5. Du îhtîmal ji bo nîvê paşî hene. Dibe ku wesfên tê de hatiye gotin ji bo Hz. Ebdullah be û dibe ku ji bo Hz. Amîne be jî. Li gorî vê şîroveya hanê li vir tewcîh heye.

Mîjara Nehem: Zewaca ‘Ebdullah û Amîne

Paşî wê sirra ‘ezîm û nûri tab

Nazilê qelbê Weheb bû îztirab

“Piştî wê sirra mezina ku nûr jê diçû -ku ew jî di navbera ‘Ebdullah û Yehûdîyan de derbas bûbû- îzdirab ket qelbê Weheb yanê qelbê wî ji bo zewaca ‘Ebdullah û Amîne ne tebitî”

1. Di bêjeyên “nûr” û “tab” de îtnab heye. Lewra nûr jixwe dibiriq; lêbelê dîsa jî peyva “tab”ê hatiye bikaranîn. Li gorî vê şîroveyê li vir peyva “tab”ê ji bo îxalê ye.

2. Di vê malikê de bûyera ku bavê Hz. Amîne li çolê ji Hz. Ebdullah û Yehûdîyan ditîye hatiye şibandin bi rojê an jî bi tiştên ku ronayîyê dide dora xwe. Ji sedem vê xalê di vir de îstîareya meknîyye û texyîlîyye heye. Lewra muşebbehun bîh nehatiye bilêvkirin û di dewsa wî de muşebbeh hatiye gotin û lazimê muşebbehun bîhê bûye wesif ji muşebbehê. Di vî halî de îstîareya texyîlîyye derdikeve holê. Di vir de “sirra û ‘ezîm” ku muşarun ileyh e dibe mulaîmê muşebbehê. Ji sedem vê xalê em dibêjin di vê malikê de îstîareya tecrîdîyye jî heye.

3. Di peyva “nazil”ê de jî îstîareya tesrîhîyye û tebeîyye heye. Lewra peydabûna izadrabê ku ji nişkava bi însan re çêdibe” hatiye şibandin bi tiştên ku ji jorê tî xwarê.

4. Di bêjeya “îzdirab”ê de dibe ku îstîare hebe. Lewra “xwestina di dilê ‘Ebdullahî ya ku ji bo Amîne ye hatiye şibandin bi îzdirabê”. Sebêbê vê şibnadina hanê xwestina zêde ye. Lewra xwestina zêde dibe sebebê ecelekirinê. Ev jî her wekî îzdirabê ye.

Çapik û çespan vegerya hate mal

Wî hikayet kir ji bo mala xwe hal

“Ebdullah bi lez û bez hat mala xwe û bûyera ku dîtî bû ji ehle mala xwe re got.”

1. Di “çapik” û “çespan”ê de îtnab heye. Lewra me’na wan her duyan jî yek e. Lêbelê bi hev re hatine û wateya wan hatiye tekîdkirin.

2. Di hinek nusxeyan de di dewsa “vegerya”yê de “wegerya” hatiye.

3. Eger mebest jê “mala xwe” jinika wî tenê be, di vir de mecaza mursel heye. Ji ber gotin kull e û qesdkirin jî cuzê ye.

4. Di lêkera “vegerya”yê de tekîd heye. Lewra ji “hate mala xwe” jî vê wateya hanê tê famkirin.

5. Di peyva malê de cînasa tam jî heye. Lewra jê bêjeya malê carek xanî carek jî ehlê malê hatiye qesdkirin.

6. Di navbera peyvên “mal” û “hal”ê de cînasa naqîs heye.

Hên hîkayet kir ji bo zewcê Weheb

Hem keramet hem ji cenga bil’eceb

“Wî ji jina xwe re tiştên dîtin behs kir û hem ji keramatên ‘Ebdullaha û êrîşa Yehûdîyan li ser wî û helakbûna wan ji alîyê melaîketan de jî behs kir.”

1. Di “Zewcê Weheb” de îltîfat heye. Lewra di şuna cînava xwe, navê Weheb bi xwe hatiye bikaranîn. Li gorî wateyê pêwîst

e “zewcê xwe” bihata. Ji mitekelimê derbasî xaibê bûyê. Li vir dibe ku tecrîd jî hebe. Yanê ji şexsê şexsek di xeyalkiriye.

2. Di bêjeya “ceng”ê de îstîare heye. Lewra êrîşa Yehudîyan li ser ‘Ebdullah hatiye şibandin bi herbê.

3. Bêjeya “hem”ê ji bo tekîd û etfê ye.

4. Nivê duyem ji yê yekem re wek îzahê ye. Ji ber vê xalê li vir em dikarin bibêjin îtnab heye. Nivê duyem îtnab nebe, pêwîst e ku “hem”a yekem an jî her du “hem”ên li dawîyê zaid be.

5. Di hinek nusxeyên mewlûdê de, di cîyê bêjeya “hem”ê de bêjeya “hin” an jî “hên” hatiye bikaranîn. Li gorî vê xwendinê di vir de mecaza mursel heye. Lewra wateya “hin”ê qismek e. Cuz hatiye gotin. Lêbelê kull hatiye qesdkirin. Dibe ku hin muxeffê jî “hindî”yê be ku wê gavê wateya wê “hemû, giş” dibe. Li gorî vê şiroveyê mecaza mursel tune ye.

Gote zewcê: “Qenc e qasid bî ji min

Rabî biçye xanedana dil mezin

“Di dû re Ebdullah ji jina xwe re got ku ey hurme ji alîyê min bibe qasid baş dibe û tu rabe biçe malabata qelb fireh.”

1. Di peyva “zewcê” de îltîfat heye. Lewra di dewsa “zewca min” de zewcê gotiye. Di belaxetê de ji vê re “derbasbûna ji mutekelimê bi bal xaibê” tê gotin.

2. Di peyva “rabî” de îtnab heye. Lewra ev lêker di vir de nehata bikaranîn jî meqsed hasil dibû.

3. Di te’bîra “qasid bî ji min” de dibe ku îcaz hebe. Lewra wateya wê dibe ku qasid bî ji alîyê min” an jî “qasid bî ji bo min” be.

4. Ji sedem ku ji bo peyva “xanedan” du wate dibe bê fêhmkirin, di vir de tewcîh heye. Lewra li vir wateya malbat û xanî tev mimkun e.

5. Di hinek nusxeyan de di dewsa “biçye” de “bêje min” hatiye. Di hinekan de jî lêkera “biçye”yê bi formê “biçne”yê hatiye.

6. Di berîya “zewcê” de dibe bêjeya “ey”yê hatibe bikaranîn. Li gorî vê şîroveya hanê li vir nîda heye û bêjeya nîdayê ketiye.

7. Di terkîba “dil mezin”ê de kînaye heye. Lewra mebest ji mezinbûna dil wan kesên bihna wan fireh û birûmet û bi qîmet in.

8. Di hinek nusxeyan de di şuna te’bîra “dilmezin”ê de “dermezin” hatiye. Di her du rewşan de jî pesindayîn heye

Bêje ‘Ebdulmüttelîb min Amîne

Wê li nik zîba ‘efîf e muqîn e

“Ji ‘Ebdulmüttelîb re bêje ku bêguman keçika min ku navê wê Amîne ye li bal min keçek xweşik û bi namus û bawermend e an jî jîr û zana ye.”

1. Di nîvê yekem de du îhtîmal hene. A yekem ku nîda û munada ketiye. A duyem jî lêkera “gote”yê ketiye. Di her du rewşan de jî îcaz heye.

2. Di şetra dawîyê de î’tilafu’l-me’na heye. Lewra bêjeyên minasibî hev hatine bikaranîn.

3. Di şetra dawîyê de hezif û îcaz jî hene. Lewra “wê li nik min” e. Lêbelê ciyê peyvan hatiye guherandin. Di hinek nusxeyan de jî qelb tune ye.

Ger ji ‘Ebdullah bibîtin ew qebûl

Temşîyet dê bêt û çêbit ew wusûl

“Heke ‘Ebdullah zewaca bi Amîne re qebul bike, karen zewacê ewê bi rêve herin û ‘Ebdullah û ‘Amîne bighîjin hev.”

1. Di hinek nusxeyan de di dewsa “bibîtin”ê de lêkera “bêtin” heye. Di “bêtin”ê de îstîareya tebeîyye. Lewra “bêtin” di dewsa “razî be, bixwaze” de hatiye.

2. Bi bêjeya “ew”ê ya dudiyan wateya hevokê hatiye tekîdkirin. Lewra “ew” ne hatiba bikaranîn jî wate kê m nedibû.

3. Di “temşîyet”ê tewcîh heye. Lewra mebest jê “meş, tevger, livandin, hereket” dibe û dibe ku mebest jê “xwestin û qaylbûn” be jî. Bi wateya “meş”ê be, tê de îstîare heye. Lewra ew tiştên ji bo dawetê tê çêkirin hatiye şibandin bi gerê bi meşê. Lêbelê bi wateya “xwestinê be” jî bo hevoka berîya xwe dibe wek tekîdê. Li gorî vê şîroveyê îhtîmla îtnabê, an jî fêslê heye.

4. Bêjeya “çêbit ew wusûl”ê jî zewacê kînaye ye. Kînaye jî nîsbetê ye. Mebest jê “ewê bi zewcin ” e.

5. Di hinek nusxeyan de di dewsa “ew”ê gihaneka “û” heye. Îhtîmala mezin ew e ku hatina “û”yê li vir xeletê ye jî teref mustensixê hatiye bikaranîn.

Nazik û sîmaxweş û dilber ew e

Layîqa wî babeta Wî her ew e

“Amîne kubar e, rû xweşik e û li qelban tesîr dike. A ku layîqî Ebdullah e û ya ku ji alîyê jîyan û exlaqê xwe de daîm dişibihe ‘Ebdullah Amîne ye.”

1. Di hinek nusxeyan de di navbera sîma û xweşê de gihaneka “û” zêde ye. Lewra di vir de raveka rengdêr heye. Ji ber vê taybetîyê hatina gihanekê di nava ravekê hewcenake.

2. Bi bêjeyên “ew” û “her”ê wate hatiye tekîdkirin.

3. Di nîvê duyem cînavka “wî”yê hatiye tekrarkirin û jî sedem tekar wate tekîd bûye.

4. Di navbera “laîqa wî” û “babeta wî”yê de gihaneka “û” yê ketiye. Ji sedem wî di vir de îcaz heye. Dibe ku xweş rengdêrê

bêjeya dilberê be. Li gorî vê şîroveyê jî gihaneka “û”yê ne zede ye.

5. Di vê malikê de qesir heye. Lewra bêjeya “ew”ê musnedun ileyh e û berîya musnedê hatiye.

6. Di vê malikê de îfîlafu’l-me’na heye. Lewra wateya lefzan nêzîkî hev e.

7. Bi bêjeyên “layîqa” û “babeta”yede îtnaba bi tekîdê hatiye îcrakirin. Lewra du bêjeyên hevme’na bi hev re hatine gotin.

8. Cînavka “ew”ê hatiye dubarekirin.

9. Bi tekrara “ew”ê bala mixateban hatiye kişandin bi bal tiştên ku nivîskar gotiye.

Hate ‘Ebdulmuttelib kir ba xeber

Hem di ‘Ebdullahi hubbê kir eser

“Jina Weheb hat mesele ji Ebdulmuttelib re got û ew gotin bu sebebê hezkirina Ebdullah ji Amîne an jî bû sebebê xwestina Amîne.”

1. Di hinek nusxeyan de bi forma “hat û ‘Ebdulmuttelib” hatiye nivîsandin. Li gorî van nusxeyan di vir de du hevokên bi gihanekê bi hev ve girêdayî hene. Lewra wateya wan “ew hat û Ebdulmuttelib xeberdar kir” e.

2. Di hinek nusxeyan de di şuna daçeka “di”yê de “ji” hatiye bikaranîn. Di vir de bikaranîna “di”yê baştir xwanê dike. Lêbelê îhtîmalek zeîf be jî dibe ku wateya wê “ji sebeb hezkirina dêya Amîne ji ‘Ebdullah, Ebdûllah jî ji Amîne’yê hezkir” be.

3. Di nivê yekem îcaz heye. Lewra kirde nehatiye gotin ku ew jî xanîma Weheb e.

4. Di “kir ba xeber”ê de dibe ku îstîfare hebe. Lewra li gorî vê îbara hanê wateya wî “gerand, kir xwedi xeber” mebest jê “xeber daye wî” ye. Lêbelê bi awayekî wusa hatiye gotin ku ew

xeber jê re bûye wek mal û jê naqete. Lewra “ba” bi wateya “pê re, an jî li cemê” ye.

5. Di nîvê duyem de dibe ku mecaza mursel hebe. Lewra hezkirin bê sebab nabe. Pewîst e ku mebest ji vê hevokê xeber be ku ew bûye sebabê hezkirinê. Bi te’bîrek din musebeb hatiye gotin lê sebab hatiye qesdkirin.

Gote dayê rabe ey zîba xîsal

Zewceyê bo min bixwaze bes delal

“Ebdullah got ku “Ey dayîka xweş ewsaf! Rabe biçê ji bo min hevserêk pir nazik û kubar, bixwaze”.

1. Di nîvê yekem de îcaz heye. Lewra kirde ku ew jî ‘Ebdullah e nehatiye gotin.

2. Di vir de bi tekrara nîdayê tekîd derketîye holê. Bêjeya dayê jî û bêjeya zîba xîsal jî munada ye. Di ya yekem de baneşana denglêkirinê nehatiye gotin.

3. Di “zîba xîsal”ê de mewsûf û sifet cî guherandinên. Bi te’bîrek din qelb heye ku eslê wê “ey xwedîyê xesletên xweşik” e. Ji vê şîroveya hanê derdikev holê ku di vê te’bîrê de îcaz jî heye. Lewra bê teqdîra bêjeya “xwedî”yê bi awayek rasteqîn em bixwazin wê fehm bikin. Famkirina wê ewê kêmbê. Lê îhtîmala ku li vir mubalexe jî hebe. Gava mubalexe bê fikirkirin îhtîyac bi bal bêjeya “xwedîyê” ve namîne.

4. Di bêjeya “dayê”yê de îcaz heye. Lewra herfa nîda nehatiye gotin.

5. Bi bêjeya “bes”ê jî tekîd hatiye îcrakirin. Lewra wateya “bes”ê “pir, gellek” e.

6. Di lêkera “rabe”yê de mecaza mursel heye. Lewra mebest ji “rabe”yê “biçe” ye. Li gorî vê şîroveyê sebab hatiye gotin. Lêbelê musbeeb hatiye qesdkirin.

Ba cemaî û ba kemal û ba edeb**Xweş eda şêrîn lîqa 'alî neseb**

“Bira yeka xweşik û gihîştibe kemalê û bi edeb û xwedîyê peyvên xweş û rû bişirî û bi esil be.”

1. Di vê malikê de însîcam û suhûlet heye. Lewra li ser cemaî, kemal, edeb, neseb ji alîyê lefz û me' nayê de minasibî hev in û ji ziman re jî asa nin.

2. Di vê malikê de îcaz heye. Ji ber ku di vir de musnedun îlyeh û lêker nehatiye zikirkirin. Mebest ji vê malikê “ew Xwedîyê van çar wesfan be”

3. Di xweş edayê de mecaza mursel heye. Lewra eda umum e. Lêbelê mebest jê xusûs e ku ew jî axaftin e.

4. Di “şêrîn liqâyê” de îstîareya meknîyye û texyîlîyye heye. Lewra lîqa wateya wê “lê rast bûn” e. Lê “lîqa” bi awayek rasteqîn şêrîn nabe. Ji ber vê tişta hanê em dibêjin ku li vir lîqa hatiye şibandin bi xwarinên şêrîn û xwarinên şêrînên nehatiye ku ew nîşanî me nehatiye dayin dibe ku li vîr îstîareya meknîyye hebe. Girêdana te'ma şêrîn bi lîqayê dibe texyîlîyye.

5. Di navbera “cemaî” û “kemaî”ê de cînasa naqis heye.

6. Di navbera “cemaî” û “kemaî”ê de tenasub jî heye.

Zûdî rabû Fatîme dilşadiman**Nazirê ber suretê gulçehrekan**

Gava 'Ebdullah ji dayika xwe Fatîme re qala zewacê kir “Fatîme bi kêfxweşî zû rabû û li wî rûyê Amînê ya ku ji alîyê xweşikîyê ve wek gul bû fikirî.”

1. Di lêkera “rabû”yê de dibe ku mecaza mursel hebe. Ji ber ku râbûn cuzekî “çûn”ê ye, li vir cuz hatiye zikirkirin, lêbelê kull hatiye qesdkirin.

2. Di navbera “surete” û “çehre”yê de îtnab heye, lewra wateya wan her duyan eynî ye.

3. Di “gul çehrekan”ê de îdafeya teşbîhîyyê heye. Lewra muşebbehun bîh hatiye îdafekirin bi bal müşebbehe ve û daçeka şibandinê hatiye hezifkirin ku ew jî daçeka “wek” e. Eslê vê îzafê wechên an jî rûyên wek gulan e. Lêbelê ji sedem îzafê bêje cî guherandin e.

4. Ji bo bêjeya “nazir”ê du îhtîmal hene. A yekem mêzekirin e. A duyem jî “fikirkirin, tefekkurkirin” e.

5. Di bêjeya “zûdî rabû”yê de du îhtîmal hene yek jê ku ev deng bêjeyek bi tenê be, wê gavê wateya wê” ecelekirin” e, A dudiyan jî ku ev deng ji du bêjeyan hatibe pêkanîn, wê gavê jî wateya “Ebdullah pêra dît ku dayika wî Fatîme rabû piyan” e.

Pırrşepal û gulruxan û taze ‘eyş

Sakînanê perdeyê alê Qureyş

“Ew pîr xweşik bûn, rûyên wan wek gulan bûn û zindî bûn. Keçikên Qureyş yê ku di binê konan de bûn xwe dinixumandin û ji mêran xwe vedişartin.”

1. Di vir de ew wesfên hanê dibe ku girêdayê malika berê ve be û dibe ku ne girêdayî wê be. Li gorî vê şîroveya hanê di vir de dibe kirde hatiye gotin û dibe nehatiye gotin wê demê îcaz derdikeve holê. Ew jî “Amîne” an jî “surete wê” ye.

2. Di nîvê yekem de î’tilafu’l-me’na heye. Lewra peyvên tê de hatiye bikaranîn ji alîyê wateyê nêzîkî hev in.

3. Bêjeya “pîrr”ê wateyê bihêzdike. Ji ber vî tiştê hanê li vir îtnab heye.

4. Di “gulruxan”ê de raveka şibandinê heye. Lewra mebest jê “rûyê wek gulan” e.

5. “Perdeyê alê Qureyş” dibe ji “namus û îffet”ê kînaye be an jî jê “jiyanek dibinê konan de ku xwe nîşan kesî nadin” hatibe qesdkirin.

Dilnewaz û pêkve naz û qendileb

Kes nedî şêrîntir ez binta Weheb

“Amîne xwedî dilek aram, bi awayekî tamamî kubar bû û lêvên wê wek şekir bû. Fatîme tu keçik ji keçika Weheb xweşiktir nedît.”

1. Di bêjeya “pêkve”yê de tekîd heye.
2. Di “qend” û “leb”ê de kînaye heye. Lewra mebest jê gotina “şêrîn” an jî ya “xweş” e. Lêbelê lêvên xweşik jî dibe ku hatibe qesdkirin.
3. Di “Qendileb”ê de leb hatiye şibandin bi “qend”ê û daçeka şibandinê jî ku wek e ketiye.
4. Sebebê ku di dewsa “Amîne”yê de binta Weheb hatiye gotin dibe du îhtîmal be. Yek jê ew e ku hurmet ji bo Amîneyê ye. A dudiyar jî diyarbûna meqsedê ye. Lewra li vir eşkere ye ku Amîne hatiye qesdkirin.
5. Di “şêrîntir”ê de îstîare heye. Lewra amînehatiye şibandin bi tiştêkî şêrin ew jî wekî hingiv. Ji sedem vê xalê di şuna “baştir, qenctir an jî rindtir”ê de “şêrîntir hatiye bikaranîn.
6. Di vê malikê de î’tîlafu’l-me’na heye. Lewra wateyên peyvan nêzîkî hev in.
7. Di te’bîra “kes nedî”yê de mubalexe heye.
8. Di hinek nusxeyan de di navbera “qend” û “leb”ê de gihaneka “û”yê heye. Lêbelê li gorî wateyê hewceyî vê gihaneka hanê nake.

Amîne gul bû di gulzarê cemal

Husni bê hed qedd û qamet 'îtîdal

“Amîne gulek bû di baxçeyê gulan de. Xweşikîtiya wê bê sînor û bê hîsab bû û Bejn û bala wê jî bîttîdal bû.”

1. Di “Amîne gul bû” yê de teşbîha belîx heye. Lewra Amîne hatiye şibandin bi gulê û wechê. Daçeka şibandinê nehatiye bikaranîn.

2. Di “gulzarê cemal”ê de îstîareya texyîlîyye û meknîyye heye. “Cemal” hatiye şibandin bi mekanê. Lêbelê mekan nehatiye zikirkirin, di ciyê wî de muşebbeh hatiye ku ew jî cemal bu xwe ye. Di dû re jî lazimê mekan hatiye îdafekirin bi bal cemalê ve.

3. Di peyva “gulzarê” de dibe ku mecaza mursel jî hebe. Lewra mekan hatiye gotin. Lêbelê mebest jê tiştê ku di mekan de hêşîn tê ye ku ew jî gul in.

4. Di risteya yekem de jî û di ya dudiyar de jî mubalexe heye. Lewra şibandina Amînehatiye bi gulê, lê bi wê nehatiye îktîfakirin. Îstîare jî hatiye çêkêrin. Di vir de “gulzar” mudaf e ji bo cemale. Cemal jî hatiye şibandin bi însan. Lêbelê di dewsa însan de muşebbeh hatiye.

5. Di rista dudiyar de jî mubalexe heye. Lewra di te'bîra “bê hed”ê de mubalexe heye.

6. Di navbera peyva “îtîdal”ê û te'bîra “bê hed”ê de tîbaq heye lewra her du ji alîyê me'nayê zidê hev in.

7. Di “qedd û qamet”ê de îtnaba bi tekîdê heye. Lewra wateya wan wek hev e.

Dê çî bejîm ez cemaî û me'rifet**Walîda Ehmed bes e her ew sîfet**

“Ezê çî bêjîm jî bo xweşikî û zanebûna dayîka Ehmed, Ew wesfên hanê jî bo wê bes in.”

1. Di risteya yekem de pîrs heye. Bi vê pîrse tecahulê ‘arif hatiye bikaranîn. An jî mebest jî vê pîrsê teqrîrîkirin jî bo xweşik bûn û minasib bûna dayîka Hz. Resûlullah e. Dibe ku li vir pîrs jî bo neerînîyê be. Wê gavê wateya malîkê “ ez tiştekek nabêjîm. Lewra van wesfên hanê jî bo dayîka Ehmed bes in.

2. Di navbera “cemaî” û “marîfet” de tenasub heye.

3. Di dewsa navê şexsî ku Amîne ye îsmê cîns hatiye ku ew jî walîde ye.

4. Di hinek nusxeyan de “ew” di hinekan de jî “ev” hatiye bikaranîn. “Ew” te’zîm îfade dike. “Ev” jî muşexxestî û diyartîyê îfade dike.

5. Bêjeya “her”ê jî bo tekîdê ye.

Fatîme dît û vegerya damîne**Gote ‘Ebdullahî behsa Amîne**

“Fatîme bi halekî ku jî Amîne re bû kefil vegeriya bi bal mala xwe û behsa Amîne jî ‘Ebdullah re kir.”

1. Di risteya yekem de îcaz heye. Lewra mefulê lêkera “dît”ê nehatiye diyarkirin. Ku ew jî “Amîne” ye.

2. Di peyva “damîne”yê de tekîd jî heye. Lewra wateya vê bêjeyê emînûna bi tiştekekî ye. Ji ber wê dibe kefil.

3. Di navbera bêjeyên “âmîne û damîne”yê de cînasa naqîs heye.

Mîslê wê nabin şepal û nazenîn

Nê di dunyê nê di Fîrdewsê berîn e

“Yeka wek wê xweşik û şîrîn û letif ne di dinyayê de ne di ceneta Fîrdewsê de ku bilind e nayê dîtin.”

1. Di bêjeya “Fîrdews”ê de mecaza mursel heye. Lewra Fîrdews hatiye gotin. Lêbelê mebest jê cenet hemû ye.

2. Di “şepal” û “nazenîn”ê de îcaza hezîfê heye. Lewra mewşûf nehatiye gotin ku ew jî bêjeya “keç an jî qîzê” ye

3. Di bêjeya “berîn”ê îtnaba bi îxal heye. Lewra “berîn” nehatiba jî wate temam bû. Lêbelê ji bo nukteya mubalexeyê berîn hatiye bikaranîn.

4. Di navbera “Dinya” û “Fîrdews”ê de tîbaq heye. Lewra zidê hev in.

5. Di hinek nusxeyan de di şuna “nê”yê de “ne” hatiye. Bêjeya “nê”yê di Kurdî de ji bo pir wateyan tê bikaranîn. Hinek ji wan wateyan “tenbîh, tehqîq, tefsîl, tekîd” in. Li gorî van wateyan em dikarin bibêjin ku li vir tewcîh heye.³⁹

6. Di hinek nusxeyan de “di” ya duyemîn nehatiye. Li gorî vê agahîya hanê li vir îcaz heye.

Carê dî çû dît û ew nazik nîhal

Lê vexûr babet in her du heval

“Fatîme carek din ji bo dîtîna wê kesa ku xwedîyê gulîyên zerîf in çû, lêbelê li cem wê bê minasîbtî ya her du hevalan ku Hz. Ebdullah û Hz. Amîne yin tiştêkî zede nebû.”

³⁹ Godîşkî, Sehlu'l-Mewrîd, r. 124, 247, 255; Celalî, Feydu'l-Qedîrî'l-Mubdî, r., 42, 56.-

1. Di “nazik nîhal”ê de şibandin heye. Lewra bejn û ciwantiya Amîne bi şaxên daran yê teze hatiye şibandin. Li vir bêjeya “ew”ê cînava navnîşanî ye. Şibandina di vir de îstîfere ye. Lewra muşebbeh nehatiye gotin.

2. Bêjeya “ew”ê dibe ji bo tezîm û teşxîsê be.

3. Di lêkerên “çû dît”ê de îcaz heye. Lewra eslê wan “çû û dît” e.

4. Di “nazik nîhal”ê de qelb heye. Lewra sifet û mewsûf cî guherandin e.

5. Gihaneka “lê”yê ji bo îstîdrakê ye. Lewra wateyên ku nehatiye qesdkirin bî wê hatiye defkirin.

6. Di nivê duyem de îtnab û îtîlafu’l-me’na heye. Lewra wateyên wan nêzîkî hev in.

Hate ‘Ebdulmüttelîb rakir ji mal

Çûn ji babê xwestin ew re’na delal

“Fatime hat ‘Ebdulmüttelîb ji malê bir û çûn nazika xweşik ji bavê wê xwestin”

1. Di lêkera “rakir”ê de mecaza mursel heye. Lewra mebest jê lêkera “bir”ê ye.

2. Di “bab”ê de îcaz heye. Lewra mebest jê “babê wê” ye.

3. Di hinek nusxeyan de di dewsa lêkerên “çûn” û “xwestin”ê de, lêkerên “çû” û “xwest” hatiye bikaranîn. Li gorî van lêkeran wateya malikê “Faitme digel Ebdulmüttelîb çû û Amîne Xwest.”

Weqîyek zîv û weqîyyek hem zeheb

Sed şutur sed pez ewî dane weheb

“ ‘Ebdulmüttelîb ji bo qelenê wê weqîyek zîv û weqîyek zêr û sed pez û sed deve dane Weheb.”

1. Di "zeheb" û weheb"ê de cînasa naqis heye.
2. Bêjeya "weqiyek"ê ji bo tekîdê hatiye tekrarkirin.
3. Bêjeya "sed"ê hatiye tekrarkirin.
4. Di navbera "sed şutur" û "sed pez"ê de îcaz heye. Lewra gihaneka "û"yê nehatiye gotin.

Sed beqer cumle ciwan û samîne

Bo hinarin Pêkve nextê Amîne

"Sed çêlekê ku hemû ciwan û qelew bûn giş ji bo qelenê Amîne hatin şandin."

1. Di "samîne" û "âmîne"yê de cînasa naqis heye.
2. Bi "pêkve" û "cumle"yê wate hatiye tekîd kirin.
3. Di vê malikê de îcaz heye. Lewra wateya wê "ji bo qelenê Amîne şandin an jî ji bo 'Ebdullah şandin" e.

Hatî 'Ebdulmüttelîb wê sa'etê

Kir tedarek kar û barê de'vetê

"'Ebdulmüttelîb wê sa'ete zivirî hate malê û haziriya kar û barên dawetê kir."

1. Di "kar" û "bar"ê de îtnaba bi tekîdê heye. Lewra wateyê wan nêzîkî hev in.
2. Di "wê sa'ete"yê de îcaz heye. Lewra wateya wê "di wê sa'ete de" ye. Li gorî vê şîroveya hanê "di û de" nehatiye gotin.
3. Dibe ku "kir tedarek" de mezza mursel hebe. Lewra gava em bibêjin emrê kirina dawetê kiriye dibe sebab ji bo kirina dawetê.

Çêkirin zad û teamê bil-'eceb

Hem Qureyşî xwendin û hindî 'Ereb

"Xwarin û vexwarinên gellek xerîb çêkirin û gazî hemû Qureyşî û Ereban kirin..

1. Di "zad û team"ê de dibe ku tekîd hebe. Lewra wateyen wan ji hev nedûr in.

2. Di bêjeya "hindî"yê de tewcîh heye. Lewra du wate jê re heye. Yek jê mebest jê hinek be. Li gorî vê wateyê hunerek bêjeyî tune ye û dibe ku bi wateya gazikirina Ereba hemûyan be. Li gorî vê şîroveyê mecaza mursel heye. Lewra kull hatiye gotin. Lêbelê cuz hatiye qesdkirin. Mebest jê mubalexe ye. Di hinek nusxeyan de di dewsa "hindî ereb"ê de "cumle ereb" hatiye. Li gorî bêjeya "cumle"yê mebest ji "hindî"yê hemû be, xweştir e.

3. Di lêkera "çêkirin"ê de jî tewcîh heye. Lewra mebest ji çêkirinê dibe ku "amade kirin" an jî "kelandin û pijandin" be. Gava em bibêjin ku mebest jê pijandin û kelenadin e, texlîb an jî muşakele heye. Lewra tiştên kelenadin hatine xalibkirin li ser tiştên nayên kelandin. Ji sedem bi hev re hatine gotin bi wateya kelandin hatiye bikaranîn.

4. Lêkera "xwendin"ê di kurdî bi wateya pirtûk an jî nivîs xwendin e. Di vir de bi wateya gazikrinê ye. Li gorî vê şîroveya hanê mecaz heye.

5. Di bêjeya "Qureyşî"ê de mecaza mursel hatiye. Lewra ne mimkune ku Qureyş hemû be.

6. Di navbera bêjeya "ereb" û "eceb"ê de cînasa naqis heye.

7. Di "bil-eceb"ê de mecaza mursel heye. Lewra team bixwe nabe eceb. Belkî dibe sebebe ecêbtîyê û heyrantîyê.

Amîne xemlî ji rengê gulşenê

Zend û bazin riştine ji rengê xenê

“Amîne bi kincên ku rengên wan wek rengên gul û kulîlkên di bostanan de bûn xemilî bû û dest û milên wê renga hinê girt.”

1. Di nîvê yekem de mecaza aqlî heye. Lewra heq ew e ku “amîne” di vir de biva bireser; lêbelê nebûye bireser. Belkî bûye kirde. Wateya vê hevokê “Wan amîne xemiland” e. An jî mutawaat heye.

2. Di “renga gulşenê” de mecaza mursel heye. Lewra mehel hatiye gotin; lêbelê mebest jê hal e. Ku ew jî gul û kulîlk û darên di gulşenê de ye. Mebest ji vê hevokê ku “Amîne pir xemilî û xweşik bûye” ye.

3. Mebest ji bêjeya “zend”ê dest e. Lewra di vir de mecaza mursel heye. Zend hatiye gotin. Lê mebest jê dest e. Eleqa mecazê li vir bi heva bûne. Di Erebî de jê vê eleqeyê re tê gotin “mucaweret”. Mebest ji bazin jî mehel ku ew jî dibe mecazê mursel. Lewra bazin nayê hinekirin. Cîyê bazinan tê hinekirin ku ev jî zen de. Lewra ji movikên destan heta dawîya enîşkan re zend tê gotin.

4. Di “renga xenê”yê de kîneye heye. Lewra mebest jê pir hinekirina destê wê ye.

5. Di hinek nusxeyên din yên mewlûdê de di dewsa “xenê”yê de “henê” hatiye. Li gorî qenaeta me di nav kurdan de “henê” meşhûrtir e. Ev bêje eslê wê erebî ye. Di erebî de jî bi tîpa “he” hatiye bikaranîn.

Xweşnawa û xweşeda hatin ereb

Cum ‘e bû ew şev nehê maha Receb

“Ji ‘Ereban yên deng xweş û lîstik xweş, şeva êvara îne nehê maha Recebê hatin dawetê.”

1. Di nîvê yekem de dibe ku “xweşnawa û xweşeda” hal bin. Lêbelê em bibêjin “qelb” tê de heye. Wê gavê dibe sifet. Wê gavê “edayê xweş û newayê xweş” dibe. Li gorî vê şîroveya hanê îcaz heye. Lewra wateya wan “ên xwedîyên edayê xweş û ên xwedîyên newayê xweş” e. Tiştek din jî ev her du ravek dibe ku kirde bin û berîya bêjeya ereb jî îcaz heye. Lewra wate “ji ereban xweşnawa û xweşeda hatin” dibe.

2. Di “xweş eda”yê de dibe ku kînaye jî hebe. Lewra li gorî hinek şîrovekarên mewlûdê bêjeya “xweş”ê bi wateya baş e.

3. Di peyva “Ereb”ê de mecaza mursel heye. Lewra mebest ji bêjeya Ereba Qureyş e. Ereba giş nîne.

4. Di peyva “nawa” û “eda”yê de jî mecaza mursel heye. Lewra ev her du bêje wateya wan ‘umûm e. Lêbelê mebest ji wan xusus e. Ku ew jî bêjeya newayê bi wateya kilam gotin û stranbêjîyê ye; ya edayê jî govend e.

5. Bi tekrarkirina bêjeya “xweş”ê wateya ravekan hatiye tekîdkirin.

6. Di nîvê duyem de jî îcaz heye. Lewra wateya wê “û nehê maha Receb bû” ye.

Wê şevê anîn nîkah û ‘eqdi best

Bûk û zava man û şerbet dane dest

“Wê şevê her duyan jî anînî û mara wan hate birandin. Ew bûn buk û zava û her yek ji wan li gorî edetên Mekke ji destên hev şerbeta şêrîn vexwarin, an jî da destên hev.”

1. Li gorî hinek şîrovekarên mewlûdê lêkera “anîn”ê, wateya wê “Amîne anîn” e. Wê gavê li vir îcaz derdikeve holê, Lewra bireser ku Amîne ye nehatiye gotin. Li gorî vê şîroveya hanê “nîkah û eqdi best” hevokek cuda ye û li vir dîsa îcaz heye. Lewra pêwîst e ku gihanek li vir ketibe.

2. Dibe ku “anîn nîkah” îstîfareya tesrîhîyye û tebeîyye be. Li gorî vê şîroveya me “berrîn” hatiye şibandin bi “anînê” û lefzê nikahê jî ji bo îstîfareyê qerîne ye. Li gorî vê nêrînê “eqdi best” hevokê din e û bi gihanekê bi hevoka berîya xwe ve hatiye girêdan.

3. Gava ku em bibêjin hevoka peyvên “nîkah” û “eqd”ê wateya wan yek e îtnab derdikeve holê. Bikaranîna her du peyvên bi hev re dibe ku ji bo tekîdê be.

4. Hinek şarihên mewlûdê bêjeya “eqd”ê wek bêjeyek lêkerî pejirandiyê. Wê gavê dibe li vir tewcîh hebe. Lewra eqd dibe bi navdêrî hatibe bikaranîn û dibe ku bi lêkerî hatibe bikaranîn. Gava em bibêjin lêker e. Gihaneka “û”yê zêde dibe.

5. Di “şerbet dane dest”ê de dibe ku kînyayê hebe. Lewra ev hevok jî bo du wateyan musaît e. Yekem wate ku heqîqeten şerbet jî wan re hatiye dayîn e. Wateya vê hevokê ya duduyan kêfxweş bûne ye.

6. Di hinek nusxeyan de di navbera bêjeyên bûk û zava de gihaneka “û”yê nehatiye bikaranîn. Wê gavê di vir de îcaz heye.

7. Di “dest” û “best”ê de cînasa naqîs heye.

8. Di bêjeyên “bûk” û “zava”yê de dibe ku tîbaq an jî îhamu’t-tîbaq hebe . Lewra minasebeta di navbera van her du kelîmeyan de ihtîmala herî kêm îhamu’t-tîbaq e.

Der Mekke meşhûri bû ev gotine

‘Ebdullah zava ye bûk e Amîne

“Di Mekkeyê de gotina ku Ebdullah zava ye û Amîne jî bûk e bela bû”

1. Di navbera bêjeyên “bûk” û “zava” de tîbaq heye.

2. Di “der Mekkeyê” de mecaza mursel heye. Lewra mebest jê di navber ehlê Mekkeyê de ye. Mehel hatiye gotin hal hatiye qesdkirin.

3. Di hinek nusxeyan de di şuna “ev”ê de “ew” hatiye bikaranîn. Di “ew”ê de te’zîm û di “ev”ê de jî muşexxestî heye.

4. Di nîvê duyem de ji ber qafiyê mubteda û xeber cî guherandine. Lewra meşhûr “Amîne bûk e” ye.

5. Di nîvê duyem de îcaz heye. Lewra gihaneka ku di navbera her du hevokan de ye ketiye.

Hesret û kerbê hemî berbad kirin

Wê şevê wan go du sed jin jê mirin

“Wan keçên ku dixwestin bi ‘Ebdullah re bi zewicîn ji qehr û kerban çûn helakê û tam du sed jin ji wan mirin.”

1. Di nîvê yekem de îcaz heye. Lewra berîya bêjeya hemî bêjeya “wan” nehatiye gotin.

2. Di navbera “kirin” û “mirin” de cînasa naqis heye.

3. Di hiinek nusxeyan de bêjeya “temam” heye. Bi bêjeya “temam”ê wate hatiye tekîd kirin.

4. Di nîvê yekem de ji bo mubalexeyê îstîfereya musrraha û tebeîyye heye. Lewra wî huzn û derdê hanê ew xistine halê helakê. Ew hal bi mirinê hatiye şibandin.

5. Di hinek nusxeyan de di dewsa lêkera “berbad kirin”ê “berba kirin” hatiye bikaranîn. Li gorî “berbayê” dibe ku tewcîh hebe. Lewra ji du wateyan re jî musaid e. Yek jê ku dîsa “helak bûn” e; a duyem jî ku li berbayê çûn yanê bê rûmet, bê qîmet û bê tesîr bûn.” Li gorî vê şîroveya hanê îstîfereya tesrîhîyye û tebeîyye heye. Lewra qehr û derdan ew di jîyan de bê bandor kirine, ew jî hatine şibandin bi tiştên li berbayê de diherin qiyemet ji wan re namîne. Vê wateya hanê dibe telmîh be bi bal ayeta فَجَعَلْنَاهُ هَبَاءً مَنْثُورًا “Me wî kir wek toza belabûyî.” (el-Furqan, 23).

6. Di vê malikê de dibe ku îstîfere neyê îcrakirin. Di şuna wê de, mecaza aqlî bê îcrakirin. Hesret û kerb mirovan helaknake, lê dibe sebebê helakê.

7. Di hinek nusxeyan de di şuna “du sed jin”ê de “sed jin” hatiye. Di vir de mubalexe an jî kînaye heye. Lewra dibe ku ji bo mubalexeyê hatibe bikaranîn û dibe ku ji bo kînayê hatibe bikaranîn. Li gorî vê şîroveya hanê wateya mubalexeyê jî û wateya heqîqî jî misaîd e. Lewra di rîwayetan de hejmar derbas dibe.

Bûk û zava her du çûne xelwetê

Şahîyane kefte baxê cennetê

“Bûk û zava her du çûn ciyê ku ew ji van re hatibû hazir kirin û bi tenê man, Kêfxweşî û aramî ket nav baxeçe yê cennetê.”

1. Di peyvên “bûk” û “zava”yê de tîbaq heye. Lewra her du ji alîyê wucûdê zidê hev in.

2. Di bêjeye “xelwet”ê de îstîfere heye. Lewra xelwet ne ciyekî ye ku mirov biçê. Di vir de xelwet hatiye şibandin bi mekan. Di vê şibandinê de mubalexe heye. Lewra di dewsa “çûne xelwetê” hatiye bikaranîn. Herwekî ji sedem kêf û şahîyê xelwet bûyi surek eleqa wan ji dinyayê birrîye.

3. Em dikarin bibêjin “Çûne xelwetê” ji “bi tenê mayin”ê kînaye ye.

4. Dibe ku berîya “xelwetê” mewsûfek an jî mudafek bê teqdîrkirin. Li gorî vê nêrîna hanê îstîfere tune ye. Lê îcaz heye. Lewra mewsûf nehatiye gotin.

5. Di şetra paşîyê de mecaza mursel heye. Lewra şahî ji bo mekan nabe. Ji bo mirovan dibe. Li vir mehel hatiye bilêvkirin. Lêbelê mebest jê wan kesên ku di mehel de ne.

6. Di hevoka “her dû çûne”yê de tekîd heye. Lewra ev wate ji bêjeyên “buk û zava”yê tê famkirin.

7. Di “baxê cennetê” de mecaza mursel heye. Lewra baxê cenetê ji ketina şahiyê re bûye zerf. Lêbelê mebest jê wan kesên di cenetê de ne û kêfxweş in.

8. Di “baxê cennetê” de îtnab heye. Lewra li vîr cenet umumtir e, an jî cenet ji bo bax tekîd û îzah e.

Zûdi Ridwanî vekir babê cînan

Daketin dergahê nîran nagehan

“Dergevanê cenetê Ridvan bi awayekî zû derê cenetê vekir û ji nişgava derên cehennemê hatin girtin.”

1. Di navbera nîvê yekem û duyem de muqabele heye. Lewra wateya wan di nav xwe de li hev tê. Lêbelê li hemberî hev li hev nayên û zidê hev in.

2. Di vê malikê tenevvû û îtîlafu'l-lefz heye. Lewra wateya nagehan û zûd, wateya dergah û bab wek hev e. Tevî ku wateya wan wek hev e jî. Di dewsa hev de nehatine. Îhtîmala mezin ew e ku ev hal ji bo aheng û weznê ye. Cînan û nîran jî wateya wan ne vek hev be jî, hatina wan ji bo deng û ahengê ye.

3. Di bêjeya “nîran”ê de mecaza mursel heye. Lewra cuz hatiye gotin. Lêbelê kull hatiye qesdkirin. Di vir de mebest ji nîranê cehennem e.

4. Di lêkera “daketin”ê de îstîfare heye. Lewra daketin di şuna “hat girtin”ê de hatiye bikaranîn.

Hor û xîlman û çem û teyr û nebat

Hatine hemd û senayê xweşluxat

“Horî û xîlman û çem û çûçik û giyayîn li ser rûyê erdê hemû hemd û senayan bi zimanekî xweş kirin, an jî gotin.”

1. Di vê malikê de cem heye. Lewra tiştên cuda dibin yek hukmekî de hatiye komkirin.

2. Di hinek nusxeyan de di dewsa “xilman”ê de “wildan” hatiye. Wateya her duyan jî wek hev e.

3. Di bêjeya “çem”ê de tewcîh heye. Dibe bi wateya teyrekî be û dibe ku bi wateya ciyê ku av tê de diherike şet be. Lewra dibe ku çemek biçûk be. Li gorî wateya yekem îtnab heye. Lewra piştî tişteki taybet ku ew jî teyrek mexsûs e tişteki umum hatiye. Ji vî tiştê hanê re tê gotin zikru’l-’ammî be’de’l-xass. Bêjeya çem şet be xweştir e. Lewra gava cenet tê behs kirin çem jî tê hişê merivan û di Qurana pîroz de jî cenet û nehr bi hev re tê gotin. Bi wateya nehr be, wateyek nû tê bikaranîn di zimên de ji wateya nû re tê gotin tesîs. Tesîs jî daîm li ser tekîdê tê tercîhkirin.

4. Di bêjeyên “ hemd û sena”yê de îtnab heye. Lewra wateya wan nêzîkî hev e.

5. Di nisbetkirina “xweş luxat” de mecaza mursel heye. Lewra hemd û sena nabin xweş luxat. Yên ku wan dibêjin ew xweş luxat dibin.

6. Di “hatin”ê de îstîfere heye. Lewra di hatinê de ji aliyê maddî û jî alî me’newî nîşan heye û ku ew jî xwestin û fiil e. Gotin ji sedem vî wesfî hatiye şibandin bi hatinê.

7. Di “xweş luxat”ê de mecaza mursel heye. Lewra luxat hatiye bikaranîn ji bo cuzê xwe ku ew jî odeng e.

Ez demê canbexşi Cîbrîlê Emîn

Mujde da ehlê semawat û zemîn

“Ji gava ku Xwedê rûh da Hz. Pêxember (s.x.l.) Hz. Cebrail mizgîn da ehlê asîmanan û erdên. Wateya duyem Hz. Cebrail ji zatê yan jî ji

devê Xwedayê canbexş mizgîna derbasbûna nûra Pêxember (s.x.l) bi bal Hz. Amîne ve da ehlê erd û asîmanan."⁴⁰

1. "Can bexşî" sifetê demê be, wateya "demê" "nefis, dev" dibe. Ew her du jî dibên ji bo Xwedê ye. Li gorî vê şîroveyê sifet ji bo tekîdê hatiye. Li vir dibe ku mecaza mursel jî hebe. Lewra li gorî vê şîroveyê cuz hatiye zikirkirin. Lê mebest jê kull e ku ew jî zatê Xwedê ye.

2. Bêjeya "demê" bi wateya zeman be, "can bexşî" dibe sifet ji "dem"ê re. Lê ev tişt di zimanê Kurdî de û Erebi de jî me nedîtiye. Tevî vê rewşê jî wateya vê te'bîrê "Zemanê ku tê de rûh tê dayin" dibe. Li gorî vê şîroveyê li vir mecaza aqilî heye. Lewra ji sedem zerfiyyetê canbexş bi bal demê hatiye îsnadkirin. Ev dişibe hevoka *أُنْبَتَ الرَّبِيعُ الْمَثَلُ* "Beharê giya hêşîn kir." Çawa di vê hevokê de mebest Xweda ye. Di "demê can bexşî"yê de jî mebest Xweda ye.

3. Di te'bîra "Cibrîlê Emîn" de dibe ku îtnaba bi îxalê hebe. Lewra bêjeya "Emîn"î neyê bikaranîn jî wate temam e. Ji bo tekîdê an jî mublaxayê îxal hatiye îcrakirin.

4. Di navbera bêjeyên "semawat" û "zemîn"ê de jî tîbaq heye.

5. Di navbera bêjeyên "emîn" û "zemîn"ê de cînasa naqis heye.

6. Di hinek nusxeyan de di dewsa "cibrîl"ê de "Cebrail" hatiye.

⁴⁰ Wateya duyem ji alîyê Seyda Mela Zeynelabidîn û Xalid Sadîni ve hatiye gotin (Zeynelabidîn Amedî, Behcetü'l-Enam, r., 106; Sadîni, Mewlûda Nebî (ya Bateyî), r., 57) Ev wate xweş e. A duyem hinek şîrovekarên din ve hatiye gotin. Li gorî qenaeta me ya duyem pir xweş nîne..

Cebraîla! Hati dewra Ehmedî

Hati şahê mîslê wî çavan nedî

“Xwedê got: Ey Cebraîl! Zemanê Ehmed hat, wexta wî Şahî hat ku çavan qet yek wek wî nedîtiye.”

1. Bi lêkera “hati”yê tiştên ku di zemanê bê de tînen wucûdê hatiye bi lêvkerin. Ev ji sedem wî tiştî ye ku mewcûdbûna wî miheqeq e yan jî ji sedem tefaulê ye.
2. Di hinek nusxeyan de di dewsa bêjeya “dewra”yê de bêjeya “nûr”ê hatiye. Ji bo her duyan jî em dikarin bibêjin mecaza mursel di wan de heye. Ku mebest ji wan hakîmîyet û tesîr be.
3. Di bêjeya “şah”ê de muşakele heye. Lewra Hz. Resûlullah ne şah e. Ji bo miqayesa hukm û tesîra wî bêjeya “şah”ê hatiye bikaranîn.
4. Di hinek nusxeyan de di dewsa “Cebraîla”yê de “Cebraîl” hatiye bikaranîn. Li gorî “Cebraîla”yê li vir gazîkirin heye. Li gorî “Cebraîl got” du îhtîmal yek jê hezîfbûna bêjeyê Xwedê û hezîfbûna baneşana bangkirinê ye. A duyem jî nehezîfkirina tu tiştêkî ye.

Rabe mizgînê bibe ji mexlûqî ra

Ji asîman û erd û ta tehte’s-sera

“Rabe mizgînê ji asîmanan heta erdê û bînê erdê bibe û bighîjîne mexlûqatan.”

1. Di hevoka “mizgînê bibe” de îstîfara heye. Mirov mizgîn nabe. Belkî mizgîn dide.
2. Di lêkera “rabe”yê de mecaza mursel heye. Lewra mebest jê “here” ye. Yanê sebeb hatiye gotin lê musebbab hatiye zikirkirin.

3. Dibe ku di “mexlûq”ê de mecaza mursel hebe. Lewra mizgîn ji bo melaîket, îns û cinnan bi tenê mimkun e. Li gorî vê şîroveya hanê kull hatiye zikirkirin. Lêbelê cuz hatiye qesdkirin.

4. Di şetra dudiyar de îtnab heye. Lewra li dû mexlûqê de ku ûmum e xusus hatiye zikirkirin. Ji vê re tê gotin zikra xusûsê piştî ‘umûmê.

5. Di navbera “erd” û “asîman”ê de tîbaq heye.

6. Nîvê duyem ji ayeta jêrê mulhem e.

لَهُ مَا فِي السَّمَاوَاتِ وَمَا فِي الْأَرْضِ وَمَا بَيْنَهُمَا وَمَا تَحْتَ الثَّرَى

“Tîştê li asîman û erdê, û tiştên li navbera wan û tiştên li binê erdê bi tenê yê Xwedê ye.” (Taha, 6). Li vir tê xwanê kirin tiştên di ayetê de derbas dibe, di vê malikê de jî derbas dibe.

Xulxule peyda bû der heft asîman

Sewtê tesbîha melek çû la mekan

“Deng û himhima zikrê di nava heft asîmanan de û denge tesbîhê melaîketan çû hata hizûra Xwedê.”

1. Bêjeya “melek”ê yek hejmar e. Lêbelê mebest jê pirjimar e.

2. Di bêjeya “xulxule”yê de tekîda wateyê heye. Lewra ev bêje bi wateya qerebalix û dengê zêdebûnê ye.

3. Di bêjeya “peyda bû”yê de bêxber bûyîn û xwestinek tabî û îcaz heye. Lewra daçeka “de” nehate gotin.

4. Nîvê duyem ji yê yekem re fesil e. Lewra wateya nîvê duyem wateya nîvê yekem diyar dike. Ji ber vî tiştê hanê em dikarin bibêjin ku li vir fesil bi etfû beyanê derketiye holê.

5. Di “la mekan”ê de du îhtîmal hene. Ev jî tewcîh e. Yek jê ew e ku “gihîşt erşê”; a duyem jî mekanê dawîyê ye di dû wî re mekan tune ye.

Hate xwarê cebraîl û mujde da

Keskê ala yek li banê Ke'be da

“Cebraîl hate xwarê û mizgîn da û alayek kesk li ser banê Ke'be çikand.”

1. Di “hate xwarê Cebraîl”ê de ciyê bêjeyan hatiye guherandin.
2. Di hinek nusxeyan de di navbera “xwarê” û “mujde da”yê de gihaneka girêdanê tune ye. Lê gorî van nusxeyan îcaz heye.
3. Di navbera her du lêkerên “da” cînasa tam heye. Lewra wateya wan ji hev cuda ye.
4. Di nivê duyem de qelb heye. Lewra te'bîra “keskê ala yek” eslê wê “yek alayê kesk” e. Lêbelê ciyê bêjeyan hatiye guherandin.

Mujde da mexlûqehayê behr û berr

Cumle heywanati zani ew xeber

“Cebraîl mizgîn da mexlûqên li berrê û li deryayê hemûyan. Wanên Xwedî rûh hemûyan xebera wî got hîn kir.”

1. Dibe ku “mexlûqehayê” de mecaza mursel hebe. Lewra mexlûq hemû li gorî adeta ilahî mîzginê nagirin. Belkî hinek ji wan mizgînê digirin.
2. Di bêjeyên “behr û berr”ê de tîbaq heye. Sebebê wê jî zidiyet e.
3. Di bêjeya “cumle”yê de tekîd heye.
4. Di navebera “behr û berr”ê de cînasa naqis jî heye.
5. Di vê malikê de bêjeya xas piştî bêjeya umumê hatiye. Lewra mexlûq umûm e, haywanat jî xusûs e. Ji ber vê xala hanê li vîr îtnab heye.

6. Di hinek nusxeyan de “ew” û di henkan de jî “ev” hatiye bikaranîn. Di “ew”ê de te’zîm û di “ev”ê de ji muşexxestî heye.

Xweş nîda hat ez yesar û meymene

Nûrê Ehmed hat çû nik Amîne

“Ji rast û çep an jî ji her terefi dengê xweş hat û got ku nûra Hz. Pêxember derbasî bi bal Hz. Âmîne bûye an jî Hz. Amîne bi Hz. Muhemmed hamile bûye.”

1. Di bêjeyên “yesar” û “meymene” de tîbaq heye. Lewra miqabilê hev in.

2. Di peyvên “yesar” û “meymene” yê de mecaza mursel jî heye. Lewra cuz hatine zikirkirin. Lêbelê mebest ji wan teref giş in.

3. Di şetra yekem de îcaz heye. Lewra di vir de lêkera “got”ê tevî ku heye nehatiye bi lêvkin.

4. Bi peyva “nûr”ê de mecaza mursel heye. Lewra nûr hatiye zikirkirin, lêbelê hebûna wî a maddî hatiye qesd kirin.

5. Di bêjeyên “hat” û “çû” yê de tîbaq heye. Sebebê wê zidiyet e.

6. Di “hat û çû” yê de em dikarin bibêjin ku îstîare jî heye. Lewra ji bo peyva “nûr”ê ev her du lêker bi me’na heqîqî hinekî nexweş tê. Belki Xwedê emr kir ev nûr jî gihişt Hz. Âmîne.

7. Di “hat û çû” yê de îtnab jî heye. Lewra yek ji wan neyêgotin jî wate تمام e.

Hatî nûranî şefî’u’l-muznîbîn

Hatî xeyru’n-Nasî xetmi’l-murselîn

“Ew kesê bi nûr e û dibe mehdervan ji bo gunehkaran, herê başê mirovan û pêxemberê dawîyê hat.”

1. Di “Şefîul muznîbîn”ê de telmîh bi bal hedîsa jêrê ve heye.

فَهِيَ نَائِلَةٌ مَنْ مَاتَ لَا يُشْرِكُ بِاللَّهِ شَيْئًا
“Şefaeta min ji bo wan kesan in ku hevalan ji Xwedê re çênakin de ye.”⁴¹

2. Di vê malikê de îcaz heye. Lewra di navbera wesfên Hz. pêxember de gihanek heye. Lêbelê nehatiye gotin.

3. Di xeyru’-n-nas de jî telmîh bi bal hedîsa jêrê ve heye.

فَلَمْ أَزَلْ خَيْرًا مِنْ خَيْرٍ
“Ez tim ji qencên qenca hatim hilbijartin.”⁴²

4. Bi tekrarkirina bêjeya “hati”yê wateya malikê hatiye tekîdkirin.

5. Di “xetmî mursalîn”ê de telmîh bi bal ayeta jêrê ve.

مَا كَانَ مُحَمَّدٌ أَبَا أَحَدٍ مِنْ رِجَالِكُمْ وَلَكِنْ رَسُولَ اللَّهِ وَخَاتَمَ النَّبِيِّينَ

“Muhemmed ne bavê yekî ji we ye. Lê belê qasidê Xwedê ye û pêxemberê herî paşîyê ye.” (el-Ehzab, 40).

6. Bêjeya “xetmê” mesder ê. Lê wateya wê îsmê fail e. Dibe ku wateya wê jî mesder be. Wê gavê li vir mubalexe heye.

Wê şevê hindî senem bûn sernigûn

Textê Îblîsê le’în bû wajigûn

“Wê şevê putan hemû li serseri li ser erdê ketin û textê îblîsê lêin qelibî.”

1. Di hinek nusxeyan di dewsa bêjeya “le’în”ê de bêjeya “şeqî”yê hatiye. Her du jî bi wesifî ji bo Îblîs hatiye bikaranîn. Lê di Quran’a pîroz de le’net ji bo wî bi awayekê eşkere hatiye bikaranîn.

2. Di “hindî”yê de tekîd heye.

⁴¹ Ibnu’l-Esîr, *Camîu’l-usûl*, 8011.

⁴² El-Hindî el-Mutteqî, *Kenzu’l-Ummal*, 33927.

3. Di “sernuxûn” û “wajigûn”ê de dibe kînaye hebe. Lewra di van her du bêjeyan de qesda wateya heqîqî û mecazî tev mimkun e.

4. Di hinek nusxeyan de di dewsa “text”ê de bêjeya “erş”ê hatiye bikaranîn.

5. Di “senem”ê de dibe tewrîye hebe. Lewra di serî de putên di Herema Şerîf de tê bîra meriv. Lêbelê dibe ku mebest jê “hemû tiştên mirovan ji Xwedê dûr dixê” be.

6. Di “textê”yê de jî kînaye heye. Lewra mebest jê dibe ku hukim be jî.

Lew li ser suret revî teşbîhê mar

Hate kohê Bû Qubeysê kir hewar

“Ji ber (tiştên hat ser)ê Îblîs. Îblîs deverû wek mar bazda û hat Çiyâyê Ebû Qubeysê qirîya û gazî kir.”

1. Di “Bû”yê de îcaz heye. Lewra herfa hemzê ketî ye. Navê çiyayekî li Mekkeya Mukerremê ye. Eslê wî Ebû Qubeys e.

2. Di hinek nusxeyan de di dewsa “şibandin”ê de “şibhet” hatiye.

3. Di “lew li ser suret”ê de dibe kînaye hebe. Lewra wateya heqîqî û mecazî her du jî li vir mimkun e. Dibe ku wateya rasteqîn ji bo li ser suret hatibe qesdkirin û dibe ku mebest jê “lezkîrin zûkîrin” be jî.

4. Di vê malikê de dibe ku îcaz hebe. Lewra nivê yekem hevokek e, nivê duyem jî du hevok e. gihanek ku “û” ye. Nehatiye gotin. Di hinek nusxeyan de di navbera “Bû Qubeys” û “kir hewar” de “û” heye.

Zuryeta wî cumle hatin bê newa

Ew çi hale bêje me, wî gote wa

*“Nesla wî hemû zû, bê deng, bêçare, perîşan û bê hazirî hatin gotin
çi bûye ji me re bêje. Wî ji wan re got.”*

1. Di bêjeya “cumle”yê de tekîd heye.
2. Di “bê newa”yê de tewcîh heye. Lewra du wateyê wê hene. Yek jê “qut, hazirî” ye. A din jî “deng” e.
3. Bêjeya “wa”yê bi wateya ax hatiye bikaranîn. Lêbelê em bibêjin bi cînava pirjimar e. Wê gavê îcaz heye. Lewra eslê wê “wan” e.
4. Pirsar “çi hale” yê ji bo teeccubê ye.
5. Bêjeya “bêje”yê ji bo diayê ye. Lewra şeytanên biçûk ji Îblîsî ku ew jî şeytanê mezin e tiştek xwestin. Yanê xwestek li vir ji merteba nizim bi bal merteba bilind e.

Lew li min çêbûye tirs û zelzele

Ba Muhammed Amîne bû hamile

*“Lewra Amîne bi Muhammed hamîle bûye û ji ber hemla wê tirs û
lerizandin li min peyda bûye.”*

1. Di “tirs û zelzele”ê de îtnaba bi tekîdê heye.
2. Di “zelzele”yê de, dibe ku mubalexe hebe. Lewra hejandina pir zêde an jî hejnadina erdê zelzele ye. Lê ji hejandina mirovan re lerzandin tê gotin.
3. Di navbera “tirs” û “zelzel”ê de sebeb û musebbebtî heye. Lewra zelzele dibe sebebê tirsar mirovan.
4. Bêjeya “ba”yê bi wateya mecazî hatiye. Lewra ev bêje bi wateya “cem, hinda”yê tê bikaranîn. Lêbelê li vir bi wateya “bi”yê hatiye bikaranîn. An jî “ba”ya Farisî ye. Wê gavê li vir wateya mecazî tune ye.

5. Di vê malikê de qelb heye. Lewra sebebê wê cî guherandin e. Qelb tuneba jî ewê nivê yekem berîya nivê duyem bihata.

Hati dewra Ehmedî dewra me çû

Lat û 'Uzza dê biket bê avirû

"Serdema Ehmed hat, serdema me qedîya û lat û uzza ewê bê rûmet bibin û tu kes ewê guhnedin wan."

1. Di navbera "hate" û "çû" yê de tîbaq heye.
2. Di "lat û uzza" yê de mecaza mursel heye. Lewra cuz hatiye gotin. Lêbelê mebest jî temamê tiştên batil e.
3. Bêjeya "dewr"ê hatiye tekrarkirin.
4. Di "av û rû" yê de dibe kîneye hebe. Lewra wateya wan ya heqîqî jî musaîd e.
5. Di hinek nusxeyan de di dewsa "ab"ê de "av" hatiye. "Ab" Farisî ye û "av" jî Kurdî ye.

Yek ji me îdî neşîtin bit 'eyan

Wî li me rê girt ji çûna asîman

"Ji niha pê de kesek ji me îdî nikare xwe eşkere bike û Wî li me riya asîman girt."

1. Di "yek ji" yê de îtnaba bi tekîdê heye. Lewra "yek ji" tuneba jî, wate temam bû.
2. Di hinek nusxeyan de "ji" nehatiye. Di vir de "ji" tune be jî wate temam e. Ji sedem vê xala hane li vir "ji" zêde ye.
3. Di bêjeya "çûna" yê de dibe ku kîneye hebe. Lewra di vir de "bilind bûn bi bal asîman ve" hatiye qedkirin. Lêbelê dibe "bilind bûna me'newî" jî bê qesdkirin.

Hati xûnrêzê cîhangîrê sefak

Em ji destê wî hemî dê bin helak

“Ê xûnê dirijîne û serdestê cîhanê ye hat û emê hemû bidestê wî helak bibin.”

1. Di bêjeya “xûnrêz”ê de mecaza mursel heye. Lewra Hz. Resûlullah bi fiila xwe kesê nekuştîye. Lêbelê ji bo bicî bûna dînê ku anîye û ji bo şikestina zaliman çeng çêbûye û di cengê de kuştin derketiye holê.

2. Di bêjeya “cîhangîr”ê de îstîare heye. Lewra hakîmyeta wî ya li dinyayê hatiye şibandin bi tiştêkî muşexxes ku ew jî zebtkirina însanên dinyayê ye.

3. Bêjeya “sefak”ê ji bo “xûnrêz”ê tekîd e. Lewra wateya wan wek hev e.

4. Di “ji deste wî” de mecaza mursel heye. Lewra dest sebeb e, lêbelê mebest jê şexs e.

5. Di bêjeya “helak”ê de kînaye heye. Lewra jê “mirin” jî û “bê bandor mayîn” jî dibe bê qesdkirin.

6. Di bêjeya “hemî”yê de tekîd heye.

Rohniya her du cîhan û mîlletan

Ummeta wî çêtirînê ummetan

“Ew rohnaya dinyayê û axiretê û hemû mîlletan e. Ummeta wî jî herî qencê ummetan e.”

1. Di vê beytê de îcaz heye. Lewra kirde ku “ew” e nehatiye gotin. Eslê hevokê “ew rohnaya her du cîhan û mîlletan e” ye.

2. Bi bêjeya “her”ê wate hatiye tekîdkirin.

3. Di bêjeya “rohnîya”yê de îstîare heye. Lewra tesîra an jî başîya Hz. Resûlullah hatiye şibandin bi rohnahîyê. Lêbelê

“tesîr, başî” nehatiye bilêvkirin di dewsa wan de muşebbehun bih ku ew jî “rohnî” ye hatiye bikaranîn.

4. Di vê malikê de îcaz heye lewra gihanek nehatiye bikaranîn. Ku ew jî gihaneka “û”yê ye di navbera her du hevokan de ye.

5. Bêjeya “ummet”ê hatiye tekrarkirin. Lewra dibe ku “herî çêtirînê umetan umetta wî ye” bihata gotin. Ji sedem vê taybetîyê li vir tekîd heye.

Dê çibit halê me û tedbîr û ray

Ayiway, ayiway û ayiway

“Wax wax wax ji bo rewşa me. Ewê çibibe û emê çibikin.”

1. Pirs “çibit halê me?” ji bo şaşbûnê ye.
2. Nîvê duyem ji bo hesret û huznê ye.
3. Di hinek nusxeyan de di navbera “halê me” û “tedbîr”ê de gihanek tune ye. Li gorî wê îcaz heye.
4. Di “tedbîr” û “ray”yê de îtnab heye. Lewra wateya “ray”yê dikeve binê tedbîrê.
5. Di “ayiway”ê de ji sedem tekrarê tekîd heye.
6. Di navbera bêjeyên “ray” û “way”ê de cînasa naqis heye.

Hem di subha wê şeva dewletfuzûn

Textê şahanê cîhan bû sernigûn

“Di sîba wê şeva ku hakimîyeta wê zêde bû selteneta meznên cîhanê qelibî an jî wenda bû.”

1. Di “şeva”yê de îstîare heye. Lewra dema cahilîyê hatiye şibandin bi şeva tarî, lêbelê muşebbeh nehatiye zikirkin. Ji sedem vê xala hanê di vir de îstîareya tesrîhiye heye. “Dewlet

fuzûn” qerîne ye û “subh” jî mulaîmê mustearun mînh e. Ji sedem vê taybetîyê di vir de îstîareya terşîhîyye heye.

2. Dibe ku bi bêjeya “dewlet”ê îstîare hatibe îcrakirin. Ev tişt mimkun e. Heke mebest jê şibandina dîn bi dewletê ji alîyê bandorê be. Lêbelê musebeb hatibe zikirkirin û mebest jê sebeb be, mecaza mursel heye. Lewra “dînê îslamê” bûye sebebe hakîmiyet û dewleta mislimanan.

3. Di nîvê duyem de wateya heqîqî jî bê qesdkirin, kînaye heye.

4. Di “textê şahanê cîhan”ê de mecaza mursel heye. Lewra mebest jê yên ku li ser rûyê erdê tesîra wan hebûye ew in. Textê şahane cîhan mehelle. Mebest jê hal e ku ew jî ê li ser text rûdinê ye.

Bê tekellum ma devê hindî mulûk

Şah eger hakim eger mîrê bulûk

“Hemû mezînen dinyayê çi emîrê biçûk û çi jî yên mezin hemû şaş bûn û bê ziman û bê dev man.”

1. Di “bê tekellum ma”yê de îcaza qîser heye. Lewra di vir de wateyên mecazî û heqîqî hemû bi hev re dibe hatibe qesdkirin.

2. Di “devê” de mecaza mursel heye. Lewra “dev” peyvan nake; ziman peyvan dike. Loma li vir mecaza mursel heye. Mehel hatiye. Lê mebest jê hal e ku ew jî ziman e.

3. Bi bêjeya “hindî”yê tekîd hatiye qesdkirin. Lewra qesdkirina mulûkan hemû mimkun nîne.

4. Bi dubarekirina bêjeya “eger”ê tekîd çêbûye.

5. Di navbera “mulûk” û “bulûk”ê cînasa naqîs heye.

6. Bêjeyên “şah, hakim, mîr”ê ji bo tekîdê an jî ji bo hemû têkvin bin hikum îtnab hatiye îcrakirin.

Mijara Dehem: Weqta Hemla Amîne Bi Hz. Pêxember

Amîne go ta kî şeş meh çûne ser

Min ji hemlê xwe ne dî qet yek eser

“Amîne got ku heta şeş meh li ser hemla min derbas bû tu êş û zehmetî ji ber hemla xwe min nedît.”

1. Di te'bîra “qet yekeser”ê de tekîd heye.
2. Di hinek nusxeyan de jî di şuna “go ta kî”yê de “got kî” hatiye
3. Di nîvê yekem de îcaz heye. Lewra eslê “çûne ser”ê “çûne li ser hemla wê” ye.
4. Di bêjeya “eser”ê de mecaza mursel heye. Lewra mebest ji eser “êş û zahmetî” ye.

Paşî şeş me gote min awazê xeyb

Min li te mizgîn e ey pakîzeceyb

“Piştî şeş mehan deng ji xeybê hate guhê min (gote) ku ey xwedîya îffetê mizgîna min li te be.”

1. Di navbera bêjeyên “xeyb” û “ceyb”ê de cînasa naqis heye.
2. Di “pakîze ceyb”ê de kînyayê heye. Lewra wateya wê ya heqîqî jî û mecazî jî mimkun e bê qesdkirin.
3. Di “awazê xeyb”ê de îcaza hezif heye. Lewra daçeka “jî”yê nehatiye gotin.

Wê di gel te xatemê peyxemberan

Nasixê herfa kîtab û defteran

“Ê ku li dawîya pêxemberan e yan jî ê ku hatina pêxemberan bi dawî dike û ê ku pirtûk û suhufan nesx dike li cem te ye.”

1. Di bêjeya “xatemê pêxemberan”ê de mecaza mursel heye. Lewra di vir de îfîbar mâ yekûnu heye. Lewra pêxembertîya Hz. Resûllullah piştî temenekî hatiye. Gava biçûk bûye ne Pêxember bûye.

2. Di “gel te”yê de îcaz heye. Lewra mebest jê di rehma te de ye.

3. Di bêjeya “herf”ê de mecaza mursel heye. Lewra li vir mebest ji herfê tiştên di kîtab û suhûfan de hatiye nivîsandin e. Cuz hatiye zikirkirin lêbelê mebest jê kull e ku ew jî hemû tiştên di wan de ne.

4. Di bêjeya “defteran”ê de dibe kînaye hebe. Lewra li vir suhûf û tiştên nivîsandî ku eleqa wan bi îtîqadê an jî emel be hemû hatine qesdkirin.

5. Di bêjeya “nasîx”ê de mecaza mursel heye. Lewra ew bûye sebeb. Wî bixwe tiştên berê nesx nekirine. Belkî wehya jê re hatiye tiştên berê nesx kirine.

Lê di xewnê da me dîtîna bê ‘eded

Enbiya û remz û nîşan û sened

“Bêguman me di xewnê de pir nebî, îşaret, alamet û mesned dîtîna.”

1. Gihaneka “lê”yê ji bo îstîdrakê tê. Lêbelê li gorî qenaeta me di malikên berîya vê malikê de tiştê ku em bibêjin îstîdrakê di dixwaze xuya nake. Belê hinek şîrovekaran gotine ku di hevoka “min ji hemlê xwe nedî qet yek eser” de îstîdrak heye. Lê bêjeya “paşê” û wesfên li dû wê tîna îhtîyac nahêle bi bal îstîdrakê. Li gorî me, li vir “lê” zaîd e an jî bi wateya gihanekê ye ku ew jî “û” ye.

2. Di “bê ‘eded”ê de mubalexe heye. Lewra ne mimkun e ku tiştên mirovan bê hed be.

3. Di “remz û nîşan”ê de ji bo tekîdê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra wateya wan nezîkî hev e.

4. Bêjeya “enbiya”yê ji sedem wateya xwe umûm e. Li vir “murselîn” jî dikeve bin hukmê wê. Ji ber vê taybetiya hanê bêjeya resûl ne hatibe jî wek hatibe tê xwanêkirin. An jî li vir îktîfa heye. Lewra temamê resûlan nebî nin jî, enbîya bê gotin tê famkirin ku resûl jî hatine qesdkirin.

5. Di nîvê duyem de hunera cem’ê heye. Lewra “enbîya” û “remz, nîşan” dibin hukmekî de hatine bikaranîn.

6. Di cînavka “me”yê de tewazû heye. Lewra di dewsa cînavka “min”ê de “me” hatiye.

Ewwela min dî ji min nûrek diçî

Qesrê Busra min ji ‘eksa wê didî

“Berîya her tiştî min dît ku nûrek ji min bilind bû. Ji ber ronahiya wê nûrê min koşka Busrayê didît.”

1. Bêjeya “ewwela”yê destpêk e ji bo tiştên ku helbestvan ewê behsa wan bike.

2. Di bêjeya “nûr”ê de te’zîm heye. Lewra li vir musnedun îleyh ku ew jî “nûr” e, wateya wê dibe ku “nûra mezin” be.

3. Cînavka “min”ê hatiye tekrarkirin. Bi vê tekrarê wate hatiye tekîdkirin.

4. Di te’bîra “qesrê Busra”yê de, îdafeya zerfîyye heye.

5. Di lêkera “diçî”yê de dibe ku îstîfare hebe. Lewra “bilind bûyin” dibe ku hatibe şibandin bi lêkera “çûn”ê.

6. Di te’bîra “ji ‘eksa wî”yê de îcaz heye. Lewra eslê wê “ji sebeb eksa wê” ye.

Mahê Ewwel hati Adem teyyiba

Kir selam û gote hemlê merheba

“Di meha yekem de Ademê qenc hat û selam da û gote ku ey hemlê ji te re merheba.”

1. Bêjeya "Adem"î musnedun îleyh e û bi bêjeya "teyyîba"yê hatiye teqyîdkirin.
2. Di dewsa te'bîra "selam da"yê de "kir selam" hatiye bikaranîn.
3. Di bêjeya "heml"ê de îcaz heye. Lewra herfa nîdayê ketiye. An jî eslê hevokê "ji hemlê re gote" ye. Li gorî vê şîroveya hanê daçek ketiye.
4. Di te'bîra "hemlê merheba"yê de dibe ku teşxîs an jî îtîbara ma yekûnu hebe. Lewra mirovê di rehma dayika xwe de be, selam li nayê dayîn.

Mahê sanî hate Şîs ez meymene

Gote min mizgîn li te ey Amîne!

"Di meha duyem de ji aliyê rast de an jî bi bereket Şîs hat û got ku Ey Amîne mizgîna min li te be."

1. Di bêjeya "Şîs"ê de îcaz heye. Di vir de bêjeya pêxember ketiye.
2. Di van malikan de ku bêjeya "mah"ê di wan de derbas dibe îcaz heye. Lewra di wan de "di" û "de" ketiye. Yanê eslê hevokê "di mahê ewwel de, di mahê sanî de" ye
3. Di "ez meymen" de îcaz heye. Lewra eslê wê "ez terefê meymene" ye.
4. Di te'bîra "ez meymene"yê de tewcîh jî heye. Lewra du wateyên wê hene. A yekem "ji aliyê raste" e. A duyem jî "bi bereket" e.
5. Di te'bîra "min mizgîn"ê de jî îcaz heye. Lewra daçeka "ji"yê hatiye ketin.
6. Di "min mizgîn"ê de dibe ku îtnab jî hebe. Lewra cînavka "min"ê nehatiba bikaranîn jî, wateya hevokê temam bû.

Mahê salis hati Îdrîsê nebî**Kir salam û mujde ber hemlê tebî**

“Di meha sêyem de jî Îdrîsê nebî hat, salam da û gote mizgîn ji bo hemla te be an jî got ji sedem hemla te mizgîn ji te re be.”

1. Wesfê “nebî”yê “ji bo tekîdê an jî ji bo qafiyê hatiye. Lewra bêjeya “nebî” nehatiba jî wateya hevokê kêm nedima.
2. Bi bêjeya “mahê”yê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra di dewsa wê de cînavk bi tenê bihata jî bes bû.
3. Di te’bîra “kir salam”ê de îstîare heye. Lewra “salam da” hatiye şibandin bi “kir salam”ê.
4. Di nivê duyem de îcaz heye. Lewra berîya bêjeya “mujde”yê lêkera “got”ê ketiye.
5. Di navbera “nebî” û “te bî”yê de cînasa naqis heye.

Mahê rabi’ Nuh û xamîs Hud û hem**Hatin û mizgînî da min ez kerem**

“Di meha çaran de Nuh û a pêncan de jî Hûd her du jî hatin û ji qencîfîyê mizgînî da min.”

1. Di vê malikê de teqşîm bi cem’ê re hatiye. Lewra di nivê yekem de teqşîm heye. Bi dû re ji bo her duyan eynî tişt hatiye gotin.
2. Di nivê yekem de îtnab heye. Lewra gihaneka “û”yê û “hem”ê her du jî di heman hevokê de ne hatina jî wate temam bû.
3. Bêjeya “hem”ê wek tekîdê xwanê dike. Wê gavê hatina gihanekê ku “û” ye zêde ye. Lewra ji alîyê wateyê îhtîyac bi bal wê namîne.
4. Di hinek nusxeyan de di şuna “ez kerem”ê de “pir kerem” hatiye. Ji bo “pir kerem” çend îhtîmal hene. Yek jê ku

wesif an jî hal be ji Îdrîs û Nûh re, a duyem ku wesif be ji bo mizgînîyê, ya sêyem jî girêdayî bi lêkera “da”yê be. Li gorî van îhtîmalan şîrovekirin cuda dibe. Lewra hal be li vir îcaz heye. Lewra wê gavê daçeka “bi” ketiye. Li gorî îhtîmala mezin wateya “ez”ê “jî” ye û ez Farisî ye. Tiştên ji bo “pir kerem” me gotin, hemû nebe jî hinek ji wan em dikarin ji bo “ez kerem”ê jî bibêjin.

Îhtîmala ku bêjeya “ez”ê di vê hevokê de kurdî be Zaîf e. Lewra wateya wê ya Kurdî di vê malikê pir ne li cî ye. Gava li vir bêjeya “ez” bi Kurdîti bê qebûlîkirin, mebest ji hatina wê tekîd dibe.

Mahê sadis Hati Îbrahîm Xelîl

Da me mizgînî ji wî hemlê celîl

“Di meha şeşan de Îbrahîmê dostê Xwedê hat û mizgîn ji bo hemla bi rûmet da me.”

1. Bêjeya “xelîl”ê ji bo pesnê hatiye û telmîh e bi bal ayeta jêrîn ve

وَاتَّخَذَ اللَّهُ إِبْرَاهِيمَ خَلِيلًا

“Xwedê Îbrahîm ji xwe re kir dost.” (en-Nîsa, 125).

2. Di dewsa cînavka “min”ê de cînavka “me” hatiye. Ev dibe ku ji sedem tewazûyê be.

3. Di navbera her du nîvê malikê de gihaneka “û”yê ketiye. Ji sedem vê taybetîyê îcaz heye.

4. Di hinek nusxeyan de di dewsa bêjeya “cemîl”ê de bêjeya “celîl” hatiye. Gava ku celîl be, divê malikê de cînasa naqis derdikeve holê.

Mahê Sabî' hati Îsmâil Zebîh**Mujde bexşî min ji wî hemlê melîh**

“Di meha heftan de Îsmâilê ku ji bo wî Xwedê Xwest bê serjêkirin hat û mizgîna hemla xweşik da min.”

1. Bêjeya “zebîh”ê hevalkar e û ji bo pesnê hatiye bikaranîn û telmîh e bi bal qurban bûna ji Xwedê re. Ev tişt di ayeta jêrê de derbas dibe.

قَالَ يَا بُنَيَّ إِنِّي أَرَى فِي الْمَنَامِ أَنِّي أَذْبَحُكَ فَانظُرْ مَاذَا تَرَى

“Îbrahîm got, Ey kurikê min! Min di xewna xwe de dit ez te serjê dikim, ka tu çi difikirî?” (es-Saffât, 102).

2. Di te'bîra “mujde bexşî”yê de îstîare heye. Lewra mizgîn dayîn bi bexşandinê hatiye şibandin.

Mahê samin hati Musa bawefa**Îbşîrî ya Amîne bî'l-mustafa**

“Di meha heştan de Musayê biwefa hat got ku ya Amîne mizgîn ji bo Mustefa ji te re be.”

1. Di te'bîra “hati musa” yê de îcaz heye. Lewra eslê wê “di xwenê de hati Musa” ye. Di hemû ciyên wek vê hevokê de îcaz heye.

2. Te'bîra “ba wefa”yê dibe ku telmîh be bi bal peymanê ku di navbera Hz. Musa û yê ku keçika xwe li wî nîkah kiriye de ye.

3. Di nîvê duyem de jî îcaz heye. Lewra berîya bêjeya “îbşîrî”yê lêkera “got”ê hatiye hezifkirin.

Mahê tasi' hati Îsa ji asîman

Mujde da min hati sultanê cihan

“Di meha nehan de Hz. Îsa ji asîmanan hat û mizgîn da min ji bo hatina sultanê cihanê.”

1. Di nivê duyem de îcaz heye. Lewra piştî hevoka “mujde da min”ê lêkera “got”ê hezif bûye”
2. Di bêjeya “sultan”ê de îstîare heye. Lewra Pêxember hatiye şibandin bi sultan.
3. te'bîra “Mahê tasi'”ê de îcaz heye. Lewra mebest jê “di mahê tasi de” ye. Di malikên din de jî berîya mahê de “di” û dû peyva li dû “mahê” tê jî “de” hatiye. Lê “di” û “de” her du jî ketine.

Ew ku çû şeş meh ji hemlê munqelîb

Gote Ebdullahî Ebdulmuttelîb

“Piştî şeş meh li ser hemla min derbas bû Ebdulmuttelîb ji Ebdullahî re got.”

1. Li vir cînavka “ew”ê na zivîre bi bal tiştêkî berîya xwe ji sedem vê xalê ev cînavk çawa ku di zimanê erebî de jî heye zemîru'ş-şen e. Lê hinekan ev cînavka hanê wek daçeka şibandinê şîrovekirine. Li gorî vê şîroveya hanê wateya wê “wekû” ye.
2. Di bêjeya “munqelîb”ê de îstîare heye. Lewra meh hatiye şibandin bi hinek tiştên ku di qelebin û deve rû dibin.
3. Li vîr ji bo “Ebdullah” du îhtîmal hene. A yekem ew e ku Ebdullah munada be û bêjeya nîdayê ketibe. A duyem jî ku “Ebdulah mefûlê lêkera “gote”yê be. Lî gorî vê şîroveyê mefûl berîya failê hatiye. Li vir ji ber berê hatina mef'ûl ji alîyê wateyê tu çewtî dernakevê holê.

Ba tîcaret dê biçî ta semtê Şam**Ez medîne bar bikî temr û team**

“Ji bo tîcaretê tu heta memlekete Şamê biçe û ji bajêr xurme û xwarin bînî.”

1. Di te'bîra “ba tîcaret”ê de îstîfare heye. Lewra “tîcaret” hatiye şibandin bi hevaleyê. Lê tîcaret ne tişteke ku meriv pê re hevaltîyê bike. An jî li vir “ba” bi wateya sebebê hatiye bikaranîn. Tişteke din jî dibe ku li vir mebest ji tîcaretê eşayayên tîcaretê be. Li gorî vê şîroveya hanê mecaza mursel li vir heye. Lewra musebeb hatiye gotin. Lê sebeb hatiye qesdkirin. Li gorî vê şîroveyê sebeb merasima ji bo wîladeta Hz. Pêxember e. Musebbab jî tîcaret e.

2. Di te'bîra “bar bikî”yê de du tişt hene. Ya yekem ku li vir mecaza mursel heye. Lewra “bar bikî” sebebe e û mebest jê “bînî” ye. Di vê malikê de lêkerên “biçî”, “bar bikî” ji alîyê lefzê xeberîyê ye û ji alîyê wateyê înşaiyê ye.

3. Di “medîne”yê de li gorî qenaeta me du îhtîmal hene. A yekem ji bo ehda zîkrî be. Yanê mebest jê Medîne “Şam” e. Lewra Şam derbas bûye. A duyem jî ku mebest jê Medîna Munewwere ye.

4. Di bêjeya “semt”ê de mecaza mursel heye. Lewra cuz hatiye zikirkirin kull hatiye qesdkirin. Mebest ji semtê şehre Şamê bixwe ye.

5. Bi bêjeyên “temr û team”ê îtnab hatiye îcrakirin, Lewra temr beşek ji teamê ye. Di vir de piştî xususê de umûm hatiye. Ji vê te'bîrê re zikra ‘umûm piştî xususê hatiye gotin.

Wê dema dê Amîne kodek bibî

Yek diyâfet lazime dawet bibî

“Gava ku ji Amîne re zarokek bibe, gazîkirina mirovan û dayîna xwarînêk pêwîst e.”

1. Bêjeya “yek”ê zaîd e. Ji bo tekîdê hatiye.
2. Bêjeya “bibî” hatiye tekrarkirin.
3. “Dê” ji bo tehqîq jî ji bo zeman jî tê bikaranîn.
4. Bêjeya “kodek”ê îsmê tesxîr e. Dibe ku mebest jê merhemet an jî hezkirin be.

5. Bi bêjeyên “diyafet” û “dawet”ê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra wateyên wan nêzîkî hev in. Bêjeya “diyafet”ê ûmûm e, mebest li vir jê xusûs e ku ew jî “welîme: xwarina dawetê” ye. Wê gavê li vir mecaza mursel heye.

6. Di hinek nusxeyan de di dewsa “dawet bibî”, “dawet nebî” û di hinekan de jî “da fevt nebî” hatiye. Li gorî wateyê herî rast jî “dawet bîbî” ye.

7. Di vê malikê de lêkera “bibî”yê ji bo qafiyê hatiye dubarekirin. Dibe ku di navbera her du lêkerên “bibî” de cînasa tam hebe. Lewra wateya vê lêkerê li gorî bêjeya pê re diguhere.

Ebdullah an mahirûyê gul’îzar

Der medîne şerbeta mergê vexwar

“Ebdullah ku gepên wî wek gulên û rûyê wî jî wek hîvê bû di wê mehê de li Medîneyê şerbeta mirîne vexwar.”

1. Di te’bîra “şerbeta mergê”yê de îstîfara heye. Lewra “mirin” hatiye şibandin bi tiştêkî ku şerbeta wî heye. Bi dû re jî muşebbehun bih nehatiye, lêbelê tiştê têkilîya wî bi muşebbehun bih ve heye hatiye. Ji sedem van tiştan di vir de îstîfara meknîyye û texyîlîyye heye. Bêjeya “vexwar” jî mulaîmê

mustearun minh e. Li gorî vê şîroveyê jî li vir îstîareya terşîhîyye heye.

2. Di te'bîra "mahê rûyê"yê de îdafeya teşbîhîyyê heye. Lewra eslê wê "rûyê wek hîvê" ye.

3. Di te'bîra "gulîzar"ê de jî îdafeya teşbîhîyyê heye. Lewra mebest jê wechê an jî cênîkê ya jî gepên wî yên wek gulan e.

'Umrê 'Ebdullahi bîst û pênc sal

Borîn û kir wî ji dunya îrtîhal

"Ebdullah temenê wî bîst û pênc sal bû û ji dinyayê koçkir."

1. Te'bîra "kir ...îrtîhal" kînaye ye ji mirinê.

2. Di hinek nusxeyan de "bîst û pênc sal" hatiye nivîsandin. Li gorî van nusxeyan îcaz heye. Lewra di hinekan de gihanek nehatiye gotin.

3. Di vê malîkê de îcazek din jî heye. Lewra pêwîst e ku di serê malîkê de tişteki wek bêjeyên "gava" û "bû" heban.

4. Di hevoka "kir wî ji dunya îrtîhal"ê de qelba mekanî heye. Lewra eslê wê "wî ji dinyayê îrtîhal kir" e.

Zanî 'Ebdulmutilib ew waqî'e

Her du çavê Amîne bûn damî'e

"Gava ku Amîne ev bûyera hanê ji Ebdulmutilîb hin kir an jî bihîst, her du çavên wê tije hêsir bû."

1. Di hinek nusxeyan de di dewsa "zanî"yê de bêjeya "çûn"ê hatiye. Di bêjeya "çûn"ê de tewcîh heye. Lewra di vir de ji bo vê peyvê sê wate mimkun in. Wateya yekem "gava" ye. Li gorî vê wateyê li vir şert û cewab heye. A dudiyan jî "çû" ye. Li gorî vê wateyê jî îcaz heye. Lewra wateya wê wê gavê "ji sedem vê waqîayê her du çavê Amîne tije hêsir bû" ye. An jî wateya wê

“ev bûyer ji ‘Ebdulmuttelib gihîşt an jî çû bal Amîne” ye. A sêyem jî ku bi wateya “wek” be. Li gorî vê şiroveyê li vir qelba mekanî û şibandin hene. Lewra Amîne girîya û biberket çawa ku Ebdulmuttelib jî bi berket”

2. Di “ew”ê de dûrxistin û nexwestin heye. Lewra behsa mirinê hatiye kirin. Li gorî wê pêwîst e ku “ev” bihata. Lêbelê ji bo dûrxistin û nexwestinê cînavka “ew”ê hatiye.

3. Di te’bîra “bûn damî’e” de mecaza mursel heye. Lewra mebest jê girîna yan jî mehzûn bûna Amîne” ye.

4. Di te’bîra “her du”yê de tekîd heye. Lewra bêjeya “çav”ê tenê jî bes bû.

Kan hebîbê min dilê min bû du nîm

Ah û hesret kodekê min ma yetîm

“Got ku dildarê min ‘Ebdullah kanê û qelbê min bû du parçe, ax û wax biçûkê min sêwî ma.”

1. Bêjeya “hebîb” ji “Ebdullah”î kînaye ye. Amîne ji bo diyar kirina hesret, huzn û hezkirina xwe diyar bike bêjeya “hebîb” bikaranîye.

2. Di te’bîra “dilê min bu du nîm” de îstîfere heye, Lewra ji sedem tesîra êş û giranîya wefata Ebdullahî qelbê xwe şibandîye bi tiştên ku dibe du parçe.

3. Di pîrsa “kan hebîbê min” de tehessur heye.

4. Di hevoka “kodekê min ma yetîm” de mecaza mursel heye. Lewra vê hevoka hanê bi îfîbar ma yekun e.

5. Di te’bîra “ah û hesret”ê de tekîd û îtnab heye. Lewra wateya wan wek hev e.

Esmerê min ma û xelqê kariwan**Hatin û peyda ne ew rûh û rewan**

“Esmerê min Ebdullah ji xelqê kariwan şunda ma. Ew hatin. Lê rûh û canê min ne hat.”

1. Di hinek nusxeyan de di dewsa “û” yê de “ji” heye. Li gorî van nusxeyan gihanek di navbera “ma” û “xelq”ê de ketiye. Eslê wê “ma û xelqê” ye. Li gorî vê şîroveya hanê hevokek bi hevokêk din ve hatiye girêdan. Ji sedem bikaranîna gihanekê li vir vesil heye. Li gorî nusxeyên ku “ji”ê di wan de derbas dibe. Nîvê yekem hemû hevokek e. Nîvê duyem jî du hevok e û gihaneka girêdanê û kirde ketiye. Li gorî vê şîroveyê “û ew hatin” e

2. Bi bêjeya “xelqê” îtnab hatiye îcrakirin. Lewra di vir de xelq tune be jî. Wate kê nabe.

3. Di te’bîra “rûh û rewan” de jî îtnab heye. Lewra wateya wan nêzîkî hev e.

4. Di “rûh û rewan” de hêzkirin û hesret jî heye.

5. Di hinek nusxeyan de di şuna “rewan”ê de “rewan” hatiye.

Dar û ber bo wê girîn wê sa’etê**Av û rohnîk nadinê qet muhletê**

“Dar û kevir û her tişt wê seetê ji bo musîbeta li ser Amîne girîyan û hisêrên çavên wê qet ne sekînê.”

1. Di “dar” û “ber”ê de ûmum bûna hikum heye. Lewra mebest jê “her tişt biber wê ketin” e.

2. Heke bi çavê mucize lê neyê mêzekirin di “dar û ber bo wî girîn” de îstîare heye. Bi çavê mucîzê lê bê nêrîn heqîqet e û îstîare tune ye.

3. Berîya “bo”yê daçeka “ji”yê ketiye. Ji sedem wê îcaz heye.
4. Di vê malikê de îcaz heye. Lewra eslê wê di wê seetê de” ye.
5. Di te’bîra “ab û rohnik”ê de cem’ ‘ heye. Lewra “rohnik” ji bo însanan ku”hêsr e; “ab” ji bo mexlûqatên din e. Lêbelê her du jî dibinê hikmekî de hatiye komkirin. Li gorî hinek îzahan “ab” hêsr e; rohnik jî bêjeya abê îzah dike. Gorî vê şîroveya hanê em dikarin bibêjin li vir ji bo mubalexeyê îstîare hatiye bikaranîn. Lewra hêsrên mirovan bi avê hatiye şibandin.
6. Bêjeya “qet”ê de îtnab heye. Lêbelê ji bo tekîdê ye.

Hem melek rabûn û gotin ya kerîm

Nê hebîbê te Muhammed ma yetîm

“Melek jî hemû bihev re rabûn û gotin ya Xwedayê kerîm bêguman hebîbê te Muhammed sêwî ma.”

1. Di lêkera “rabûn”ê de kînaye heye. Lewra ji vê lêkerê wateya mecazî jî û ya heqîqî jî dibe bê qesdkirin.
2. Li vir “ya kerîm” ji bo diayê hatiye bikaranîn.
3. Di nivê duyem de îtnab heye. Lewra bêjeya tekîdê hatiye ku ew jî “nê” ye. Mixateb Xweda ye. Xweda bi hemû tiştan baş zane. Pêwîstî bi bal tekîdê nîne. Lê îtnab dibe ku ji bo weznê be.
4. Bêjeya “Muhammed”î ji bo lezzeta di zikra “Muhammed”î de hatiye. Lewra Muhammed ne hatiba gotin jî wate dihat famkirin. Li vir “Muhammed” bedelu’l-kull e.

Maliku’l-mulkê mezin da ev cewab

Çêtirim bo wî ji xêra da û bab

“Xwedîyê mulkê mezin ev cewaba hanê da û got ku ez ji bo wî ji alîyê xêrê ve ji dê bavan çêtirim.”

1. Di bêjeya “ev”ê de îtnab ji bo tekîd hatiye îcrakirin. Lewra cînavka “ev”ê nehatiba bikaranîn ji wate تمام bû.
2. Di nivê duyem de îcaz heye. Lewra mebest jê “xêra min ji wî re ji xêra dê û bavên çêtire” ye.
3. Di navbera “da û bab” de tîbaq heye.
4. Di “da û bab”ê de mecaza mursel heye. Lewra her du bêje ji bo umûmê ye. Lê mebest jê Dê û bavê Hz. Pêxember in.

Ey Xudawendanê ‘eqlê mustaqîm

Kes nizânit qîmeta durra yetîm

“Ey xwedîyên aqilê rast! Kes qîmeta durra ku sêwî ma ye nîza ne.”

1. Di “ey xwendanê aqilê mustaqîm”ê de îrşad heye. Lewra gazîkîrin li vir ji bo îrşadê hatiye bikaranîn.
2. Di te’bîra “kes nizânit”ê de îcaz heye. Lewra mebest jê Umûm e. Li gorî vê şîroveya hanê eslê wê “tu kes” e.
3. Bi bêjeya “mustaqîm”ê de, tekîd heye. Lewra ev bêje nehata bikaranîn ji wateya wê tê famkîrin.
4. Di “durra yetîm”ê de îstîfare heye. Lewra Hz. Pêxember hatiye şibandin bi “durr”ê ku Hz. Pêxember muşebbeh e û nehatiye zikîrkirin. Lê gorî vê taybetîya hanê di vîr de îstîfarea tesrîhîye heye. Lêbelê di bêjeya “yetîm”ê de jî îstîfarea tecrîdîye heye. Lewra “yetîm” mulaîmê muşebbehê ye. Li vir qerîne dibe ku malika jorê be.

Mijara Yazdehem: Hatina Hz. Pêxember bi bal Dinyayê

Ez rebî’u’l-ewwel a şev rewşen e

Heştî şev borîn li hemlê Amîne

“Ji meha rebî’u’l-ewwela ku şevên wê ronî bûn heşt şev li ser hemla Amîne derbas bû.”

1. Di bêjeya “rewşen”ê de îstîfare heye. Lewra xweşikî û rindîtîya ku Hz. Amîne di wan şevan dîtîye hatiye şibandin bi ronahîyê. Ji sedem vê xala hanê îstîfareya tesrîhîyye heye û ji sedem tu mulaîm nehatiye jî îstîfareya mutleqa heye.
2. Di nivê yekem de dibe bêjeya “ser”ê ketibe. Li gorî vê şîroveyê li vir îcaz derdikeve holê.
3. Di nivê duyem de îcaz heye. Lewra eslê wê “borîn li ser hemla Amîne” ye.
4. Di bêjeya “şev”ê de îtnab heye. Lewra bêjeya “şev”ê nehata tekrarkirin jî wate tema bû.

Ya Nehê Zaîl bû jê tirs û ‘îna

Ya dehê bû mujde der xîf û mina

“Di şeva nehan de tirs û zehmetî ji ser Amîne rabû û di ya dehan de jî di navbera Xîf û Mînayê de an jî di navbera tirs û hêviyê de mizgînê girt.”

1. Di nivê yekem de îcaz heye. Lewra mebest jê “di ya şeva nehan de” ye. Di nivê duyem de jî mebest jê “di ya şeva dehan de” ye.
2. Di vê malikê de îcaz heye. Lewra li dû “nehê” û “dehê” de “da” ketiye.
3. Dibe ku nivê duyem de qelba mekanî hebe. Lewra “mujde bû” baştir xuya dike.
4. Ji bo bêjeyên “xîf û mîna” hatiye gotin ku “Xîf” navê mescîdekê ye û “Mîna” jî navê ciyên dora wê ye. Lêbelê dibe ku mebest ji “xîf û mina”yê tirs û hêvî be.
5. Gava “xîf” û “mîna” ne navên ciyekî bin, em dikarin bibêjin li vir tîbaq heye. Lewra wateya wan zidê hev e.

Yanzdehem bû xûlxûl û awazi hem**Zemzem û tesbîhi der hindî herem**

“Şeva yanzdan ji ber kêf û mizgînê ji aliyê însanan û cinan hemû dengê tesbîh û zikr ket tamamê heremê.”

1. Di nivê yekem de îcaz heye. Lewra mebest jê “di yanzdehem de” ye.

2. Bêjeya “hem”ê ji bo tekîdê ye. Lewra “û” û “hem” her du jî gihanek in. Gihaneka “û”yê îhtîyac bi bal hemê nahêle. Li gorî vê şîroveya hanê “hem” di vê malikê de zâid e. Lê faydeya wê tekîd e.

3. Di “xûlxûl, zemzema û awaz”ê de îtnab heye. Lewra wateyên wan nêzîkî hev in.

4. Di bêjeya “hindî”yê de tekîd heye. Lewra wateya wê “hemû” ye.

5. Di hinek nusxeyan de di dewsa “zemzem û tesbîh”ê de “zemzema tesbîhi” hatiye. Li gorî wateyê ev şekil baştir e. Li vir îhtîmala mecaza mursel heye. Lewra dibe ku mebest ji tesbîhê musebbîh be.

Diwazdehem helbû şemala Dewletê**Amîne ma bû tenê der xelwetê**

“Şeva dozdan de çira dewlemendiyê vêket û wê şevê Amîne bi tenê li mala xwe ma.”

1. Di bêjeya “diwazdehem”ê de jî wek malikên berê îcaz heye.

2. Di nivê duyem ji sedem mubalexeyê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra ji “ma bû tenê” “der xelwetê” jî tê famkirin.”

3. Gava bêjeya “dewletê” bi wateya “quwet, dewlemendî”yê an jî “îdare”yê be, li vir îstîfare heye. Lewra ew

hatiye şibandin bi çiyê ku çira an jî lembe tê de vêdikeve. Bi dû re muşebbehun bîh nehatiye gotin. Lêbelê muşebbeh hatiye gotin û tiştê girêdayê bi muşebbehun bîhê ve ye jî hatiye zikirkirin ku ew jî şemal e û wateya wê jî “mum an jî çira” ye. Li gorî vê şîroveyê di vir de îstîareya meknîyye heye. Girêdana şemalê bi dewletê ve jî dibe îstîareya texyîlyye. Bi bêjeya “helbû”yê jî îstîareya terşîhîyye hatiye îcrakirin. Lewra li vir “helbû” mulâimê muşebbehun bîhê ye.

Li gorî hinekan “dewlet” bi wateya “kâinat”ê an jî bi wateya “dewlet”ê bixwe ye. Wê gavê îstîareya tesrîhîyye û eslîyye di bêjeya “şemal”ê de heye. Lewra Îslam, an jî Hz. Pêxember bixwe bi çirayê hatiye şibandin. Li vir ravek qerîne ye ji bo îstîareyê.

4. Dibe ku di bêjeya “xelwet”ê de jî îstîare hebe. Lewra xelwet wek mekanekî hatiye fikirkirin.

Wê şevê der Ke'be Ebdulmuttelîb

Mabû, bo te'mîrê erdê munqelib

“Di wê şeva ku Hz. Pêxember tê de hate dinyayê ji bo temîra Ke'be Ebdulmuttelîb li Kebê bû.”

1. Di “wê şev”ê de îcaz heye. Lewra mebest ji vê raveka hanê “di wê şevê de” ye.

2. Di “erdê munqelib” de kînaye heye. Lewra li vir mebest ji erdê Ke'be ye.

3. Di hinek nusxeyan de di nîvê duyem de “bo” heye û di hinekan de jî vê bêjeya hanê tune ye. Di hinekan de jî di dewsa “bo”yê de “ber” hatiye. Gava yek jî ji wan neyê îcaz derdikeve holê.

Amîne go mam tenê bê mêt û jin**Ez demek tirsam û lerzî hate min**

“Amîne got ku ez tenê mam û mêt û jin tu kes li cem min nema. Gavek tirsê ez girtim û lerizîm.”

1. Di nîvê yekem de bihêzkirina wateyê heye. Lewra bêjeya “tenê” nehata bikaranîn jî wateya hevokê temam bû.
2. Di navebra “tirsam û lerzî” de eleqa sebeb û musebbeh heye. Lewra tirs sebebê lerze ye.
3. Di navbera “mêt” û “jin”ê de tîbaq heye. Lewra zidiyet di navbera wan de heye.
4. Di hinek nusxeyan de di şuna lêkera “go”yê de “got” hatiye. Ji ber vî tiştê hanê wê gavê li vir îcaz heye. Lewra tîpa “t”yê nehatiye bikaranîn.
5. Di nîvê duyem de tewcîh heye. Lewra bêjeya “demek”ê dibe bi wateya zemanek hindik be û dibe ku bi wateya zemanekî dirêj be jî. Li gorî qenaeta me, li vir “demek” bi wateya zemanekî kurt e.
6. Di “lerzî hate min”ê de îtnab heye. Lewra di dewsa vê hevokê de “lerizîm” kafî bû.
7. Di navbera her du ristan de gihaneka “û”yê heye. Li gorî vê şîroveya hanê li vir îcaz heye.

Min dî xanî rohnî bê xayet belê**Çari jin hatin ji ruknê menzelê**

“Min dit ku mal pir -an jî çavîya ku ez tê de bûm- rohni bû û çar heb jin ji goşê malê derketin û hatin.”

1. Di te'bîra “bê xayet”ê de ji bo mubalexeyê îtnab hatiye îcrakirin.

2. Bêjeya “belê”yê hinek dibêjin ku ji bo îstîdrakê ye. Lê di vir de îhtîyac bi bal îstîdrakê ve tune ye.

Li vir bêjeya “belê” ji bo pîrsek bersîvê be, xweştir e. Her wekî pîrsek veşartî hatiye hişê helbestvan û wî cewab daye û wateyê tekîd kiriye.

3. Di nîvê duyem de îcaz heye. Lewra wateya wê “ji alîyê ruknê” ye. Bêjeya “alîyê” ketiye.

4. Di hinek nusxeyan de di dewsa “bê”yê de “bû” hatiye. Li gorî qenaeta me. Ji ber sê xalan “bû” li vir bê, baştir dibe. Lewra gava “bû” be. A yekem hezif çênabe. A duyem jî wateya hevokê xweştir tê famkirin. A sêyem bêjeya “xayet”ê bi tenê ji bo mubalexeyê dibe.

Gava “bê” be. îcaz derdikeve holê. Lewra berîya “xanî”yê teqdîra daçeka “bi”yê pêwîst e. Ev daçek neyê teqdîrkinin, wateya hevokê tekûz nabe.

Di hinek nusxeyan de jî “rohnî bû bê xayet belê” ye. Her du bêje bi hev re bin baştir e. Lewra lêker jî wateya mubalexeyê jî her du bi hev re di hevokê de kom dibe.

Ba cemal û husn û nûranî qemer

Hulleyê îstebreq û sundus dîber

“Bi xweşikî, rindîtî û bi ronahîya hîvê tevî ku li ser wan kincên ji îbrîşîm yê n qalîn û yê n tenîk hebûn hatin.”

1. Di “cemal” û “husn”ê de îtnab heye. Lewra yek ji wan neyê bikaranîn jî ji alîyê wateyê tu kêmanî dernakeve holê.

2. Di vê malikê de mura’etu’n-nezîr heye. Lewra her du nîvê malikên jî di nav xwe de wateyên nêzîkî hev anînin ziman.

3. Di “nûranî qemer”ê de dibe ku îstîfere hebe. Li gorî vê şîroveya hanê dibe ku muşebbeh “wechê wan” be û dibe ku muşebbeh “şexsê wan” be û qemer jî muşebbehun bîh be. Di her

du halan de jî îstîfareya tesrîhîyye û eslîyye heye. Bêjeya nûranî jî dibe îstîfareya terşîhîyye.

4. Di nîvê duyem de îtnab heye. Lewra piştî umûmê xusûs hatiye. “Hulle” ji bo umumê ye. “Sundus” û “îstebreq” jî ji bo xususê ye.

5. Di “nûrânî”yê de jî dibe ku şibandin hebe. Li gorî vê taybetîya hanê wateya “nûrânî qemer”ê “ronahîya wek hîvê” dibe. Daçeka şibandinê ketiye.

Le'leha têrav û ava kewserê

Zulfeha sed te'ne dane 'enberê

“Lêvên van jinan ji ava kewserê têrbûn û bîna ji porê wan dihat sed car bîna enberê eybdar dikir.”

1. Di vê malikê de bêjeya “têr”ê dibe ku “ter” ji bê xwendin. Gava “ter” bê xwendin wateya wê “şilbû” ye. Li gorî vê şîroveya hanê li vir mebest wateya heqîqî ye. Gava “têr” bê xwendin mecaza mursel heye. Lewra leleha cuz e; lêbelê kull hatiye qesdkirin.

2. Di “te'ne dane”yê de îstîfare heye. Lewra mebest jê “eybdar kir û lekedar kir” e. Ev jî muşebbeh e û tane dane jî muşebbehun bîh e.

3. Di “ava kewser”ê de telmîh bi bal ayeta jêrê ve hatiye kirin.

إِنَّا أَعْطَيْنَاكَ الْكَوْثَرَ

“Bêguman me pir xêr û bêr da te.” (el-Kewser, 1).

4. Mebest ji bêjeya “sed”ê ne hejmar e. Belkî mubalexe ye.

5. Ev malik di nusxeyan de bi awayên cuda hatiye. Di hinekan de “leliha têrav û ava kewserê” ye. Bi rastî bi vî awayê wate ne xweş e. Li gorî van nusxeyan “ji” ketiye ku ew jî îcaz e. Wateya wê jî “ji ava dinê û axiret tev têr bûne” ye.

6. Di nîvê duyem de dibe ku berîya “zulfeha” û “enberê” mudaf ketibe. Ew jî “bêhn” e. We gavê di vir de jî îcaz heye.

Bejn û bala serw û sîmayê şefaf

Min şibandin tuxmeê ‘Ebdulmenaf

“Bejn û qama wan a wek dara selvê û sîma wan jî diyar bû, min wan şibandin bi jinên ku ji nesla Ebdulmenaf in.”

1. Di bêjeyên “bejn” û “bala”yê de îtnab heye. Lewra wateya her du bêjeyan yek e. Bejn Kurdî ye; bala jî Farisî ye. Mebest ji bikaranîna wan bihêzkirina wateyê e.

2. Di “bejn û bala serw”ê de şibandina belîx heye. Lewra wechê şebêhê û daçeka şibandin ketiye.

3. Di nîvê yekem de îcaz heye. Lewra lêkera pêveberê an jî qetafa wê ketiye ku ew jî “bû” an jî “e” ye.

4. Di “tuxme”ê Ebdulmenaf de îtîbarê ma kane heye. Ji sedem vê şîroveya hanê mecaza mursel hatiye bikaranîn. Tuxme hatiye zikirkirin. Lêbelê mirov hatiye qesdkirin.

5. Di “min şibandin”ê de îcaz heye. Lewra mefulê şibandinê nehatiye. Ku ew jî cînava “wan”ê ye. Di hinek nusxeyan de di dû “sîmayê” de cînavka “wan”ê nehatiye. Li gorî vê tesbîta hanê li vir îcaz heye.

Yek li destê rastê hat û yek li çep

Yek li piştê yek li pêşmin ba edeb

“Yek ji wan li alî rast, yek jî li alî çep, yek ji wan jî ji alîyê pişt min û ya di jî tarafê pêş ve bi edeb hatin li cem min sekinîn.”

1. Di navbera peyvên “rast” û “çep”ê de tîbaq heye. Lewra her du li hemberî hev in.

2. Di bêjeya “dest”ê de jî mecaza mursel heye. Lewra hal hatiye gotin. Lê mebest jê mehella e.

3. Di vê malikê de li dû bêjeyên “destê” û “piştê” de cînavka “min” ketiye. Ev jî îcaz e.

4. Berîya bêjeya “çep”ê bêjeya “dest”ê ketiye. Ev tiştê îcaz û îktîfa tev e.

5. Di “pişt” û “pêş”ê de jî tîbaq heye. Di navbera van her du bêjeyan de jî dijabatî heye.

6. Di bêjeya “çep”ê de îcaz heye. Lewra berîya bêjeya çepê pêwîst e ku bêjeya “dest”ê bihata bikaranîn. Di vê malikê de lêkera “hat”ê carek bi tenê hatiye. Di her sê ciyên din de tenazu û îcaz heye. Lewra lêkera “hat”ê ketiye û tevî ketina wê jî ew ji bo te’bîra “yek li çep û yê din” amil e.

7. Te’bîra “yek li” hatiye dubarekirin.

Ew kî bûn Hawwa û Sare Asiye

Ya li pêşim Meryema ‘Îmranî ye

“(Heke bê gotin) Ew kî bûn? Ew, Hawwa û Sare û Asiye bûn. Ya li pêş min jî Meryema keça Îmranî bû.”

1. Pirsê “ew kî bûn”ê ji bo haydarkirina mixateban hatiye bikaranîn.

2. Di te’bîra “Meryama ‘Îmranî”yê de îcaz heye. Lewra mebest jê “Meryema keça Îmran” e.

3. Di vir de îcaz heye. Cewaba pirsê bi bêjeya “ew”ê destpêdike. Lêbelê ji sedem ku cînav bê diyarkirin jî tê famkirin. Li vir “ew” nehatiye gotin.

Meryemê husn û melahet zêde bû

Pal vedayî wê, ji bo min tekye bû

“Xweşîktî û rindîtiya Meryemê ji yê dinan pirtir bû. Piştî xwe da bû tiştêkî û ji bo xizmetkirinê ji min re amade bû.”

1. Di bêjeyên “husn û melâhet”ê de îtnab heye. Lewra wateya her du bêjeyan wek hev e. Mebest ji bikaranîna wan bi hev re tekîd e.
2. Di “pal vedayî bû”yê de kînaye heye. Lewra li vir wateya heqîqî û mecazî her du jî mimkun e.
3. Di cînavka “ew”ê de tekîd heye. Lewra ev cînavk nehata bikaranîn jî wate tamam bû.
4. Lêkera “bû”yê hatiye tekrarkirin.

Nagehan bû zemzem û tesbîh û deng

Ba luxathayê muxalif rengereng

“Ji nişgava deng û tesbîhên cuda cuda bi zimanên cure cure derket holê.”

1. Di navbera “zemzem, tesbîh û deng”ê de tekîd heye. Lewra wateyên wan pir nêzîkî hev in.
2. Di navbera “muxalif rengereng”ê de jî tekîd heye. Lewra wateyên wan jî nêzîkî hev in.
3. Di “rengereng”ê de îstîare heye. Lewra mebest jê şibandina dangan bi rengan e. Ji sedem vê taybetîyê li vir îstîareya tesrîhîyye heye.
4. Di navbera “deng” û “reng”ê de cînasa naqis heye.

Rast û çep min dî kewakîb têk firrîn

Qafi ta qafi cîhan bû enwerîn

“Ji alîyê rast û çep stêrk tev min dî bi hev re firîyan. Ji qaf heta qafê cîhan hemû rohnî bû.”

1. Di bêjeyên “rast” û “çep”ê de tîbaq heye.

2. Di rîsta “qafi ta qafi”yê de kînaye heye. Ji qafê mebest temam erdê ye. Di vir de dibe ku mecaza mursel jî hebe. Heke em bibêjin cuz zikr bûye û meqsed jê kull e.

3. Di lêkera “firîn”ê de dibe ku îstîfareya tebeîyye hebe. Lewra stêrk nafirin. Lê “bela di bin û wenda dibin.” Ji vî tiştê ku em dibêjin dibe ku li vir “belabûn” hatibe şibandin bi firandinê.

4. Di “qafi ta qaf”ê de îcaz heye. Lewra berîya qafa yekem bêjeya “ji” ketiye.

5. Bêjeya “têk”ê bi wateya hemû ye. Ji ber vê taybetîya hanê li vir ji bo tekîdê îtnab hatiye îcrakirin.

Pêkve dunya min dî bû yek qursê nûr

Meşrîq û mexrîb didîtin min ji dûr

“Min dît ku dinya hemû bû parçekî ronahî û min rojhilat û rojava ji dûr ve dîtin.”

1. Di risteya yekem de şibandin heye. Lewra dinya hatiye şibandin bi parçê nûrê.

2. Di navbera “meşrîqê û mexrîb”ê de tîbaq heye.

3. Di “nûr” û “dûr”ê de cînasa naqis heye.

4. Di bêjeya “pêkve”yê de tekîd heye.

Keski Alayek di mexrîb da me dî

Yek li şerqê yek li banê ke’be dî

“Ala kesk me wê li alî rojava dît û yek jî li alî rojhilat ya di jî li ser banê Ke’bê me dît.”

1. Di navbera “şerq û mexrîb”ê de tîbaq heye.

2. Bêjeya “yek”ê ji bo tekîdê hatiye tekrarkirin.

3. Di “keskê ala” de îdafeya sifetê bi bal mewsûfê ve heye. Lewra ji aliyê esil di dewsa “keskê ala”yê de “alaya kesk” e.

4. Di nîvê duyem de îcaz heye. Lewra “me” ku kirde ye nehatiye bikaranîn.
5. Lêkera “dî” yê hatiye dubare kirin.

Emrê Cebrâîl kirî mîrê mezin

Mujde da ehlê semwat û zemîn

“Xwedayê mezin emrê Cebrail kir got ku mizgîn bide ehle asîmanan û erdê.”

1. Di “mîrê mezin” de muşakele heye. Lewra bi sedem behsa Hz. Resûlullah hatiye kirin ji bo Xwedayê teala ji bêjeya ji bo mirovan hatiye bikaranîn. Mebest jê “Xwedê emir kir û Cebrâîl jî mîzgîn da” ye.
2. Di berîya nîvê duyem de teqdîrkirina lêkera got xweş dibe. Ji ber vê teqdîra hanê li vir îcaz heye.
3. Di navbera “semawat” û “zemîn” de tîbaq heye.
4. Di hinek nusxeyan de di dewsa “semawat û zemîn” de “semawatan ji bin” hatiye. Te’bîra “ji bin” umûm e.

Daketin dergahê nîran nagehan

Şahiyanê hor û ridwanê cînan

“Derên cehennemê ji nişgava hatin girtin û kêfxweşî ket nav horî û nobetdarên cenetê.”

1. Di navbera “nîran” û “cînan”ê de tîbaq heye.
2. Di lêkera “daketin”ê de îstîare heye. Lewra mebest jê “daketin” “girtin” e. Lêbelê ji bo minasebet bi “nagehan” ve çêbibe lêkera “daketin”ê hatiye bikaranîn.
3. Di “şahiyanê hor û ridwan cînan” de mubteda û xeber cî guhertine. Ev jî teqdîm e.

4. Di nîvê duyem de îcaz heye. Lewra mudafu îleyhîyê bêjeya “hor”ê ketiye ku ew jî “cînan” e.

5. Di “ridwan”ê de mecaza mursel heye. Lewra mebest jê mihafizê cenetê hemû ne.

6. Dibe ku di “dergah”ê de îstîfareya meknîyye û texyîlîyye hebe. Lewra li gorî vê şîrovevê dergah hatine şibandin bi tiştêkî xwedî îrade û bi dû re jî muşebbehun bîh nehatiye. Lêbelê lazimê muşebbehun bîhê ku ew jî “daketin” e hatiye bikaranîn.

Xulxulîn horî di qesrê cennetê

Kî dizanit kar û barê qudretê

“Di koşkên cenetê de horî ji ber hatina Hz. Pêxember bi bal dinyayê ve kêfîkirin û kî karê û emrê Xwedê dizane? (kes nizane)”

1. Bi “kar û bar”ê ji sedem tekîdê îtnab hatiye îcrakirin.
2. Di nîvê yekem de îcaz heye. Lewra li vir bêjeya “de”yê ketiye.
3. Mebest ji pîrsa “ki dizanit”ê de pîrs nine. Belkî mebest jê neyînî ye. Yanê bêyî Xweda kes nizane.
4. Di bêjeya “qudretê”ê de kînaye heye. Lewra mebest jê Xweda ye.

Hati Cibrîl û melâîk fewci fewc

Çar kenarê mekkehê bûn mewci mewc

“Cebraîl û melaîket bir bi bir hatin û çar alî Mekehheyê pêl pêl tije kirin.”

1. Bi tekrara “mewc û mewc” û “fewc û fewc”ê wate hatiye tekîdkirin.

2. Nîvê duyem ji yekem re wek tekîd e. Lewra wateya wê wek a yekem e.

3. Di Cebrailê de texlîb heye. Lewra Cebrail tenê bixwe fewc nabe. Lêbelê hukmê pirjimarîyê hatiye nisbetkirin bi bal wî ve jî. Ji ber vê xala hanê Cebrail jî wek fewcekî hatiye bikaranîn. Ku ew jî “melaîk” in.

4. Di “Cebrail û melaîk” de îtnab heye. Lewra li vir ‘umûm bede’l-xusûs heye.

5. Di nîvê duyem de îcaz heye. Lewra berîya “bûn”ê lêkera “tije”yê ketiye.

Nagehan ez têhnî bûm wê sa’etê

Min dî da destê me tasek şerbetê

“Ji nişgava de ez di wê seetê de tî bûm, min dî ku Cebrail qedehek şerbet da destê min.”

1. Di “wê sa’ete” de îcaz heye. Lewra mebest jê “di wê sa’ete de” ye.

2. Mebest ji cînavka “me” te’zîm” e. Lewra li vir Hz. Âmîne behsa xwe bi tenê dike.

3. Di hinek nusxeya di dewsa “tasek”ê de bêjeya “camek” hatiye. Li gorî van nusxeyan di şuna fer’ê cins hatiye. Lewra cam ji bo tasan carna dibe cins.

Sippî wek şîrî we şêrîn wek ‘esel

Nê ji wê şîr û ‘esel bûne mesel

“Ew şerbet wek şîrê sippî û wek hingiv jî şêrîn bû. Ji sedem vê şerbetê şîr û hingiv di sippî bûn û şêranîyê de bûn mînak.”

1. Di vê malikê de di nîvê duyem de du caran şibandin hatiye îcrakirin.

2. Di nîvê yekem de îcaz heye. Lewra eslê wê “şerbet wek şîrî sippî” ye.
3. Di navbera “mesel û esel”ê de cînasa naqis heye.
4. Di nîvê yekem de du heb şibandin bi daçeka “wek” hatiye îcrakirin.
5. Bêjeyên “şîr” û “esel”ê jî hatine dubarekirin.

Min vexwar û têhnî çû halî ji min

Teyrekî sipî hat û permalê di min

“Gava min vexwar têhnîya min nema û çivîkekî sipî hat û perên xwe da ser min.”

1. Di “min vexwar”ê de îcaz heye. Lewra cînavka “ew”ê ketîye.
2. Di “çû”yê de îstîareya tesrîhîyye ve tebeîyye heye. Lewra “tîhnîtî naçe. Bi tenê namîne.
3. Bêjeya “min” tekrar bûye.
4. Te’bîra “fi’l-hal”ê mebest jê “zûbûne” û wate bi wê bihêztir bûye.
5. Di hinek nusxeyan de di dewsa “halî”yê de “fi’l-hal” hatiye. Hâlî baştir xuya dike. Lewra ew îcaztir e.

Wê demê min bû Muhemmed mustefa

Nûrê can û me’dena sidq û sefa

“Wê gavê min dît ku nûra can û me’dena rastî û wefkarîyê Muhemmed mustefa hat dinê.”

1. Di “min bû”yê de îcaz heye. Lewra li vir çar îhtîmal heye. Ya yekem ku “ji bo min bû” ye. Lewra di hinek nusxeyan de di dewsa “bû” “bo” hatiye. A duyem ku “ji min re bû” ye. A sêyem jî ku “ji min bû” ye. Yanê “welidî an jî min ew welidand” e. A

çarem “wê demê min” e. Ev îhtîmal zeîf e. Di hemûyan de jî îcaz heye.

2. Di “min bû Muhammed” de qelbê heye. Lewra lêker berîya kirdeyê hatiye.

3. Di “me’den”ê de îstîfere heye. Lewra Hz. Pêxember ji sedem rastî û paqijîyî hatiye şibandin bi me’dnê û tiştên ji me’denê hasil dibe jî rastî û paqijî ye.

4. Di “nûrê can” de jî wek medenê îstîfere heye.

5. Di nivê duyem de î’îlafu’l me’na heye. Lewra wateyên wan nêzîkî hev in.

Mijara Duwazdehem: Merhaba Dayîna Kaînatê Ji Hz. Pêxember Re.

Cûmle zerratê cîhan da ev seda

Kirne gazî pêkve gotin merheba

“Zerreyên di cîhanê de ye hemûyan gazî kirin û gotin merheba ji te re.”

1. Di bêjeya “cumle”yê de tekîd heye. Lewra “cûmle” nehatiba jî wateya eslî kêma nedima.

2. Di lêkera “da”yê de îstîfereya tesrîhîyê û tebeîyê heye. Lewra lêkera “derxistin, an jî gazîkirin”ê hatiye şibandin bi lêkera “da”yê.

3. Di “cumle zerratê”ê de mubalexe heye û şibandin bi mirovan heye. Lewra deng dayîn ji bo mirovan e. Lê dibe ku mebesta helbestvan li vir wateya rasteqîn be jî. Lewra gava ev tiştê ew dibêje ji aliyê Xwedê bi mucizetî hatibe holê bêfikirkirin. Wê gavê li vir mecaz namîne.

4. Di “da ev nîda, kirine gazî û pêkve gotin” de bi qesda tekîdê an ji sedem weznê îtnab heye. Lewra wateyên wan wek hev in.

5. Di “kirne gazî”yê de qelb heye. Lewra eslê wê “gazî kirine” ye.
6. Di bêjeya “pêkve” de îtnab heye. Ji bo tekîdê hatiye.
7. Di hinek nusxeyan de di dewsa “seda”yê de, nîda hatiye bikaranîn.

Merheba ey sirrê furqan merheba

Merheba ey derdê derman merheba

“Ey sirê Quranê! Ey dermanê êş û derdan! merheba ji te re.”

1. Di “derman”ê de îstîare heye. Lewra Hz. Pêxember hatiye şibandin bi derman.
2. Bêjeya “sirr”ê dibe ku bi wateya îsmê fail be û dibe ku bi wateya ismê meful be. Li gorî a yekem wateya wê yê ku tiştên di Quranê de heye pê dizan e. Ew jî Hz. Pêxember e; li gorî ya duyem ew şexs e ku di Quranê de navê wî û wesfê wî heye ye.
3. Dibe ku mebest ji “furqan”ê tiştê ku heq û batil ji hev cuda dike be. Li gorî vê taybetîya hanê li vir tewrîye heye. Lewra di vê malikê de berîya her tiştî ji furqanê Quran tê hişê merivan. Lê mebest jê li vir dibe ku Hz. Pêxember be.
4. Di hinek nusxeyan de “derdê derman” heye û di hinek nusxeyan de jî “dermanê derd” heye. Di hinekan de jî “dermanê derdan” e. Di hinek nusxeyan de jî ev te’bîr tune ye. Tê gotin ku wateya “derdê derman” “ew tişt e ku meriv ji sedem wî êş û zehmetî dikişîne û ji ber êş û zehmetîya wî meriv başdibe”. Hinekan jî gotine ku: li vir qelba mekanî çêbûye û eslê wê “demanê derd” e. Wê gavê li vir tu pirsgirêk namîne. Gava “derdê derman” be ji alîyê wateyê jî û ji alîyê şeklê jî li vir problem tune ye.
5. Bêjeya “merheba”yê çar car ji bo tekîdê di malikê de derbas bûye.

6. Di vê malikê û malikên li dû wê tîrê rîvêkê û rengdêrên li dû baneşana “ey”ê hatine dibe ku cinavka “yê” ketibe. Ji sedemê vê şîroveyê dibe ku “ey yê ku sîrrê furqan e, ey yê ku canê baqî ye, ey yê ku şemsê taban e” bê gotin.

Merheba ey canê baqî merheba

Merheba uşşaqî saqî merheba

“Ey rûhê ebedî yê ku fena bûn jê re tune ye û eyê ku ava evînê dide evindaran ji te re merheba.”

1. Di bêjeya “can”ê de tewcîh heye. Lewra wateya wê “dildar û rûh” dibe.
2. Raveka “canê baqî” de dibe ravekî rengdêr û dibe ku ravekî navdêr be. Li gorî ya yekem “ew canê ku baqî” ye. Li gorî ya duyem jî canê baqî yanê “canê Xwedê” ye.
3. Di navbera “saqî” û “baqî”yê de cînasa naqis heye.
4. Di “uşşaqê saqî” de îhtîmala teqdîm û texîr heye. Lewra eslê wê “saqîyê uşşaq” e.

Merheba ey alî sultan merheba

Merheba ey kanê îrfan merheba

“Ey sultanê qedir bilind û me’dene me’rîfet û zanistê merheba ji te re.”

1. Di bêjeya “sultan”ê de muşakele an jî îstîiare heye.
2. Di “ ‘alî sultan”ê de sîfeta hatiye îdafekirin bi bal mewsûfê ve.
3. Di bêjeya “kan”ê de jî îstîiare heye. Lewra Hz. Pêxember bi kanê hatiye şibandin. Çawa kan jî cîyê me’denan e. Bi wî awayî Hz. Resûlullah jî cîyê ilm û marîfet û zanistê ye.

Merheba ey şemsê taban merheba**Merheba ey canê canan merheba**

“Ey ê rojan rohani dike û dibiriqîne û ey rûhê rûhan merheba ji te re!”

1. Di “şems”ê de îstîareya tesrîhîyye, eslîyye û terşîhîyye heye. Lewra Hz. Pêxember bi rojê hatiye şibandin. Ji vê alî de tesrîhîyye û eslîyye heye. “Taban” jî îstîareya terşîhîyye ye. Lewra “taban” mulaîmê şemsê ye.

2. Ji bo bêjeya “taban”ê sê ihtîmal hene.

A yekem ku “taban” bi wateya “roja bi çirûsk, bi tîrêj û ronahî” be û wê gavê ravek jî dibe raveka rengdêrî. Wê gavê em dibêjin taban mulaîmê muşebbehun bîhê ye û îstîareya terşîhîyye heye. Wê demê dibe ku “taban” ji bo mubalexeyê hatibe ku ew jî îtnaba bi îxalê dibe. Lewra roj jixwe derdora xwe rohnî dike. Taban tune be jî ev wate tê famkirin. Li gorî vê şîroveya me, terşîh û îxal her du bi hev re ne.

A duyem li gorî “canê canan” bê fikirkirin dibe ku li vir mebest ji “taban”ê roj bixwe be û taban bêjeyek pirjimar e. Wê gavê mubalexe jî pirbihêz dibe û wek îdafa “şemsu’s-şumûs” dibe. Tiştêk din jî li gorî vê şîroveya hanê di “taban”ê de mecaza mursel jî derdikeve holê. Lewra lazim hatiye gotin mebest jê melzûm e. Yanê “ronahiya ronahiyan” e

A sêyem jî “taban” dîsa bi wateya çirûsk, tîrêj û ronahîyê” ye. Wateya vê te’bîrê jî “roja çirûskan, tîrêjan an jî ronahîyan” dibe. Yanê li ravek raveka îdafeyê ye. A sifetê nîne. Mebest jê wê wateyê ku çî çirûsk, ronahî hene ji vê rojê ye. ev roj jî Hz. Pêxember e. Yanê “hemû tiştên başên di kaînatê de hene ji cem Hz. Pêxember (s.x.l.) tê”. Ji alîyê huner ve wek xala yekem dîsa li vîr îstîareya tesrîhîyye û terşîhîyye heye

3. Di “canê canan”ê de mubalexe heye. Lewra canan di dewsa cesedê de hatiye fikirkirin û can bi bal wê ve hatiye îdafekirin. Bi vê ravekê hezkirin û te’zîm hatiye qesdkirin.

Merheba ey qurret-ûl ‘eynî Xelîl

Merheba ey xasi mehbûbê Celîl

“Ey ê ku ronîya çavê Hz. Îbrâhîm e û ey ê ku hatiye xas kirin bi leqeba hebîbullah! ji te re merheba.”

1. Te’bîra “Qurretu’l eyn”ê ayeta jêrê tîne bîra merivan.

وَقَرِّي عَيْنًا

“Çavên te ronî be, kêf xweş be.” (Meryem, 26).

2. Di “qurretu’l eyn”ê de mecaza mursel heye. Lewra nebûye sebab ji bo ronî bûna çavan bitênê. Belkî bûye sebab ji bo însan bixwe kêf bike. Tiştek din jî li vir dibe ku bêjeya “jî”yê hebe. Li vir tewcîh jî debe hebe. Lewra ronî bûna çavan jî û kêfxweşîya mirovan jî mimkun e.

3. Di tebîra “Xasê mehbûbê Celîl” de dibe ku telmîh bi bal hedîsa jêrê ve hebe. وَأَنَا حبيب الله “û ez hebîbê Xwedê me.”⁴³

4. Di navbera “xelîl” û “celîl”ê de cînasa naqis heye.

Merheba ey afitabê bê zewal

Merheba ey mahitabê layezal

“Ey roja naçî ava û ey hîva daîm xwediyê ronahîyê ye! Ji te re merheba.”

1. Di bêjeya “afitab”ê de îstîfare heye. Di vir de Hz. Pêxember hatiye şibandin bi rojê.

2. Di bêjeya “mah”ê de jî îstîfare heye. Li vir Hz. Pêxember bi hîvê hatiye şibandin. Di “tab” û “layezal”ê de ji bo mubalexeyê

⁴³ Kadî ‘Îyaz, Îkmalu’l- mu’allim bi fewaîd Muslim. VII, 384.

îtnab heye. Em dikarin bibêjin îtnaba li vir îxal e. Lewra “layezal” ne hatiba jî wate tamam ba. Ev te’bîr ji bo mubalexeyê ye.

3. Di navbera bêjeyê “mah” û “afitab”ê de tîbaq heye. Lewra her du li hember hev in.

4. Di vir de ji ber minasebeta wateyê î’fîlafu’l me’na heye.

Merheba ey bûlbûlê baxê wîsal!

Merheba ey aşînayê Zûl-celal!

“Ey bulbulê baxçê gihîştina bi bal Xwedê ve û ey ê ku bi Xwedê yê zu’l-celal aşîna ye! Ji te re merheba.”

1. Di bêjeya “bax”ê de îstîareya tesrîhîyye û eslîyye heye. Bêjeya “wîsal”ê ji bo qerîna îstîareyê ye. Bêjeya “bulbul”ê jî îstîareya terşîhîyye ye. Lewra mulaîmê muşebbehun bîh e.

2. Di “aşînayê zu’l-Celal”î de mudaf bi îdafê rûmet girtiye.

3. Bêjeya “aşîna”yê dibe ku bi wateya îsmê fail be û dibe ku bi wateya îsmê meful be jî. Li gorî ya yekem “Ê ku Xweda nasdike” ye; a duyem jî “Yê ku Xweda wî nasdike” ye.

Merheba ey nûrê xurşîdê Xuda

Merheba ey tû ji heq nabî cuda

“Ey ronahiya roja Xwedê! Ji te re merheba. Ey ê ku ji heq cuda nabe! Ji te re merheba.”

1. Bêjeya “xurşîd”ê wateya wê ya heqîqî roj e. Lêbelê bi mecazî bi wateya Îslam an jî dîn be, em dikarin bibêjin li vir îstîare heye.

2. Te’bîra “merheba ey”yê di hemû malikan de ji bo bihêzbûn û xweşikbûna wateyê hatiye dubarekirin.

3. Di vir de tewcîh heye. Lewra “heq” ji bo Xwedê û ji bo tiştên rast hemûyan tê bikaranîn. Ev her du wate jî li vir mimkun

in. Gava ji bo Xwedê be li vir îcaz heye. Lewra mebest jê “ji emrê heq” e.

Merheba matlubê alem her tû yî

Merheba ewladê Haşim her tû yî

“Ey ê ku hemû alem wî bi tenê dixwaze! Ji te re merheba. Ey ê ku di nav zarokên Haşim de bê hempa ye! Ji te re merheba.”

1. Di vê malikê de qesra îzafî heye. “her tu yî” ji bo qesrê ye.
2. Di bêjeya “alem”ê de mecaza mursel heye. Hemû hatiye gotin. Lê hinek jê hatiye qesdkirin. Lewra yên bawer nakin ji însan û cinan pêxemberê Xwedê naxwazin.
3. “Her tu yî” ji bo tekîdê hatiye dubarekirin.

Merheba ey nûrê heq ra mezher î

Merheba ey ewliya ra serwer î

“Ey ê ku ji bo nûra Xwedê bûye mezher! Ji te re Merheba. Ey ê ku mezinê heval û dostên Xwedê ye! Ji te re merheba.”

1. Di bêjeya “heq”ê de kînaye heye. Lewra ji bo Xwedê û ji bo xeyrê Xwedê re hemûyan ku heq in dibe hatibe bikaranîn. Di dewsa kînayê de dibe ku tewcîh bê gotin.
2. Di bêjeya “ ewlîya”yê de ûmûm heye. Pêxember jî dikevin binî. Lewra Pêxember çawa Pêxember in bi wî awayî dostê xweda yin jî.
3. Di hinek nusxeyan de di şuna “ewlîya” de “ewlîyan” hatiye ev jî îcaza bi hezîfê ye.

Merheba hatî şivanê ûmmetê**Merheba hat bo me nûra dewletê**

“Ey ê ku ji bo şivantîya ummetê hatiye ji te re merheba! Ê ku hat û ji bo me ronaya dewletê ye ji te re merheba!”

1. Di bêtîya “şivan” de îstîareya tesrîhîyye û eslîyye heye. Lewra Hz. Pêxember hatiye şibandin bi şivanê li ber pez. Qerîna îstîarê îdafekirina şivan bi bal ummetê ve ye.

2. Em bibêjin mebest ji “dewletê” “Ola Îslamê” ye wê demê îstîare heye. Lewra Îslam bi dewletê hatiye şibandin ji alîyê tesîr û îmkanê.

Merheba ey bedrê alem ya mûnîr**Merheba ey xelqê ketî ra destegîr**

“Ey ê ku hîva ronî ye ji bo kaînatê ji te re merheba! Ey ê ku ji bo gelên bindest re alîkar e ji te re merheba”

1. Di “bedrê alem” de îstîareya tesrîhîyye û eslîyye heye. Lewra Hz. Pêxember hatiye şibandin bi hîva çarde şevî. Ji sedem te’bîra “ya mûnîr” mulaîmê muşebbehun bîhê ye di vir de jî îstîareya terşîhîyye hatiye îcrakirin.

2. Di “xelqê ketî ra destegîr” de kînaye heye. Lewra wateya mecazi û heqîqî her du jî dibe ku li vir bê qesdkirin. Yanê destegîr dibe ku wan ji zilimê xelas dike û ew dighîjin azadîyê serbest dibin ji bin tehekkuma gelan xelas dibin. An ji bi dest wan digre ya ji alîyê wan dike.

Merheba sultanê cumle enbîya

Merheba ey nûrê çeşmê esfîya

“Ey ê ku mezinê enbîya hemûya ye! Ji te re merheba. Ey ê ku ronaya çavên wan kesan e ku wan nefsa xwe ji xerabîyan paqijkiriye! Ji te re merheba.”

1. Di bêjeya “sultan”ê de muşakele heye. Lewra ji bo Hz. Pêxember bêjeya sultanê hatiye bikaranîn. Di sultanê de dibe ku îstîfare jî hebe.
2. Di bêjeya “cumle”yê de tekîd heye.
3. Di “çeşme esfîya”yê de îstîfare heye. Lewra esfîya hatiye şibandin bi mirovan. Dû re jî çeşm hatiye îdafekirin bi bal esfîyayê ve.
4. Bêjeya “esfîya”yê ‘umûm e. Lewra temamê ehlê Xwedê dibe ku têkeve binê wê.

Merheba ey îftîxarê enbîya

Merheba ey şem’ê cem’ê ewlîya

“Ey ê kû fexra pêxemberan e! Ji te re merheba. Ey ê ku muma ronayîya temamê dostên Xwedê ye! Ji te re Merheba..”

1. Di te’bîra “îftîxarê enbîya”yê de te’zîm ji bo mudafû ileyhî heye.
2. Di navbera her du nîvên malikê de î’tîlafu’l-me’na heye. Lewra wateyên wan minasibê hev in û cami in.
3. Di bêjeya “şem’e” de îstîfareya tesrîhîyye û eslîyye heye. Lewra rehbertîya Hz. Pêxember ji bo komên ehlên Xwedê hatiye şibandin bi mumê. Li vir ji sedem ku mulaîm ji bo muşebbeh û muşebbehun bîh tune ye, îstîfareya mutleqa heye.
4. Di navbera “şem’ û cem”ê de jî cînasa naqis heye.

Merheba ey menb'ê 'îzz û wefa**Merheba ey kanê îhsan û 'eta**

"Ey ê ku kanîya rûmet û wefakarîyê ye! Ji te re merheba. Ey ê kana lutafên ku hatine dayîn! Ji te re merheba."

1. Di bêjeya "menb'"ê de îstîare heye. Lewra Hz. Pêxember bi kanîyên ku av ji wan diherike hatiye şibandin. Îzzet û şeref jî wek avê ji zat, gotin û fiilê wî tê wucûdê û diherike.

2. Di bêjeya "kan"ê de îstîareya tesrîhîyye heye. Lewra ew jî wek menbe' muşebbehun bîh e. Di van her du îstîareyan de gava ku nîda ji bo îstîarê wek bê pejirandin, em dikarin bibêjin bi bêjeyên "weaf, 'izzet, 'eta û îhsan"ê istîareya tecrîdiyye hatiye îcrakirin. Lewra ev bêje hemû mulaîmê mustearûn lehê ye.

3. Di "îhsan û eta"yê de îtnab heye. Lewra her du di dewsa hev de werin jî wate kêr namîne.

4. Di hinek nusxeyan de di şuna bêjeya "îhsan"ê bêjeya "'eta"yê hatiye.

Merheba ey nûrê çêşmê ummetê**Merheba ey sun'ê şahê qudretê**

"Ey ê ku ronayîya çavên umetê ye! Ji te re merheba. Ey ê ku mexluqê şahê qudretê ye! Ji te re merheba."

1. Di "çêşme ummet"ê de îstîareya meknîyye û îstîareya texyîlîyye heye. Lewra umet hatiye şibandin bi însan û lazimê însan hatiye îdafekirin bi bal ummetê ve.

2. Bêjeya "sun"ê mesder e. Lêbelê mebest jê îsmê meful e. Yanê wateya wê "mesnû" e.

3. Di bêjeya "şah"ê de muşakele heye. Lewra şah ji bo mexlûqan e. Di vir de ji bo Xwedê hatiye bikaranîn. Dibe ku îstîare jî hebe.

4. Di bêjeya “qudret”ê de dibe ku îktîfa hebe. Lewra mebest jê ku mezinbûna Xweda di sîfetên di jî de heye.

Mijara Sêzdehem: Munacat û Niyaz

Ehmeda! Çavê te ma zaxe'l-beser

Yek îşarata te înceqqe'l-qemer

“Ey Ehmed! Çavê te şaş nebû û tiştê te dîtin jî te rast dîtin. Bi îşaretên te hîv parçe bû.”

1. Bêjeya “Ehmeda” munada ye. Di vir de îltîfat heye. Lewra Hz. Resûlullah ne li hemberî muellif e ku bi xîtabê bê gazîkirin. Lêbelê nivîskar ji sedem ku hez kirina xwe ji Pêxember (s.x.l.) re diyar bike, di dewsa raweka xâibê de raweka mixatebê bikaranîye. Di vir de hatiye nîşan (s.x.l.) dayîn ku Hz. Pêxember daîm di hişê û dilê Bateyî de bûye.

2. “Ma zaxe'l-beser” îqtîbas hatiye kirin ji ayetê. Lewra ev hevok Qurana pîroz de heye.

مَا زَاغَ الْبَصَرُ وَمَا طَغَى

“Çav şaş nebû û heddê xwe jî derbas nekir.” (en-Necm, 17).

3. Hevoka “înceqqe'l-qemer”î jî ji ayete îqtîbas e. Lewra ev hevok di sureyê qemer de derbas dibe.

وَأَنشَقَّ الْقَمْرُ

“û hîv qelişî.” (el-Qemer, 1).

4. Di “yek îşarata te înceqqe'l-qemer” de, mecaza eqlî heye. Lewra du parçe bûna hîvê nebi îşareta Hz. Pêxember e. Belkî bi xwestina xwedê ye. Lêbelê îşareta Hz. Pêxember bûye sebeb. Bi her du îqtîbasan Hz. Pêxember hatiye medihkirin.

5. Di hinek nusxeyên mewlûdê de di şuna “îşareta”yê de “îşarata” hatiye. Îşarat pirjimarî ye. Lê li vir hatina pirjimariyê baş nîn e. Lewra di hevokê de berîya bêjeya “îşarat”ê bêjeya

“yek” hatiye. Li gorî peyva “yek”ê yekjimarîya îşaretê pêwîst e. Lê îcaz hebe. Li vir mimkun e. Wê hingê wateya wê “yek ji îşareta te” dibe. Bi hezifkirina “ji” îcaz hatiye îcrakirin.

Hukmê tû carî ji ‘erşî ta bi ferş

Ey ji nûra te munevver ta bi ‘erş

“Hukmê te ji erşê heta ferşê carî ye. Ji ber nûra te heta erşê her tişt ronî bûye.”

1. Di navbera bêjeyên ‘erş û ferşê de cînasa naqis heye.
 2. Di raveka “hukmê tû”yê de mecaza mursel heye. Lewra hukmê Xwedê ye. Lêbelê ji sedem ku Hz. Pêxember bûye sebeb ji bo bicî anîna hukmê Xwedê bêjeya “tû” hatiye bikaranîn.
 3. Di bêjeya “nûr”ê de dibe ku kînaye hebe. Li gorî vê şîroveyê ku di vir de wateya heqîqî û mecazî tev hatiye qesdkirin. Wateya heqîqî ronahiya fizîkî ye. Lewra Li gorî hinek rîwayetan şeva ku Hz. Pêxember tê de hatiye dinyayê dinya ronî bûye. Wateya wê ya mecazî jî ew e ku bi Quran û sunnetê û rê dayîna Hz. Pêxember ji mirovan re mirovan riya rast dît.
 4. Te’bîra “Ey ji nura te!” de îcaz heye. Lewra li vir cînavka “yê” ketiye ku li vir ew munada ye.
 5. Di te’bîra “nûra te”yê de dibe ku mecaza mursel hebe. Lewra li gorî vê şîroveyê mebest ji “te”yê Qûrân e. Li gorî vê îzaha hanê em dikarin bibêjin bi bêjeya “nûr”ê, îstîfareya tesrîhîyye hatiye bikaranîn. Lewra “Quran dibe muşebbeh be û nûr jî dibe muşebbehun û bîh be. Qerîne jî peyva munewwerê ye.
 6. Di nivê dawîyê de îcaz heye. Lewra ta bi erşê hatiye gotin ev alî alîyê qedandinê ye. Lêbelê alîyê destpêke nehatiye gotin. Pêwîst e ku di vir de “ji ferş” an jî “ji erdê” heba.
- Di nivê duyem de. Îcazek din jî heye. Lewra lêkera “bû”yê an jî daçeka “e”yê hatiye hezifkirin.

7. Di vir de dibe ku tarîz û medih jî hebe. Lewra ji vê malikê tê famkirin ku hukmê dînê Pêxemberên din nemaye. Lewra nûra wî her tiştî girtiye. Ji ber vê xala hanê pesn ji bo Pêxemberê me û dînê ku wî anîye ye.

8. Te'bîra "ta bi" hatiye tekrarkirin.

Ateşê Musa çî bû ruxsarê tû

We'dduha nûra dilê hişyar ê tû

"(Ey Ehmed!) agirê ku Musa li çiyayê Tûrê dît ew ronahiya rûyê te bû û sonda bi duhayê jî ronahiya qelbê teyê hişyar e."

1. Di nivê yekem de telmîh bi bal ayeta jêrê ve heye.

إِنِّي أَنسْتُ نَارًا لَعَلِّي آتِيكُمْ مِنْهَا بِخَبَرٍ أَوْ جَذْوَةٍ مِنَ النَّارِ

"Bêguman min agirek dî. (ezê herim wî alîyî) Hêvî heye ku ez jê xeberkî an jî piçek agir bînim." (el-Qesas, 29). Mebest ji ateşê Musa *إِنِّي أَنسْتُ نَارًا* e.

2. Di "ateşê Musa"yî de îcaz heye. Lewra mebest jê "ateşê ku mûsa dîtîye" ye.

3. Di nivê duyem de jî telmîh heye. Lêbelê telmîh bi bal ayeta jêrê ve ye.

وَالضُّحَىٰ

"Sond dixwim bi gava ku roj bilind dibe." (ed-Duha, 1).

4. "We'd-duha nûra dilê hişyarê tû" dibe ku mubalexe jî be.

5. "We'd-duha nûra dilê hişyarê tû" dibe ku mecaza mursel be jî. Lewra li gorî vê şîroveyê di vir de "nûra dilê hişyarê tû" ji bo "ronî bûna dunyayê" sebeb e.

6. Di "we'd-duha nûra dilê hişyarê tû" de dibe ku şibandin jî hebe. Lewra ronahiya weqta duhayê hatiye şibandin bi ronahiya dilê Hz. Resûllah (s.x.l.) ve.

7. Di “nûra dilê hişyarî tû” de teqdîm û texîr jî heye û navbir ketiye nava mudaf û mudafun ileyhê. Lewra eslê vê te’bîrê “nûra dilê te ya hişyar” e.

8. Pirsra “çi bû” ji bo bal ve kişandin û teqrîrê ye.

Durdê nûra te diyaê mêhr û mah

Lî maallahî'l-celîli barigah

“Bermahiya nûra te Ronahiya roj û hîvê ye. Te gotiye ku ji bo te bi Xwedayê mezin re demek heye ku kesek di wê demê de bi te re nikare hevaltiyê bike.”

1. Di “durdê nûra te diyaê mêhr û mah” de şibandin heye. Lewra durd hatiye şibandin bi diyaê.” Li vir daçeka şibandinê ketiye. Di hinek nusxeyan de di dewsa “durd”ê “dur” hatiye û gihanek di navbera diya, mêhr û mahê de hatiye. Berîya nûrê jî daçeka “ji”yê heye. Wê gavê dur mubteda û muşebbeh e û diya, mêhr û mah jî xeber û muşebbehun bîh e. Wê gavê dibe teşbîha cem’ê. Lewra muşebbehun bih jî “mehr, mah û diya” ye.

2. Di “dur ji nûra te diyaê mihr û mah”ê de îcaza qîser heye. Lewra bi vê hevoka kurt tê famkirin her tiştên baş ji nûra Hz. Pêxember (s.x.l.) e.

3. Dibe ku di “dur ji nûra te diyaê mêhr û mah”ê de mecaza mursel û mubalexe hebe. Lewra li gorî vê malikê nûra Hz. Resûlullah bûye sebebê tiştên ku hatiye zikirkirin.

4. Di “Lê maallahî'l-celîli barigah” de telmîh bi bal hedîsa ku dibêje ku “ji bo min seetekî sohbetê li cem Xwedê heye ku tu kes di wê seetê de nabe hevalê min.”

5. Di “Lê maallahî'l-celîli barigah” de îcaza hezfê heye. Lewra lêkera “te got”ê hatiye hezifkirin.

6. Di “lê maallahî'l-celîli barigah”ê de îcaza qîser ji hedîsê ve heye. Lewra di vir de bi hevokê kurt tê famkirin ku merteba

Hz. Pêxember bilind e û hemû mexlûqat ji alîyê mertebê li dû wî tên.

Nê jî ne'leyna te ey durra yetîm

Fexr û teşrîf e ji bo 'erşê 'ezîm

“Bêguman ji sedem te bi her du solên xweyên bi rûmet pê li erşê 'ezîm kiriye. Ew ji erşê 'ezîm re pesn û medih e.”

1. Di “durrê”ê de îstîareya tesrîhîyye û eslîyye heye. Qerîne jî bêjeya “yetîm”ê ye. Wateya wê “Muhemmedê wek durrê” ye. Gava Muhemmed û daçeka şibandinê ketiye durr bi tenê maye. Durr muşebbehun bîh e, yetîm jî qerîne ye. Ne'leyna te jî mulaîmê muşebbehê ye. Ev jî dibe îstîareya tecrîdîyye .

2. Dibe ku yetîm hatibe şibandin bi durrê. Wê gavê îdafeya teşbîhîyye heye. Wateya wê “sêwî yê wek durrê” dibe.

3. Di “fexr û teşrîf”ê de ji bo 'erşê 'ezîm” de mura'etun'nezîr heye.

4. Di “Fexr û teşrîf e ji bo 'erşê 'ezîm” de îtnab jî heye. Lewra wateya wan wek hev e an jî nêzîk hev e.

5. Di vê malikê de telmîh bi bal bûyera mîracê ve heye.

6. Di 'erşê de elem bî'l-xelebe hatiye bikaranîn. Lewra erş 'elem be jî. bikaranînê wek 'elem bûye.

Her du 'alem çî siha îqbalê tû

Sondê we'l-leylê bi zulf û xalê tû

“Dinya û axiret sîya te yin an jî îşaret in ji bo hatina te. Ji bo te hatine çêkirin. Sonda Xwedê bi şevê sonda bi porê û şanikên te yê reş in.”

1. Di “her du 'alem çî siha îqbalê tû”yê de şibandin heye. Lewra di vê hevokê de axiret û dinya hatiye şibandin bi siye. Ev

teşbîha belîx e. Lewra wechê şebêh û daçeka şibandînê nehatiye bikaranîn.

2. Bi “we leylê”yê îjî Quran’a pîroz qûbas hatiye kirin. Lewra di ayetê de وَاللَّيْلِ إِذَا يَغْشَىٰ Xwedayê teala dibêji ku “ez sond dixwim bi şevê wexta ku tarî dibe.” (el-Leyl,1).

3. Di “we-leylê bi zulf û xalê tû”yê de em dikarin bibêjin şibandina dimnê heye. Lewra li vir şibandin diyar nebe jî; bi awayekî veşartî şibandin tê famkirin.

4. Di “siha îqbalê tû” de dibe ku mecaza mursel jî hebe. Lewra li gorî vê şîroveyê mebest ji cînava “tû”yê Quran an jî îslam e.

5. “Çi” dibe ku ji pirs be. Li gorî pirsê jî cewab hatiye dayîn. Dibe ku ne pirs be jî ji bo bihizkirina wateyê û bal ve kişandinê be.

6. Bi cînava “tû”yê tekrar hatiye kirin. Li gorî qeneata me jî sedem hezkirina pêxember û bal kişinadina hatiye bikaranîn.

Hem tû rûh û hem rewanê can û dil

Pêşi bejna te siha te bû xecil

“(Ey Muhemmed!) Tu can û dil î û tu rûh û rewan î. Li hember qam û bejna te siya te şermkir û xuya nebû.”

1. Bêjeyên “rûh, rewan”ê heke em bibêjin wateya wan yek e îtnab heye. Bêjeyên “can û dil” jî wateya wan yek be, dîsa îtnab heye.

2. Di “can û dil”ê de îcaz jî heye. Lewra herfa gazîkirinê hatiye hezifkirin.

3. Di bêjeyên “rûh û rewan”ê de şibandin jî heye. Lewra mixateb hatiye şibandin bi “rûh” û “rewan”. Daçeka şibandînê û wechê şibandînê nehatiye bikaranîn.

4. Di vê malikê de î'tîlafu'l-me'na û î'tîlafu lefz heye. Lewra lefz û me'neyên nêzîkî hev hatine bikaranîn.

5. Di "siha te bû xecil"ê de bi te'bîra "bû xecil"ê îstîfareya tebeîyye hatiye bikaranîn. Lewra ji bo siyê bêyî wateya heqîqî ne mimkun e. Şermkirin jî ji bo siyê wateyek heqîqî nîn e. Lewra mebest jê "siha te derneket holê" ye.

Canfîdayê bejn û balayê te bim

Mest û ser gerdanê sîmayê te bim

"Ez xwe ji bo bejna û qama te feda dikim an jî feda bim. Ez ji bo sîmayê teyê xweşik mest û şaş mame û gêj bûme."

1. Bêjeyên "bejn û bala"ê muteradif in. Ji sedem vê xusûsiyetê di vir de îtnab heye.

2. "Te bim" hatiye tekrarkirin û îtnab bûye. Li gorî qenaeta me sedema vê îtnabê lezzeta tekrara cînavê ye.

3. Bêjeyên "mest û sergerdan" jî alîyê wateyên nêzîkî hev in. Bi hatina her du bêjeyan de tekrar hatiye çêkirin.

4. Di bêjeya "sîma"yê de du îhtîmal hene. A yekem ku mecaza mursel e. Li gorî vê şîroveya hanê di vir de cuz hatiye gotin lêbelê kull hatiye qesdkirin. Îhtîmala duyem jî sedem pir xweşikbûna serçavê Hz. Pêxember e serçav bixwe hatibe qesdkirin.

5. Di bêjeya "sergerdan"ê de dibe îstîfare hebe. Lewra heyranfî hatiye şibandin bi serxweş bûnê.

Şehrêyarê çetrê ewra rayê tû

Xettê seq bû ber felek tuxrayê tû

"Ey sultanê kâinatê Muhemmed! Sîwana ewran ala û nîşanên te yin û ew xêz û rêçikên li asîman û li kâinatê derketiye holê mohra te ye."

1. Bêjeya “Şehrêyar”ê îstîare an jî muşakele ye.
2. Di bêjeya “çetr”ê de îstîare heye. Lewra siya ewra bi siwanan hatiye şibandin.
3. Bêjeya “tû”yê hatiye dubarekirin.
4. Di vê malikê de pesn û medih heye. Lewra lefzê bi wateya wan e.

Şehswarê dul dulê kewn û mekan

Wasilê wahdet serayê la mekan

“Ey xweş siwarê duldula kewn û mekanê! Tu ew kes e ku dighîji seraya wahdetê ku ew bê mekan e.”

1. Bi bêjeya “mekan”ê tekrar e.
2. Di “wahdet seray”ê de îstîare heye. Lewra halê wahdetê bi serayê hatiye şibandin.
3. Bêjeya di “dûl dulê kewn û mekan”ê de îstîare heye. Lewra “duldul” bi bal kewn û ve hatiye îdafekirin.
4. Di “mekan û la mekan”ê de tîbaqa selbî heye. Lewra yek ji her du alîyan erênî ye ya din jî neyînî ye.

Min hebin sêsed hezar ezman û dev

Yek demê xafil nemînîm roj û şev

“Ji min re sêsed hezar dev û ziman hebin yek ji wan xafil nemînîn bi roj û şev nesekinin.”

1. Mebest ji “sê sed hezar” mubalexe ye an jî pirrîtî ye.
2. Bi bêjeya “dev”ê îtnab hatiye bikaranîn. Lewra di vir de piştî bêjeya ezmanê îhtîyac bi bal “dev”ê ve tune ye. Dev ji bo qafiyê hatiye bikaranîn.
3. Di bêjeyên “roj û şev”ê de, tîbaq heye. Lewra di navbera wan de zêdîtî heye.

4. Bi bêjeyên “dev û şev”ê cînasa naqıs hatiye bikaranîn.
5. Di navbera bêjeyên yek “deme” û “roj û şev” de îtnab heye. Mebest ji vê îtnabê tekîd e. Îtnab ji sedem ku bêjeya “yek dem” roj û şevan dixê binê xwe heye.
6. Di hinek nusxeyan de di dewsa “neminim” de “neminin” hatiye. Li gorî van nusxeyan div ê malikê de îhtîmala tecrîdê jî heye. Lewra helbestvan bêjeyên “ziman” û “dev”ê her wekî tiştêkî ji xwe cuda bikaranî ye.

Wesfê husna te bibêjim subh û şam

Sed qiyamet dê biçîn hêj na tamam

“Di sibe û şevan de behsa xweşikîya te bikin û di ser wan de sed qiyamet derbas bibin, dîsa jî wesfê xweşikîya te tamam nabe.”

1. Di “subh” û “şam”ê de tîbaq heye.
2. Bi “subh” û “şam” de mecaza mursel jî hatiye bikaranîn. Lewra cuzên zeman hatine bilêvkirin. Lêbelê mebest ji wan zeman hemû ye.
3. Di “sed qiyamet”ê de mubalexe heye.
4. Di vê malikê de Îcaz jî heye. Lewra kirde ku husna te ye di nivê duyem de nehatiye bikaranîn.

Ya Resûlellah Resûlê îns û cin

Ya şefî’ê sedrê dîwana mezin

“Ey resûlê xwedê yê ku ji bo însan û cinan hatiye şandin û ey şefîê ku li serê pêşîya eywana mezin e.”

1. Bêjeya “resul”ê hatiye tekrarkirin.
2. Di bêjeyên “ins” û “cin”ê de tîbaq heye.

3. Bêjeya “sedr”ê dibe ku bi wateya “ê ku destpêdike” be. An jî “vedike” be. Li gorî vê wateyê mebest ji “eywana a mezin” jî “mehşera mezin” e.

4. Bêjeya “sedr”ê dibe ku bi wateya serê meclise be. Li gorî vê wateyê jî em dikarin bibêjin di vir de îcaz heye. Lewra mebest jê “di sedrê eywana mezin de” ye.

5. Di “dîwana mezîn” de îstîfere heye. Lewra ciyê mehşer li çêdibe hatiye şibandin bi meclisekî mezin û girîng.

6. Bêjeya “sedr” bi wateya ê ku meclîsê vedike an jî dide destpêkirin be, sedrê dibe sifet ji bo bêjeya şefî’ê.

7. Di hinek nusxeyan de di dewsa “dîwana mezin”ê de “eywana mezin” hatiye bikarnîn.

Tu şefa’et ke ji bo me ‘asîyan

Wer ne nefsa şûme naket qencîyan

“Tu ji bo me gunehkaran şefaet bike. Heke tu ji nefsa me re ku ew bê oxur e û başîya nake şefaet neke, emê helak bibin.”

1. Bi bêjeya “asîyan”ê de helbestvan perîşanî û xerabî ya xwe û mirovan îtîraf dike.

2. Di vê malikê de îcaz heye. Lewra wateya wê “heke tu şefaate ji me re nekî, nefsa me tiştêkî baş nake” ye.

3. Di “nefsa şûme”yê de hiciv heye. Lewra bêjeya şûmeyê ku bi wateya “bêwechîyê û bêkêrî û bê xêriyê” tê bikaranîn.

Ya Kerîm û ya Îlahe’l-’alemîn

Ya Rehîm û ya ‘Ezîm û ya Metîn

“Ey comerd û baş û îlahê alemê! Ey rehîm û ey mezin ey metîn.”

1. Di vê malikê de mura’etu’n-nezîr heye. Lewra wesfê ku hatine gotin hemû alî wanê îkram û rehme gîrnatir e ji alîyê din.

2. Herfa nîdayê hatiye dubarekirin.
3. Di vê malikê de î'tîlafu'l-lefz û me'na heye.

Hêvî darê rehm û îhsana te yîn

Talibê îkram û xufrana te yîn

“Ên ji bo mewlûdê hazir bûne û li wê guhdarî dikin rehma te, qencîya te, comerdîya te û ef'wa te hêvîdikin.”

1. Di vê malikê de dibe ku îltîfat hebe. Lewra di malika berîya ya jorê de, behsa mutekelim mea'l-xeyr heye. Lêbelê di vê malikê de gaîb hatiye.
2. Di vê malikê de îtnab heye. Lewra wateya nîvê beytê ya yekem û ya duyem wek hev e.
3. Bêjeya te'bîra “te yîn” hatiye tekrarkirin û bi tekarara wê tekîda gotinê derketiye holê û bi tekrare qafiye rast bûye.
4. Di vê malikê de jî mura'etu'n-nezîr heye. Lewra ji alîyê wateyê bêje nezîkî hev in.

Hazir û guhdarê mewlûda resul

Hêviya me tu bikey ya Reb qebûl

“Ey Rebbî! Tu hêvîya me hazir û guhdaran qebûl bike”

1. Di bêjeyên “hazir û guhdar”ê de îtnab heye. Lewra hazir tevî ku hazir in pê re jî guhdar in jî. Ji sedem vê xususiyetê bi bêjeya guhdar îtnab çêbûye. Ji vê itnabê re em dikarin bibêjin li vir zîkru'l-xas be'de'l-'amm heye.
2. Bi “Hêviya me” de jî îltîfat heye. Lewra te'bîra “hazir” û “guhdar”ê ji bo xaîbê ye. Lê te'bîra “hêviya me” ji bo mutekelimê ye.

3. Di hinek nusxeyan de di dewsa “hazîr û guhdarê” de “hazîre guhdarê” hatiye. Li gorî van nusxeyan raveka rengdêr hatiye bikaranîn.

Nê tu xeffar î û settarê ‘uyûb

Ma bibexşî û bi xufranî zunûb

“Bêguman tu pir gunahan efû dikî û qusuran jî tu pir vedişêrî. Bi efûkirina gunehên me tu me efu bike.”

1. Di “tu xeffar î” de îcaz heye. Lewra jî “zunûb” nehatiye behs kirin.

2. Di vê malikê de dibe ku muşakele hebe. Ji bo “uyûb”ê bêjeyên “xeffar” û “settar”ê tev hatiye bikaranîn. Lewra bêjeya xeffar jî bo guneha tê bikaranîn. Lê dibe kul i vir îktîfa hebe.

3. Di “me bibexşînî û xufranê zunûb”ê de mebest tekîd e û îtnab hatiye îcrakirin. Lewra bibexşînî û xufrana zunûb wateya wan wek hev e.

4. Li vir mura’etu’n-nezîr jî heye. Lewra wezn û wateya van bêjeyan ya wek hev in an jî nêzîkî hev in.

Hem li da û babê hindî mumînin

Hem li hindî mumînatana ecmaîn

“Hem jî temamê mêrên mumîn û jinên mumîn hem jî dê û bavên wan gişan bibexşîne.”

1. Ji bo tekîdê tevî gihaneka “û”yê bêjeya “hem”ê jî hatiye bikaranîn.

2. Bi bêjeyên “hindî û ecamaîn” bi mebesta tekîdê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra wateya wan her duyan wek hev e.

Tabî'ê an şehsuwarê ummetê

Pêkve rabin dê biçîne cennetê

“Emê hemû bi hev ra rabin û tab'ê siwarîyê mahşerê bibin û emê biçîn cenetê.”

1. Di bêjeya “şehsuwar”ê de îstîfere heye. Lewra muşebbehun bih hatiye zikirkirin. Lêbelê muşebbeh nehatiye gotin.
2. Bi bêjeya “Pêkve”yê jî tekîd hatiye îcrakirin.
3. Dibe ku bêjeya tabî'ê munada be. Li gorî vê taybetîyê di vir de îcaz heye. Lewra wê gavê herfa nîdayê ketiye.

Ewwela bo rewzeya nûrînnîqab

Sanîya bo al û ezvac û sehab

“Berîya her tiştî ji bo Hz. Pêxember an jî ji bo baxçe ku bi nûrê hatiye veşartin -ku mebest jê dîsa Hz. Pêxember e- û di dû wî re jî ehl û jinên Hz. Pêxember û sehabeyan”

1. Bi bêjeya “rewze”yê îstîfere hatiye îcrakirin. Lewra mebest ji rewzeyê qebra Hz. Pêxember e. Li gorî vê xala hanê qebir hatiye qesdkirin lêbelê hatiye şibandin bi baxçe.
2. Di “ewwela” û “sanîya”yê de îcaz heye. Lewra mebest jê “cara yekem” û “cara duyem” e.
3. Di “rewze”yê de dibe ku mecaza mursel jî hebe. Lewra Li gorî vê şîroveyê, mebest ji rewzeyê zatê Hz. Pêxember e.
4. Bi bêjeyên “al” û “ezvac”ê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra ezvac dikeve binê al û sehabê. Sehab jî dikev binê alê. Ev zîkra xusûsê piştî umûmê ye.
5. Di hinek nusxeyan de di şuna bêjeya “nûrîn”ê de bêjeya “şîrîn”ê hatiye bikaranîn. Nûrîn baştir e. Lewra wateya nûrîn li vir ji wateya şîrînê xweştir e.

Salîsa bo enbîya û murselîn

Rabi'a bo ewlîya û mumînîn

“A sisîyan jî ji bo nebî û resûlan a çaran jî ji bo ewlîya û mumînan.”

1. Di vê malikê de di nivê yekem de ji merteba biçûk hatiye çuyin bi bal merteba mezin. Lewra nebî ji aliyê mertebe kêmî rusulan e.

2. Bi bêjeya “murselîn”ê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra ji xwe gava enbîya hat gotin murselin jî dikeve bin wateya wê. Çiqas resûl heman deme de nebî ne jî. Li piştî ‘umûmê xusûs hatiye. Ev zîkra xusûsê bede’l-‘umûmê ye.

3. Bi bêjeya “ewlîya”yê îtnab hatiye îcrakirin. Lewra ji ewliya dikeve binê mumînînê. Ev zîkra ‘umûmê bede’l-xusûsê ye.

4. Di nivê duyem de ji merteba mezin hatiye merteba biçûk. Lewra di welî de mumintî û îbadet kirin tev heye. Lêbelê di mûmin de dibe ku welîtîya bi istilahî tune be.

Hem ji bo huccac û xuzzatan temam

Hem ji bo vê meclisa sahib team

“Hem jî ji bo heccî û xazîyan giş hem jî bo ehlê vê meclisa ku xwedîyê xwarinê ye.”

1. Di “hem ji bo”yê de tekrar heye.

2. Di bêjeya “meclis”ê de îcaz heye. Lewra bêjeya “ehl”ê hatiye hezifkirin. Dibe ku bi bêjeya “meclis”ê mecaza mursel hatibe bikaranîn. Lewra li gorî vê nêrîna hanê meclis mehel e. Lêbelê hal hatiye qedkirin. Ku ew jî ehlê meclisê ye.

3. Bi bêjeya “temam”ê wate hatiye bihêzkirin.

4. Di “vê meclisa sahib team”ê de kînaya ji meclîsa mewlûdê heye.

5. Di navbera “team” û “temam”ê de cînasa naqîs heye.

Hem ji bo her çar îmamê caddeê

Hem ji bo kâtibe vê nusxeê

“Hem jî ji bo her çar îmamê mezheban û ji bo yê ku vê pirtukê nivîsandîye.”

1. Bi “hem ji bo” tekrar bûye.

2. Di bêjeya “her”ê de tekîd heye.

3. Di “cadde”ê de îstîfere heye. Lewra Îslam hatiye şibandin bi caddeyê. Dibe mebest ji caddeyê mezheb be jî. Li gorî vê şîroveya hanê di vir de tewcîh heye.

Bo cemî’ê musulmînê salîhe

Bo feqîrê Bateyî el-fatîhe

“Ji bo temamê muminûn û salîha û ji bo Bateyê feqîr fatîha bixwînin.”

1. Bi bêjeya “cemî”yê tekîd hatiye bikaranîn.

2. Di hinek nusxeyan de di şuna “muslîmînê salîhe” de “muslîmin û salîhe” hatiye. Li gorî hemû nusxeyan li vir îtnab heye. Lewra wateya wan ji hev na qetin. Ev îtnab zîkra xusûs be’del ‘umûm e.

3. Di “feqîrê Bateyî” de tecrîd heye. An ji bo tewazuyê di dewsa cînava “min”ê de te’bîra “feqîrê Bateyî” hatiye. Ev jî îltîfat e. Lewra di dewsa mutekelimê de xaîb hatiye.

4. Ji bo tekîdê an jî ji bo weznê daçeka “bo”yê tekrar bûye.

5. Li vir îcaz jî heye. Lewra lêkera “bixwînin”ê ketiye.

ENCAM

Mewlûda Bateyî di edebiyata Kurdî de metnek edebî û klasîk e. Di navbera berhemên kurdî de berhema herî meşhûr e. Lewra piraniya Kurdan ji biçûkî ve ew xwend û jiber kir. Vê berhemê ji aliyê dînî, edebî û musîkî tesîr li Kurdan kiriye û dike. Ji sedem van taybetiyên hanê xebatên li ser wê gellek girîng in. Li gorî qenaeta me ev xebat pirtir girîng e. Li gorî qenaeta me ev xebat pirtir girîng e. Lewra di xebatên li ser mewlûdê de bi piranî wate girîng hatiye ditîn û aliyê huner pir hindik hatiye îzah kirin. Em dikarin bibêjin ji aliyê hunerên li ser Mewlûda Bateyî qet xebat tune ne an jî hindik in. Vê xebata hanê ji aliyê huneran ji bo Mewlûda Bateyî pir girîng e.

Ji bo, di mewlûda Bateyî de tesbîtkirina huneran bi awayekî baş derkeve holê malikên mewlûdê qenc hatiye nirxandin. Tevî nirxandinê lêkolîner, ji zanistên ziman û dînî jî îstîfadekirin. Tevî nirxandinê, îstîfadekirin ji zanistên ziman û dînî jî hat kirin. Bi vî awayî hunerên mewlûdê rind derket holê. Hinek hunerên di wê de bi nirxandinek hindik hatiye fehm kirin. Hinek jê jî nirxandinek balkêş dixwaze.

Mewlûda Bateyî tevî ku zimanê wê ne dijwar e jî ji aliyê huneran dewlemend e. Tê de ji zanistên meanî, beyan û bedî, hunerên edebî hene. Bi giştî her malikek wê, sê çar huner dixwe de dihewîne. Hunerên wek îstîfayê, teşbîhê, kînayeyê, cînasê, tîbaqê di metnan de hene û normal e. Hunerên meanîyê wek fesil e, weslê, îltîfatê, îktîfayê, îxalê di metnan de pir hindik in. Lê di mewlûda Bateyî de ev huner hene.

Ji aliyê hunerên meanîyê, di mewlûdê de hevok bi piranî xeberî ne. Lê carinan hevokên pirs, dia û emir jî derbas dibin. Ew hevok înaşayî ne. Hinek ji van hevokan bi mecazî hatine bikaranîn. Mînakên qesrê jî di mewlûda Bateyî de derbas dibin.

Lê li gorî îtnabê kê m derbas dibin. Hevokên fesil û weslê jî wek hevokên qesrê hindikin. Hinek caran hevokên di wan de fesil û wesil in. Li gorî mêzekirina xwendevan dibe ku bi îtnabî jî bê dîtîna Îtnab û îcaz bi pirên awayê xwe di mewlûdê de cî digirin. Musawat pir kê m e. Îcaza hezfê di mewlûdê de ji ya qiser zêdetir e. Îtnab bi pirên formê xwe di mewlûdê de derbas dibe. Berîya her tiştî îtnaba bi tkrarê pirtir xwanê dike. Tkrar pirê caran me'newî ye. Carinan jî îtnab bi umûm, xusûs, îxal, tezyîl, îhtîras, tetmîmîyê jî tê. Di mewlûda Bateyî de mecaza eqlî kê m be jî di hinek hevokan de heye.

Di mewlûda Bateyî de mijarên Beyan hemû tên şibandin îstîfare, mecaza mursel û kînaye giş hene. Pir mînakên îstîfaryên cuda di mewlûdê de di mewlûdê de cî girtiye. Îstîfaryên eslîyê, tesrîhîyê, tebeîyê, meknîyê, texyîlîyê, terşîhîyê, mutleqa û tecrîdîyê hemû di mewlûdê de hene. Ji zanista belaxetê bedî jî huner di mewlûdê de hene. Hinek ji wan tewrîyê, tewcîh, tîbaq, muqabele, mura'etu'n-nezîr, tecahulu'l-arîf, tenasub, cînas, tefrîq, qelba mekanî, teqşîm, cem, tecrîd, îqtîbas, telmîh û muşakele ye.

Di mewlûda Bateyî de bê van hemû tiştan hinek tiştên nahwî hene. Ew jî eleqeya wan pir bi belaxetê ve heye. Bikaranîna bêjeyên zaîd, cureyên îdafeyê, hatina mewsûfê sîfetê bi îdafeyê, muteadîtî û lazîmtî hemû mînak in ji bo tiştên me gotin.

Bêyî van hunerên me gotin pir nukteyên edebî jî di Mewlûda Bateyî de hene. Hatina navan li devsa cînavan, an ji hatina cînavan li dewsa navan, hatina mesderê, îsmê faile, ismê mefûlê, lêkera "bihurî"yê, lêkera "bê"yê li dewsa yên din û nekretî, marîfetî hwd., ji mînakan hinek in. Ev jî nîşan dide ku mewlûda Bateyî ji alîyê hunerên edebî ve dewlemend e û girîng e.

ÇAVKANÎ

- Adak**, Abudurrahman, *Teşeyên Nezmê Di Edebîyata Kurdî Ya Klasik De*, Nûbihâr, 2019-Îstanbul.
- Adak**, Abddurrahman, *Destpêka Edebîyata Kurdî Ya Klasik*, Nûbihar, İstanbul-2013.
- Adak**, Abdurrahman, “*Destnivîsên Mewlûda Melayê Bateyî Di Arşîva A Jaba De: Nasandin û Analîz*”, *The Journal of Mesopotamian Studies*, C:2/2, Havîn, 2017.
- Amedî**, Seyda Mela Zeynelabidîn, *Behcetü'l-Enâm bi Şerhî Mewlîdî Sahîbî'l-Meqam*, Mektebetu Seyda, Diyarbekir-2011.
- Aslanoğlu**, Osman “*Di Mem û Zînê de Çend Hunerên Wateyî*”, *Muqaddîme*, 2019 10 (1).
- Aslanoğlu**, Osman, “*Di Mem û Zînê de Hunerên Mecazî*”, e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi, Nisan-2019 Cilt:11 sayı 1 (23).
- Baba**, Merdoxê Ruhanî, *Dîroka Navdarên Kurd*, (werger: M. Reşîd Irgat û îsmet Kılıçarslan), Nûbihar, İstanbul-2020.
- Baykal**, Abdullah, *Sîwana Quranê Meala Qurana Pîroz*, Nubihar, İstanbul-2017.
- el-Behrekî**, Tahîr Molla ‘Ebdullah, *Heyatu'l-Emcad Mîn ‘Ulemaî'l-Ekrad*, Daru İbn Hazm, Beyrut-1436/2015.
- Bozarlsan**, M. Emîn, *Ferhenga Kurdî*, (Amadekar: Ünal Yardımcı), Weşanên Deng, İstanbul-2011.
- el-Buceyremî**, Suleyman Muhemmed, *Tuhfetu'l-Hebîb ‘ela Şerhi'l-Xetîb*, Daru'l-Kutubi'l-İlmîyye, Beyrut-1996.

Celâlî, Seyda Mela Musa el-Beyazîdî, *Feydu'l-Qadîr Şerhu Mevlidi'l-Kurdî*, Sembol, İstanbul-2010.

Çağmar, M. Edip, *Edebî Açından Arapça Mevlitler*, İlahiyat, Ankara-2004.

Ertekin, Zahir, "Mela 'Elîyê Baqûstanî û Mewlûda Wî", *Muqaddîme*-2015 , 6 (1), r., 107;

Farqînî, Zana, *Ferhenga Kurdî Tirkî, Enstîtuya Kurdî Ya Enstîtuya Stenbolê*, Stenbol-1992.

Hemdî Selefî, 'Ebdulmecîd-ed-Doskî, Tehsîn Îbrahîm, 'Îqdu'l-Cuman, *Mektebetu'l-Esale ve't-Turas, eş-Şârîqa*-1429/2008.

el-Hindî el-Mutteqî, 'Elî b. Husam, *Kenzu'l-'Ummal*, agahiyên din kifş nînin.

Godişkî, Seydayê Mela Nûrullah el-Xuyûtî, *Sehlu'l-Mewrîd fî Şerhi'l-Mewlîd*, İstanbul-2010.

İbnu'l-Esîr, Mecduddîn, *Camî'û'l-Usûl fî Ehadîsi'r-resûl*, (thq., Ebdullah el-Arnawut), *Mektebetu'l-Hulwan*, Ciyê çapê kifşnîne, 1969-1972.

Îlhan, Zîver, *Mewlûda Mela Husynê Bateyî (metn û lêkolîn)*, (Zanigeha Artuklu Teza Bilind), Mêrdîn-2013.

Kızıl, Hayreddin- **Şığnar**, Cemal- **Çetin**, Ramazan "Ceribandinek Li ser Senîfadina Kurdîya Kurmancî li Gorî Mijarên Wan", *Înternational Journal of Kurdish*, Issue, No. 1. (2015/1), s.58.

Kızıl, Hayreddîn, "Diyarbakır ve Çevresinde Yazılmış Mevlitlerin Konularına Göre Tasnifi Denemesi", e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi, Sayı: VII, Nisan-2012.

Kurdo, Qanatê, *Tarîxa Edebîyata Kurdî*, Weşanên Lîs, Amed-2010.

Melayê Bateyî, Huseyîn, *Mewlûd û Hemû Helbestên Wî*, (Amadekar: Rênas Jiyan), Belkî, Diyarbakır-2013.

Melayê Bateyî, Huseyîn, *Mewlûdu'n-Nebî*, (Tahqîq ve şîrovekar; 'Ebdulbasît Muhammed 'Ebdus-samed el-Amedî), Nubihar, İstanbul-2003.

Melayê Bateyî, Huseyîn, *Mewlûd*, (Amadekar: Huseyn Şemrexî), Nûbihar, İstanbul-2018.

Melayê Bateyî, *Mewlûdu'n-Nebî*, (Amdekar: Kurdîzade Ahmed Ramiz, Qahire-1324), .

Molla Hüseyîn Bateyî, *Mevlîd-i Şerîf/Mewlûda Nebî*, (Werger û Şîkar: M. Xalid Sadini), T. C. Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, Ankara-2015.

Okiç, Tayyip, "*Çeşitli Dillerde ve Süleyman Çelebi Mevlidinin Tercemeleri*", Atatürk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, sayı: 1975

Sexawî, Muhammed b. 'Ebdurrahîm, *Îlan bî't-tewbîx li men zemme't-tarîx*, Weşan: el-Qudsi, Beyrut-1403/1983.

Zekî Beg, Muhammed Emîn, *Meşahîru'l-Kurd ve Kurdîstan*, (Werger: es-Seyyidetu Kerîme), Daru'z-Zeman, Dimeşq-2006.